herêmêm din re diçû û ew ji diketine rê de û dihatina alî wan. Yên ku ew rewş li ser lingan dihişt û bi rê ve dibir û pêşengitî jê re dikir mirovên 'pîr' bûn. Mîr, ku dibû mîr, bi hebûne xwe re weke pîrekî jê re rêz dihata girtin. Di civatan de li gotine wî dihata hisandin. Ti kesekî jê re ne digot ne. Bi vê yekê re ew êdî mîr bû. Naîriyan, bi vê yekê re rewşeke ku pir pêşketî afirandibûn. Xosletekî naîriyan ew bû ku bi vê yekê re li gor hizre civakatîyê jîn bibin bûn. Bi vê yekê re li pêş bûn. Wan pergala ku di nav xwe de afirandi bû û avakiribû, li gor nêzîkatiya civakatîyê bû. Ew li hizre civakê jîn dibûn. Ku em bêjin, ew hizre civakatîyê ya ku iro pêşketiya, wan di pêvajoyaka wê de weyneke mazin leyist, ma gelo wê xalat bê? Dema ku mirov li wê demê û pêşketinên wê demê dimeyîzenê, mirov nikarê bêje ku ew yek xalata. Ew, pêşketina ku di dema sumeriyên de derketibû hole û Akad û Babilî ji li gor wê jîn bûbûn û ew di rewşe xwe de hinekî dî ji bi pêşve biribin, wan ji hinekî dî bi pêşve bir û li gor demê bi têgihiştin kirin. Wan têgihiştine xwe ya demê, kire nivîsê de ji. Naîrî, dema ku mirov li kêvalbarên ku ji deme wan mana ku mirov li wan dimeyîzenê, mirov vê yekê baş û qanc dibîne. Wan pêşketina xwe dana nivîsandin. Wan hizre xwe ya ku di pêşketine hizre civakatîyê de weke pêvajoyaka girîng ku derdikeve pêşiya mirov, dana nivîsandin. Bi wê nivîsandinê ji, di demên xwe yê piştî de weyn leyistin. Dema Medan li ser wê demê re bi pêşdikeve. Hizir û pêşketinên wê demê dixwênin û fahmdikin û bi têgihiştin dikin û li ser wê têgihiştinê re pergala xwe di damazirênin û xwe bi hêz dikin. Bi vê yekê re divêt ku mirov wan pir baş bi xwêne. Li me, ku deme naîriyan baş newê fahmkirin, wê deme Medan ji di fahmkirin û têgihiştinê de kêmbimene. Ji ber ku deme Medan, demeke ku pişt wê demê re tê û li ser hizir, nirx û pêşketinên wê xwe ava dike. Bi vê yekê re Medan, bi pêşketine xwe re, bi hizir û pêşketine hizre xwe re, weke sentezeke ku sûd û encama wê demê bê ya.

Bi vê yekê re, mirov karê pêşketina Medan bêne ser ziman. Pêşketine Medan, di xwe de di pêşketine xwe de, deme nû ya. Ew dema nû ji, çawa ku xwe formûla kiriya, her weha li ser wê yekê re hebûne xwe berdewam dike. Li ser wê yekê re hebûne xwe mazin tene ser ziman. Medî jiyana xwe her weha li gor hizir û pêşketine xwe ya ku heye di sert û mercên xwe de nûjen û hemdem dikin. Bi vê gotinê re mirov karê bêje ku xosletekî wan yê din ji derdikeve hole û tê fahmkirin.

Medî, ew hizre ku pêşketî, di deme naîriyan de, di dema wan de hinekî dî ji bi pêş dikeve. Hinekî dî ji mazin dibe. Hinekî dî ji bi pergala dibe. Êdî bi wê pergala bûnê, mirov karê bêje ku hevirdore wan bi tavahî karê ji wê

hizrê û ji wan sud bigirê. Sud girtin, ji wan mazin dibe. Di deme wan de anatolia bidest pêşketinê dike. Filozofên mazin derdikevin li anatolia. Filozofên weke Thales, artistotales, Platon derdikevin. Thales û Artistotales û hê gelek filozofên wek wan çûne welatê Mediya û ewder dîtina û ji pêşketine wan pir sudne mazin derxistina. Ew hizrên ku li wan deran dikiina serê xwe de, li anatolia û Athene tênine ser ziman. Her weha pir rewş derdikevin. Herodot bixwe ji çûya Mediya. Wî ewder dîtina. Pêşketina wan pir baş û qanc fahm kirina. Berî wan Homeros ji bixwe ji riya xwe bi wanderan xistiya. Ew tê gotin ku ta bi misrê wanderan çûya. Bi vê yekê re, û rewşên her weha re, hizir û pêşketine wê xosleteke gerdûnî yê bitêgihîştin ditêne. Bi vê yekê re êdî jiyana û têtigihîştinê wê, ji xwe êdî bi gavên mazin û demên biçûk bi rê ve diçê. Di demên biçûk de, pêketinên mazin derdikevine hole.

Di medan de, pêşketin ku tê ser ziman, bi hinek xoslatan ji tê ser ziman. Divêt ku mirov mazin bêne ser ziman. Jiyana wan pêşketî ya. Ew hevirdore xwe, di derbarê wê de xwedî têtigihîştin. Di derbarê jiyana xwe de xwedî têtigihîştin. Medîyan, di qasrên xwe de pirtûkxaneyên mazin avakirina. Di wê demê de ev yek kirina. Bi vê yekê re, dema ku mirov pêşketine wan bêne ser ziman, divêt ku mirov hinekî mazin û bi têtigihîştin bêne ser ziman. Bi vê têtigihîştinê, divêt ku mirov wan civatên wan bêne ser ziman. Ew civat, bingihne pêşketinê yên mazin. Di dema naîriyan de ev yek her weha mazin bû. Di deme Medan de, hinekî dî ji maztir dibe. Med, bi civatan re, rewşe xwe bi pêş dixin û rêveberiya xwe bi rê ve dibin. Bi vê yekê re, civat bi gelek xosletan tê ser ziman.

Civat, dema ku mirov bahsa wan bike, divêt ku mirov di vir de hinekî bi hizir bêne ser ziman. Naîriyan, civat weke perlemento û senetoyên bi kar dianî. Ji ber vê yekê, civat hinekî girîngin. Bi hebûne civatan re, di nav naîriyan de, hinek nîrx û kevneşopî ji hebûn. Divêt ku mirov wan ji bêne ser ziman. Her kom û herêm, bi civat bû. Her kom û herêm, di civatan de ku dihatina cem hevdû ku hizrên wan ji hevdû re hebûn digotin. Ku tiştekî wan ji hevdû re hebene ji hevdû re digotin. Axlabe ji, deme ku mirov hebûne civatan bixwe bêne ser ziman, mirov vê yekê bêne ser ziman. Axlabe ji, civat ji mirov 'kal' pêk dihatin. Bêja 'kal' bixwe ji, ji wê demê, xwediyê pêşketineke ku bi pergala. Kal, yên ku pîr bûn û zanebûn. Her weha navserî xwe bûn. Bi vê yekê re ew hebûn. Wan kalan çî gotibana û biryar girtibana, ti kesekî ji wan re ne digot ne. Bi vê yekê re, ev rêvebirê nav xalkê bûn. Bi vê yekê re ji, xwediyê hebûneke ku hizre civakî her weha bi pêş dixistin bûn. Wan bi vê yekê re hizre civakî ji bi pêş dixist. Ji xwe,

ew bi wê rewşê xwe ya ku weke ku di civatan de yên bigotin bûn, ew pêşengê vê yekê bûn. Bi vê yekê re mirov divêt ku hinekî dî ji wan mazin şîrove bike. Divêt ku mirov hinekî dî ji wan bi hizir şîrove bike. Ew afrinerê civatan bûn. Bi vê yekê re, wan di civatan de li ser bi hev re bûnê hizir dikir û dianî ser ziman. Ji xwe, ew bi hev re bûn bi serê xwe ji, dibû weke rewşekê bi wan re. Li hevdû meyîzandin û li ruyê hevdû meyîzandin û hevdû naskirin û bi nerîne li hevdû re hevdû di serê hevdû de bicih kirin, dibû hîmê hizre civakî. Wan, bi civatê re, ji vê yekê re û pêşketine wê re pêşengtî dikir. Bi vê yekê re, mirov karê wan kalan weke filozofên hizre civakîyê şîrove bike û bêne ser ziman. Ji xwe ji, ew wilo bûn. Ew xwediyê rastiyek û hebûneke wilo bûn. Naîriyan, pir rêzeke mazin ji kalan re digirt. Kalitî, li cem wan, pir bi rêz û nirx bû. Heçikê ku kal bû, dibe weke hizirvanekî xalkê. Ji wê zêdetir ji, nêzîkatiyeke piroz ji li wan dihata kiirn. Bi vê yekê re, bi kalan re çandak û pir kevneşopî hebûn bi wan re. Kal, yên ku civat li ser lingan digirtin bûn. Yên ku di civatan hizir çêdikirin bûn. Yên ku hizir dikirin û riye qanci û neqanciyê zanibûn bûn..

Civatan de hertimî gotina pêşî ya wan bû. Ji ber vê yekê, deme ku li civatê dihata rûniştin, pêşî bal diçû ser wan. Kalitî û civat, bi vê yekê re, du bêjeyên ku bi hev re bûn. Hevdû diafirandin bûn.

Hizre xalkê di civatê de çêdibe. Di civatê de ku cêdibe, êdî belav dibe. Bi vê yekê re, çend ku kurbûn û mazin bûn çêdibû, êdî pêşketin ji derdikete holê. Bi vê yekê re, bi civatiya xwe re, naîrî, bingihê civakîyê bi têgihîştin diafirênin. Ew di vê yekê de, pêvajoyaka ku ti carî divêt ku newine binçavkirin in. Wan di vê yekê de demne nû dana dest pê kirin. Pêvajoyne nû dana çêkirin. Bi vê yekê re, mirovahî li wan deyndara. Pêşketina bi wan re çêbû, di dema Medan de û piştre, bêhtir bi têgihîştin bû û mazin bû û bû bingihê gelek pêşketinên din. Bi vê yekê re, deme ku miorv civatê têne ser ziman, mirov gelek tiştan û hizran û deman têne ser ziman. Civat, her weha bêjejeke ku pir mazina.

Vêce, civat, her weha ku mirov têne ser ziman, mirov bahsa gelek nirxan dike. Ji wan deman ta deme Mihamed, civat, mazin li dar bûn. Civatan di kevneşopîyên xwe de pir pêşketin çêkiribûn. Lê belê, hebûnên xwe ji berdewam kiribûn. Bi vê yekê re, divêt ku mirov bahsa civatan bike. Ta ku hatibû wê demê, civatan, bi gelek awayan pêşketin çêkiribûn. 'Civatên rêveberan', 'civatên dergah û parastgahan', 'civatên xalkê' û hwd, hê gelek awayên wan hebûn. Di wê heyeme de, li medrese, mihamed, li medrese di civatê de bû. Di nav faqa û sofîyan de rûniştibû û di axivî. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li cem wî bû.

Mihamed, civata zanistan de bû. Bi wan re rûniştibû bû. Bi wan re diaxift. Li dore wî ji her weha pir mirovên ku karibûn ku pêre biaxivin û bidin û bistênin. Ew demek bû bi ser ve çûbû bû ku mele Serhengê zaxoyî gahabû bû rehmate xwe. Hê ji nûkava ji çilê wî derdiket. Hê di aqilan de bû. Ew ne dihata ji bîrkirin. Ji ber ku wî cihê k mazin bi xwe re di nav xalkê de û di nav mirovên li dore xwe de di girt. Ji ber vê yekê ji, pişt wî re cihê wî pir baş û qanc dihata xuyakirin. Ew xuyakirin, li ber çavên herkesekî bû. Li ber çavên Mihamed bixwe ji bû. Wî ew demeke ne zêde dirêj dîtibû û naskiribû. Pêre demekê ji mabû. Di wê demê de çend ku Mihamed di dilê wî de çih girtibû bû, her weha wî ji di dilê wî de cih girtibû bû. Mihamed, ew ji bîr ne dikir. Bi vê yekê re, pir li ser wî di hizirî. Bi hev re ji Cizîre bota ketibûbûne rê de û hatibûbûna wir. Wê j wir, bi hev re çûbûban herêmên rojhilat û li wanderan ji gerahaban. Lê ew çûne wan, di nivê rê de weke ku qutbû bû. Ev ji di serê Mihamed de bû. Vêce nahaka ew li medrese di nav faqa û sofîyan de weke seydeykî mazin rûniştibû û ji wan re dianî ser ziman. Seyde Avdîrehîmê xaniqî ji di rex de rûniştî bi bédeng bû. Deng ji wî ji dervediket. Bala wê li ser Mihamed bû. Mihamed diaxift û wî li wî dihisand. Lê dimeyîzend. Lê ew bi bédeng bû. Ka di serê xwe de çî dihizirî û çî dibir û dianî.

Di wê rojê de, ji xwe, ew ji zû rabûbûn, Weke her rojên din. Hê mirovên ku ji deverên dûr dihatin û dergaha mele Serhengê zaxoyî zîyeret dikirin hebûn. Yên ku dihatin, gelek ji wan, seyde bûn. Yên ku dihatin, pirrên ji wan, li wir diman. Ji ber ku ji deverên dûr dihatin. Ne dibû ku ew di heman rojê de vegerehebana. Ji ber vê yekê ji ew ji li wir diman. Vêce ku diman, Mihamed û mirovên weke wî, di nav wan de dirûniştin nimînerî dikirin. Bi vê yekê re, êdî ew ji li wir hinekî dî ji bicih bûbûn. Piştî ku her weha hinekî dem têve çûbû, êdî wê rewşê, hebûne xwe hema wilo berdewam kiribû. Êdî Mihamed li medrese mabû bû. Ew demek bû ku wê rewşê wilo hebûne xwe berdewam dikir. Wê sibehê ji hinek mirov hatibûbûn. Li wir mabûn. Li medrese mabûbûn. Lê hê bi ber deme asrê ve diçû. Hê wilo zêde ne dereng bû. Ew demek bû ku wilo rûniştibû bûn. Divêt ku rabûban. Ji bo ku çûbûban û li mizgefte mêje xwe ji kiriban. Mîr birahîm ji, di wê heyeme de, ne li wir bû. Ew li qasre xwe bû. Li qasrê ji mêhvan hebûn. Li mizgefte, ne mumkun bû ku wan hevdu ne dîtina. Wê ew ji di wê deme mêje de wê li wir bana. Wê ew ji hatiban wir, ku mêj kin. Mihamed, ji ew demek bû ku diaxift. Mirovên ku li dore wî ji, bi hey bala xwe dabûbûnê de û lê pir bi bal lê dihisandin. Lê wî ji axiftina xwe bi

dawi kiribû. Êdî wilo axiftinên mazin ne dihatina kirin. Vê yekê ji dide dide nîşandin ku wê rabûban ser xwe û wê çûbûban mêj mizgefte.

Beş 3.

Xweza rastiyeke jiyanê ya.Dema ku mirov li xwezê dimeyîzenê, mirov jiyanê ji dibîne. Dar, sawal, û hê hê gelek heywanetên binard û serard wê jiyanê di afirênin.Hemû bi hev re di xwezê de di ahengekê de jîn di bin. Jiyana, her weha pir mazina.

Ku mirov di serê xwe de li jiyanê di hizirê, mirov ji gelek aliyan ve karê wê hizir bike.Lê hê gelek alîyên wê hene ku em nikarîn hizir ji bikin. Ji ber ku me ne dîtina an ji di derbarê wan de di serê mirov zêde wilo ti agahî zêde nînin. Bi vê yekê re mirov kifşdike ku dîtina, bi mirov re hîmê hebûna hizre. Dema ku mirov li ser tiştêkî di dihizirê, mirov ku di derbarê wî tiştî xwedi dîtina û agahî bê, hingî mirov karê bêje, ku mirov wê xwedi hizir.

Jiyana, di ahengê xwe de di dijî.Di hebûne xwe de dijî.Mirov ji bi jiyana xwe re ji wê ahengê ne dûre. Li gor Mihamed, mirov qatek ji wê ya. Mirov ne bê xweza ya. Ew wilo mirov hizir dike û têne ser ziman.Li gor vê yekê, mirov di jiyanê de, li gor wî xwedi hebûne. Jiyana mirov li gor wî bi serê xwe ji nîne. Gelek tişt yên bi me re jiyana me kifş dikin hene. Lê mirov bi aqilê xwe di nav waqas tiştan de ji yê herî ku mazin kifş dike ya. Bi vê yekê hebûne mirov têne ser ziman.Dema ku ew di nav mirovan de diaxivê her weha pir li ser jiyanê ji di sekinê. Li ser hatina û çûna mirov ya ji jiyanê ji dirawastê. Bi vê yekê re pir mazin têne ser ziman. Dema ku ew diaxivê, pir bizane diaxivê. Bi wê zane axiftina xwe re bala hevdirdore pir maztir dikşêne ser xwe.di wê heyeme de ku wî di nav mêhvan û faqayên li dore xwe de axiftin dikir ji, her weha bi vê yekê re pir balaka mazin li wî çêbû bû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di cihê xwe de rûniştî bû û bala wî li ser Mihamed bû û bi bêhis lê di hisand.Mihamed ji dore xwe re diaxift. Weke demekê diaxivê.Piştî di sekinî Deme ku ew disekinê, weke ku ew mirovên li dore wî yên ku lê di hisandin, werine xwe li wan têt û bala xwe didinê de. Piştî wî ji demekê bêdengî çêdibe. Deng ji ti kesekî dernekeve. Mirovên ku li dore wî ne, deng ji yek ji ji wan dernekeve di wê heyeme de. Piştî bi qadarekê re deng ji seyde Avdilrehîmê xaniqî derdikeve. Ew mafê axiftinê di nav civata li dore xwe de dihilde û hinekî di axivê. Sê çar lavzan di bêje. Lê ew ji wilo zêde ne axivê.Di axiftine xwe de tenê hema wilo deme bi bîre mirovên li dore xwe de.Piştî ew ji di sekinê. Zêde wilo ti axiftinê neke. Lê bi axiftina wî re, weke ku balaka mazin çûbûbê ser wî dibe.Wî ji ev yek fahm kir. Bi wê fahm kirinê re, wî ji bala xwe bire ser

Mihamed. Dema ku wî bala xwe bire ser Mihamed, dît ku wa Mihamed ji di cihê xwe de maya sekinî bi bêdeng. Ti deng û sahl jê dernekeve.

Bi vê yekê re, seyde Avdilrehîmê xaniqî weke ku bixweze wê bêdengiyê xirabike kir. Bi awayekî ku bixweze wê bêdengiyê wî xirabike lê meyîzend. Mihamed ji deme ku wî wilo meyîzend, ji wê nerîne wî, ew nêhte wî fahmkir. Piştî ku Mihamed ew nêhte wî fahm kir, êdî kir ku bide xwe û xwe ji wî bêdengiyê derxe. Wî ji her weha weke naqlekê an ji du naqlan da xwe di wê heyeme de. Mirovên li dore wan ji bala wan li ser wan bû. Di wê heyeme de, weke yê xwediyê malê di nav civatê seyde Avdilrehîmê xaniqî hebû û Mihamed hebû. Wan çî gav avêtibana, wê mirovên li dore wan ji weke wan gav avêtibana. Mihamed, di serê weke ku li ser ku çî gavê biavêje di hizirî. Lê wekî dî ji, dihata têgihîştin ku ew di serê xwe de di hizre xwe de ji wir dûr ketiya. Her weha ji dihata xuyakirin. Mihamed, piştî ku weke ku carekê an ji du caran da xwe, êdî piştî bal çûn ser wan. Dema mêje ji hatibû. Divîbû ku çûbûban mizgeftê ji. Ev yek ji xwe, di wê heyeme de di aqilan de bû. Bi axiftina seyde Avdilrehîmê xaniqî re hatibû bîre herkesekê li wir. Li bîre Mihamed ji bû. Lê Mihamed di cihê xwe de bi bêdeng mabû bp sekinî. Ma gelo ji bo çî? Ji bo çî ew di cihê xwe de mabû bû sekinî di wê heyeme de? Ew ji ne kifş bû. Lê sekinî bû. Bi bêdeng bû. Bal ji li ser wî bûn. Piştî ku her weha weke demekê dem buhurî, êdî piştî ne bi gelekî re Mihamed ji da xwe û kir ku bide pêşîya civatê û rabine ser xwe û herine mizgeftê. Piştî ku her weha Mihamed li anî ku rabe, êdî piştî zêde ne ma û rabû ser xwe ji cihê xwe di wê heyeme de. Dema ku da xwe ku rabe, bi dengê ku 'de êdî em rabin û herine bi ber mizgeftê ve ji, dem tê', da xwe û rabû ser xwe di wê heyeme de. Dema ku ew her weha rabû ser xwe, êdî pêre, mirovên ku li dore wî bûn, hemûkan bi hev re bi wî re da xwe û rabûna ser xwe di wê heyeme de.

Ku rabûna ser xwe, êdî Mihamed bixweze derkete pêş. Dema ku rabû ser xwe, ku mirovên li dore wî ji pêre rabûna xwe, weke ku li dore wî bibîne kom, bû. Bi vê yekê re Mihamed weke ku di nêvîyê wan de bimene ma. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li cem wî bû. di rex wî de mabû bû sekinî. Ew yek bixweza afirî bû. Piştî ku Mihamed da xwe, ku di rex wî de seyde Avdilrehîmê xaniqî heye û hin mirovên din ji yên ku bi zane ne, ku di rex wî de ne, êdî bi hev re meşîn. Mihamed, ku di rex wî de seyde avdilrehîmê xaniqî û hinekî mirovên din ji ku weke wî mazin û zane û navdarin ji di rex wî de meşîn. Li dore wan ji pir mirovên ku dimeşîn

hebûn. Hemû ji, mirovne ku mazin bûn û zane bûn. Di rex hevdû de ketine ser rê de û kirin ku herine bi ber mizgeftê de.

Dema ku ketine ser rê de, Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî di rex hevdû de bûn. Seyde avdilrehîmê xaniqî pir aşqî axiftin bû. Di rê de ji di axift. Zimanekî wî yê pir xweş ji hebû. Dema ku diaxift ji pir xweşik û xweş diaxift. Mirov, lê dihisand, ji axiftine wî têr ne dibû. Her weha hingî xweşik diaxift. Di wê heyeme de ji her weha ew diaxift. Bi axiftina xwe re, herkesek li xwe dide hisandin. Lê deme ku diaxift, dikir ku mirovên dore wî hemû ji pêre bikevine axiftinê de. Her weha mirov bi axiftina xwe ya delal di kişanda axiftinê. Mihamed ji her weha ziman xweş bû. Zimanê wî ji wilo xweş bû..

Seyde Avdilrehîmê xaniqî, bi hin danûstandinne dikir ku axiftin di nav wan de bibe. Bi wî re, mirovên li dore wî ji, yên biaxiftin biaxivin. Ew dikişandina nav axiftinê. Bi vê yekê re dimeşê de ji xwe re diaxivîn û diçûn. Her weha di rewşekê de bûn. Mihamed ji bi mirovên ku di rex wî di demeşîn diaxift. Wî ji hin axiftin dikir. Lê wilo zêde ti axiftin mazin ne dikir. Lavz bi lavz diaxift. Lê axlabe ji, weke ku di hizirî di rewşekê de bû.

Ku weke qadarekê dimeşîn êdî digihine nêzîkî mizgeftê. Dema ku digihine nêzîkî mizgeftê, êdî bi hev re dikin ku herin û xwe bigihinênine de û bikevine hundur de. Hê hinekî jê dûr bûn. Lê wilo dihata xuyakirin ku pir mirov têde hebûn. Ji dûrve gelek mirov dihatina xuyakirin. Wê yekê dide xuyakirin ku mîr berî wan bi mirov ku pêre ne, hatiya mizgeftê. Ku mîr ne li wir bana, wê wilqas mirov bi hev re bi careke re ne li wir bana. Dema ku Mihamed û mirovên ku pêre ne, ku her weha dîtîn, êdî weke ku geşbûnek bi wan re bibe bû. Weke ku ji rewşe xwe werine xwe li wan hat. Seyde Avdilrehîmê xaniqîni wilo lê hat. Dema ku wan wilo pir mirov bi careke re biçav li ber çavan dîtîn, êdî wan ji weke ku gavên xwe hê zûrtir kirin. Bi wê zûtirkirinê re ji, êdî zêde dem têve neçû û wan xwe gahanda ber devê deriyê mizgeftê. Deriyê mizgefte bixwe ji, weke ku ji zêr bê dihata xuyakirin. Menteşên wê wilo li ber çavan diketin. Derî hinekî biling bû û fireh bû. Hêtên hawşê ji, bilind bûn. Pir xweşik dihatina xuyakirin. Li ser kevî û serdorên hêt, naqş dihatina xuyakirin. Lê derî pir bi bal bû. Dema ku lê dihata meyîzendin, weke ku mirov nîgerekê meyîzenê li mirov dihat. Wilo xweşik bû. Li ser derî bixwe ji naqş hebûn. Li ser deverên ku weke ku hesin bûn ji naqş hebû. Hin nivîsên bi kurdî hatibûbûn nivîsandin ji li ser hebû. Dema ku mirov lê dimeyîzend, her weha pir nerîneke xweş û xweşik bi ber çavên mirov diket. Derî, bixwe, ku mirov lê dimeyîzend, weke deriyê mizgefte Nebi Nuh ku li Cizîre bota dihata xuyakirin. Weke

ku yê n ku ew derî çêkiribûn, ew derî dîtî bûn. Gelek tijbandinên weke hevdû lê hebûn. Derîyê mizgefte Nebî Nuh li Cizîre bota bi nav û deng bû. Pir bahsa wê ji, dihata kirin. Li ser derî gelek ayatên pîroz yê n bi kurdî hebûn. Nivîsên ku hatibûbûna nivîsandin ji, ji bo ku mayînda bin, weke ku rism li ser hatibe halandin û pê hatibe qayîmkirin dihatina xuyakirin. Bi halandina rismê weke ku nivîs hatibûbûna nivîsandin. Lê nivîs weke ku li ser hesin bin dihatina xuyakirin. Lê wir ji, derî wilo hatibûbû çêkirin. Bi vê yekê re, gelek tijbandinên weke hevdû li ser hebûn. Li wir ji, li ser derî, hinek ayatên ku bi kurdî hatibûbûna nivîsandin hebûn. Dema ku mirov ji dûr ve lê meyîzendibana bi ber çavên mirov diket. Mirov didît. Ew mizgeft ji mazin bû. Ji aliyê şêx ve hatibûbû çêkirin. Pir mazin hatibûbû çêkirin. Bi vê yekê re navê wê ji hatibû. Ji ber ku şêx çêkiribû, têde mêj kirin ji bixêr dihata dîtin. Ji ber vê yekê, ji gelek deverên dûr û cûr ji mirov dihatina ku li wir mêj bikin. Hundurê wê ji, ji gelek beşan pêk dihat. Beşa mazin ya mêjê bû. Lê beşa xwandinê lê hebû. Bêşa ku şêx hata wir û wê lê rûnihê ji hebû. Beşeka wê bi giştî ji ji bo pirtûkan hati cidakirin. Di hundurê wê beşê de ji, beşeke ku ji wan pirtûkan ji hinek pirtûk hatina naqandin û têde hatina bicihkirin hebû. Ew ji li ber çavan bû. Mihamed, bi mele Serhengê zaxoyî re pir li wir mabû û têde rûniştibû û bi hev re danûstandin kiribûn.

Mihamed û mirovên ku pêre ne, ku digihine mizgefte, êdî nasekinin û di kevine hundur de. Dema ku ew dikevine hundur de, êdî ew ji dibinin ku wa pir mirov li wir hene. Mîr ji li wir bû. Mîr bi mêhvan xwe û mirovên xwe re hatibû wir. Di wê heyeme de bi vê yekê re gelek mirov li wir hebûn. Dema ku mihamed û mirovên ku pêre ne ji, ketine hundurê mizgeftê de, êdî hê bêhtir bûne gelek di mizgeftê de. Seyde Avdîrehîmê xaniqî di wê heyeme de di rex mihamed de bû. Dema ku mihmaed kete hundur de û mîr û ku hinek mirov wê li dore wî ne, dît, êdî bi bi ber wan ve çû. Pêre Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ji çû. Dema ku çûn û gahana dehma wan, êdî wan ji ber û bala xwe di wan û silav da wan. Mihamed û seyde Avdîlrehîmê xaniqî, deme wan ku silav da, êdî wan ji silava wan hilda û silava wan li wan ve gerand. Êdî wan ji, ku silav da wan, êdî li wir li cihê ku lê sekinî bûn, li wir hinekî di bi hev re li ser lingan mana sekinî û piştîre ku demeke mêjê hat, êdî bi hev re kirin ku herine hundur.

Ku çûne hundur, mîr û Mihamed di rêze pêşî de rêzgirtin û bi hev re mana sekinî Piştîre ku mirovên din ji rêze xwe girtin, êdî bi hev re bidest mêja xwe kirin.

Ku mêje xwe kirin, êdî piştîre rêzên xwe xira ne kirin û wilo di cihê xwe de mana sekinî bi hev re hinekî ji xwe re axiftin. Mirovên weke seyde

Avdîlrehîmê xaniqî û yê n weke Mihamed çend gotin li ser hev gotin. Mîr ji çend gotin gotin. Hinek mirovên din ji çend gotin pişt wî re gotin. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku weke qadarekê bi hev re axiftin. Bala mîr, dema ku di axift ji li ser Mihamed bû. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ji ev yek farq kiribû. Lê ti tiştê ne gotibû û ne ji abû bû kifş kirin. Hema wilo tenê farqkiribû û mabû bû sekinî. Di wê sekne de ji, bala wî ji ne ku ne li sr Mihamed bû. Bala wî ji li ser Mihamed bû. Ev yek pir baş û qanc dihata farqkirin û kifşkirin. Mihamed ji dibêt ku ew bal û heyên li ser xwe kifş kiribûn. Lê deynedikir. Bêdeng bû. Weke ku di serê wî de tiştin hebûn û li ser dihizirî. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî weke ku zanibe ku ka ew di serê xwe de li ser çî di hizire. Bi vî awayî lê dimeyîzend. Lê tenê lê dimeyîzend. Lê di wê navbarê de axiftin ji dibûn. Mirovên ku dixiftin hebûn. Mîr ji car bi car mafê axiftinê di hilda, ku ne bi vegotinên dirêj bana, bi vegotinên kin hinek gotin digotin. Lê dema ku wî ji weke seyde Avdîlrehîmê xaniqî kifşkiribû ku Mihamed bi hizirê û her weha dîtibû, êdî ew ji weke ku bi hizir dibû. Weke ku mereq bike ku ka ew li ser çî di hizirê. Ka çî di serê wî de heya.

Mihamed, ew demek ku li wir bû. Li herêmê ji geraha bû. Li herêmê gelek dever dîtibûn. Li wanderan ji mabû bû. Li herêmê mirovên ku navê wan û rêze wan heya hema bêja gelek ji wan wî dîtibûn. Bi wan re mabûbû û hizre wan fêrbûbû. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku Mihamed di hizrê de xwe gahandibû astaka dî ya hê bilind. Li herêmê, gelek mirovên zane hebûn. Her yek ji wan ji bi zanebûne û hizire nav dabû bûn. Hemû ji, yê n weke mele Serhengê zaxoyî bûn. Weke wî xwedi dergah bûn. Navê wan hebû û rêz ji wan re hebû. Mihamed, hema bêje ppranîyên wan dîtibûn û naskiribûn. Bi wan re rûniştibû û bi hizir danûstandin kiribû. Bi vê yekê re hizre wan ji fêr bûbû. Wan ji hizre wî feê bû bû û ew nas kiribû. Ew bi mele Serhengê zaxoyî re ji Cizîre bota ketibû rê de û hatibû wir. Wê bi hev re ta bi rojhilat çûbûban. Lê mele Serhengê zaxoyî ne dima. Mihamed, di vê yekê de, weke ku hinekî êdî xwe bi tenê di dît. Pişt mele Serhengê zaxoyî bêhtir bihizir bû bû. Bêhtir dihizirî. Berî hingî çend caran bi seyde Avdîlrehîmê xaniqî re axiftibû û baş Cizîre bota kiribû û bahsa ku wê bi hev re çûbûban ta bi rojhilat kiribû. Bahsa, ku wê çûbûban herêmên Kirmaşanê û Dînwerê kiribû. Ne di demeke pir kevn de bahs kiribû. Berî hingî bi çendekê bi hev re danûstandin kiribûn û wî ji wî re bahs kiribû. Di wê heyeme de dibêt ku Mihamed wilqasî bihizir bû, li ser wê yekê di hizirî. Li ser çûna xwe ya bi wîr ve hizir dikir. Dibêt ku ev yek di wê heyeme

de di serê wî de. Lê dibêt ku tiştne din di serê wî de hebûn. Ne kifşbû ku ka çî di serê wî de hebû. Mihamed pir bihizir bû. Pir di hizirî.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku lê meyîzendibû û ew bi hizir dîtibû ew ji bi hizir bû bû. Ew ji weke ku di serê xwe de kur û dût çûbû bû. Ew di serê xwe de pir mazin çûbû bû. Dibet ku ev yek di serê wî de hebû. Dibêt ku ew danûstandina wî û Mihamed di serê wî de hebû di wê heyeme de. Ew ji ne kifş bû. Ew ji di serê xwe de bi hizir û weke ku heya wî ji wir nebe bû. Wilo di rewşekê de bû.

Mîr, dema ku Mihamed her weha bi hizir dîtibû, êdî ew ji bi hizir bû bû. Ew li ser wî bi hizir bû bû. Ew di hizir ku ka ew li ser çî di hizirî. Heya wî ji hizre di serê Mihamed de hebû. Berî hingê çend caran di civata wî û mele Serhengê zaxoyî de ew hizre wan ya çûna bi ber kirmaşanê ve hatibû rojava wan. Di wê heyeme de ew ji hatibû bîre wî ji. Lê yekî ji ji wan, di wê heyeme de ya di serê xwe de kifş ne dikir. Nîqaş dikirin. Li ser mijarên ku li ser dihata axiftin hizre xwe ji dianîne ser ziman. Lê her weha ku hizrek di serê wan de hebene ne dianîne ser ziman. Tenê bi çavan li hevdû dimeyîzandin. Weke ku bi çavan tiştne ji hevdû re bêjin. Ji wê pêve ti tiştêkî dî ne dikirin.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku li Mihamed dimeyîzend, her weha weke ku bi vê hizrê û ku di wê heyeme de hatibû bîre û li ser di hizirî dimeyîzend. Bala wî bi vê yekê, li ser Mihamed bû. Mihamed, bi bêdeng bû. Tenê dihisand. Car bi car ji ku çend lavz gotibana, ji wê pêve ti tiştêk dî ne di got. Mihamed bi bêdeng mabû.

Ew di serê xwe de pir di hizirî li ser demên xwe yên berê dihizirî. Li ser demên xwe yên li Cizîre bota di hizirî. Dibêt ku di wê heyeme de mele Silêman û faqa Qasim ji hatibûbûna bîre wî. Li ser wan ji di hizirî. Dibêt ku di wê heyeme de ew li ser wan demên wan yên ku wan bi hev re buhurandibû di hizirî. Her weha hizirkirin bîrkirina. Wî ji ew ji bîr nekiribûn. Ew di bîre wî de bûn. Li ser wan di hizirî. Li ser wan danûstandinên wan yên bi hev re dihizirî. Mihamed, her weha pir di hizirî.

De ne, divêt ku mirov wê deme jiyana Mihamed hinekî bi teybet bînine ser ziman, da qana were fahmkirin ku ka çima wilqasî li ser wan û wê demê di hizirî. Ew dem, di jiyana wî de pir girîng bû. Wî di wê demê de gav avêtibû jiyana hizir. Ji wê pêde ji, li wir, bi hizir mazin bû bû. Bi vê yekê re ew li wir, ne tenê bi hizir, bi hest ji mazin bûbû. Tiştên ku wî di dana hizirkirin di derbarê wê demê de, ne tenê yên hizirî bûn. Hinek benê hestî ji hebûn. Axlabe ji deme ku mirov wê hizir kirina wî hizir bike, divêt ku mirov vê yekê ji ber çavan dût neke. Meleyê Cizîrî bene ji wan benên ku

pêre yêne hestiyar bûn. Dilber û Dilşad wî ti carî ji bîr nekirin. Ew hertimî di serê wî de bûn. Gelek caran ji wî ew di nav civatan de di axiftinên xwe de anî ser ziman. Dilberê û Dilşad, bi mihamed re hîmekê hestiyar yê pir mazin afirandibû bûn. Mihamed, ku bahsa wan dikir û li ser wan hizir dikir bi hzir dibû. Hizreke hestiyar ya pir mazin pêre çêbû bû. Hest, mirov pir bi fêr dikin. Di jiyane de hest, mirov kur dikin. Mirov bêhtir tenik dikin. Mirov bêhtir zîz dikin. Peljenîyeke pir bi tenik bi mirov re çêdikin. Mihamed ji her weha pir tenik bûbû. Di afirandin û pêşketina Mihamed de ev rewşên ku wî jîn kiribûn, wî pir bi wate bûn.

Di wê heyeme de, Mihamed di nav mirovên li dore xwe de diaxivî ji. Piştî mêjê, di nav wan de ku ew di cihê xwe de rûniştî, nîqaşaka pir mazin û kur dest pê kiribû. Yê ku pir bi zanebûn, di wê heyeme de dixwestin ku di wê nîqaşê de xwe bidine der, xwebdine ber çavan. Bi vê yekê re, navber germû bû. Mihamed ji car bi car mafê axiftinê digirt û diaxift. Ew pir bizane bû. Dema ku diaxift ji, pir bizane diaxift. Ku diaxift, mirovên ku li wir bûn, lê pir bi bal di hisandin. Ku ew diaxift, deng ji ti kesekî dernediket. Herkesek bi bêdeng dima. Herkesekî bi bala heya xwe dide ser wî û lê dihisand. Mîr ji, ku ew diaxift, pir bala xwe dide ser wî. Mîr, ji xwe, bala wî li ser wî bû. Çawa, dema ku Mihamed hatibû û bala wî pir bi hey li ser wî bû, her weha piştî ji wê bala wî hebûne xwe berdewam kiribû. Çend ku Mihamed li wir hatibû naskirin, êdî bal bêhtir çûbûbûna ser wî di wê heyeme de. Mîr, bêhtir Mihamed di serê wî de cih girtibû bû. Ew bêhtir li ser Mihamed bi hey bû û bi bal bû. Di wê heyeme de dema ku Mihamed diaxift ji, wî bêhtir bala xwe dide ser wî. Mihamed, bi zanebûna xwe û her weha zanistîya xwe bal kişandibû ser xwe di wê heyeme de.

Civata ku piştî mêjê li hevdu rûniştibû û bi hev re bidest axiftinê kiribû, demeke dirêj her weha bi hev re axiftibûn. Bi hev re demeke dirêj bi wî awayî buhurandibûn. Piştî ku dem hinekî têve çû, êdî weke ku karê rabûnê wê bihatana kirin. Mîr ji, wê rabûbûna. Ji xwe divêt ku ji rabûbûna. Ji ber ku mêhvanên wî ji hebûn. Wê bi hev re ku çûbûban û hinekî li ser gerahaban wê gerahaban, lê ku gerahan an ji ne çûn û ne gerahan, wê rastûrast rê girtiban û çûban qasrê. Wê li qasrê dise civata xwe li dar xistiban. Ew mîr bû. Hertimî civate wî li dar bû. Hertimî li dore wî mirovên ku rûnitîbûn hebûn.

Mihamed, ku hinekî axiftibû, êdî piştî di cihê xwe de mabû sekinî bi bêdeng. Ti deng jê dernediket. Seyde Avdilrehîmê xaniqî bala wî li ser wî bû. Mihamed bi awayê ku rûniştibû, berê wî li aliyê cihê kurcika pirtûkan bû. Ew der li ber çavên wî bû. Li wir dimeyîzend. Berî hingî gelek caran bi

mele Serhengê zaxoyî re li wir li hevdû rûniştibûn. Bi hev re li wir rûniştibûn û li pirtûkan meyîzendibûn. Bi hev re ketibûbûn axiftin û nîqaşan de. Her weha gelek demên bi hev re li wir buhurandibûn. Nahaka vêce di cihê xwe de rûniştî û berê wî li wir bi wir ve dimeyîzend. Weke ku ew dem û rewş li ber çavên wî bûn. Her weha bi wir ve dimeyîzend. Deme ku mirov di wê heyeme de lê dimeyîzend, mirov di dît ku weke ku ne tenê bi hizir bû. Hinekî weke ku bi hazn ji bû. Her weha ji wî û ji rewşe wî dihata têgihiştin. Mihamed, her weha di rewşekê de bû.

Ku her weha weke qadarekê civata wan di cihê xwe de rûnişti dimene, êdî piştê bi pêşengiye mîr dike ku rabê ser xwe di wê heyeme de. Ku her weha li hatin dibe, êdî piştê ne bi gelekî re dirabine ser xwe ku derkevin ji mizgefte.

Mihamed, hê berê wî li wir bû. Hê bi wir ve dimeyîzend. Bala wî li wir bû. Weke ku li ser wan demn xwe yên li wir ku bi mele Serhengê zaxoyî re buhurandibûn di hizirî. Li ser wan deman di hizirî.

Bi vê yekê re ketibû hizirkirinaka wilo de ku weke k heya wî ji dore wî nebe bû. Wilo di rewşe xwe de dihata berçavan. Mihamed, her weha çiqasî li wir rûniştî bûn, berê wî li wir bû. Di wan demên ku axiftibû de berê wî li wir bû. Di axiftina xwe de li ser mele Serhengê zaxoyî ji çend gotin anîbû ser ziman. Ku hinekî li ser wî ji anîbû ser ziman, piştê axiftina xwe bidawî kiribû. Piştî ku wî axiftina bidawî kiribû, di wê heyeme de weke wî hinekî hazn weke ku bi mirovên li dore wî de ji çêbû bû. Deme ku wî bahsa mele Serhengê zaxoyî kiribû, hingî, weke ku hazn çêbû bû. Piştê ku wî axiftina xwe bidawî kiribû ji, hinekî bêdengî ji vê yekê bi wan re çêbû bû.

Lê wê bêdengîyê wilo zêde berdewam ne kiribû. Piştê ne bi gelekî re mîr ketibû devrê de û wî mafê axiftinê hilde bû ew bêdengî şikandibû. Deme ku axiftibû ji, weke qadarekê axiftibû û hinekî wî weke ku rastiyê bêne ser ziman, li ser dinyê û mirinê bêne ser ziman, axivî bû. Wî xwestibû ku bêne ser ziman ku mirov pêşîya me mirovan hemûkana. Ji ber vê yekê re ji, mele Serhengê zaxoyî mînaq dabû. Piştê hinekî wî ji bahsa qancî û zanebûne mele Serhengê zaxoyî kiribû. Li ser wî, ew ji her weha weke demekê axiftibû. Mîr, deme ku axiftibû, weke ku ne tenê xwestibû ku biaxivê. Ji wê ji zêdetir, xwestibû ku hinekî bideng bûne çêbike. Bi vê ermancê axiftibû. Lê wî ji kiribû û ne kiribû, êdî ew zindîbûn çênekiribû. Piştê ku hinekî li ser vê yekê re dem buhuratibû, êdî piştê bahsa rabûnê hatibû kirin. Ya rasti, ku mirov bêje, bi mirov re ji, weke ku hinekî hazniti hebû. Ew ji hinekî bi hazn bû. Dema ku lê dihata meyîzandin, ev yek pir baş û qanc dihata têgihiştin. Lê mîr, weke ku xwestibû ku wê haznitiya xwe

nede der, li xwe anîbû der. Lê ji wî ev yek dihata fahm kirim. Piştêre ku kara xwe ya rabûne kirin û ku rabûn, êdî mîr ti kesek ji mirovên li dore xwe ne berde û bi hev re ku hinekî çûn û li ser gerahan, piştêre berê xwe dana qasrê û çûne qasrê, ku lê rûnihin û civata xwe li wir li dar bixin. Dema ku rabûna ser xwe, êdî ne bi gelekî re ji mizgeftê derketin. Deme ku derketin ji, êdî hinekî bi ber çem ve bi ber dar û gulistanan ve çûn. Bi vê yekê re hinekî li ser xwe gerahan. Pêşiya wan daristan bû. Daristanaka pir gurr ji bû. Pir mazin bû. Dema ku ji dûr ve lê dihata meyîzendin, ev yek dihata ber çavan. Lê çem pir xweş bû. Li ber çem rûniştin an ji di ber de bi meşê çuyin pir xweşbûnek dikire dilê mirov de. Ew ji di wê farqê de bûn. Ji ber wê yekê, di nav wê xweşbûnê de diçûn.

Ku her weha weke qadarekê li ser xwe gerahan, êdî piştêre ne bi gelekî re kirin ku vegehihin û herine qasrê. Ku her weha dikin ku vegehihine qasrê, êdî ne bi gelekî re divegehihine qasrê û li qasrê bi hev re li civatê dirûnihin. Ku hatina qasrê û buhurtin û çûne mezele civatê û lê rûniştin, êdî piştêre ne bi gelekî re bidest axiftina xwe kirin. Bidest nîqaşkirin û danûstandinên di nav xwe de kirin. Mihamed ji û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bi mîr hatibûbûna wir. Mirovên ku bi wan re ji bûn, ew ji bi wan re hatibûbûna wir. Bi hev re hatibûbûna qasrê. Bi ev re di wê heyeme de li civate hevdu rûniştibûn. Civata mîr, pir mazin û dirêj bû.

Di wê heyeme de, deme ku bidest rûniştinê kiribûn, êdî piştêre ku rûniştibûn, êdî bidest axiftinên di nav xwe de kiribûn. Bidest guftûgoyan di nav xwe de kiribûn. Mirovên ku li wir bûn, yên ku ji xwe bi bawer û navserî xwe bûn. Yên ku ji aqlê xwe bi bawer bûn. Mirovne ku di nav xalkê de ji rêzê ji wan hebû. Mirovên wilo li hevdu rûniştibûn. Ji hevdu re diaxiftin.

Ku bi hev re bidest axiftinê kirin, êdî pêşî axiftina pêşî mîr kir. Wî pêşengtiye axiftinan kir. Pêşengtiye nîqaşan kir. Ku mîr hinekî axift, piştêre êdî mirovên dore wî mafê axiftinê hilda û yek bi yek êdî axiftin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji mafê axiftinê hilde û axift. Ew ji weke demekê axift. Bi vê yekê re mirov divêt ku bêje ku hin bi hin nîqaş di nav wan de dibû. Hin bi hin axiftin dibûn. Lê Mihamed hê weke ku li mizgeftê bû bi bêdeng bû. Lê bal ji li wir wî bûn. Ew mirovekî ku zanist bû û li berçav bû. Ji ber vê yekê ji, êdî bal li ser wî bûn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di farqa ve yekê de bû. Wî ji di dît ku bal li ser Mihamed in. Ku wî wilo dît, êdî wî ji li Mihamed meyîzend. Dema ku wî li Mihamed meyîzend, Mihamed dît ku wî li wî eyîzend. Dema ku dît ku wî li wî meyîzend, êdî wî ji berê xwe

da wî û li wir meyîzend. Bi vê yekê re weke ku herdû ji çav bi çav hatina hevberê hevdû.

Ku Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî çav bi çav hatina hevberê hevdû, êdî bi vê yekê re weke ku Mihamed were xwe lê hat. Mihamed piştî ku li wî meyîzend, êdî serê xwe rakir û li dore xwe meyîzend. Dema ku li dor xwe meyîzend, êdî dît ku wa bala mirovên li wir geleke ji wan li ser wî ya. Dema ku wî wilo dît û farq kir, êdî weke ku xwe li xwe bide hevdû kir û wî ji li dore xwe meyîzend. Di wê heyeme de, nîqaşa ku di nav wan de li civata wan dibû ji, j ya ku di mizgeftê de kiribûn ne cudetir bû. Ji mele Serhengê zaxoyî dest pê kiribûn û piştîre bi axiftinê û guftûgoyan bahsa pir zanistên mazin yên demê ji kiribûn. Bahsa Şêx Nişanî ji hatibû kirin. Ew ji mirovekî ku mazin û zane bû. Navê wî ji hebû. Wî ji piştî xwe re navek û gelek nivîs û pirtûk hiştibû. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku rêzeke ku mazin jê re hebû. Ew ji di wê heyeme de ne dima. Piştîre wî re ji, gelek û gelekî bahsa wî hatibû kirin. Navê wî di civatan de hatibû ser ziman. Di civata mîran de pir navê wî hatibû ser ziman. Di wê heyeme de ji bahsa wî hatibû kirin. Ji dîwana wî ji, mirovên ku zanibûn di wê heyeme de gotibûn. Mihamed ji di derbarê wî de xwedî agahî bû. Wî zanibû ku ew kî ya. Li ser wî ji, ku bahs hatibû kirin, êdî piştîre ku mihamed hatibû xwe, êdî çend gotin vegotibûn. Mihamed, deme ku bahsa wî kiribû, mirovên li civatê lê pir bi hey di hisandin. Lê Mihamed, wê naqlê axiftina wilo zêde dirêj ne kir. Kin birrî. Bi wê kin birrînê re, weke ku bala mîr kişand. Mîr vê yekê re weke ku xwest ku hinekî bi Mihamed re bikeve danûstandinê de. Lê di wê heyeme de Seyde Avdilrehîmê xaniqî firsand ne de vê yekê û wê mafê axiftinê hilde û axift. Dema ku axift, hinekî wî ji ku li ser wê mijara ku li ser dixiftin ku ka çî zanibû anî ser ziman û piştîre wî bixwe, gotinek li ser Mihamed di nav civatê de anî ser ziman. Got ku 'Mihamed, ez dibe qey dixweze bi rêviyekê de herê. Deme ku wî wilo anî ser ziman, êdî ne sekinî û piştî piştî gotina xwe ji anî û got ku 'Mihamed dixweze bi aliyê kirmaşanê wanderan de gava xwe biavêje.' Bi vê yekê re bala mîr pir çû ser wî. Bala mîr çû ser Mihamed. Lê hê seyde Avdilrehîmê xaniqî ku xaberdana xwe bidawî nekirî, hinek tiştne dîn ji vegotin û her weha got. 'Mîr ji nêht kiriye pêre careke dî gava xwe biavêjim bi wir ve'. Piştî ku wî ev gotin ji got, êdî ma sekinî. Mîr, dema ku ew axift û axiftina xwe bidawî kir, êdî di cih de mafê axiftinê hilde û axift û pirsî ku ka kengî wê herin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku mîr her weha pirs pirsî, êdî hê ku wî axiftina xwe bidawî ne kir, mafê axiftinê hilde û pêre weke ku bikeve guftûgoyê de axift û her weha got, 'ji bo demeke emê herin û

vegerihin'.Piştî ku seyde Avdîlrehîmê xaniqî ev gotin got û ma sekinî, êdî piştê mîr ji hinekî dî ji axift û ma sekinî. Piştê mirovên din yên li civatê mafê axiftinê hildan û axiftin.

Mîr axiftina xwe bidawî kiribû û mabû bû sekinî ji, lê hê ji bala wî li ser Mihamed bû. Mihamed bêdeng bû. Lê heya wî li ser civatê û axiftinê civatê bû. Dema ku di nav axifinê seyde Avdîlrehîmê xaniqî de navê derbas bû bû, êdî weke ku heybûnek pêre li ser civatê û axiftinê bû bû.

Mîr, heya wî pir li ser Mihamed bû. Piştî ku Seyde Avdîlrehîmê xaniqî bahsa çûna wan kiribû, êdî bala wî bêhtir çûbû bû ser Mihamed. Mihamed lê bi bêdeng bû. Zêde wilo ti deng jê dernediket. Piştî ku mîr ji axiftina xwe kiribû, piştê civata wan hinekî diaxiftina xwe de çûbû bû ser rojhilat û navdarên wê. Li ser danûstandin di wê heyeme de di nav wan de zêde bûbû. Kê çî zanibana û berê bihîstibana, di wê heyeme de ji civatê re dianî ser ziman. Bi vê yekê re gelek mirovên ku diaxiftin hebûn. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî pir bidest axiftinê kiribû di wê heyeme de. Ji ber ku wî pir di derbarê wê herême kurdistanê û zanistên wê de zanibû. Li wanderan mabû bû. Di nav zanistên wê herême de mabû û bi wan re danûstandin kiribû. Bi vê yekê re li ser wê herême û zanistên wê pir bi agahî bû. Mihamed ji, hinek agahî bihîstibûn. Lê ne weke Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ku di derbarê wê herême û zanistên wê de bi agahî bû. Ew li wanderan mabû bû. Ji ber vê yekê mabû bû. Lê Mihamed li wanderan ne mabû bû.

Civata wan her weha ku hinekî di nav xwe de kete danûstandinan de, piştê bi qadarekê re êdî kir ku rabê ser xwe. Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî wê çûbûban Medrese. Bi wan re hinek mirov ji hebûn. Mirovên ku ji dûr hatibû bûn. Bi hev re wê çûbûban. Bi vê yekê re, Mihamed û seyde Avdîlrehîmê xaniqî li hevdu meyîzend û piştê kirin ku bidine xwe di wê heyeme de. Mîr ev yek farq kir. Dema ku mîr farq kir, êdî piştê di nav civatê de mîr berê xwe da wan û ji wan pirsî ku ka wê çî kin. Dema ku mîr pirsî, êdî seyde Avdîlrehîmê xaniqî di cih de bersive mîr da û got ku 'divêt ku em nahaka rabûn û herine medrese. Divêt ku em herin'. Dema ku Seyde Avdîlrehîmê xaniqî got, êdî mîr ji piştî bersive wî re hinekî ma sekinî û piştê careke dî mafê axiftinê hilda û gotiyê de, 'divêt ku win nahaka neçin, wê nahaka xwerina me were. Emê bi hev re bixwûn û piştê emê bi hev re herine wir. Em ji dixwezî ku werine wir. De ne, va li vir gelek mirov mirovên ku ji dûr hatina ji bo serdana Şêxê me yê mazin mele Serhengê Zaxoyî. Dema kuu mîr wilo got, êdî deng ji ti kesekî î derneket. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ji mîr ne şikand. Wî ji bi çavakî li Mihamed meyîzend û piştê got 'bila mîrê min' û hwd. Piştê civata û axiftina wan

berdewam kir. Ji derve ji dihata dîtîn ku çûn û hatinaka mazin hebû. Dema xwerine bû. Wê sofre xwerine li ber mîr û mêhvanan bihatana vekirin. Ji ber vê yekê çûnûhatinaka mazin hebû. Ji xwe, piştî ku mîr ji wilo gotibû, êdî bêhtir çûnûhatin zêdetir bûbû. Dengê mîr çûbû bû wan ku wê sofre were vekirin. Piştî ku mîr wilo gotibû, êdî divîbû ku zêde nema bana û sofre li ber wan vebû bana.

Ji xwe, demeke dirêj têve neçû û piştî re ne bi gelekî re êdî bidest vekirin sofre li pêşiya civatê hata kirin. Gelek mirovên ku suxretî dikirin û diçûn û dihatin hebûn. Wan sofre divekir. Piştî ku sofre bidest vekirinê hata kirin, êdî ne bi gelekî re sofre vebû. Mirovên ku di civatê de rûniştibû bûn ji, axiftina xwe ne birrî bûn û berdewam kiribûn. Piştî ku amedekirine sofre bidawî bû ji, wan axiftina bidawî ne kiribû. Lê hinekî axiftin weke ku kêmbû. Piştî ku sofre bi tememî kêmbû, êdî piştî re bi keremkirin mîr re mirovan xwe li dore sofre da hew. Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bi hev re xwe dana dore sofre. Piştî ku xwe dana dore sofre bû ji, lavz bi lavz axiftin dibû. Deme ku xwe dana dore sofre, êdî zêdetir bidest xwerinê hatibû kirin. Mîr bixwe, hem dixwar û hem ji car bi car diaxift. Hin gotin digotin. Lê bala wî li ser civata wî ji bû. Deme ku wî çavên xwe li civatê digerland, ku çavên ne anîbana ser Mihamed ne dibû. Mihamed pir li ber çavan bû. Ji xaynê wê yekê ji, piştî ku seyde Avdilrehîmê xaniqî bahsa çûne kiribû, êdî bêhtir bal çûbûban ser wî. Bi zêdeyî ji bala mîr li ser wî bû. Mihamed ji, di bin balan de di wê heyeme de bi bêdeng bû. Car bi car ku jev dihata pirsîn an ji di rewşne de ku divîbana ku bi axivê diaxift. Ji wê pêde ti axiftin wilo zêde ne dikir. Bêdeng bû. Di serê xwe de dihizirî. Ew bêdengbûna wî, hizirkirina di serê wî de bû.

De ne, di vir de divêt ku mirov bêje, mirovekî ku zanist û weke Mihamed hertimî bal li ser hebûn. Dema ku di civatan de bana, hertimî bal li ser wan bû û hêvîye axiftinê ji wan dihata kirin. Ew bixweze li ber çavan bûn. Di civatan de her mijara ku wê bihatana axiftin, wan pêşengti dikir. Ev ji ji wan dihata xwestin. Lê deme ku her weha bêdengî ji çêbûbana, êdî dihata pirsîn ku ka çima bêdengî bûya. Ku dikete derba xwe de ji wan ji dihata pirsîn ku ka çima û ji ber çî ew bêdengî heye. Di civatan de hetimî axiftin dibû. Danûstandin dibû. Hizir kirin û dana hizir kirin ya bi gotinê dibû. Her weha civat hebûn. Civat ji bo bi hev re axiftin û danûstandinê bûn.

Di wê heyeme de deme ku Mihamed bêdeng dima, êdî her weha di serê mirovan de mereq ji dibû. Bi wê mereqê re êdî bêhtir bal diçûna ser wî. Lê yên ku ew nasdikirin, zanibûn ku ka ew ji ber çî bi bêdengê. Zanibûn ku

Mihamed di serê xwe de bi hizirê û ku kete derba xwe de wê ew tişte ku li ser hizir dikir wê bigotina.

Piştire ku deme li ser xwerine buhurandin êdî piştire ku têr ji xwerin, êdî kirin ku xwe ji ser sofere bidine bi şûn ve. Lê yêr ku têr xwerin ji li gor adete mana di cihê xwe de ta ku hevalên wan yêr din ji têr bixwûn û mîr xwe bide bi şûn ve. Berî mîr ev yek ne dibû. Mîr pêşengiti dikir. Ev di her qadê xwe bi nîrx û adet û kevneşopî bû di nav xalkê de. Piştî ku mîr ji têr xwar û mîr li dore xwe meyîzend ku herkesekî wa têr xweriya lê li bendî wî û xwe dana bi şûn ve ne, êdî mîr ji şikirkirinê re xwe da bi şûn ve. Dema ku wî xwe da bi şûn ve, êdî mirovên din ji hemûkan bi careke re xwe da bi şûn ve. Piştî ku wan xwe da bi şûn ve, êdî di demeke pir kin de wan mirovên ku suxretî dikir û sofere vekiribûn, sofere di demeke kin de li hev dana hevdû. Ku wan sofere li hevdû da hevdû, êdî piştire ne bi gelekî re şîranî û tiştên wilo hatina ber wan û wan ji xwar û vexwartin. Di wê navberê de ji bi axiftinê danûstandina wan ji di nav wan de berdewam dikir. Bi hev re di axiftin û didan û distandin.

Bi vê yekê re, wan demeke dirêj buhurand. Bi axftin û xwarin û vexwartinê demeke dirêj buhurandin. Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî ne li dûrî hevdû rûniştibû bûn. Piştî xwerinê re ji, hinekî dî nêqaşên wan yêr di nav wan de gurr bûbûn. Seyde Avdîrehîmê xaniqî ji tevî nîqaşan dibû. Mihamed ji car bi car tevî axiftina dibû. Nîqaş, her weha careke dî nav wan de bû bû. Mîr ji, yêr ku herî zêde di nav nîqaşan de bû.

Lê wê rewşê, her weha zêde berdewam ne kir. Piştire ne bi gelekî re êdî kirin ku bi hev re rabin û derkevin. Berî hingê Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî kiribû ku bidina xwe û rabin û herin, mîr ew dabûbûna sekinandin. Ev yek di serê mîr de bû. Piştire ji xwe, ne Seyde Avdîrehîmê xaniqî û ne ji Mihamed wê bi bîr xistibana. Divîbû ku Mîr bixwe, ev yek hizir kiribana. Ji ber ku wî dabûbûna sekinandin û gotibû ku emê piştire bi hev re herine medresê. Mîr ji, piştire ku demek têve çûbû, li ser xwerin xwerinê re, êdî mîr bi bîr xistibû ku wê herina medresê. Bi vê yekê re êdî piştire ne bi gelekî re dana xwe û rabûna ser xwe ku herine medrese. Wê li medresê ji hinekî li hevdû rûniştiban. Medrese weke dergaha mele Serhengê xaxoyî bû. Hema bêja mirovên ku hatibûbûna wir ji ji bo serdana wî hatibûn. Ji ber vê yekê ji, çûna wir li wir rûniştin û diayak li wir xwandin ji, ji adete dihata dîtin. Weke kevneşopîyekê bû. Mihamed û Seyde Avdîrehîmê xaniqî weke yêr xwediyê malê bûn. Mîr ji wilo dihata hasibandin. Vêce ku mirov, ji ber serdanê hatibana qasrê ji, divîbû ku çûbana medrese. Dema ku ne hatibana wir, wê rast ji ne hatibana dîtin. Ji

ber vê yekê, divîbû ku çûbû ban wir û li wir ji hinekî li wir rûniştiban. Ji ber vê yekê, êdî ev ji bi hev re rabûna ser xwe û kirin ku herine medrese. Deme ku rabûna ser xwe û ku mîr da pêşîye civatê, Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî ji di rex wî de bûn. Bi hev r di rex hevdû de ketibûbûna rê de û diçûna Medresê. Deme ku rabûna ser xwe, û derketin û ketine ser rê de ku herin, di rê de ji di nav wan de danûstandinên wan berdewam dikirin. Bi hev re diaxiftin û diçûn. Mihamed, di rê de di rex mîr de bû. Lê hinek mirovên ku di rex wî de dimeşîn ji pêre di danûstandinê de bûn. Ew ji bi wan re di danûstandinê de bû. Bi hev re diaxiftin û dimeşîn. Mîr ji di danûstandinê de bû. Ew ji bi mirovên li dore xwe re di danûstandinê de. Bi wan re diaxift û dimeşî.

Dema ku dimeşîn, Mihamed bi bideng bû. Hinekî di axift. Lê ne wilo zêde. Mirovên ku di rex wî de dimeşîn, pêre diketine axiftinê de. Ew ji li ser vê yekê divîbû ku ketibana axiftinê de. Di kete axiftinê de. Bi mirovên ku di rex wî de dimeşîn diaxift. Mihamed, wekî dî ji, ku ku mirov li dimeyîzend, mirov ew bi hizir didît. Deme ku diaxift ji ku mirov lê dimeyîzend, mirov jê fahm dikir ku ew di serê xwe de li ser tiştne bi hizire. Her weha Mîrov fahmdikir. Mîrov ji, bi mirovên ku di rex wî de dimeşîn di axiftinê de bû. Yên ku bi wan re dimeşîn ji bala wan axlaba li ser axiftina mîr û ya Mihamed bû. Lê axlabe ji bala wan li ser Mîr bû. Li mîr di hisandin ku ka çi got an ji ne got. Mîr di bin balan de bû. Mihamed ji dibin balan de bû. Bala mirovên li dore wan li ser wan bû. Mihamed zanistvanekî ku pir mazin bû. Axiftinê ku wî dikir ji, di bin bala mirovên li dore wî de bû.

Mihamed, di rex wî de lê hinekî nêzikî mirov ji dimeşî bi seyde Avdîrehîmê xaniqî re dimeşî. Bala wî ji li ser Mihamed bû. Lê ew ji diaxiftinê de bû. Hem diaxift û hem ji bala wî li ser Mihamed û mirovên ku pêre diaxiftin ji. Bi vê yekê re di nav axiftinê de çûbû bûn. Weke qadarekê ku dimeşîn êdî digihinê ber Medresê. Weke qadarekê dî ku dimeşîn, êdî hinekî dî ji digihine ber medresê.

Di nav koma wan de, yê ku herî zêde dengê wî derdiket ji mîr bû. Mîr Bi mirovên di rex xwe de dimeşî di axift. Dengê Hemûkên ku bi wan re dimeşîn his dikirin. Bi wê hiskirinê re bala wan ji bi zêdeyî diçû ser Mîr di wê heyeme de. Mîr, mazin û bideng biind diaxift. Ji xwe êmin diaxift. Deme ku diaxift û gotinên xwe digotin, mirov ji gotinên wî ew êmin bûna wî pir baş û qanc fahm dikir û didît. Demekê, weke ku diaxiftinê de tenê dengê mîr bilind bû. Herkesekê din yê ku dimeşîn bêdeng man. Mihamed ji bêdeng ma. Herkesek bala wan çû ser Mîr û axiftina wî di wê heyeme de. Mihamed, deme ku hisand, ew hingî di serê xwe de weke ku ji wir çûbû

bû. Di serê xwe de ew çûbû bû Cizîre bota. Heya wî wî çûbû bû cizîre bota. Dema ku ew li cizîre bota bû, pir caran, ew çûbû bû û li civata mîre bota rûniştibû. Heya wî çûbû bû ser wî û wê heyeme, di wê heyeme de. Mîrê bota ji ku diaxift, wilo bi deng bilind diaxift. Dengê wî ji wilo gurr derdiket. Gelo ji ber çî dengê mîran wilo hertimî bilind bû? Yê ku ji nûkava ji bûbana mîr ji, ku diaxiftin, diaxiftina xwe ya pêşî de ji bana, dengê xwe bilind dikirin. Dengê wî bi ser yê herkesekî re bû. Dengê wî hertimî bi bal bû di nav xalkê de. Ev yek, hertimî, weke xosletekî li ber çavan bû. Hertimî di dihata xuyakirin. Lê ya ku di serê Mihamed de hatibû bîre wî di wê heyeme de ne tenê ev yek bû. Ji xaynê vê yekê, ew jiyana wî ya li wir bû ku hatibû bîre wî. Li wir, wî jiyana ku ti carî ji bîrnekê jîn kiribû.

Li wir, Mihamed gelek tişt jîn kiribûn. Li wir wî, gelek tiştên ji bîrnekê jîn kiribûn. Ku weke wê kêlikê, hertimî werine bîre wî, wî jîn kiribûn. Di jiyana mirov de hertimî hinek kêlikên ku mirov wan di ti demê de ji bîrneke hene. Ev yek ji bo her mirovî wilo ya. Ji bo zanistekî bihişyar ev yek bêhtir biwate ya. Ew zanistekî ku bi hişyar bû. Wî ji bîr nedikir. Di jiyana xwe de wî çî jîn kiribana, zû bi zû wî ji bîr nedikir. Ev yek ji, weke xosletekî wî li ber çavan bû. Ma wî çî yê ku jîn kiribû ji bîr kiribû. Wî ti tiştê jîn ne kiribû. Wî Dilberê û Dilşad ti car ji bîr nekiribû. Her kêlike ku wî jîn kiribû, ew di bîr û hişê wî de bûn. Meleyê Cizîrê ji wilo bû. Di wê heyeme de ne mumkun bû ku mele Silêman û faqa Qasim ji ne di bîre wî de bana. Ew ji di bîre wî de bûn. Ew ji qatek ji jiyana wî bûn. Wilo bûbûn. Wan bi hev re demne pir dirêj û tiştî bi hev re buhurandibûn. Wan bi ev re pir danûstandin û nîqaş kiribû. Ew hemû di bîre wî de bûn. Li ser wan ji di hizirî. Di wê heyeme de, deme ku dengê mîr hinekî weke ku bilind hatibû wî, wê yekê ew di wê heyeme de di serê wî de weke ku ji wir biribû û her weha gelek tişt anîbûbûna bîre wî. Mirov ku gelek tişt jîn kiribin, her tişt û dengê ku tê mirov ji, mirov bi carekê re heya ku bibe wî jiyana mirov jînkirî. Her weha ev yek weke rastiyekê ya, bi mirov re. Mihamed ji, pir jîn kiribû. Pir tişt û mişt dîtibûn û jîn kiribûn. Ku mirov şaxsiyeta wê ya mazin şîrove bike, divêt ku mirov ji bîr neke ku ne tenê ew hizre di serê wî de her weha ew mazin dikir. Ew jiyandin û dîtînen wî ji, her weha ew mazin dikir. Dîtî, mirov pir mazin dike. Dîtî, pir girînge. Dîtî, di jiyana mirov de, karekê wê yê dî ji ewê ku kirdariyê bi mirov re dike. Mirov, di hizre mirov de bi intibayên ku dike re bêhtir bi hzir dike. Bêhtir mirov di hizre mirov de bi hîm dike. Her weha bi wate ya dîtî.

Mihamed, di serê xwe de xwediyê pir dîtînan bû. Bi vê yekê re mirov barê bêje ku ew pir bidîtînan bû. Pir bidîtînan, mirov di jiyana de ji gelek

hiltapilandinan xilas dike. Ew ji bi gelek dîtin bû. Bi vê yekê re mirov karibû ku ji bo wî bêje ku ew cerb bû. Wî bi tiştên ku jîn kiribû jiyan pir baş fahm kiribû. Bi xwandinê ji pir baştir fahm kiribû.

Li Cizîre bota, Mihamed pir jîn kiribû û xwandibû. Pir demeke mazin ya bi hizir buhurandî bû. Ew deme wî ya ku wî li wir jîn kiribû, ew kiribû pir bihizir. Wî jiyan li wir, bi gelek awayan dîtibû. Bi xwandinê fahm kiribû û jînkirinêji dîtibû. Her weha pir mazin jîn kiribû. Deme ku mirov bahsa zanebûna Mihamed bike, divêt ku mirov hinekî pir baş bi hizirê û bêne ser ziman. Ew di deme xwe de pir bi hizre xwe re ji li wir li pêş bû. Dem ji deme ku mirov bi hizire hêdî hêdî derdikete pêş bû. Bi vê yekê re ew yê ku di wê deme ku mirov bi hizir derdikete pêş, ew derketibû pêş. Bi vê yekê re, bi hizire, mirov çawa tê dîtin û li gor demê ev yek çawa bû, di wî de dihata berçavan. Bi vê yekê re, ew pir girîng bû û jiyandinên wî girîng bûn. Divîbû ku mirov li ser bisekinîyana.

Bi hizire jiyan avakirin, demeke hizir ya pêşketî dide nîşandin. Ev pêşketin pêre hebû. Wî ev yek di xwe de dide nîşandin. Ji ber vê yekê têgihîştin û fahmkirina wî pir girîng bû. Deme wî, bidest bikar anîna hizre anîbû, di jiyanê de. Ne tenê bi awayekî bidest bikarîne anîbû. Bi gelek awayan bidest bikar anîne anîbû. Wî di deme xwe de ev yek û ew dem û mirovtiya wê demê jîn dikir. Ji ber vê yekê bitêgihîştin û fahm kirina xwe re pir girîng bû.

Mihamed, deme ku mirov li ser dihizirê, mirov jê digihê pir amcaman. Mirov jê pir tiştan fahm dikir. Weke ku wî di axiftinên xwe de cerna digot, 'tenê hewcebûna mirov, bizanebûna meyîzandinê heya'. Bizane meyîzandin, di vir de bi du wateyan mirov karê bêne ser ziman. Awayê pêşî bi zanebûn û têgihîştin û hizrê tê ser ziman. Awayê din ji, bi nêzîkatî û têgihîştinê nêzîkatîyê tê ser ziman. Wî girîngî dide têgihîştine nêzîkatîyê. Ew di axiftinên xwe cerna ku diaxift, pir li ser vê yekê di sekinî.

Têgihîştinê jiyanê ye demên berê, demeke dirêj bi 'wekxwe' manê, pêşketiya. Ev dem ji, deme metafizîkê ya. Berî zanîyê demên şaristaniyê yên pêşî û hinekî berê wan ji dike nava xwe de. Naîriyan, li ser wan axan ev yek jîn kir. Lê naîriyan di deme xwe de, yên ku ew nêzîkatî bi pêşketinê hinekî guharandin ji ev bûn. Wan, ew têgih kir ku her tişt weke xwe ne mene. Bi vê yekê re, hizir kirin ku tevger û dem, bi hev re pir biwate ne. Li ser vê yekê ji pir hizir kirin. Di deme wan de astronomî pir bi wan re bi pêşketibû. Ew pêşketin û têgihîştinê wê ya ku bi wan re bûbû ji, dibû bingihê wê têgihîştine wan ya di vê qadê de ku bi wan re dibû. Wekwebûn, di jiyanê de di tevger û demê de weke xwe ne mene. Bi vê

yekê re, ev gahana wê hizre ku wê hizrê, ku wan bigihinê wê têgihiştine demê, di deme xwe de.

Ku mirov li temenê pêşketine Medan bigerihê, divêt ku mirov herê deme naîriyan. Deme naîriyan, hîmê wan afirand. Wan jiyana xwe li ser hizir, çand û civaknasîyê avakirin. Wan, bi vê yekê re, mirov karê bêje ku xalên ku wan herî zêde girîngî didanê de ji ev bûn. Jiyana wan, bi xosletên xwe re her weha bû. Hizre wan mazin bû. Piştî wan, demên pişt wan re, yên ku hatin, ji wan pir sûd girtin. Wan, fêrkir ku wê çawa baş hizir bikar bînin. Ev xosletekî wan yê herî zêde li ber çavan bû. Bi têgihiştine hizir re, têgihiştine bikaranîna hizir mirov bi wan re mazin dibîne. Mirov bi wan re bi sîmset dibîne. Bi vê yekê re, hewcebûna zanebûne meyîzendinê, mirov bi wan re pir baş dibîne. Li ser vê yekê di hizirin. Hizirkirin, bi xwe re mirov tenê nagihine hizir, mirov digihine têgihiştinê hizir ji. Ji xwe, Hizirkirin, bi serê xwe, ji mirov têgihiştinekê di derbarê hizirkirinê de dixweze. Mihamed her weha bi vê têgihiştinê bû. Wî hizre wê têgihiştinê bi xwe re çêkiribû. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov pir li ser hizirkirine wî bisekinê. Pir caran divêt ku mirov bêje Mihamed di hizirî û mirov divêt ku bêje ku li ser çî û çawa dihizirî û çawa dihizirî. Bi vê yekê re, her cara ku mirov got ku mihamed dihizirî, divêt ku mirov zanibe ku bi gotinên pişt wê gotinê re tî ser ziman re, xosletekî wî yê têgihiştinê tê ser ziman. Bi vê yekê re hewceti pê heya ku mirov pir li ser hizirkirina wî bi hizirê. Hizirkirin, bi xwe re, ku mirov li ser dihizirê û tîne ser ziman, xosletên xwe tîne ser ziman..

Mihamed, di vê yekê de piştî ku bi bilind axiftina mîr re her weha hinekî di xwe de di nav hizran de çû, piştî ku weke qadarekê ku tîve diçê, ku tîne ber deve deriyê medrese û ku bahsa ketine medrese tê kirin û pêre ji hinek mirov bahsa mele Serhengê xaxoyî dîkin, êdî weke ku tî xwe di wê heyeme de. Deme ku tî xwe, weke ku ji xewekê rabe ser xwe dibe. Xwe li ber devê deriyê medrese dibîne. Bi ketine mirovan hundurê re, êdî weke ku were xwe lê têt. Ku dikevîne hundurê hewşa medresê de, zêde li hundurê hewşê ne mînin û bi hev re dibuhurin û di kevîne hundurê de.

Dema ku di buhurine hundur, êdî bi hev re diçin û li dîwana rûniştinê dirûnihin. Mîr, ku di rex Mihamed û Seyde Avdilrehîmê de, diçê pêş û li pêşîye civatê dirûnihê. Di civatê de, ji xaynî Mihamed, seyde Avdilrehîmê û mîr, hinek mirovên din ji yên ku mazin in, hebûn. Ew ji li pêş cihê xwe girtin. Ku hemûkan cihê xwe girt û rûniştin, êdî bi hev re pêşî ji bo mele Serhengê xaxoyî diayek bi hev re kirin û piştî êdî bi hev re di pêşengiyê mîr û hinek mirovên din yên weke wan mazin de bidest axiftina xwe kirin.

Mîr, mazin bû. Bi temen mazin û bi hebûne xwe ji mazin bû. Rêzeke mazin ji her awayî re jê re hebû. Ji ber vê yekê, ji xwe deme ku mirovan bi hev re dia kir piştre, bal çûne ser wî di wê heyeme de. Mîr ji, deme ku bal çûbû bûna ser wî, fahm kiribû ku civat li bendî wî û axiftina pêşiya. Mîr ji ku her weha li bendbûnî wî bûn bû û piştre ku wî ji bidest axiftinê kir, êdî pişt wî re, civat ji xwe re êdî bi axiftinê pêde çû. Di rewşên wilo de, hertimî mirovên ku mazin û navserî xwe mafê pêşî yê wana. Mîr ji mazin bû. Pişt Mîr re, bal çûne ser Mihamed û seyde Avdîlrehîmê xaqinî. Deme ku bal çûne ser wan, êdî wan ji ev yek farq û fahm kir. Lê herdû ji, di cihê xwe de bi bêdeng bûn. Deng ji wan dervediket. Wan ji, mafê axiftinê yê pêşî ji mîr re hiştibû. Lê ew ji weke 'xwediyê malê', bal li ser wan bûn. Xwediyê malê, di nav civatê de bi bêdeng nemêne. Hertimî ew ji bigotina. Ew ji divêt ku bigotin bana. Ew civat hemû hatibûbûna sersaxiyê. Ev yek ji adet û kevneşopîyê bû. hem yên ku ji dûr bihatana diçûn ev yek dikirin û hem yên ku ji wir ji bana, wê ev yek kiribana. Ev yek her weha weke çandaka piştî çûne ser dilovaniya xwe bû.

Mîr, deme ku axift, pêşî hinek bahsa mele Serhengê zaxoyî û zanebûne wî kir. Li ser mazinatiya wî sekinî. Bahsa hizre wî kir. Bahsa rêze ku ji wir re hebû di nav xalkê de kir. Bi vê yekê re mîr weke qadarekê axift. Deme ku ew axift, mirovên li dore wî ji, pir bi bal lê dihisandin. Bala xwe pir bi hey didana ser wî û axiftina wî di wê heyeme de. Mîr ji, mirovekî ku zane bû. Mirovekî ku di nav salan de çûbû bû. Dinye dîtibû û fahm kiribû. Deme ku axift ji, ji zanebûna xwe axift. Ji zanebûna xwe axift. Pir zane axift. Deme ku diaxift, di gotin û lavzên xwe pir bi bal diaxift. Gotinên xwe di naqand û digot. Bi vê yekê re mirov karê bêje ku pir bi zane diaxift. De ne, mirovê ku heya wî ji ji dinyê û dore wî hebe, û bi zane be, ev yek di gotin û di bêjeyên ku di naqêne û têne ser ziman de tê kifş kirin. Ku mirov bala xwe didiyê de, ev yek tê kifş kirin. Mîr ji ku mirov her weha lê dihisand, mirov ev yek pêre didît. Mîre bota ji wilo xweşik bi axiftin bû. Mîre bota navê wî di civate wî de bi xweşik û xweş axiftina wî re ji heya. Di wê heyeme de, deme ku ew ji her weha axift, mirov di got ku qey mîre bota diaxivê li hevberê mirov. Mîritî, ku mirov gotinekê li ser bêje, mirov karê her weha bêje. Mîritî, başbûn, qançbûn û bi zanebûne wî re xweşik û xweş axiftin hinekî weke xosletên ku jê dihatina xwestin bûn. Mîritî, di nav kurdan weke çandaka mazin bû. Wê çandê, bi xwe re gelek pêşketin derdixistine hole û didana çêkirin. Mîr bixwe, weke dagaraka wê çand û pêşketina wê çandê bû. Ku lê dihata meyîzandin, pêre gelek tişt û rewş û kevneşopî dihatina dîtin. "Pêre rastiya civakî dihata

ser ziman”.Mîr, her weha mazin bû.Mîr, her weha bi wate bû di nav xalkê de.Nirxne mazin pêre li ser lingan bûn.Di kijan civatê de bana, ew xwediyê gotina pêşîya civatê bû. Ew xwediyê wasfê ku di civatê de jê re dihata kirin bû. Dengbêjan, navê wî bi helbestî dianî ser ziman. Li cem wan di civate wan de, hertimî dengbêj hebûn. Wan di her civatê de digot û ku digot ji, bahsa mîr û rastiya wî û mazinatiya wî dikirin.Bahsa mêrantiyên ku wî berê kirina di kirin. Her weha pir bahsa wî û navê wî dihata kirin.Civat, bixwe, weke nirxekê bûn.Her weha ew rewşên weha ji, weke nirxên wê nirxê bûn. Xalkê ji wilo didît. Civate mîr û ya ku mîr de, pir mazin û bi rêz dihata dîtin..

Mîr, di wê heyeme de deme ku axift, bala herkesekê li wir li ser wî bû.Herkesekî ew pir mazin nasdikir.Navê mîr û mîritîyê hebû.Bi vê yekê re di wê heyeme de, divêt k mirov bêje ku mirovekî ku mazin ji li ser mirovekî ku mazin diaxift. Gotinên ku mîr li ser wî di nav civatê de gotibana ji, wê ne hatibana ji bîr kirin. Wê di serê mirovên li wir de mabana. Wê wan mirovan ji, ku cihên ku çûne de, wê ew gotinên li ser mele Serhengê zaxoyî anîban ser ziman. Wê her weha ji devê mîr bianîyan ser ziman. Ev yek ji pir girînge. Ji devê mîr anîn ser ziman, pir girînge. Divêt ku mirov li ser vê yekê ji hinek rawastê.Ji ber ku ev yek pir girînge. Mirov, ku ji devê mîr hata ser ziman, hingî pir bahs li ser dihata kirin. Navê wî ne dihata ji bîr kirin.Di hata gotin,”mîr ew anî ser ziman”. Ev gotin, bi serê xwe, rewşeke ku mirov fahmbike têne ser ziman. Rewşeke ku di nav xalkê de biwate bû têne ser ziman.Deme ku mirov bahsa wê rewşê bike, divêt ku mirov zanibe ku ew rewşê çend girînge.Çend bi wate ya.

Herkesekê li wir ev yek zanibû. Herkesekê li wir zanibû ku mirov ji devê mîr were ser ziman, çend girînge.Wê bi mazinbûna mîr, êdî wê mazinbûna wî mirovê ku navê wî hata ser ziman wê bihata ser ziman. Ev yek, her weha girîng bû.

Mirov deme ku li ser vê yek di hizirê, mirov bi vê yekê re çandekê dibîne. Mirov çandaka civakî dibîne. Mirov bi wê çandê re ji, hinek nnirxne civakî yên ku pêşketibûn û bi pêşdixistin dibîne.Mîritî, bixwe, di hîmê xwe de demne pêşketinê ku ta deme deme Sûmerîyan diçû, mirov didît.Pişt wan re mirov dibîne ku di dene Naîriyan de weke pergalka civakî bi pêş dikeve û tê ser ziman. Bi vê yekê re gelek nirxan bi xwe re têne ser ziman.Bi demên xwe yên pêşketinê re, her weha dîrokeke pêşketinê têne ser ziman.Mîr, di deme naîriyan de rêveberekî civakî bû. Rêveberekî pêşketibû. Bi xwe re wî hebûne pêşketine pergalka civakî dianî ser ziman.Hizre civakî di deme naîriyan de bi nêzîkatiyaka nûjen bi

pergalî bideŝketinê dike. Piştî wê demê re ji, her weha ew pêşketin bi pergalî hebûna xwe berdewam kir. Mîr, di vir de pir mazin xwedî weyne. Deme ku mirov li wan deman dimeyîzenê, mirov wê weyne wî dibîne. Mîritî ta wê demê, her weha mazin pêşketibû û pêşxistibû. Di nav civakê de êdî mîr weke rêzanekî mazin dihata dîtin. Deme ku mirov mîr bêne ser ziman, divêt mirov bi wê dîroke wî ye pêşketin û rêzaniye wî, wî bêne ser ziman. Ev yek, di vir de pir girînge. Ku mirov bêje, mîr bi hebûna xwe ya rêzanî û civakî re teolojîyek bi xwe re di nav xalkê de avakiribû, wê ne xalat be. Ew teolojî, teolojiye wî bû. Ya mîritîya wî bû. Mîrîtî, xwediye hebûneke ku bi pir çand û hizire. Bi vê yekê re divêt ku mirov bêne ser ziman. Bi vê yekê re divêt ku mirov di vir de bi çend gotinan tişt û nirxên ku jê dihata xwestin ji bêne ser ziman. Ji mîrîtî weke ku me li jor got, zanebûn dihata xwestin. Ji wê pêde, parastin û lê xwedi derketine nirxên xalkê yên ku pêşketine ji, jê dihata xwestin. Ev herdû xal weke xalna ku li ser nîqaş ji ne dihata kirin bûn. Li ser wan zêde bi nîqaş danûstandin ji ne dihata kirin. Tenê dihata xwestin. Deme ku mîr di hata ser mîritîyê ji, pêşî lê dihata meyîzandin ku ka karê her weha li nirxan xwedî derkeve û her awayî bi pareze û bêne ser ziman. Li gor van yekan, jê re rêz û hûrmet dihata girtin. Mirov karê bêje ku di vê nûqtê de bi xalkê re têgihîştineke bizanî ji hebû. Bi vê têgihîştine bizanî, li mîr dihata ser ziman. Ku mîr karibana ku li nirxên ku xalkê jê dixwest ku li wan xwedi derkeve, ku xwedî derdiket, û her weha xalkê ji didît, êdî mîr birêz û hûrmet dibû di nav xalkê de. Bi vê yekê re, ku mirov bêje, ku mîr weke rêveber û berpîrsîyarê ne tenê xalkê ye nirxne ji dihata dîtin.

Di wê heyeme de, li ser mele serhengê zaxoyî mirovekî ku di nav xalkê de her weha mazin û bi wate diaxift. Mîr, li ser mele Serhengê zaxoyî weke demeke axift û piştî ma sekinî. Deme ku ma sekinî ji weke ku ji axiftina mîr, zingênî di serê mirovên ku lê dihisandin de çêbû bû. Mîr pir axiftinaka xweş û xweşik li ber civatê di dîwana mele Serhengê zaxoyî de kiribû. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji pir bi bal lê hisandibûn. Piştî ku mîr axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî, weke bêhnekê deng ji ti kesekî derneket. Lê piştî bi bêhneke ye ku deng jê derket ji seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Wî, li mîr û li nav çavên wî meyîzendibû û gotibûyê de 'mîrê min, ti pir mazin û xweşik axiftî. Piştî axiftina tê re gotin ji me re nema ku em li ser seydeyê meyê mazin mele Serhengê bêjin'. Piştî ku seyde Avdilrehîmê xaniqî ev gotin gotin, êdî piştî hinekî dî ji wî sê çar gotinne din ji got. Deme ku seyde Avdilrehîmê xanqî pêşî ew gotin ji civatê re gotin, yên ku mele Serhengê zaxoyî berî hingî nasdikirin ji, li seyde

Avdilrehîmê xaniqî weke ku bêjinê de ”ti rast dibêje” bi bêdengî lê meyîzendin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ku ew ji weke demekê axift, êdî piştê wî ji axiftina xwe bidawî kir û mafê axiftinê ji mirovên mazin yên navserî xwe yên ku di wê heyeme de di civatê de rûniştibûn re hişt û piştê wan ji êdî pişt wî û mîr re hêdî hêdî bidest axiftinê kirin. Ew ji, yên ku gotinên wan yên gotinê wê hebene, mafê axiftinê hildan û gotinên xwe bidest vegotinê kirin. Êdî hin bi hin civate wan, piştê, bi axiftin û gotin bû.

Civate wan, di wê heyeme de her weha pir mazin êdî kete nîqaşan de. Mihamed di cihê xwe de sekinî bû. Car bi car ku mirovên di rex wî de berê xwe didayê de û pêre hin gotin dikirin, êdî wî ji weke bersivdayînê hin gotin di gotin û dise dima sekinî. Lê Mihamed wilo ti axiftinên dirêj ne dikirin. Mihamed mabû bû sekinî û li yên ku di axiftin di hisand. Mîr ji, cerna di axift û cerna ji dima sekinî. Lê ew tevî axiftinan dibû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji, ji xwe, piştî ku pişt mîr re axiftibû piştê ji tevî axiftinan dibû. Ew di axift. Car bi car bala wî li ser Mihamed ji bû. Li Mihamed dimeyîzend. Mihamed, di cihê xwe de li mirovên ku di axift di hisand û di hizirî. Pir di hizirî. Di serê xwe de, wilo di hata xuyakirin ku pir çûbû bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek jê têgihişt.

Her weha ku weke qadarekê dem têve çû, êdî piştê dise mîr mafê axiftinê hilda û xaberda. Deme ku wî xaberda, mirovên li dore wî weke cara pêşî, pir lê bi hey di hisandin. Mihamed ji bala wî li ser mîr bû. Mîr ji, deme ku di axift hem di axift û hem ji weke bala wî li ser Mihamed ji bû. Lê dimeyîzend ku ka bala wî li wî ya an ji ne. Lê bala Mihamed lê bû. Ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pir baş û qanc fahmdikir. Mîr, weke qadarekê axift. Weke cara pêşî, dise ku axift bû, bahsa mele Serhengê zaxoyî û mazinatiya wî kiribû. Bahsa hin demên xwe yên ku wan bi hev re buhurandibûn kir. Bi vê yekê re, wî caraka din di axiftina xwe de mele Serhengê zaxoyî bi bîranî bû. Mîr û mele Serhengê zaxoyî, de ne, pir bi hev re mabû bûn. Bi hev re pir danûstandin kiribûn. Bi hev re li civate hevdu pir mabû bûn. Bi vê yekê, ew hatibû bûna naskirin. Deme ku mele Serhengê zaxoyî gahabû rehmeta xwe, mîr bixwe, pir pê bi êşbû bû. Dilê wî pir êşaha bû. Herkesekî ji ew êşandina ku pêre bûbû ditibû û fahm kiribû. Di wê heyeme de ji, deme ku di axift mîr, pir bi hest û ji dil, di axift. Deme ku di axift, ew hestbûna ku pêre çêdibû, ji aliyê mirovên ku lê di hisandin ve di hata têgihiştin. Mihamed ji, fahmdikir. Mihamed ji, ku mîr di axiftina xwe pêde çûbû, êdî bala wî ji ber ku ew her weha hinekî bi hest û bi bal axiftibû, bala wî pir mazin çûbû bû ser wî di wê heyeme de. Bi wê bala wî ya ku çûbû bû ser wî, di wê heyeme de, weke ku ew ji hinekî bi wê axiftina

wî re bi hest bibe lê hatibû bû. Wîlo ji rewşê wî dihata fahm kirin. Ew ji pir bi mele Serhengê zaxoyî re mabû bû. Hevdû pir baş û qanc naskiribûbûn. Ji ber vê yekê, weke ku Mihamed ji bi hest bûbû. Mihamed, di deme axiftina mîr de, ku hinekî pêde çûbû bû, êdî lê pir bi hey bûbû. Bi wê hestbûnê re mîr axiftina demeke dirêj berdewam kir. Demeke dirêj axift. Deme ku axift ji, pir li ser mele Serhengê zaxoyî gotin ji dil gotin. Mirov ku gotinê ji dil bêje, mirovên ku li mirov dihiênin ji, wê ji dil fahmbikin. Wan mirovên ku lê hisandibûn ji, ji dil lê hisandibûn û ew fahm kiribûn. Mihamed ji, her weha ji dil bû di wê heyeme de. Ew ji bûna wî bû ku bala wî bi hey biribû bû ser mîr di wê heyeme de. Mîr, bi wê hestiyariyê axiftina anîbû ber dawiyî û bidawî kiribû. Piştîre ku mîr axiftina xwe bidawî kir, gelek mirovan kara xwe kir ku mafê axiftinê hildin û biaxivin. Lê di nav waqas mirovên ku kara xwe kirin ku biaxivin, ku Mihamed ji hata dîtin ku kara xwe kir ku biaxivê, êdî bal weke ku bi tavahî çûne ser wî di wê heyeme de. Mirovên ku kara xwe kirin ji, di cihê xwe de mana sekinî. Weke ku cihê axiftinê û mafê wê ji Mihamed re bihêjin mana sekin. De ne, di vir de divêt ku mirov bêje. Ku mirovne kara xwe kir ku biaxivê û piştîre cihê axiftinê ji hinekan re hişt, ev yek, weke rêzdayîna pir mazin tê dîtin. Li hevberê vê nêzîkatiyê, rêzeke mazin heya. Ew mirovê ku di wê heyeme de cihê axiftinê jê re hata hiştin, êdî ji wî re ji rêzeke ku mazin tê nîşandin. Ew êdî hertimî li ber çavan dimene. Piştîre ji, rêze lê mazin dibe. Ev yek û nêzîkatî, di nav xalkê de ji belav dibe. Xalk, pir bahsa wê ji dike di nava xwe de di her heyemê de. Xalk êdî pir bahsa wê nêzîkatiyê dike. Kî ji bê, êdî nêzîkatî, wê wî bike rojeve xalkê di nav xwe de. Mihamed, di wê heyeme de, nêzîkatiyê her weha jê re hatibû nîşandin. Ji xwe, ew mazin bû û rêzeke mazin jê re hebû. Lê ev yek, ku bûbû, êdî balaka mazin biribû ser wî. Mihamed ji, fahm kiribû ev yek. Wî ji wate wê nêzîkatiyê zanibû. Wî ji, zanibû ku ew nêzîkatî ji yekî hata nîşandin, êdî weke ku rêzeke mazin jê re bê nîşandin tê ber çavan. Mihamed, deme ku her weha jê re nêzîkatî hata nîşandin, êdî weke bêhneke biçûk xwe di cihê xwe de adiland û piştîre bidest axiftina xwe kir. Mihamed, deme ku bidest axiftina kir û axift, êdî mirovên li dore wî hemûkesek lê bi hey bûn. Herkesekî lê bi hey di hisand. Mîr û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li Mihamed bi hey û kêf dimeyîzandin û dihisandin. Mihamed, deme ku di bin wan balên li ser de bidest axiftinê kir û axift, êdî piştîre kir ku bi axiftina wî re mirovên ku lê dihisandin lê bi heyran bimênin. Ew pir xweşik diaxift. Pir bizane diaxift. Deme ku diaxift ji, pir xweşik lê dianî. Di axiftinê de, her gotine ku ji devê wî derdiket, weke gotinên helbestekê li pey hevdû bi rêz bûn. Weke ku helbestekê bixwêne

li mirovên ku lê dihisandin dihat. Mihamed, di serê axiftina xwe de, gotin ji pêxamberan dabû bû dest pê krin. Piştire hinekî li ser Birahîm xalîl ji sekinî bû. Pişt wî re ji bahsa Nebî Nuh kiribû. Pêre ji hinekî li ser Yunis û Yusif ji sekinî bû. Bahsa gelek Nebîyên din ji kiribû. Bahsa qawîtiyên wan yên wan kiribûn ji kir. Pişt wan re bahsa aliman kiribû. Di nav wan aliman de bahsa Mele Serhengê zaxoyî kiribû. Pir xweşik û ji dil bahsa wî kiribû.

Mihamed, her weha weke qadarekê axiftina xwe berdewam kiribû. Weke qadarekê axiftibû. Piştire ku wî axiftina xwe weke qadarekê berdewam kiribû, piştire, wî axiftina xwe kiribû ku bidawî bike. Piştî ji, ku kir ku bidawî bike, êdî piştire ji ku çend gotinên din ji gotin, êdî piştire axiftina bidawî kir û ma sekinî di dihê xwe de. Deme ku wî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî, piştire ji, bala gelek mirovan li ser wî bû. Pişt wî re yên ku mafê axiftinê hilda û gote Mihamed, "ti pir xweş û xweşik axift, xwûde ji tê razî be!. Te dilê me xweş kir. Tê pir rast û ji dil got û anî ser ziman". Pişt wan gotinên mîr re, êdî mîr ji bdeng ma û pişt mîr re hinek mirovên ku li wir bûn û dengê wan pir xweş bûn ketine devrê de bidest qasîdekirinê kirin. Wan ji pişt axiftina Mihamed re her weha hinek qasîdeyên pir xweş û dirêj gotin. Dilê wan mirovên li wir ku dihisandin xweş kirin. Dilê wan, biqasî ku xweş kirin, wilqasî ji zîz ji kirin. Mirovên ku qasîde digotin, berî hingî, di demên mele Serhengê zaxoyî dima de ji li cem wî û li civate wî dirûniştin û her weha qasîde digotin. Qasîde gotin, weke zikirne dihata dîtin. Weke xêrne ji dihata dîtin. Di wê heyeme de, mele Serhengê zaxoyî di bîre wan de bû û digotin. Bi vê yekê re, weke ku li ser wî ji bêjin dibû. Weke ku zikrekê ji wî re ji bikin dibû. Bi vê yekê re, weke ku diayekê an ji xêrekê ji wî re bikin ji dibû. Mele Serhengê zaxoyî, bixwe ji, xwedî dîwan bû. Ku her weha hatina gotin û ji dîwana wî ne hatibana gotin, ma qey dibû. Ne ne dibû. Bi vê yekê re, ji dîwana wî ji hinekî hata gotin. Her weha weke demeke dirêj bi qasîde gotine dem buhurî. Mirovên ku digotin, dengên wan pir xweş bû. Deme ku wan digot, mirovên li dore wan ji pir bi bal li wan dihisand.

Mirovên ku qasîde gotin, weke demekê herweha qasîde gotin. Piştire ku wan weke demeke ku ne kin qasîde gotin, êdî piştire ne bi gelekî re, mirovên ku navserî xwe bûn, wan ji di ber gotina qasîde de bidest hilda mafê axiftinê kirin û bidest axiftinê kirin. Her weha êdî axiftin û qasîde kirin bi hv re dihata kirin. Mihamed, di wê heyeem de dixwest ku li wan qasîdeyên ku dihatina gotin bihêne. Bala xwe pir bi bal dide wan qasîdeyan. Ew qasîdeyên ku dihatina gotin, weke ku pir li xoşa Mihamed diçû. Deme ku mirov li Mihamed dimeyîzend, mirov ji wî ev yek

fahmdikir. Wî bi kêf dihisand. Wî pir bibal dihisand. Mihamed, berî hingî ji, gelek caran li wan mirovên ku digotin li wan hisandibû. Deme ku mele Serhengê zaxoyî dima, ku li hevdû dirûniştin û civate xwe li dar dixistin, êdî di nav axiftinê de ew ji bi wî dengê xwe yê pir xweş têvlî wan dibûn. Dilê wan xweş dikirin. Qasîde, ku lê dihata hisandin, bi du awayan jê xweşbûna dihata xwestin. Ya pêşî, yê ku bêje bixweşbûna dengê wî re xweşbûnak jê dihata xwestin û di gotinên wê de ji li xweşbûnekê lê dihata lêgerîn. Ev herdû alî, di qasîde di ahengekê de dibûn yek. Di qasîde de, bi dengê ku xweş re qasîdeyeke ku gotinên wê pir xweş û baş hatina nivîsandin hevdû temem dikir. Mirovên ku qasîde digotin, ku her weha weke qaderekê gotin, êdî hin bi hin axiftin de zêde dibû. Mîr ji, ku weke qadarekê li mirovên ku qasîde digotin li wan hisand, û ku hin bi hin mirovên ku navserî xwe bûn ku di ber qasîdeyan de bidest axiftinê kirin, êdî piştî ne bi gelekî re mîr ji mafê axiftinê hilde û kete axiftinê de. Êdî hin bi hin axiftin bû û derkete pêş û mirovên ku qasîde digotin ji hin bi hin cihê gotina xwe ji mirovên ku axiftin dikirin re hiştin.

Axiftin, hin bi hin di nav wan de dise zêde bû. Hin bi hin mirovên ku navserî xwe bûn, dise bidest axiftinê kirin. Lê vê carê, ne weke cara pêşî bû. Cara pêşî, tenê axiftin dibûn. Lê vê carê, ne tenê axiftin dibûn. Cerna di berde yên ku dengê wan xweş bû û weke dengbêj bûn ji diketine devrê de. Wan ji digot. Bi vê yekê re, nava wan xweş bû bû. Lê yên ku dengbêjbûn, li gor civatê, tenê di wê heyeme de qasîde û vegotinên di wê aste digotin. Bi vê yekê re axiftin û qasîdekirin di nav hevdû berdeyam kir. Seyde Avdîrehîmê xaniqî di vir de ku mirov di du sê gotinan li ser bêje, mirov karê vê yekê bêje. Divêt ku mirov bêje ku ew ji deng xweş bû. Ew ji xwedî dîwan bû. Wî ji cerna digot. Lê di wê heyeme de ne got. Cihê gotinê, ji yê hinekî ji wî ciwantir re hişt. Lê yên ku digotin ji, ji dievê seyde Avdîrehîmê xaniqî hinek dîwanên wî his kiribûn. Ji ber vê yekê ne mumkun bû ku yên ku hiskiribûn, ji wî, ji wan hiskirinên xwe ne gotibana. Divîbû ku ji wî ji gotiban. Wan ji got.

Seyde Avdîrehîmê xaniqî hem dengê wî xweş bû û hem ji xweşgotin bû. Cerna ku li mizgefte di rûnişt, bi awayekî ku gih diaxift û gih ji weke ku distirand digot. Mirovên ku lê di hisandin ji, bala xwe didanê de. Rêzeke mazin ji jê re di girtin. Ew ji pîr di wê heyeme de. Weke berê bi qasîde ne distirand. Lê diaxift û pir xweş ji diaxift. Bi axiftinaka wilo xweş û bi bandûr diaxift, dikir ku dilê mirovên ku lê di hisandin xweş bibe. Dikir ku wan ti carî ne dixwest ku jê dîr bimênin. Ew mirovekî ku her weha bû. Mihamed ji, li cem wî rûnişti bû. Piştî ku Mihamed hatibû wir, êdî ku

derfet di dîtin, di her firsandê dihatina cem hevdû û ji hevdû re diaxiftin. Herdû ji mirovne ku zanebûn. Bizanebûne diçûne ser hevdû û di dilê hevdû de cih digirtin. Di wê heyeme de, deme ku Seyde Avdilrehîmê xaniqî diaxift, Mihamed ji pir bi bal, bala xwe didayê de û lê di hisand. Mirovên zane, tê gotin ku bêhtir ji hevdû fahmdikin. Her qinyetek hebû di nav mirovan de di nav xalkê de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, pir bi zane bû. Wî gelek dever û zanistên deme dîtibûn. Li herême botanê ji mabû. Li wanderan li gelek deveran mabû bû. Li herême botanê ji li gelek deveran dergahên şêxan hedûn. Li wan dergahan ji mirovên ku li hevdû dihatina hevdû hebûn. Weke Serdêfe, Mamolanê, Serêkahnîyê û hwd. Li gelek deverên din ji hebû. Li Cizîre bota bixwe ji hebûn. Hemû ji heya wan jev hebû û bi ser hevdû de diçûn û bi zanist û zanebûne xwe, bi hev re diketine nîqaş û danûstandinan de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî li cem wan ji mabû. Li wanderan ji, softi li pêş bû. Gelek softi hebû. Softi, weke xwediyê têgihiştinekê bûn. Xwediyê têgihiştineke demê bûn. Ew, ji aliyekî ku mirov bêje zanistên deme xwe ji bûn wê ne xalat be. Li dore dergahan axlabe ji, ew li hevdû digahana hevdû. Li dergaha ku lê digahana hevdû, weke ku "dibûna sofîyê wir". Di nav xalkê de ji her weha dihatina xanin. Ku li herêmeke dergah hebene, li wir, li cem şêx, softi ji li hevdû digahana hevdû. Demeke dirêj li cem şêx diman. Êdî ew weke ahlê wir, yê wê dergahê dihatina zanin. Ew ku dihatina bi navkirin, navê dergahê û an ji şêx ji dihatina gotin ku "ew sofîyên filan dergahê ne". An ji di gotin "ew sofîyê filan şêxî ne". Ev yek, her weha navdar bû. Pir dihatina ser ziman. Her weha navkirin dibû. Lê divêt ku mirov di vir de bêje ku ew softi ji ne softine ku bêzanebûn bûn. Her yek weke Seydeyekî dihatina dîtin. Jê kêmtir ne dihatina dîtin. Zanebûne wî jine kêmtir ya seydeyekî bû. Di nav xalkê de ji her weha dihatina zanin. Softi, her weha di nav kurdan bi nav bû. Lê softi, di nav wan bi zêdeyî ji bi kirin û dengê xwe navdar bû. Biqasî ku dihatina gotin ku zanebûna, her weha jê dihatina xwestin ku dengê wî yê qasîdetiyê hebana. Dengê Sofîyan ji xweş bû. Navê dengê wan ji hebû. Softi, hertimî Arbana wan di destên wan de bûn û di nav xalkê de digaharan. Wan Arbanayaka pir xweş lê dixistin. Dilê mirov bi lêxistina arbana xwe xweş dikirin. Bi wî dengê wan yê xweş, navê mazin û alliman û pêxamberan hertimî dihatina ser ziman û xalkê jê wan biagahdar dibû. Bi vê yekê re ew hertimî, dihatina naskirin. Deme ku mirov xwestibana ku li softiyan û dengê wan û zanista wan bihisêne ji wan, divêt ku rê girtibana û çûbana dergaha ku ew lê bûn.

Li wir ji, li dergaha mele Serhengê zaxoyî ji sofîyên ku li wir diman û li wir disekinîn hebûn. Ew ji yên ku bi dengê xwe re nav dabûn di nav wan de hebûn. Yên ku pir bahsa wan dikirin hebûn. Di wê heyeme de deme ku civat ji qasrê rabûbû û hatibû wir û li wir li hevdû rûniştibûn û bi hev re bidest axiftinê kirin û ku hinekî axiftibûn û piştire mirovên ku dengê wan xweş ji ketibûbûna devrê de û bidest qasîde gotinê kirin, hingî ew ji li ser lingan bûn. Ew ji yên ku di rewşên wilo de ku bi dengên xwe ban an ji bi bi arbana xwe ban, di devrê debûn û digotin. Di wê heyeme de ji wan ji digot. Wan ji gelek qasîde yên pîroz gotin. Wan ji, bi dengê xwe dilê mirovên ku li wir in zîz kirin. Demeke dirêj wan gotibû. Piştire êdî mabûbûna sekinî û cihê gotin û axiftinê ji civatê re hiştibûn. Piştire civat êdî ketibû axiftinê de. Di deme axiftinê de ji, mirovên weke Seyde Avdilrehîmê xaniqî bi zanebûna xwe ketibûbûna devrê de. Wan ji êdî ji civatê axiftin kiribû. Mîr ji bidest axiftinê kiribû. Mihamed ji bidest axiftinê kiribû. Hê gelek mirovên wek wan yên zane û bigotin hebûn û ew ji ketibûbûna devrê de û axiftibûn ji civatê re di wê heyeme de.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî, li herême botanê li cihê ku mabû, li wanderan, li cem sofî û seydeyan mabû. Li cem Mirovên zanist, ku bi zanistiya xwe re navê wan hebû mabû. Bi wan re ketibû danûstandinê de. Bi vê yekê re, ew pir bi zanistan re mabû. Mirov karê vê gotinê ji bo wî dubara bike û bi êmin bêne ser ziman. Di wê heyeme de, ew demek bû ku ew li wir bû. Li Zaxoyê bû. Li cem mele Serhengê zaxoyî mabû bû. Pêre pir rûniştibû û dabû û standibû. Her weha divêt ku mirov vê yekê, weke gotineke girîng bêne ser ziman. Mihamed ji pêre mabû bû. Lê ew ji Mihamed zêdetir pêre mabû bû. Ji ber vê yekê, mirov karê bêje ku çûna ser dilowaniya xwe ya mele Serhengê zaxoyî, pir pêre hestbûn çêkiribû. Pir bandûr pêre çêkiribû. Deme ku mirov lê dimeyîzend û li gotin û axiftinên wî dihisand, mirov ev yek pir baş û qanc pêre didît û kifş dikir.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî, bi awayekî pir mazin bi mele Serhengê zaxoyî ve girêdayî bû. Pir hij wî dikir. Ti civat an ji rûniştinên wî, bê Seyde Avdilrehîmê xaniqî ne dibûn. Hertimî li cem hevdû bûn. Hertimî bi hev re bûn. Bi zanebûn bi hev re hatibûbûna girêdan. Ev rewş, di wê heyeme de, ji aliyê her mirovên ku li wir bûn û ew didîtin û nasdikirin ve dihatan dîtin û fahm kirin. Yê ku herî zêde ev yek didît û fahmdikir ji Mihamed bû.

Mihamed ji, ku mirov bi vî awayî hinekî ji bo wî bêne ser ziman, wê ne xalat bê. Ew ji ew demek bû ku bi mele Serhengê zaxoyî re bû. Bi hev re ji Cizîre bota ketibûbûna rê de û hatibû bûna wir. Li wir, bi hev re wan demeke xwe ya dirêj buhurandibû. Bi hev re li herême ji li gelek deverên

wê gerahabûn. Li başûre kurdistanê li gelek deverên wê gerahabûn. Gelek deverên wê bi hev re dîtibûn. Bi hev re li gelek civatan rûniştin û bi zanistan re mabûbûn. Bi hev re li gelek cihan mabûbûn. Lê hê ku ne vegerehebûn, di rê de rewşe mele Serhengê zaxoyî bi ber xirabûnê ve çûbû bû. Piştî ku hatibûbûna Zaxoyê ji, êdî ne bi gelekî re mele Serhengê zaxoyî rewşe wî xirabû bû. Piştî ne bi gelekî ji ew gahabû rehmata xwe. Piştî ku gahabû rehmata xwe, êdî ne bi gelekî re, herême mirovên ku ew nas dikirin yên ku navê wî bihîtibûn, di cih de rê girtibûn û hatibûbûna wir. Ta wê demê, hê mirovên ku ew nasdikirin dihatina wir, sersaxiya wî. Çûna wî ya li ser dilovaniya xwe, mirovan pir bihaznkiribû. Pir li dilê mirovan xistibû. ew mirovekî ku mazin bû. Di wê heyeme de, deme ku li ser wî diaxiftin ji, ji mazinatiya wî û hizre wî diaxiftin. Bahsa kirinên wî dikirin. Yên ku ew nasdikirin û zanibûn ku ew çend mazina, bêhtir wî di dilê wan de êşek çêkiribû. Êşe mele Serhengê Zaxoyî li gor wan pir mazin bû. Di rastiye de ji pir mazin bû. Ew mirovekî ku pir bizane bû. Di deme ku ew saxbû de, ji gelek herêmê dûr û cûr bi cûr dihatin ku li wî bihênin. Ji bo ku ji hizre wî hinekî bigirin. Her weha ew mirovekî ku bi zanebûna xwe mazin bû. Ew mirovekî ku bizanebûna pir mazin bû. Mirovekî ku weha zahabûna wî pir mazin bû. Wê ne hatibana ji bîrkirin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, di wê heyeme de deme ku axiftibû, her weha ji gelek aliyan de bahsa wî û mazinbûna wî kiribû. Ew deme ku bidest axiftinê kir û axiftina xwe bidawî kir, piştî ne bi gelekî re êdî di cih de mîr mafê axiftinê dihildê û bidest axiftinê dike. Ew ji deme ku diaxivê, li ser mele Serhengê zaxoyî û mazinatiya wî diaxivê. Bahsa jiyana wî dike. Bahsa wan mirovên ku ji deverên dûr, tenê ji bo ku hinekî lê bihisênin dihatina wir dike. Her weha ew ji weke demeke dirêj û mazin diaxivê.

Piştî ku mîr ji mafê axiftinê hilde û hinekî axift û piştî ku hinekî axift êdî axiftina xwe bidawî kir, êdî civata wan ji wan, bidest axiftin û nîqaşan kir. Dîse weke ku bi axiftinê nava wan germ bû. Dîse weke ku di serî de çûnûhatinê çûbû. Mihamed ji, di wê heyeme de bêdeng nema. Ew ji axift. Wî ji mafê axiftinê hilde û careke dî axift. Wê carê, deme ku axift, hinekî vêce ji bahsa Cizîre bota kir. Di axiftina xwe de wî bahsa Nebî Nuh kiribû. Li ser Nebî Nuh hinekî dî sekinî bi axiftinê. Mihamed, wê carê ji, deme ku axift, ne kin axift. Lê zêde wilo ne zêde dirêj ji axift. Axiftin, di wê heyeme de, di nav wan de ne tenê weke ku yek biaxivê û yê din lê ta dawiyê lê bihisênin bû. Bi hev re niqaşkirin û di niqaşê de bi hev re ketine axiftinê ji hebû. Her weha rewşeke nîqaşê di wê heyeme de bi wan re di nav wan de bû. Mîr ji piştî ku hinekî axiftibû mabû bû sekinî di cihê xwe

de bi bêdeng. Lê di wê heyeme de, deme ku wilo axiftin û nîqaşkirin di nav hevdû de bû, êdî ew ji bêdeng nema bû. Ew ji tevî axiftinan bû bû. Ji xwe ji wî ji her weha dihata xwestin. Bêdengî ti carî li mîr ne dihat. Hertimî axiftin lê dihat. Di wê heyeme de deme ku her weha hinekî germbûn bi nîqaşê di nav wan de bû, êdî çav ji çûbûbûna ser mîr. Wî ji ev yek dîtibû. Ji ber ku ew yek dîtibû, êdî bêdeng nema bû. Mihamed ji di wê heyeme de bêdeng nema bû. Ew ji di nav axiftinan de bû. Dengê wî ji dihat. Deme ku ew ji diaxift, weke mîr çawa ku herkesek bal diçûna ser wî, her weha bal dihatina ser wî ji. Herkesekî bala xwe dide ser wî di wê heyeme de.

Bi vî awayê axiftin û nîqaşkirin di nav wan de weke demeke berdewam kir. Di wê heyeme de gelek hizir bi wan re derketina hole. Bahsa gelek tiştan kirin. Bahsa gelek nirxan kirin. Di wan nirxên ku wan bahsa kir de, nirxên civakê yên pîroz ji hebûn. Ji xwe, di rewşeke wilo, ku mirovekî ku mazin û hêje çû ser dilovaniya xwe, di deme ku mirov çûna ser saxsiya malbatê an ji rewşeke weha, di wê heyeme de bahsa nirxên pîroz ne mumkun bû ne hatibana kirin. Bahs dihata kirin. Li ser dihata axiftin. Weke ku mirov di wê rewşê de careke nirxên xwe yên pîroz bixe dikir. Di wê rewşê de ji ev yek hatibû kirin. Di wê rewşê de civatê gelek nirx bi bîr xistibûn. Li ser gelek nirxan hatibû axiftin. Ji dîrokê û heyem berê, kê çi zanibana dianî ser ziman. Deme ku dihata ser ziman ji, ji xaynî yên dianî ser ziman, kî yî dî, ku di derbarê wê rewşê an ji hizre de çi zanibana wî ji di wê heyeme de qasisî ne dikir û dianî ser ziman. Ji gotinê ve ti kesekî qasisî ne dikir. Herkesekî çi rast û qanc zanibana dianî ser ziman. Bi vî yekê re, herkesek li ber hevdû bû. Di nîqaşê de bû. Nîqaşkirin, weke nirxekî li pêş bû. Di civatan de her weha ev yek li pêş bû. Deme ku mirov bahsa nîqaşkirinê û civatan bike, divêt ku mirov di vir de ji jiyana asayî ya xalkê bêne ser ziman. Pêdivî bi vî yekê heya. Jiyan, di civatan de bi awayekî din bû.

Li kudera Kurdistanê bana, mirov hertimî civatên xwe li dar dixistin. Hertimî civatên xwe bi hev re li dar dixistin. Li malekê bana an ji li qesra mîr ji bana, her weha ev yek hebû. Li her herêmê cihê mîr û qasra mazin hebû. Hertimî li qasra wî li hev gahana hevdû dibû. Car bi car ji ku ji deverên dût û cûr bi cûr ji mirov dihatin, axlabe li qasra mîr levdigahana hevdû. Li wir, li hevdû dirûniştin û bi hev re diketina nîqaşan de. Diketina danûstandinan de. Lê deme ku mirov bahsa civatan kir, divêt ku mirov zanibe ku ne tenê di qasrê de dibûn. Li herderê dibûn. Axlabe ji ku dibû êvar û hinek raş dikete ardê de, êdî li hevdû li malekê ku karibe civatê ragirê lev digahana hevdû. Deme ku her weha bi vî awayî lev digahana

hevdû, êdî ne tenê mêr diçûna civatan. Ji xaynî wan, jîn ji bi zarokên xwe re bi wan re bûn. Jîn ji deme ku dihatin, li civatê bi mêran re dirûniştin û diketina nîqaşan de. Ew ji her weha di civatan de di gelek rewşan de gotina wan hebû û li wan dihata hisandin. Li civatê mîr û li qasrê ji, jinên ku pîr û navserî xwe axlabe dihatina dîtîn. Lê ne wilo zêde. Lê li yên ku herweha di nav xalkê de dibûn, hertimî hebûn û dihatina dîtîn. Bi hev re dirûniştin û didan û distandin. Li civatan, ev yek hebû. Li herême botanê, bi xosisî ji li Cizîre bota û li dore wê û li dore riha ev yek hebû. Di heyemên berê de ev yek hebû. Piştî di demên dawiyê de hin bi hin ev yek ji hole rabû. Êdî civata bûna yên mêran. Axlaba ji li herême rihayê guharandinaka mazin çêbû. Piştî, jin di civatan de li vê herêmê ne dihata dîtîn ji. Lê herême botanê, her çend k guharandin bû ji, ne weke vê herêmê bû. Li herême botanê jin dise hebû di civatan de, lê belê di wê herêmê de kêmbûn bû bû. Bi vê yekê re, êdî hin bi hin rewş û kevneşopîya civatan hata guharandin. Êdî tenê bûna civatên mêran. Civat, êdî civatên mêran bûn.

Lê ya rastî, ku mirov hinekî kur diçê û şrove dike û dimeyîzenê, mirov dibîne ku bitememî di nav xalkê de ev guharandin rast ne dihata dîtîn. Xalkê di nav xwe de li kevneşopîyên xwe yên berê li gelek herêman tevdiqaraha. Bi zêdeyî ji li herême botanê û li hinek herêmên Serhadê ev yek hebû. Li van herêman ev çand bi tavahî nayê guharandin. Ev herêm, ji ber ku xwediyê dîrokeke ku pir kevn û kur bûn. Kevneşopîyên wan ji, pir xurt bûn. Pir mazin di bîran de bûn. Wan kevneşopîyên wan, di demê de bi wan re hinek nixne pir mazin afirandi bûn. Li herêmê Serhadê ku bahsa wê dihata kirin û dihata gotin ku di heymên berê de jîn bûya, bahsa Xacê dihata kirin. Deme ku bahsa wê dihata kirin. Bahsa jineke ku ji dêla mêrê xwe yê mîr bûya mîr dihata kirin. Pir li ser wê ji dihata sekinandin. Deme ku bahsa wê dihata kirin, pir dirêj bizanistî bahsa wê dihata kirin. Ew ji pir bi hêz bû. Ku bahsa wê dihata kirin, weke dagarîya hêza jinê bahsa wê dihata kirin. Pir bi zane û bi vegotina xurt bahsa wê dihata kirin. Xacê, li dore wê hertimî civata wê li dar bû. Li dore wê pir mêr û mîr li hevdû digahana hevdû. Wê ji wan re axiftin dikir. Ji wan re weke mîrekî axiftin dikir. Ji wan re pir bi zane diaxift. Bi vê yekê re, bi gotinên wê re di nav xalkê de kevneşopîyeke mazin ji bi jinê tê afirandin. Jin bi wê re derdikeve pêş di nav xalkê de û di civatan de. Ew bi xwe jin bû. Deme ku li civatan dirûnişt, ne ku mumkun bû ku jinne din li cem wê nebin. Hin jinên din ji dayimî hebûn li cem wê di civatan de. Bi vê yekê re, mirov karê bêje ku jin û mêr bi hev re di civatê de weke hevdû cih digirtin û dibûna xwedî gotin. Çawa ku di nav xalkê de bahsa rûstemê Zal dihata kirin bi mêraniya

wî, her weha ew ji jin bû û bahsa wê ji bi wê rewşa wê ya mîrîtiya wê û sereketiya wê dihata kirin. Mihamed ji û mirovên ku li civatê rûniştibûn, heya wam ji vê yekê hebû. Ji ber ku di nav xalkê xwe pir li ser dihata axiftin, êdî wî ji pir baş û qanc his kiribû. Wî ji his kiribû ku çawa û bi çi awayî bahsa wê dikin. Ji ber ku Xacê bixwe ji, keça şêxekî ji bû, êdî bahsa wê bi rêz dihata kirin. Weke Xacê ku ji aliyê bav ve an ji ji aliyê dê ve şêxitiya wan heya, di nav xalkê de her weha bi awayekî derdiketine pêş. Gelekan ji wan dergahên xwe ji avadikirin. Çawa ku weke şêx û seydeyên mêr mirov diçûna serdana wan û li wan û i civata wan dirûniştin, her weha diçûna cem wan ji û li wan û li civata wan ji dirûniştin. Ji wan berg(dua) ji dixwestin. Ji ber ku ev ji şêx bûn an ji ji mala şêxan bûn, pîroziyaka wan hebû. Bi vê yekê, derdikevine pêş. Mihamed bixwe ji bûbû bû şahidê rewşên wilo, hê ku biçûk bû. Di biçûkatiya wî de wî didît ku çawa mirov dihatina cem pîrka wî. Deme ku kalkê wî ji ber hatina osmaniyan ya bi ser wî de ku ew ravî, êdî pîrka wî li wir mabû. Ew bixwe ji jineke ku pir pîr bû. Li dore wê ji civat lev digaha hevdû. Wî didît ev yek. Deme ku civat li dore bavê wî ji lev digaha hevdû, pîrka wî di civatê de amede dibû û ji civatê re diaxift ji. Deme ku ew dirûnişt ji, gelek jinên ku wê li cem wê rûnihin û her weha bi tenê nehêlin di civatê de hebûn. Bi vê yekê re rewşeke ku jin û mêr bi hev re di civatê de li hevdû dirûniştin çêdibû. Mihamed, ew rewş jîn kiribû. Gelek caran, deme ku dayika wî ji li cem pîrka wî dirûnişt, ew ji li cem wan û bavê xwe bû. Ev rewş, di civatên kurdan de rewşeke ku asayî bû. Bi vê rewşê re, divêt ku mirov bêje ku kevneşopîyeke pir kevn û dîrokî hebû. Mirovên ku dîroke wê kevneşopîyê nizanîbana ji, di xwe de hizir û nirxî û kevneşopîyên wê rewşê bi xwezabûnaka ku di xwe de hîs dikir têgihîşt. Bi vê yekê re, weke ku bi xweza, di derbarê wê rewşê û dîrokê wê de xwedi hizir bê, dihata berçavan. Civat, her weha weke kevneşopîyeke pir mazin bû di nav kurdan de. Deme ku mirov bahsa civatê bike, divêt ku mirov bi dîrok, hizir û têgihîştineke mazin e dîrokî bahsa wê bike. Ji ber ku rastiye wê ji wilo bû. Mihamed, di wê heyeme de di nav seyde û mirovên ku navserî de bû. Di nav wan de dirûniştibû û diaxift. Mîr ji li wir bû. Bi vê yekê re, civata wan pir mazin bû. Bi nirx bû. Di civataka wilo de ew amede bûn û di wê heyeme de diaxiftin û nîqaş dikirin bi hev re û ji hev re..

Di civatê de di wê heyeme de deme ku Mihamed ji û mîr ji ku di nav de hinekî weke demeke dirêj ji xwe re axiftin, êdî piştê weke ku bi wastihin mana sekinî û ku ew mana sekinî êdî dise ew mirovên ku dengê wan xweş bû bi wî dengê xwe yê xweş ketine devrê de û bidest gotinê

kirin. Deme ku mirovên deng xweş ketine devrê de, êdî bêdeng bûn çêbû. Mîr ji bêdeng ma û li wan hisand. Wan pir xweş û xweşik di stirand. Pir xweş û xweşik diavête ser mirovan. Di wê heyeme de ji ber ku ji bo mele Serhengê xaxoyî li wir bûn, pîrên wan di gotine xwe de diavêtine ser wî û pir xweş digotin.

Civate wan her weha weke demeke dirêj bi axiftin û qasîde gotinê berdewam kir. Pir demeke xweş buhurandibûn bi hev re. Civate wan, ku her weha weke demekê ma, êdî piştî ne bi gelekî re farqkirin ku dem hatiya ber derengiyê. Lê wilo zêde ji ne bû bû. Hê ji xwe re rûniştibûn. Hê bi hev re diaxiftin. Hê ji hevdû re divegotin. Hemû ji hema bêja mirovên ku zanist û navserî xwe bûn. Yên ku zanist bûn. Zanibûn ku ka wê çi ji hev re bênine ser ziman û bêjin. Bi vê yekê re mirov karê wan bêne ser ziman. Di wê heyeme de, deme ku li hevdû rûniştibûn, li ser pir tiştan axiftibûn. Pir tişt û rewş di nav wan de di civata wan de hatibû ser ziman. Bahsa wê ji jina ku bahsa wê dikirin û ku digotin ku navê wê Xaçê ji ya kiribûn. Deme ku bahsa wê kiribûn di wê heyeme de di serê Mihamed de hinek rewşne dî şaq dabû bûn. Di serê Mihamed de, ew demên ku ew biçûk bû û li malê li cem dayika xwe bû hatibû bîre wî di wê heyeme de. Pîrka wî hatibû bîre wî. Dayika wî hatibû bîre wî. Ew deme wan hatibû bîre wî. Dayika wî ji pir kêf û kêferat kiribû ji bo pêşketin Mihamed. Deme ku wî li cem seyde dixwand, êdî ku dihata malê, dayika wî fêrên wî bi wî didana revakirin. Ew hemû di serê wî de bûn. Di wê heyeme de deme ku her weha bahs hatibû kirin ji, weke di xatekê de ew dem hemûk di ber çavên wî de buhurtibûn. Mihamed, deme ku her weha di ber çavên wî de buhurtibûn, ew ji di serê xwe de li ser wan û wan rewşan bidest hizirandinê kiribû. Di serê xwe de bi vê yekê re weke ku ji wir herê lê hatibû. Ew di serê xwe de bi vê yekê, ji wê heyeme çûbû û çûbû bû wê heyeme. Ew dem û rewş li berçavên wî bûn. Dayika wî li ber çavên wî bû. Pîrka wî li ber çavên wî bû. Dayik, di jiyana mirov xwediyê wateyaka pir mazina. Bi vê yekê, di vêt ku mirov bêje ku xwediyê rêzeke ku pir mazina. Ew ji her alî ve afirneke jiyane ya.

Mihamed, ew dem hemû di bîre wî de bûn. Li ser wan deman dihizirî. Cerna gotinek û an ji dîtinek dike ku gelek demên jiyana mirov yê ku li şûn mana bi careke re werine bîre mirov. Di wê rewşê de ji, her weha li serê Mihamed hatibû. Wî bi bahskirina Xaçê û navê wê re ew dem û rewş bi careke re hatibûbûna bîre wî di wê heyeme de. Ne tenê hinek hatibûbûna bîre wî. Gelek tişt û rewş di wê kêlikê de hatibûbûna bîre wî di wê heyeme de. Ewqas wê werine bîre wî, lê ka ma wê Dilberê û Dilşad ma newina bîre

wî?Belê, ew ji hatibûbûna bîre wî. Ew ji, nûqteyêke ku pir girîngbûn di jiyana wî de. Ew ji di wê heyeme de hatibûbûna bîre wî. Rewşa Dilberê û Dilşad, di jiyane Mihamed de xwediyê cihekî ku pir girîng bû. Wî ti carî, ew ji bîr nekirin. Hertimî, ew di serê wî de jîn û zîn man.Hertimî li ser wan di hizirî. Ew hertimî di bîre wî de bûn.Gelek caran, di axiftinên xwe de wî ew dianîna ser ziman di nav civatan de. Deme ku ew dianîna ser ziman û bahsa wan dikir ji, pir bi hest û raman dibû. Cerna weke ku ji xwe diçû ji lê dihat. Her weha pir bihest û raman dibû.Wî ew jidil û hertimî di dil de jîn û zîn jînkirinbûn.Bi vê yekê re mirov karê wan di jiyana wî de bêne ser ziman.

Mihamed, her weha ku weke ku di hizir de ji xwe çûbû, piştî ne bi gelekî re dervî wî, bala seyde Avdilrehîmê xaniqî çûbû bû ser wî. Seyde Adilrehîmê xaniqî lê meyîzend ku wa ew ji xwe çûya. Wa ew weke ku ne li wir be dihata kifş kirin. Mihamed, di cihê xwe de rûniştibû û weke ku di hisand. Mirovên ku lê dimeyîzendin, ev yek jê fahmdikirin û têgihîştin. Lê Seyde Avdilrehîmê xaniqî farqkiribû ku ew ji xwe çûya di wê heyeme de. Farq kiribû ku ew di serê xwe de ji wir çûya û di rewşne de ya. Lê ka ew di çî rewşan de bû ji, ew ji di wê heyeme de zêde wilo ji aliyê wan ve ne dihata fahm kirin.Seyde Avdilrehîmê xaniqî, piştî ku bahsa Xaçê û rewşa wê hatibû kirin û bahsa mazinatiya wê hatibû kirin, êdî dîtibû ku wa Mihamed di serê xwe de weke ku çû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî berî hingî gelek caran bi Mihamed re axiftibû û Mihamed jê re bahsa wan rewşên ku dîtibûn kiribû. Bahsa Rewşên weke rewşa Dilberê û Dilşad û wan kiribû. Wî ji her weha ew rewş ji wî fêr bûbûn.

Mihamed, di serê xwe de dihizirî.Li ser wan demên ku li malê û wan demên ku wî li cem seydeyê xwe xwe buhurandibû û piştî ku bi hev re çûbûbûna cem şêx dihizirî. Ew her weha pir dihizirî. Her rewşên ku di serê wî de ku ew li ser dihizirî, rewşên ku wî pir didana hizirandin bûn. Rewşên ku wî hîç ji bîr ne kiribûn bûn.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew rewş rewşne ku pir bandûra wan li ser wî hebûn bûn.

Jiyana Xaçê, deme ku hata ser ziman, pir bahsa wê hata kirin. Bi wê re bahsa alimtiya jinan û mazinbûna wan hata kirin. Ew weke dagerîyaka wan dihata ser ziman. Piştî gelek deman re, bi Xaçê re careke din kevneşopîya jinê hatibû jînkirin. Ev yek, ne dihata jîn kirin. Wê bi xwe re hin kevneşopî bi kevneşopîyên civakê yên ku hene re afirandibû.Bi vê yekê re deme wê pir mazin li ser dihata axiftin. Di civatan de pir bahsa wê û dema wê û serpêhatiyên wê dihata kirin.Deme ku bahsa wê dihata kirin, her weha di serê Mihamed de dayika wî, pîrka wî û Dilberê dihata bîre wî. Ew hersê

jin di jiyana wî de pir mazin bi wate bûn. Cihê wan û nejbîrkirina wan pêre pir mazin bû. Wî hersê bi bi awayekê dîtîbûn. Wî dayîka xwe bi awayekê û bi mazinatiyekê dîtîbû. Wî pîrka bi awayekê û bi mazinatiyekê dîtîbû. Û wî Dilberê ji bi awayekê û bi rewşekê dîtîbû. Lê hersê ji, bi wî re pir mazin bicih bûn. Hersê ji mazin bûn. Wate wan mazin bû. Cerna wate mirov, mirov mazin dike. Cerna ji mirov wate xwe bi xwe re mazin dike. Her weha ew bi hev re ne. Mihamed ji vê yekê zanibû. Ew ji di têgihîştine vê yekê de bû. Ew zanistekî mazin yê deme xwe bû. Hizre wî mazin bû. Di nav xalkê de pir dihata zanîn.

Mihamed, ku her weha hinekî di rewşe xwe de bi hizir dimêne, êdî piştî ne bi gelekî re dike ku were xwe. Di wê heyeme de bala Seyde Avdîrehîmê xaniqî ji li ser wî bû. Li wî dimeyîzend. Deme ku Mihamed carekê serê xwe ji ber xwe rakir û li dore xwe meyîzend, hingî bi seyde Avdîrehîmê xaniqî re çav bi çav hat. Hingî dît û fahm kir ku bala wî li ser wî ya. Civata wan ji, di wê heyeme de ji xwe re diaxift. Nîqaşên wan berdewam bûn. Pir çûnûhatin di seran de hebû. Pir hizir derdiketina hole. Ku yek diaxift û wî axiftina xwe bidawî dikir û dima sekinî, di cih de yê din mafê axiftinê dihilde û ji wî berdewam dikir. Nedihişt ku navend bikeve naqabîna axiftina wan de. Yek li pey yê din bû. Her weha rewşeke nîqaşê di civate wan de bi wan re hebû. Mihamed ji, cerna ku di xwe de didît û mafê axiftinê digirt diaxift. Ji xwe, di rewşeke wilo ne mumkun bû ku ew bêaxiftin mabana. Mirovên weke wî bizane û mazin, di axiftinê de bêhtir hêvîya axitinê ji wan dihata kirin. Bêhtir gotin ji wan dihata xwestin. Bêhtir ji wan dihata xwestin ku rastiye bînine ser ziman. Mihamed, ji mirovekî ku li berçavan bû. Ew mirovekî ku mazin bû û zane bû. Ew demek bû ku ew li wir bû. Li wir pir hatibû naskirin. Wî ji ewder û mirovên wêderê naskiribûn. Her weha hevdu naskirinek hebû. Bi vê yekê, êdî ew li ber çavan bû. Yên ku ew naskiribûn ji, dîtîbûn û fahmkiribûn ku ew çend bi zanebûna. Bi vê yekê ew hatibû naskirin. Bi vê yekê re ji çav çûbûbûna ser wî. Deme ku di civatê de bana an ji di rewşên din yên wilo de bana, ew li ber çavan bû û jê mirov bi hêvî bûn. Yê ku di têgihîştine vê yekê de bû, herî zêde seyde Avdîrehîmê xaniqî bû. Ji ber vê yekê bû ku bala wî pir mazin li ser Mihamed bû. Li Mihamed dimeyîzend ku ka ew di çi rewşê de ya. Rewşe wî çi ya. Seyde Avdîrehîmê xaniqî, zanibû ku nabe ku Mihamed do civata wilo de û di nav mirovên wilo de bêdeng bimene. Ew ji di wê têgihîştinê de bû. Mihamed bi xwe ji, ew yek zanibû. Di têgihîştinê wê yekê de bû. Lê ew di serê xwe de weke demekê ji wir çûbû bû. Bi vê yekê re ji, êdî bêdeng mabû. Weke qadarekê bêdeng

mabû. Ew bêdengbûn ji, bal kişandibû. Di serî de bala seyde Avdilrehîmê xaniqî kişandibû. Bi vê yekê êdî bala wî çûbû bû ser Mihamed û lê meyîzendibû. Deme ku Mihamed ji serê xwe rakiribû û li dore xwe meyîzendibû, bi wî re çav bi çav hatibû. Deme ku Mihamed bi wî re çav bi çav hatibû, hingî ev yek weke ku were bîre wî lê hatibû û wî di cihê xwe de xwe adilandibû û kiribû ku tevlî axiftin û nîqaşên ku dibûn bibe. Axiftin di nav wan de careke din germ bû bû. Gelekî axiftin dibû. Mihamed ku her weha li xwe anî, êdî bala seyde Avdilrehîmê xaniqî ji kişand. Piştî êdî Mihamed kir ku tevlî axiftinan hê zêdetir bibe. Deme ku Mihamed her weha weke ku li xwe anî, ji aliyê mirovên dore wî ji ew hata kifşkirin û bal çûna ser wî.

Mihamed, deme ku her weha ku kifş dike ku bal li ser wî ne, êdî dike ku xwe li xwe bide hevdû. Ew, di wê heyeme de amede dike ku tevlî axiftinan bibe. Mîr bixwe, ji xwe ew pir bi gotin bû. Ew pir diaxift. Ew di nav axiftinan de çûbû bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji her weha di nav axiftinan de bû. Ew ji diaxift. Wî ji, di wê heyeme de weke mîr ku di wê heyeme de ku diaxift hinekî dirêj diaxift, ew ji wilo dirêj diaxift. Li wir gelek mirovên zane hebûn. Yên ku ji deverên dût hatina û zanistin hebûn. Ku ew diaxiftin, ew ji pir mazin û baş û dirêj di axiftin. Wan ji hizreke pir xweş û xweşik didanî hole di wê heyeme de di axiftinê de. Mihamed ji, deme ku her weha hinekî weke ku hatibû xwe, êdî ew ji bidest tevlî axiftinan kir. Ew ji divîbû ku tevlî bûbana. Divîbû ku bêdeng ne mabana. Ew mirovekî ku li ber çavan bû. Bal pir li ser hebûn. Ew berî hingî bi qaderekê bêdeng mabû. Hinekî di serê xwe de li ser hinek demên berê hizirî bû. Di serê xwe de herweha li ser wan deman kur û dût çûbû bû. Deme ku di axiftinan de bahsa Xaçê hatibû kirin, êdî ew ji hinekî li ser wê û wan gotinên ku li ser hatibûbûna ser ziman, hizirî bû. Di hizirkirina xwe de ji pir kur û dût çûbû bû. Deme ku bidest hizirkirinê kiribû, ne tenê ew ketibû ber hizirkirina wî de. Ji xaynî wê ji, dayika wî û pîrka wî û Dilbarê ji hatibûbûna bîre wî û ketibûbûna ber hizirkirina wî de. Li ser wan ji pir di serê xwe de di wê heyeme de hizirî bû. Wî, deme ku Dilberê dîtibû pir li dilê wî xistibû. Piştî bi wê li dil xistinê ew di ti demê de ji bîr ne kiribû. Ew hertimî di hiş û ramanê wî de bû. Pir caran ku bahs dibû, wî ji bahsa wê dikir ji mirovên li dore xwe re. Bi awayê ku digot dilê wan ji diêşand. Dikir ku dilê wan ji bi êşehê.

Piştî Dilberê re deme ku li Cizîre bota mabû ji, ew ji anîbû ser ziman. Li wir, mirovên ku li civata Mihamed rûniştibûn, ew rewş his kiribûn. Ew rewş, ji wî hisandibûn. Mirovên ku ji deverên dût dihatina wir û ku li wî û

li civata wî dirûniştin ji, lê dihisandin. Ku dihisandin û ew rewş his dikirin, piştê cihê ku ew ji di çûnê de, wan ji ew rewş ji mirovên ku li dore wan dibûna kom re digotin. Bi vî awayî, ew rewş ji aliyê gelek mirovan ve hatibû bihîstin. Hatibû hiskirin. Di wê heyeme de, li wir ji, mirovên ku ew rewş hisnekiribûn û nizanibûn, hema bêja nebûn. Herkesekê li wir ji hiskiribûn. Yên ku ji Mihamed hiskiribûn di wê heyeme de hiskiri bûn. Û yên ku ji derne din hiskiribûn di wê heyeme de zanibûn. Lê ku, mirov bigiştî dimeyîzend, mirov di dît ku herkesekî zanibû. Lê yê ku herî zêde zanibû ji, Mihamed bû. Ew ji ber ku jîn bû bû. Wî di nav wê rewşê de cih girtibû. Hema bêja ji serî ta binî, wî ji jîn kiribû. Piştî jînkirinê re ji, wî di ti demê de ji bîr ne kiribû. Di wê heyeme de, deme ku çend gotin ne li ser wê ji hatibûbûna ser ziman, ew anîbûbûna bîre wî. Her weha ew hê di serê wî de zîn û jîn bû. Hê di serê wî de bi hebûn û mazin bû. Mihamed, bi qasîdeyî ji, ew anîbû ser ziman. Li ser wê pir dirêj anîbû ser ziman. Ya ku wî anîbû ser ziman, piştê ji aliyê yên ku lê hisandibûn ve ji di serî de hatibû hiştin û piştê wan ji di nav xwe de digot. Bi vê awayê, ew qasîdeyî li ser wê ji hatibû jiberkirin. Bi vê yekê re, wê ji di serê mirovên din de ji cih girtibû. Bi vê yekê re divêt ku mirov bêje ku êdî rewşa Dilberê bi qasîdekirinê re êdî weke ku pîrozîyek ji standibû. Bi wî awayî ji dihata ser ziman. Ji xwe, mirovên ku rewşên wilo werine serê wan, her weha dihatina dîtin. Vêce, ku qasîde ji li ser wan dihata gotin, êdî di nav hizir, nîrx û nêzîkatîyên bawerî de ji cih digirtin. Heman nêzîkati, di wê heyeme de ji bo Dilberê ji hebû.

Bi vê yekê re, ku mirov li hizirkirina Mihamed dihizirê, mirov fahmdike û têdighê ku ew çend mazin û bi hizir dihizirî. Çend bi hest dihizirî. Hizirkirinaka hestiyarî pêre hebû. Ew mirovekî ku pir bi hestiyar bû. Bi vê yekê re di vir de divêt ku mirov careke dî ji bêne ser ziman û bêje, Mihamed xwediyê têgihîştin û hizre hestiyarî ji bû. Di vê yekê de pir kur bû ji. Deme ku ew dihizirî pir mazin hizir dikir. Hest, dihêle ku mirov pir kur herê di hizirkirinê de. Weke ku mirov ji xwe herê, hest di deme hizirkirinê de mirov ji mirov dibe. Mirov pir kur dibe. Mirov bi hizir û raman mazin dike. Hest, di hîmê xwe de jînkirin di pareze. Ew jînkirin ji, bi hizirîn. Deme ku mirov di hizirê, êdî di hizirkirinê re, ew hizirkirina bi hestiyar, mirov bi wan hizran re dibe û dibe. Mirov pir kur dibe. Mirov weke ku di lebirantekê de bibe dibe.

Hizirkirin, her weha ku bi hestiyarî bû, êdî pir kur dibe. Hizirkirin, di serê mirov de her weha bi pir alîyan heya. Mihamed ji, di wê heyeme de, deme ku mirov li nerîn û gavavêtinên wî dimeyîzenê, mirov dibîne ku

weke ku di têtgihiştine wê de ya.Mirov pêre wê kurbûnê dibîne.Mihamed di hizre xwe de pir kur bû.Pir bi hizir bû. Deme ku di hizirî, pir mazin di hiizrî. Deme ku dianî ser ziman, pir mazin û kur dianî ser ziman.Pir kur diçû di hizirkirin û anîna ser ziman de.Bi vê yekê re mirov karê bêje ku ew pir mazin bi hizir bû.

Di wê heyeme de, deme ku Mihamed xwe kar kiribû û di cihê xwe de xwe adilandibû, bala mirovên li dore wî hemûkan ji çûbû bû ser wî. Bala seyde Avdilrehîmê xaniqî herî zêde çûbû bû ser wî. Ji ber ku wî ew nasdikir. Wî zanibû ku Mihamed di serê xwe de çend bi hizire û mazina.Wî zanibû ku Mihamed di serê xwe de çend karê mazin bi hizirê.Mîr ji her weha weke seyde Avdilrehîmê zaniqî xwedi zanebûn bû di derbarê wî de. Wî ji ew naskiribû. Ji ber ku Mihamed ew demek bû ku li wir bû. Bi vê yekê re ji aliyê mirovên ku li wir bûn ve pir baş hatibû naskirin. Mihamed li medrese hertimî weke ku fêrdayînan axiftinên pir mazin û bi têtgihiştin û dirêj dikir. Li medresê ji, mirovên zane û yên ku his xwandin û li xwandinan hissandinan dikirin, li wir di demê xwandinê de dibûna kom. Li faqayan dihisandin. Piştire ku xwandin bidawi dibû, êdî ku bi hev re ketine nêqaşê de dibû, wan ji di nav de cih digirt. Wan hizre xwe dinaî ser ziman. Hizre wan ji hebû. Wan ji dixwand.Ew ji, hertimî bixwandin bûn. Bi vê yekê re, deme ku nîqaşak dest pê kiribana, êdî wan ji, ku amede ban hizre xwe dianîna ser ziman.Bi vê yekê re, ew ji bi zanebûna xwe tevî nîqaşên ku faqa û sofîyan bi hev re dikirin dibûn.Wan bi hev re hizre xwe hevpar dikir.

Mihamed, deme ku xwe di cihê xwe de xwe amede kir, êdî ku bal ji çûna ser wî, êdî wî mafê axiftinê hilda û hinekî axift. Deme ku axift ji, bal hemû li ser bûn. Guhê herkesekî li wî bû.Lê dihisandin. Pir bi bal lê dihisandin.Mihamed, li ser Xaçê û wan hizrên ku li ser wê hatina ser ziman ji, hinekî hizre xwe anî ser ziman. Piştire wî ji nerîne xwe anî ser ziman.Piştî ku nerîne xwe anî ser ziman, êî piştire wî hinekî bahsa jinan kir.Bahsa wan û cihê wan yê di nav xalkê de kir. Bahsa wan û weyne wan ya di jîyanê de kir. Hinekî dirêj ji li ser wê axift. Ji demên berê ji axift. Bahsa dayika pêxamber ji kir.Piştire ku hinekî dirêj axift, êdî wî, minaqaka ku berî hingî ji anîbû ser ziman di wê heyeme de ji civatê re anî ser ziman.Ew ji minaq ji her weha bû:

”Tê gotin ku rojekê dayikek hebû.Di deme pêxamberê me de jî bûya.Di wê demê de, berî hingî zilmeke mazin li ser serê jinê hebû. Kecên ku ji nûve ji dayik dibûn ku keç ban, bisaxiti dikirin bin ardê de.Piştire ku pêxamber hat û pêxamberî jê re hat, pêşî ev rewş sermazarkir. Berî hingî,

ku hinek bê mêrê xwe derketibana derve û gotinak li ser navê hatibana gotin, ew nêvî bi nêvî dikirin bin axê de û piştre bi kevirkirinê ew dikuştin. Vê rewşê, pêxamberê me pir hizirandibû, li ser vê yekê pir hizirî bû. Piştre gaha wê têgihîştinê ku 'yek ku di derbarê jinekê de xirabiyekê bi çavên serê xwe nebîne, divêt ku tiştêkî wilo newê kirin. Bi vê yekê re rewşê jinê di deme îslamê de careke dî hati şîrovekirin û di nav xalkê de hatibû bi watekirin. Ji bû dayikan pêxamberê me, gotiya "bihuşt di bin lingên dayikan de ya". Piştre gotiya "mafê wê yê dayikîyê li ser herkesêkî heya". Piştre deme ku ji pêxamber me tê pirsîn ku cihê jinê di nav xalkê de wê çawa be an ji divêt ku çawa be. Ew ji bersiv dide û dibêje ku "bila ti kes xwe li ser ti kesêkî re ne bîne". Mihamed van gotin gotin hizran ji di axiftina xwe de bîr dixê. Ji mirovên li dore xwe têne ser ziman. Li ser wan gotinan ji, hinekî zêde ji dirawastihê. Pir bahsa jinê dike. Hinek gotinê xwe bi gotinên mirovên ku berê axiftina û li ser Xaçê axiftina ve dike. Piştre çend gotinan li ser Dilberê ji têne ser ziman. Çi hatibû serê wê, di wê heyeme de careke din bi bîr dixê. Dike ku mirovên li dore wî, careke dî li ser wê rewşê di serê xwe de bi hizirin. Piştre Mihamed hinekî weke çend gotinan li ser 'keçkabikezî' ji têne ser ziman. Keçkabikazî, keça şêxekî bû. Zîyere te wê li Xirabêsosina li ber çemê bestê bû. Bi vê yekê re weke demekê diaxivê. Piştre ku weke demekê diaxivê, êdî axiftina xwe bidawî dike û di sekinê. Deme ku Mihamed di sekinê, êdî piştre yên ku weke wî zane ne, dikevîne devrê de û bidest axiftinê dikin. Yên ku diaxiftin û axiftina xwe bidawî dikin ji, bi mafdayîma Mihamed re axiftina xwe bidawî dikin. Di wê heyeme de, piştî axiftina Mihamed re, zêde wilo ti mirov ne axivin. Hinek mirov diaxivin. Hinek mirovên ku pir navserî xwe ne û pir bi zane ne diaxivin. ...".

Mihamed, ku weke demekê diaxivê, her weha êdî piştre axiftina ku bidawî kiribû, êdî mirovên li dore wî axiftibûn. Yên ku axiftibûn ji, li ser ji gotinên Mihamed bidest axiftina xwe kiribûn. Bi vê yekê re ku her weha hinek ji wan ji diaxivin, êdî piştre axiftin bidawî nabe. Piştre bêhtir berdeyam dike. Mihamed ji ku di nav de axiftin û danûstandin di nav wan de berdeyam dike. Mihamed, bi axiftina xwe nîqaşaka hizrî û dîrokî û pir bi hizir dabûbû dest pê kirin. Nîqaş li ser jinê hin bi hin êdî ji gotinên ku Mihamed anîne ser ziman berdeyam dike û kur dibe. Yên ku ji zanebûna xwe bi êmin bûn, êdî xwe didana pêş diaxiftinê de û diaxivîn.

Di vir de divêt ku mirov bi pirsê ku cihê jinê di nav civakê de çiya û çawa ya û weyne wê çî ya. Deme ku mirov ev pirs pirsîn, divêt ku mirov bi zanebûn û têgihîştin bersive bidiyêde. Divêt ku mirov ji zanebûna

civaknasiya civakê ne bêpar bê. Divêt ku mirov mirov mirov nasbike. Divêt ku mirov berî hertiştî jinê bixwe û bi xosletên xwe re nasbike. Ev yek pir girînge. Deme ku mirov nasbike û bersive bide, hingî, wê bersivên mirov ji di cih de bin û ji rastiye ne dûr bin. Hingî wê rastiye di xwe de bi xwe re hawnênin. Bersivên ku rastiye di xwe de dihawênin, yên ku dîrokê di nivîsênin. Yên ku bi rasti ji dibine bersiv in. Deme ku mirov bixweze bersiveke pir baş bide, divêt ku mirov her weha ji rast bipar bê. Da ku bersivên mirov di cih de bin. Mihamed, vê têgihiştinê de bû. Ew deme ku dikir ku bersiveke bide pirsekê an ji li ser mijaraka ku têde pir pirs hatina pirsîn bi bersivkê, ew pir di hizirî. Di serê xwe de pir di hizirî. Ew bi vê yekê, her dayimî di hizirî. Deme ku jê dihata pirsin ji her weha wî pir bi hizir bersiv dida. Di wê heyeme de deme ku nîqaş hatibû ser jinê ji, hingî, bal hatibûbûna ser Mihamed. Mihamed bi zanebû. Mirovan ji mereq dikir ku ew mirovê zane, bi zanebûna xwe li ser jinê çî dihizirî. Çî di serê wî de heye. Her weha mereq di serê xalkê de bûn. Di serê mirovên li dore wî de dibûn.

De ne, li ser mijara jinê, di wê demê pir nîqaşaka mazin hebû. Ji deme ku ola misilmanatiyê hatibû ew nîqaş hebû. Berî hingî li gor kevneşopiyekê cihê jinê dihata nîşandin. Lê nahaka vêce ne tenê li gor wan kevneşopîyên ku hene wê bihatana nîşandin. Ew hizrên olî ji divêt ku li ber çavana bihatana girtin. Li ser vê yekê ji nîqaş hebûn. Biqasî ku em têdigihin, divêt ku em hinekî li ser kevneşopîyan û têde cihê jinê ji bisekinê. Piştî mirov were ser wan hizrên ku wê guharandinan bikin di wê mijare de.

Di kevneşopîyan de ji demên berê ve cihekî jin yê teybet hebû. Jin di jiyane de xwedî hebûn bû. Xwedî hêze kifşkirinê bû. Wê di malê de kifş dikir. Li derve ji ew xwediyê hêze kifş kirinê bû. Li derve, li ber mêran ji ew xwedî gotin bûn. Kevneşopîyên jinê, yên ku hatibûbûna nivîsandin û yên ku nehatibûbûna nivîsandin hebûn. Berî zayinê ji demê sumeriyan jinên weke Lipî Îştîr bûn û bûna xwedî weyne di pêşketinê de. Wan bi navê xwe hinek zagon ji kifş kirin. Her weha gelek derketin. Di nav kurdan de jina "jina mîr", xwediyê hêzeke wilo bû. Wê hertimî karibû ku gotina xwe bide erêkirin. Ji gotine wê re ne mîr û ne ji jin ne digot ne. Bi wê re, jinên civakê xwedî hêz bûn. Ku du mîr ketibana berhevdû de û pevçûban û ku jin ketibana naqabîna wan de, wan nikaribû ku ji pevçûna xwe neqarihin. Divîbû ku wan ji pevçûna xwe qarabana. Ku ew pevçûn di naqabîna di herêman de ji bana, heman nêzîkatî bi wate bû. Bi vê yekê jin pir bi weyn bû di jiyane û di pêşketinê jiyane de. Di civaka kurdan de, jinê ne tenê barê malê kiribû ser piştî xwe de. Ji xaynî wê ji, barê aramiya

nav xalkê parastin ji li ser pišta wê bû. Her çend ku mîr ji vê yekê, berpirsiyar ji bana, jinê di jiyana xweza de ev yek pêk dianî. Mîr, tenê weke dagerê wê aramiyê bû ku bi hêze ku li ber destê wî bû, ji êrîşên derve û pevçûnên di nav xwe de bibin bi pareze bû. Her weha ev yek hebû. Jin, ev yek bi xweza dikir. Di jiyana de ev yek dikir. Bi vê yekê divêt ku mirov rêzeke mazin jê re bide nîşandin. Weke minaqekê ku mirov neyêne ser ziman divêt ku mirov ne buhurê, divêt ku mirov bahsa "hemawîyê" ji bike. Hemawî, weke dageriyê vê yekê li serê jina kurd bû. Deme ku du mirov li ber hevdû rabûbûna û jin hatibana û li ber wan sekinî bana û hîç deyn ji ne kiribana û hamawîya serê xwe ji serê avêtibana nava wan, êdî li wir wê ew pevçûne ne mabana. Ku pevçûn mabana ji, wê bêhûrmetiyeke mazin ji hevberê jine û xalkê ji bihatana kirin. Ku mîr ji bana, wê ew bêhûrmetî ne kiribana. Ku kiribana wê lê hatibana girtin.

Mihamed, deme ku bidest axiftinê kiribû, hinekî ji demên berê ji axiftibû. Bahsa wê kevneşopîyê kiribû. Gotibû ku 'divêt ku mirov rêzekê ji vê kevneşopîyê re bigirê'. Bi wê yekê re Mihamed, hinekî li ser jinên alim sekinî bû. Pir bahsa wan kiribû. "Ew jinên ku xwedî dergah" bûn bahsa wan kiribû. Li ser jiyana wan sekinî bû. Ew jinên ku xwedî dergah, "xwediyê kevneşopîyekê" bûn. Jiyana wan ya ku pir bi rêz hebû. Pir li ser wan dihata sekinandin. Li ser gotina wan dihata sekinandin. Pir rêzeke mazin ji gotina wan re hebû. Di nav xalkê de ji pir li ber wan dihata sekinandin. Ku mîr ji bana û jin ji bana. Ti kesekî ji rêze li ber wan kêr ne dikir.

Di nav xalkê de bi wan re kevneşopîyek ji hebû. Pir bahsa wan û gotina wan dihata kirin. Li ser gotina wan dihata sekinandin. Ew jin, weke dageriyekê bû. Weke dageriya, jiyana e jine bû. Ji xaynî wê ji, weke daageriya kevneşopîyekê bû. Berî Musulmanetîyê cihê ku ew lê disekinîn û ku bi navê "mal" dihata binavkirin hebûn. Piştî hatina Musulmanetiyê re êdî dergah derketibûn. Ew jinên mazin bûn. Berî hingî, ji ber ku di nav xalkê de agir pîroz bû, agirgah ji wan re dihatina çêkirin. Bi navê wan. Li wanderan mirov lev digahana hevdû. Bi hev re berg dikirin ji wan re û ji bo wan. De ne, divêt ku mirov bêje, di nav kurdan de biqasî ku ji wan mirovên mazin bi bergkirinê alîkarî dihata xwestin, her weha bi bergkirinê ji wan re ji xwûdê alîkarî dihata xwestin. Bi vê yekê, dihata nîşandin ku xalkê bi wan re ya û li cem wana. Bi vê yekê re wan rêze xwe dide nîşandin. Rêz ji, ji mirovên weha rêzdar re nîşandan, du wate bi hizir diafirand. Yek ji bo wan û saxsiyate wan bû. Ya din ji, her weha ji bo ku

bêzanin ku ew mirovne ku mazinin bûn.”mirovên ku rêzeke mazin ji wan re hebe, xwûdê ji wan dibîne”.Her weha baweriyek ji hebû.

Bi vê yekê re di nav xalkê de rêzeke mazin ji wan re hebû. Yên ku rêze ji wan re mazin bû, yên ku zane bûn. Axlabe ji, xalkê digot ”yên ku navserî xwe”. Deme ku her weha ji wan re digot, êdî weke ku digot ku ew mirovne ku zane ne û mirovne ku pîr in.Mirovên pîr, yên ku navserî xwe bû. Ji ber ku yên dinye dîtibû û bi jînkirina xwe re fahmkiribû bû. Yên ku navserî xwe ji yên nêzîkî xwûdê bû.Yê ku nêzîkî xwûdê ji, yên ku mirov jê re rêzê bigirê bû.Her weha dihata vegotin.Ev mirovê navserî xwe, hebû ku jin ji bana û hebû ku mêr ji bana. Di vê yekê de navbeynî nebû.Bi vê yekê re kevneşopî hebû. Bi vê yekê re rêzdayîn hebû. Jin ji bana û mêr bana, wê heman rêz girtibana. Wê weke hevdû li gotina wan hatibana hisandin. Wê ti gotinên wan piştguh ne hatibana kirin.Bi vê yekê re, mirvo karê careke dî bêje ku rêze li ber jin û mêr wek hevdû bû. Lê di demên piştire de hin bi hin ew wekhevbûn weke ku xira bû.Mêr derkete pêş.Jin hinekî li şûn ma.Mihamed, deme ku axiftibû, ev ji anîbû ser ziman.Li gor wî ev yek li gor olê ji nerast bû.Deme ku anîbû ser ziman, êdî di dawiya axiftina xwe pirsra ”çima” kiribû û piştire axiftina xwe hinekî dî ji berdewam kiribû û piştire bidawî kiribû.Di deme ku diaxivî de, weke ku li bersive wê pirse ku kiribû ji di axiftina xwe lê digeraha.Bi vê yekê re, divêt ku mirov bêje ku deme ku diaxift, ji demên berê pir mînaqên baş û yên ku hatina jînkirin û nebaş ji dida.Mirovên ku li dore wî bi mîr ve, herkesekî pir bi bal lê dihisand. Mihamed, wilo xweş û xweşik bahsa jine dikir, mirov digot ku qey bahsa hinekan ne ji dinyê dike. Her weha xweş û xweşik diaxift. Minaqên ku wî li ser jine dabûbûn ji hemû ji ji jinên ku xwedî dergah bûn dabûbû.Bahsa wan jinên wilo kiribû. Ew jinên ku rêzeke mazin bi mîran ve herkesekî dide.Li ser jîyan û bandûra wan ji sekinî bû. Bahsa Xaçê hatibû kirin. Xaçê mirovên li wir herkesek di derbarê wê jiyana wê de xwedî agahî bûn.Mihamed, deme ku axiftibû, her weha hinek jinên ku herkesekî navê wan hiskiribû bahsa wan kiribû. Bahsa hebûna wan ye di nav xalkê de kiribû.Kevneşopîya şêxitiyê ya li Serdêfe li ser dergahtiya jinê ya demê bû. Mihamed, bixwe ji, deme ku li Cizîre bota bû, xwe gahandibû Serdêfe. Li wir çendekê ji mabû. Ewder dîtibû. Deme ku ew li wir di nav civatê axiftibû, hingî bahsa wê ji kiribû. Bahsa çûna xwe ya li cem wê ji kiribû. Li wir wî çî dîtibû û çawa dîtibû ji bahs kiribû. Deme ku diaxift, her weha, mirovên li dore wî, pir bi bal û b hey lê dihisandin. Balaka mazin didana ser wî û gotinên wî. Mihamed ji demên û deme xwe bahsa rewşa jine kiribû. Pir dîrêj ji bahsa wê kiribû.Bahsa rewşe wê ya di

nav xalkê de kiribû. Miorvên li dore wî ji, pir bi hey lê dihisandin. Mihamed axiftina xwe anîbû ber dawiyê. Dikir ku axiftina lev bide hevdu û gotinên xwe yê dawiyê bêje û bidawi bike..

Mihamed, piştê ku her weha weke qadarekê diaxivê, êdî piştê axiftina bidawi dike û dimene sekinê. Lê deme ku ew dimene sekinê, mirovên li dore wî yên ku lê dihisandin ji, lê şaq bûn. Piştî ku Mihamed axiftina xwe bidawi kir û ma sekinê ji, weke ku ew diaxivê, bala mirovên li dore wî hê li ser bû. Mîr ji her weha bala wî li ser bû. Hemû ji lê heyirmayî mabû bûn. Hemû ji lê pir bi bal mabû bûn. Mihamed pir mazin û bi zane axiftibû. Axiftina wî ew her weha kiribû bin balên bişaq de. Mihamed, piştî ku axiftina xwe bidawi kir û ma sekinê, piştê ku hinek bi ser ve ji çû, êdî yê ku mafê axiftinê hilda û pişt Mihamed axift mîr bû. Mîr, deme ku mafê axiftinê hilda û axift, pêşî ji Mihamed re got ku "ti pir xweş û xweşik axiftî. Ti bizanî axiftî". Piştê mîr, axiftina xwe berdewam kir. Mîr axiftina xwe, hinekî wî ji li ser jine kir. Mijarên ku Mihamed anîbûbûna ser ziman û ji demên berê minaq ji bo dabûbûn, mîr ji li ser wan axift. Mîr ji, ne bêzan bû. Ew ji bizan bû. Hertimî di civate wî de mirovên zane û mazin diaxiftin. Ew ji li ser wan mijarên ku Mihamed li ser wan hizre xwe anîbû ser ziman, wî ji zanibû. Ji ber vê yekê, deme ku ew ji axiftibû, wî ji li ser wan axiftina xwe kiribû. Mîr ji, kir ku axiftinaka pir bizane bike. Wilo li xwe anî. Deme ku Mîr ji axift, bal li ser bûn. Çavên mirovan li ser wî bûn. Lê dimeyîzendin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di cihê xwe de bi bêdeng û his lê dimeyîzend û dihisand. Wî ji, bala dabûbû ser mîr, ku ka wê çî pişt wê axiftina Mihamed ya xweş û xweşik re bêne ser ziman. Ji bo vê yekê, fahm bike ji, wî bala xwe pir bi hey dabûbû ser wî di wê heyeme de.

Mîr, deme ku axift û hinekî di axiftina xwe de pêde çû, êdî hinekî kir ku bizanebûn biaxivê. Hinekî wî ji di axiftina xwe de bahsa mirovên zane û alim kir. Bahsa hinek mirovên zane ku hatina qasre wî û di qasre wî de lê rûniştine û axiftina û di axiftina xwe de çî anîna ser ziman kir. Pîr ji li ser wan sekinê. Pîr li ser mirovên alim sekinê. Di axiftina xwe de, car bi car ji bahsa mele Serhengê zaxoyî ku di civatê de di nav mirovên mazin de diaxift û hizre wî ya ku wî di wan heyeman de dianî ser ziman kir. Hinekî dirêj ji bahsa wî û wan axiftinên wî kir. Piştê hinekî li ser aliman axift. Li ser alimên ku wî navê wan bihîstiya û yên ku bi wan re rûniştîya kir. Ji axiftin û hizrên wan ji hinek anî ser ziman. Deme ku wî dianî ser ziman, mirovên li dore wî ji lê pir bi hey dihisandin. Guhê xwe pir bi hey didanê de. Mihamed ji lê bihey dihisand. Ew zanistên demê yên ku wî bahsa wan dikir ji, Mihamed gelek ji wan, wî ji his kiribûn û navê wan û hizre wan

xwandibû. Li ser wan xwedî zanebûn bû. Mîr, axiftina xwe berdewam kir. Mîr li ser wan zanist û aliman axiftinaka mazin kir. Ew mazin bû. Ji ber vê yekê ji dixwest ku axiftinaka mazin bike. Ji xwe, di wê heyeme de wî ji hewldide ku axiftineka mazin û bizanebûn û bitêgihîştin bike. Pir mazin dikir ku gotinên xwe bêne ser ziman. Deme ku gotinên xwe dianîna ser ziman, ji xwe bi êmin dianînine ser ziman. Mihamed ji wilo ji xwe bi êmin axift, deme ku ew axift. Mirovên zane û ku ji aqilê xwe êmin be, hertimî ku diaxivê, ji xwe biêmin diaxivê. Mirovên di xwe de mazin ji her weha ji xwe biêmin diaxivê. Mîr, ji xwe pir biêmin bû. Di xwe de ji pir mazin bû. Ew hertimî civate wî li dore wî ava bû. Ev yek ji bo wî navek bû. Hertimî ji bo wî dihata ser ziman. Ew mîr bû. Divîbû ku ji wilo bana. Mîr, divîbû ku bi zanebûn û nêzîkatîyên xwe re ji zanistekî ne kêmbana. Xalkê ji wilo di nav xwe de jê dixwest. Di wê heyeme de mîr di axiftina xwe de ji ev yek dida ber çavan. Bi zanebûn dikir ku gotinên xwe bêje. Bizanebûn ji digot. Mîr, her weha weke qadarekê diaxivê. Axiftina ku pêşî weke ku dest pê kiribû, ku hinekî ji zanist û aliman diaxivê, piştê ew ji axiftina xwe têne ser ziman mijara jine. Ew ji hizre xwe têne ser ziman. Di nav xalkê de pêşî bahsa wê dike. Piştê berê çawa bû, bahsa hingî dike. Piştê ji hinekî ji heyemên berê hinekî têne ser ziman. De ne, mîr, ne bizanebûna dîrokê bû. Ew xwedî zanebûna dîrokê bû. Wî ji hinek ji heyemên berê anî ser ziman. Berê nixêni ji bo jine yên di nav xalkê de çawa bûn? Hinekî li ser vê yekê, ew ji disekinê. Mîr, ku hinekî her weha diaxivê, piştê êdî dike ku axiftina bidawî bike. Lê berî ku bidawî dike, weke demeke ku ne kin ji li ser demên berê û nêzîkatîyên demên berê yên bi jine re li ser wan disekinê. Hinekî dirêj ji bahsa wan deman dike. Mihamed, de ne, hinekî di axiftina bahsa deme Nebî Nuh kiribû. Wî ji hinek di civatên li dore xwe de li ser wê demê hiskiribû. Ji ber vê yekê, li ser wê demê, ew ji ne bêzanebûn bû. Ew ji hinekî li ser wê demê têne ser ziman. Weke Mihamed, ew ji çend gotinan li ser rewşa Jina Nebî Nuh têne ser ziman. Bahsa jina wî ya ku pêre mabû piştî tûfanê. Ew baweriye wê lê wî pir hebû. Xwûde, ji ber vê yekê, jiyana mazin û birûmet dabûbû wê ji weke Nebî Nuh. Tirba wê ji piştî mirinê li nêzîkî ya Nebî Nuh hatibû çêkirin..

De ne, Mihamed, ji ber ku li Cizire bota mabû bû, li ser wê demê û rewşan pir derfet dîtibû ku bixwêne û rawastê. Li mizgefte Nebî Nuh, têne Berhemên ku li ser wî hatibûbûna nivîsandin bi tomaran bûn. Li ser hevdû bûn. Gelek bûn. Mirovên ku li wir li hevdû dirûniştin û ji hevdû re diaxiftin, li wan ji dimeyîzandin. Ew ji dixwandin. Bi kurdiyeke pir safî û zelal hatibûbûna nivîsandin. Di hizir û hizirkirina kurdan, kevneşopîyeke

pir girîng hebû di wê demê de. Ew ji her weha ew bû ku deme ku dixwandin û di nivîsandin, pir ser wate deman û watekirina deman dirawastahan. Ev nêzîkati, xwediyê kevneşopîyeka pir dîrokî bû. Pir hizir her weha hatibû afirandin û nivîsandin.

Mîr, deme ku axiftibû, hinekî li ser wê û wê demê ji axiftibû. Bahsa jina Nebî Nuh ji kiribû. Hizrên ku wî ji hizr kiribûn di derbarê wê de ne hindik bûn. De ne, pir li ser wê ji dihata axiftin. Weke dageriya hevgirtina jine li mêr ji dihata nîşandin. Di pir axiftinan de bahsa wê ji dihata kirin. ew ji weke Jinnebîyek (Jineka ku gahabe asta nebîtiyê), weke Nebî Nuh car bi car ji dihata şîrove kirin. Rêzeke mazin her weha jê re dihata nîşandin. Mihamed, deme ku bahsa wê kiribû, weke weke jineka ku jin jê minaqê bigirin bahs kiribû. Pîrozî pêre anîbû ser ziman. Ev yek, ji bala yên ku lê hisandibûn ji ne ravî bû. Yên ku lê hisandibûn, deme ku Mihamed her weha bahs kiribû, êdî lê pir bi hey bûbûn. Di wê heyeme de, deme ku mîr ji hinek gotin di wê rêze anîna ser ziman, êdî bal çûbûbûna ser mîr ji. Li di hisandin ku ka wê di dawiya gotinên xwe de wê çî dî li ser wî bêne ser ziman. Mîr ji, weke demekê axiftibû. Mîr ku axiftibû, êdî piştire mabûbû sekinî. Ku ew ma sekinî, êdî piştire ne bi gelekî re Seyde Avdilrehîmê xaniqî kir ku biaxivê û axivî. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, ku bidest axiftinê kir, pêşî gote Mihamed ku ew çend xweş û xweşik bi bizanebûn û rast axiftiya. Piştire her weha di wê wate çend gotin ji mîr re ji gotin. Piştire, kir ku biaxivê. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, di wir de di nav civatê de yek ji wan mirovên ku herî zêde xwedi têgihîştin û zanebûn bû. Li ser demên berê ji pir bizanebûn bû. Pir xwandibû. Ji zanebûna wî, xuf û gumana ti kesekî ne bû. Rêzeke mazin jê re hebû. Deme ku wî mafê axiftinê girt û bidest axiftinê kir, êdî herkesekî bi mîr û Mihamed ve ji bala bi hey dane de û lê hisandin, ku ka ew wê çî ji wan re bêne ser ziman û bêje. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, li ser Deme Nebî Nuh û deme Qawmê lot ji pir bizanebûn bû. Li ser van herdû deman pir nivîs di wê demê dihatina ji nivîsandin ji aliyê aliman ve. Wî li ser herdû deman sekinî bû. Hinekî dîrê ji li ser wan deman axift. Piştire weke mîr û Mihamed, wî ji axiftina xwe anî ser jine û li ser jine hinek bi wê zanebûna xwe rawastaha. Wî ji hinekî li ser wê anî ser ziman. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, pir xweşik diaxift. Bi dengê xwe re gotinên xwe rast dikirin û dianî ser ziman. Bi wî awayî ji fikir ku bandûraka mazin li ser wan mirovên ku lê dihisandin bike. Ew hinekî li ser Deme Nebî Nuh, jina wî, kurên wî Ham, Sîn, Yafêt û Mada rawastaha bû. Piştî Nebî Nuh re, ew kurên wî ji bûbûn xwedi nav bi hizir û tuxmên xwe re. Her yekê bûbû êlek. Lê hemû ji, piştire di şopa Nebî Nuh

de meşî bûn. Nebî Nuh li Cizîre bota bû û pişt wî re kurê wî Yefêt, Cizîre weke ku ji nûve ji bo wî û rûmete wî avakê dike. Piştî Nebî Nuh re, weke kurê wî Mada Yafêt ji, Cizîre bota Mazin dibe bi tuxmê xwe re. Hata ku dem tê Deme Nebî Salih û Nebî Lot û pişt re wan re ji deme Birehîm Xelîl ji, li wir, bi di xatekê de pêşketin dibêt. Hinekî li ser wan ji anîbû ser ziman. Seyde Avdilrehîmê xaniqî pir minaqan dide di axiftina xwe de di wê heyeme de di deme ku axivê de. Ku weke demekê diaxivê, pişt re axiftina xwe bidawî dike. Deme ku axiftina xwe bidawî dike, êdî yê ku pêşî mafê axiftinê pişt wî re digirê û diaxivê Mihamed dibe. Mihamed, di serî de ji wî re di nav civatê de dibêje ku ew pir xweş û xweşik axift û dike ku hin gotinne bi ser axiftina wî ve zêde bike. Hingî, ew xweşik axiftibû, di serê Mihamed de hinek hizir dabûbûna çêkirin. Mihamed ji, piştî ku wî axiftina xwe bidawî kiribû, êdî di cih de xwestibû ku wan hizrên ku di wê heyeme ku ew diaxift de di serê wî de çêbûbûn bêne ser ziman. Bi vê nêhtê, mafê axiftinê hildabû û axiftibû. Piştî ku Mihamed hinekî axift, êdî ma sekinî di cihê xwe de. Mihamed, deme ku ma sekinî, êdî weke ku bi keve hizran de ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.

Ew, wê çûbana bi aliyê rojhilat de bi seyde Avdilrehîmê xaniqî re. Di wê heyeme de deme ku mabû sekinî û weke ku hinekî hizirî bû, ev yek hatibû hişê di wê kêlikê de. Deme ku ev yek hatibû hişê wî, hinekî dî ji mabû sekinî bihazn. Hinekî hazini ji bû. Hizirandinaka bi hazn, di cihê xwe de di wê heyeme de mabû bû sekinî. Piştî wî û axiftina wî axiftin di nav civatê gurr bû bû. Mirovên ku li wir bûn, careke dî bidest axiftinê kiribûn. De ne, berî wê axiftina wan, weke bêhnekê bêdengbûn di nav civatê de bûbû. Piştî axiftina wî re, ew bêdengbûn ji hole rabû bû. Dengbûn çêbû bû. Mirovên ku li wir bûn, hema bêja hemûkan pişt axiftina Mihamed, mîr û seyde Avdilrehîmê xaniqî re axift. Her yekê, careke ji bê mafê axiftinê hilda û axift. Di wê heyeme de Mihamed bi bêdeng li mirovên ku diaxift dihisand. Lê di wê hisandina xwe de weke ku ne li wir bû dihata xuyakirin. Weke ku di serê xwe de li derne din bû dihata xuyakirin. Deme ku mirov lê dimeyîzend, ev yek mirov pir baş û qanc fahm dikir.

Piştî ku her weha weke qadarekê axiftin çêbû do nav civatê de û mirov axivîn, êdî pişt re bi bêhnekê re seyde Avdilrehîmê xaniqî di ber axiftinan re careke din kara xwe kir ku biaxivê. Lê berî ku biaxivê, serê xwe zivirand û li Mihamed meyîzend. Deme ku wî li Mihamed meyîzend, dît ku wa Mihamed weke ku bihizîre. Herweha dihata xuyakirin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku wilo dît, wî deng ne kir û ew hizirkirina Mihamed xira ne

kir. Lê bala wî ji di wê heyeme de weke ku çûbû bû ser Mihamed. Her weha dihata xuyakirin.

Mihamed, bi rasti ji di serê xwe de çûbû bû. Ketibû hizran de. Ji wê heyemê weke ku çûbû bû heyemeke din. Her weha di hata xuyakirin. Deme ku berî hingî bi kêlîkêke hizirî bû û çûna wan hatibû bîra wî, êdî ketibû hizran de. Di wê heyeme de bi hizirkirina çûnê re deme ku ji Cizîre bota derketibûn û hatibûbûna wir hatibû bîre wî di wê heyeme de. Ew dem hatibû bîre wî. Mele Silêman hatibû bîre wî. Faqa Qasim hatibû bîre wî. Wî ew di ti demê de ta wê heyemê, ew ji bîr ne kiribûn. Hertimî re di bîre wî de bûn. Hertimî ew li ser wan ji di hizirî. Wî ew demên ku wa bi hev re di buhurandibûn, bi bîr dikirin. Li ser wan deman di hizirî. Deme ku mirov xwediye şaxsiyeteke hestiyar bê, hingî mirov tiştên ku berê jînkirina ji bîr neke. Wê hertimî di bîre mirov de bin. Mihamed ji mirovekî ku xwedi şaxsiyeteke hestiyar bû. Wî ti rewşên ku berê jînkiribûn ji bîr ne kiribûn. Hemû rewş yê qanc û xirab di serê wî de weke ku di wê heyeme de jînkiribe zîn û jînkiribûn. Deme ku di wê heyeme de ketibû hizran de êdî weke şerîdeke film, ew demên berê di ber çavên wî de di rêzê de buhurtibûn. Bi vê yekê re, weke ku di wê heyeme de di serê xwe de ji wir herê ji lê hatibû. Wî di wê heyeme ku hizir dikir de tiştên ku bi bîr anîbûn jînkiribûn. Li ser wan hizir dikir. Ew dem hizir dikirin.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bala wî li ser Mihamed bû. Lê dimeyîzend. Mihamed li ber çavên wî sekinî bû. Lê weke ku di heyemeke din de be bû. Her weha dihata xuyakirin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ev yek fahm kiribû. Deme ku wî, her weha li Mihamed meyîzendibû û ew bi hizir dîtibû û lê hinekî meyîzendibû, êdî weke ku ew ji di serê xwe de bi hizir bibe lê hatibû. Weke ku di serê wî de ji hinekî demên berê werine bîre wî lê hatibû. Bi vê yekê re, ew ji hinekê bi hizir bûbû. Ya rastî, ew ji bi hizir bûbû. Ew ji hinek tişt ji demên berê hatibûbûna bîre wî di wê heyeme de. Hinekê demên berê ji wan demên ku wî bi mele Serhengê zaxoyî buhurandibûn hatibûbûna bîre wî di wî heyeme de. Wekî di ji, hinek dem ji wan demên ku li rojhilat mabû bû, hatibûbûna bîre wî. Ew hinekî li dore Dînwerê ku hinekî dibêr daristanê de hatibû çêkirin li Medrese şêx Hisên mabû. Li wir wî demeke pir dirêj û baş buhurandibû. Ew dem hatibû bîre wî. Wî li wir ji Abu Hanîfê Dînwerî ji pir xwandibû. De ne, Abu Hanîfê Dînwerî, zanistekî kurd bû. Di deme destpêka îslamê wan de jînkiribû. Tê gotin ku di dore 8. wan de jînkiribû. Wî pir nivîsandibû. Li ser aqil û vacê, tenduristîyê û başbûnê. Li ser baytariya sawalan ji wî pir nivîsandibû. Hizreke wî ya mazin hebû. Wî di deme xwe de navê xwe bi

tipên zerîn nivîsandibû. Pir bahsa wî dihata kirin. Ku mirov li wir mabana û ew nas ne kiribana û ne xwandibana ji bo zanistekî nedibû. Wê weke kêmesiyekê ji bihatana dîtin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ew xwandibû. Ya rastî ku mirov bêje, berhemên Abu hanîfê Dînwerî gelek, ji wan nushayên weke wan di nivîsandin û bi xwe re di birîna herêmên din ji. Bi vê yekê, hizre wî gahabû Cizîre bota. Li wir ji ji berhemên wî nusha hebû. Mihamed di wê heyeme ku li Cizîre bota bû, ew xwandibû. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku ew ji di derbarê hizre wî de xwedî zanebûn bû.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî di hizirkirina xwe de çûbû bû wêderê û deme ku li wir bû. Li wir ji, gelek mirovên zane hebûn. Yên ku xwedi zanebûn bûn hebûn. Yên ku navê wan ji herêman ji devan diçû herêman hebûn. Mirovên ku pir bahsa wan dihata kirin hebûn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî li wir bi wan re ji mabû bû. Demeke dirêj ji bi wan re buhurandibû. Wê di demeke kin de careke din ji çûbana wir. Wê carê, wê bi Mihamed re çûbana wir. Wan hizir dikir ku herine wir û li wir ji weke demekê bi mênin û piştire vegehihin. Wê çûban. Lê ka wê demê çi şani wan dabana ew ji wî di wê deme çûna wan de hatibana dîtin.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji her weha weke qadarekê bi bédeng li Mihamed bi hey dikeve hizran de. Civate wan ji, bi axiftin û danûstandinan berdewam dikir. Mirovên ku li dore wan bûn di axiftin. Mîr ji car bi car diaxift. Deme ku mîr diaxift, ew hinekî dirêj ji diaxift. Ji ber ku ew mîr bû. Ew mazin bû. Deme ew axift, ji axiftina wî, mirovan hêvî dikir ku tişteki fêr û fahm bikin. Bi vê yekê, bala mirovan li ser li ser Mîr bû. Deme ku ew diaxift ji, her weha bi vê yekê bal li ser bûn. Ew di civatê de ji divêt ku mîr bana. Her weha hêvî jê dihata kirin. Di civatê de mîr bûn, mîrbûnaka herî mazin bû. Ya ku li ber çavan dima ji ew bû. Ya ku di serê mirovan de dima û li ser danûstandin dikirin ji ew bû. Mîr, bêguman mazin bû. Lê di civatan de mazin bûn, ew mazinbûna wî dide erêkirin. "Mîrê civatê", hertimî li ser ziman bû. Bi gotina xwe ji pêşeng bû. Rê şani mirovan dide. "Mîrê civatê, bi vê yekê bi wate bû û mazin bû. Deme ku mîr ji nû kava dikata dewsa bavê xwe ku bibe mîr ji, pêşî di nav civatê de lê dihata hisandin. Deme ku lê dihata hisandin ji, di nerîn ku ka ew çend bi zanebûna. Li zanebûna wî bihey diman. Deme ku ew di civatê axift, ku çend ciwan ji bana, balixbûnak di hizir de û di şaxsiyetê ji dihata xwestin. Ev yek pir girîng bû û divîbû ku wî ev yek pêk bianîyana. Deme ku mirovan di nav civatê lê dihisand, li gorinên wî dimeyîzandin ku ka çend di cih de ne. Mirovên ku lê dihisandin ji, yên ku navserî xwe û zanist bûn. Ew mirovên ku di nav xalkê de xwedi rêz bûn. Ku wan di derbarê mîr de çi gotin gotibana, wê

ew gotin di nav xalkê de ji hatibana bihîstin û wê ew gotin weke perspektifekê li ber çavan hatibana hiştin. Deme ku li wî mirovî hatibana meyîzandin, êdî wê ew gotin ji hatiban bîre wan. Civat, bi vê yekê kifşkar bûn. Pir bi wate bûn. Civatê mîran, ji xwe yên ku herî kifşkar û bi nav û deng bûn.

Mîr, di axiftinê de bû. Mirovên li dore wan ji yên ku ji dûr ji hatibûn û yên ku ji wir ji bûn, bi hev re diaxiftinê de bûn. Kê çî zanibana, di wê heyeme de di axiftinê de ku dikete derba xwe de dianî ser ziman. Berî hingî bi qadarekê Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî di axiftinên xwe de pir hizirne mazin anîbûbûna ser ziman. Nîqaş ji, hê ji wan hizran berdewam dikir. Mihamed, dihisand. Ne tenê dihisand hinekî weke bi hazn ji bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji her weha bi hizir bûbû. Ew ji hinekî weke ku ketibû hazn de. Lê wê hazn kirina seyde Avdilrehîmê xaniqî zêde berdewam ne kir. Ew ji tevî axiftinên ku mîr û mirovên li wir dikirn bû. Ji xwe, wilo zêde bêdeng man ji di wê heyeme de ji bo mirovên weke wî mazin û zanist ji hêvî ne dihata kirin. Ji wan hêvî dihata kirin ku biaxivin. ew mirovne zane bûn. Wan, divîbû axivîbana û hizre xwe bi mirovan re hevpar kiribana. Her weha hêvî dihata kirin. Ev nêzîkati bi civatan xwediyê kevneşopîyekê ji bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ew bêdengbûna xwe xira kiribû û bidest axiftinê kiribû. Deme ku wî li xwe anîbû û axiftibû, êdî Mihamed ji weke ku were xwe lê hatibû di wê heyeme de û wî ji piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî re ku hinekî mabûbû bêdeng, êdî wî ji bidest axiftinê kiribû. Piştî, ku ew ji tevî axiftinê bû, êdî axiftin di naqabîna wan de hinekî çû û hat. Mihamed, mîr, seyde Avdilrehîmê xaniqî û hinek mirovên wek wan mazin û zanist û ku navserî xwe bûn, axiftin di nav wan de çû û hat. Mirovên ku li dore wan bûn, yên ku di wê heyeme de li civatê rûniştibûn, bêguman hema bêja bi giştî ji yên ku zane û navserî xwe bûn. Lê mirovên weke mîr, seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mihamed, yên ku hinekî zêde hatina naskirin û navê wan li ser zimanan, ku bidest axiftinê kiribûn, êdî mirovên li dore wan ji, yên din ji, xwe dabûbûna hisandina li wan. Wan, ku her weha hinekî axiftin, êdî piştî ew ji mana sekinî û ku di dawiyê hinekî mîr ji axift, êdî piştî weke ku civata wan kir ku rabe ser xwe di wê heyeme de. Mîr, deme ku diaxift ji, bala wî li ser Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Ew rêvan bûn. Ew li ser rê bûn. Wê çûban.

Mîr diaxift û li wan dimeyîzand. Li Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî dimeyîzand. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di wê rewşê de bala wî li ser Mihamed bû. Wî ji li Mihamed di meyîzand. Mîr ku weke qadarekê axift, êdî piştî ne bi gelekî re axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî. Piştî ku ew

ma sekînî êdî pişt wî re çend mirovên ku navserî xwe bûn mafê axiftinê hildan û axiftin. Pişt ku wan ji her weha axiftin kir, êdî piştne ne bi gelekî re hinekî weke ku bédeng bûn çêbû. Zêde wilo deng ji ti kesekî derneket. Herkesek bédeng ma. Lê wê bédeng bûnê wilo zêde berdewam ne kir. Piştne ye ku ew bédengbûn xira kir ji mîr bû. Mîr, deme ku axift, çend gotinên din ji gotin û di gotina xwe ya dawiyê de rabû bi bîre civatê xist. Deme ku mîr her weha rabûn bi bîr xist, êdî mirovên li civatê ji êdî li ser rabûnê hizirîn. Ew ji êdî kir ku kara xwe bikin û rabin. Mîr, ji xwe, divîbû ku rabûbana. Ew mêhvanên wî hebûn. Ew xwedi mêhvan bû. Mêhvanên wî ji ber şênîya mele Serhengê zaxoyî hatibûn. Deme ku mêhvan hatibûn, pêşî çûbû bûn qasrê û li qasrê rûniştibû bûn. Li qasrê pêşî rûniştin û xwaribûn û vexwaribûn û hinekî li wir bi mîr re li civate hevdû ji rûniştibû bûn û piştne bi hev re rabû bûn û hatibûbûna dargahê. Li wir hertimî mele Serheng zaxoyî dima. Ewder weke mala wî bû. Ji ber vê yekê ji ew ji hatibûbûna wir. Li wir li hevdû rûniştibûn û hinekî dia ji ji wî re kiribûn û êdî vêce dikirin ku rabin û herin.

Mîr pêşengîya wan dikir. Berî hingî ji di deme çilê mele Serhengê zaxoyî ji mirovên ku di hatin ji aliyê mîr ve dihatina pêşwazikirin li qasrê. Li wir, pêşî hinekî dirûniştin û piştne diçûn û hinekî li dergaha mele Serhengê zaxoyî ji dirûniştin û piştne diçûn. De ne, weke kevneşopîyekê ya. Deme ku mêhvan hatina şênîyê (serxasiyê = serxweşiyê), li mala ku mazin bû, xwe lê di girtin. Li wir civat li dar dixistin. Mala ku nêzîkî mele Serhengê zaxoyî bû.

Piştî ku civatê kara xwe kir ku rabe ser xwe, êdî piştne ne bi gelekî re hêdî hêdî kara rabûnê hata kirin. Deme ku her weha kara rabûnê hata kirin, êdî weke qadarekê piştne civatê di pêşengîye mîr de bidest rabûnê kir. Deme ku civatê kara kir ku rabe, êdî piştî mirovên ku wê rabû bana li bendî mîr û rabûna wî man. Ku ew rabû êdî wê li duv wî rabûban. Mîr ku da xwe û rabû ser xwe, êdî pêre yên ku li wir li civatê rûniştibûn ji dana xwe û rabûna ser xwe û rabûna ser xwe di wê heyeme de. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bi mîr re rabûna xwe. Ew weke xwediye malê bûn. Her weha dihatina pêşwazikirin. Deme ku mîr da xwe û rabû ser xwe û kir ku berê xwe bide devê dêrî, êdî ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û çend mirovên din yên ku navserî xwe ne di rex de kirin ku herine ber dêrî. Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî û mîr, bi hev re dana pêşîya civatê ku derketina derve. Deme ku derketina derve, êdî mirovên ku li wir bûn ji, li duv wan dana pey wan û derketin. Deme ku derketina derve, li derve, mîr berê xwe da Mihamed û lê meyîzend. Lê di deme ku meyîzend

de ti gotin ji devê wî derneket. Bêdeng ma. Wî zanibû ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê li ser rê xwe kar kirina. Wê bi rê ve çin. Deme ku mîr li Mihamed meyîzend, Mihamed ji farq kir ku mîr lê meyîzend û wî ji di cih de bi heman nêzkatiyê mîr bersiv kir û lê meyîzend. Mihamed ji ti gotin ji devê wî dervediket. Mihamed zan kir ku mîr tiştêkî jê vebêje, ji ber wilo lê meyîzend. Mihamed, bi vê yekê, weke bersivekê nerînek li mîr nerît. Lê mîr ti tiştêk jê negot. Deme ku Mihamed li mîr nerît, êdî hatina bermberê hevdû bi çav bi cav. Mîr, deme ku her weha hatina ber hevdû, bi rûdêneka bi dil û kêfxweş li Mihamed meyîzend û kenî. Di wê heyeme de dibêt ku mîr hinek gotin ji ji Mihamed bigotina. Her weha li ber hevdû sekinî bûn. Weke bêhneke li ber hevdû sekinîn ji. Lê li dore wan mirov hebûn û bi hev re diaxiftin û hin gotinên ku weke ku bixwezî mîr bi bersivêkî ji dikirin. Bi vê yekê, heya mîr li ser wan ji bû. Mihamed ji ev yek didît. Mîr, piştî ku weke qadarek li ber Mihamed, weke bêhnekê bêdeng mabû, piştî ne bi gelekî re êdî mecbûr mabû ku bi axivê bi yê li dore xwe re. Bi vê yekê re ku nêhte axiftinê bi Mîr re hebena ji bicih ne hatibû. Ya rastî, weke ku mîr diaxwest ku Mihamed re bipeyivê. Mihamed wê çûbana. Ew demek bû ku li wir bû. Li wir wan hevdû pir baş û qanc naskiribû. Mihamed ji di wê heyeme ku li wir mabû de bû bû weke mirovek ji wir. Naqabîna wî û mîr ji hinekî xweş bû. Mîr, gelek hij hisandina li mirovên zane dikir. Gelek cara hem di deme ku mele Serhengê zaxoyî li jiyane bû û hem ji piştî ji mihmed piştî cara li mîr rûniştibû û ew bi hev re axifti bûn. Mîr pir hij axiftina mihamed dikir. Mihamed pir bizane diaxift. Deme ku diaxift, axiftina wî bandûraka mazin li ser mirov dikir. Axiftina Mihamed li ser Mîr ji bandûra mazin diberda. Deme ku mîr lê dihisand, weke ku ji xwe herê car bi car lê dihat. Mihamed dengê wî tenik bû. Dengê wî pir bi hest bû. Deme ku Mihamed diaxift, dikir ku mirov lê şaq bimêne. Axiftina ku wî li ber mirov dikir û diaxiftina xwe gotinên ku dianîna ser ziman, bi awayê axiftinê dikir ku di mejîyê mirov cihekî ku mazin bigirin û têde dayimî bibin. Bi vê yekê, dengê wî yê xweş hebû.

Mîr û Mihamed her weha pir bi hev re mabûn û axiftibûn. Di wê heyeme de deme ku mîr li Mihamed meyîzend, dibêt ku ew axiftinên ku Mihamed û wî bi hev re kirina hatibûbûna bire wî. Deme ku mîr lê meyîzendibû, dibêt ku deme ku Mihamed hatibû wir û ew bi mirovên li dore xwe re ku çûbû pêşîya wî û mele Serhengê zaxoyî hatibû bire wî. Dibêt ku deme ku lê meyîzendibû, her weha ew jiyana mihamed ya ku li wir buhurtibû û wî dîtibû di ber çavên wî re buhurtibû. Deme ku mirov pir bi mirovekî re ma, û ku ew mirov bi ser rê ket, êdî her weha bi bîr kirin pir çêdibe. Pir tê bire

mirov ji buhurandina bi wî re. Mîr ji, bi Mihamed re demek buhurandibû. Demeke pir ku bizane buhurandibû.

Mîr, ku her weha hinekî bi bêdeng mabû li ber Mihamed û piştire ku demek têve çûbû û bi mirovên li dore xwe re bidest axiftinê kiribû, êdî ku di serê wî de axiftina bi Mihamed hebena ji di wê heyeme de di serê wî de mabû bû. Deme ku mîr bi yên li dore xwe re bidest axiftinê kir, êdî deme ku ew axift, gelek mirov bi hev re li ber wî mana sekinî û li ser lingan bi hev re û bi mîr li ber wî axiftin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li nêzikî Mihamed sekinî bû. Li ber wî û li dore wî ji çend mirov hebûn û bi hev re û bi wî re diaxiftin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bala wî li ser wan bû. Gih bi yên ku pêre diaxiftin re diaxift û gih bi bal li yên ku diaxiftin dihisand. Seyde Avdîrehîmê xaniqî bi vî awayî di rewşekê de bû. Mihamed ji mirovên ku li dore wî hebûn û diaxiftin. Ew ji bi wan re diaxift. Mihamed, lê weke ku hinekî bêdeng bû. Weke ku di serê xwe de bi hizir bû di rewşekê de di cihê xwe de li ser lingan di sekinî di wê heyeme de. Mîr, di wê heyeme de deme ku bidest axiftinê bi mirovên li dore xwe re kiribû, êdî weke bêhneke bi wan re axiftibû. Piştire êdî ku weke bêhnekê piştire ku ew ji axiftinê xilas dibe, piştire weke ku ji nûva Mihamed careke din were bire lê hat û berê xwe da Mihamed û lê meyîzend. Deme ku lê meyîzend, êdî mîr dît ku wan çend mirov wê li ber Mihamed sekinî ne û pêre diaxivin. Pêre didin û distênin. Mîr, deme ku berê xwe da bi ber Mihamed ve, êdî wê bala xwe da ser Mihamed û bala xwe êdî ji ser wî ne vekir. Bala xwe ne bire ser ti kesekî din. Mihamed, ku hinekî weke çend gotinan bi mirovên li ber xwe re axift, piştire êdî bala wî çû ser mîr ku bala wî li ser wî ya. Bi vê yekê re êdî bala Mihamed ji çû ser mîr û êdî wî berê xwe bi tememî da bi mîr ve û lê meyîzend. Ku Mihamed berê xwe bi tememî da bi mîr ve û ma sekinî, êdî piştire mîr ji bi tememî berî xwe da wî û kir ku bi Mihamed re bi peyivê. Deme ku mihamed her weha fahm kir ku mîr wê bi wî re bi peyivê, êdî Mihamed bi tememî heya xwe da ser mîr di wê heyeme de. Mîr deme ku xwe kar ku bi peyivê, êdî piştire ne bi gelekî re axift û ji Mihamed re got ku 'ez bi qasî ku pê hisaha me winê bi rê ve herin. Me ne wilo ya?' Deme ku mîr wilo ji Mihamed re got û pirsî, êdî Mihamed bersiv da mîr û her weha jê re got 'erê mîrê min, me nêht kir ku bi aliyê rojhilat ve herin û xwe bigihinêne Dînwerê wanderan ji û piştire careke di vegerihin. Me berê bi şêx re hizir kiribû ku em bi hev re herin. Lê şêx êdî ne mêne. Nahak vêce ez û seydeyê min Avdilrehîm ev hevalên hevdû yên ku bi hev re herin in`. Deme ku Mihamed her weha ji mîr re got, êdî mîr hinekî ma sekinî. Mîr, deme ku Mihamed axiftibû, lê pir baş hisandibû.

Miorvên li dore wan ji li Mihamed hisandibûn. Dengê axiftina Mihamed çûbû bû Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di wê heyeme de. Piştî ku dengê Mihamed çûbû bû wî, êdî bala wî ji bi hey hatibû ser Mihamed di wê kêlîkê de. Piştî ku heya wî hatibû ser Mihamed êdî heya wî ji ser Mihamed qut ne bû bû. Mihamed, deme ku axiftibû li ber mîr, di wê heyeme de bal çûbûbûna ser wî. Piştî, Mîr ku Mihamed axiftina bidawî kir, êdî piştî careke din axift û gote Mihamed, ' ez dibe qey winê sibe bi rê kevin. Emê hingê ji hevdû bibînin'. Piştî ku mîr her weha çend gotinên din ji gotin, piştî kir ku herê bi mirovên ku pêre ne. Piştî êdî xatir ji hevdû xwestin û mîr û yên ku pêre wê çûban çûn û Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ku hinek mirovên ku sofî û faqa bûn ku li dore wan man. Piştî ku mîr û yên pêre çûn û ji ber çavan wînda bûn, êdî Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bi hev re ketine hundurê de. Mihamed deme ku berê xwe da hundur û meşî bi hizir bû. Her weha ji rûdên û rewşê wî dihata têgihiştin.

Mihamed li Cizîre bota pir nivîsandibû. Deme ku bi rê ketibû û hatibû wir ji hinek nivîsên xwe yên ku wî pir girîngî dide wan li wir radestî faqa Qasim kiribûn. Lê hinek ji wan ji kiribû tûrikê xwe de û bi xwe re anîbû bûna wir. Li wir ji, di deme ku mabû de hinek nivîsên din ji li wan nivîsên zêde kiribûn. Hineke din ji bi ser wan ve kiribûn. Mihamed, li ser aqil pir di sekinî. Di axiftinên xwe de û di nivîsandinên xwe de pir li ser aqil disekinî. Aqil, ji têgihiştine jiyanê ji mirov re lazim bû. Mihamed ji cerna ku diaxift, di axiftinên xwe de ev yek dianî ser ziman. Li ser vê yekê disekinî. Di wê deme ku li Zaxo mabû de wî hinek nivîsên ku saf li ser aqil bûn nivîsandibû. De ne, divêt ku mirov bêje, di wê heyeme de pir li ser aqil û hebûna aqil dihata rawastandin. Pir li ser nîqaş dihatina kirin. Mirovên bîaqil li ser aqil hizre xwe dianîna ser ziman. Weke ku bi hev re di gotin û anîna ser ziman de bikevine pêşbaziyekê li ser aqil û jiyanê hizre xwe dianîna ser ziman. Mihamed ji hizre xwe li ser aqil û jiyanê dianî ser ziman. Wî dianîna ser ziman ya hizre jiyanê de rastteqîni derdixista pêş di vegotin û hizre xwe de. Wî dixwest ku di hizre xwe de xwe bigihêne cewherê wê yê ku heya. Ew di hizirkirin û hizre xwe de weke di hewldanaka wilo de bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend û lê pir hizirkirina wî di meyîzend, mirov digihîşt vê yaqîniyê. Mihamed yaqîn dikir ku jiyana xwediyê cewherê kirî pir mazina. Deme ku mirov xwe bigihêne wê cewherê, hingî mirov wê xwe bigihêne rastiya jiyanê ya herî mazin ji. Yê ku xwe gahanda wê rastiye ji, wê bûbana yê ku herî nêzikî xwûdê. Bi vê yekê, ew di baweriyekê de bû. Bawerîya wî pir mazin bû. Ew xwediyê hizreke rewîştî ya pir mazin bû. Bi wê hizre wê ya rewîştî, mirov karê ji bo wî bi rehetî bêje ku ew mirovekî rewîştê bû. Li ser hizre rewîştê ya wî berî nahaka em hinekî li ser sekinî bûn. Lê ji ber ku hizir û nêzikatiya rewîştî pêre pir mazin û xurt bû, êdî li gelek deveran ew hizir û nêzikatiya wî ji bo ku were ser ziman derdikeve pêşîye mirov. Divirde ji derkekeve pêşîya mirov. Deme ku mirov li vir, li ser wî dihizirê mirov vê yekê pir baş û qanc û mazin dibîne. Jiyana wî, pir mazin bû. Pir bi nirx bû. Jiyan ku binirx be, hingî, rewîşt weke nirxekê derkeve pêşîya mirov. Bi vê yekê, ew rewîştitiya bi wî re derdikeve pêşîya mirov. Deme ku mirov li vir, rewîştê pêre şirove bike, divêt ku mirov ji bîr neke û bêne ser ziman, ku rewîşt pêre bi têgihiştin bû. Li ser rewîştê û rewşên rewîştî bixwe, hinek hizrên wî yên ku wî rijandina ser rupel hene. Ew hizrên wî ji di hatina zanîn. Deme ku ev rêz tene nivîsandin, ne bê wan têgihiştinan tê nivîsandin. Ji wan hizrên wî bixaber tene nivîsandin. Jiyanaka wî ya ku bi hizir û rewîşt buhurîbû hebû. Bi vê yekê, ev bi gelek aliyên xwe ve li ber çavan bû û weke mînaq

bû ji mirovên li dore û yê ku ew didîtin re.Ev yek, divêt di vir de biteybetî were ser ziman.

Mihamed, piştî ku ji seyde Avdilrehîmê zaniqî vaqatahabû, êdî hatibû cihê xwe.Li cihê xwe bû.Kiribû ku razihê lê xwe ji li ser çavên wî ne bû.Çavên wî ji bê xew bûn.Di serê wî de di wê kêlikê de hinek hizrên ku wî pir didana hizirandin hebûn.Ew di wê kêlikê de bi wan hizran bû. Di serê xwe de di wê heyeme de pir bi hizir bû.Cerna ku mirov bitenê ji bê, bêhtir mirov bi hizir dibe di rewşên weha de.Mihamed wi dê heyeme de li cihê xwe bitenê di hizir de bû.Di wê rewş û demê de ku mirov dikeve hizir de, hingî, mirov bêhtir dikeve hizran de. Di wê rewş û kêlikê de bêhtir,hizrên ku mirov didina hizirandin ru didin di serê mirov de.Rewş Mihamed ji di wê heyeme de ji vê yekê ne cudetir bû.

Di wê heyeme de tenê di cihê xwe de rûniştibû û di hizirî.Tenê di serê xwe de dihizirî.Li cem wî pir nivîs û pirtûk ji hebûn.Lê belê wî heya xwe ji wan ne dianî.Di wê heyeme de wilo sekinandin û hizirkirin, ji wî re pir çêtir û baştir dihat.Wî Wilo xwe çêtir hîs dikir.Wilo di dilê xwe de û di serê xwe de di wê heyeme de ew yek wilo dixwest.Tenê wilo dixwest.Mirov, cerna ku li pirtûkne ji dimeyîzenê, ji bo hizrekê an ji hizirkirinekê, ew pirtûk ji heya ku ji mirov re di wê rewşê de têr newin.Heya ku kêr werin.

Cerna ya herî baş ji mirov re hizirkirina.Hizirkirin, ku bû ser jiyane an ji jiyana mirov bixwe, hingî,weke pirtûkaka ku mirov lê meyîzenê û bixwanê, tenê jiyandin û kirinên mirov bi mirov dide têgihîştin.Dixweze ku li ser wan bi hizire û bide hizirkirin.Pirtûka mirov ya herî mazin û zîn û jîn jiyana mirov ya jiyankirî ya.Mirov karibe wê pirtûka xwe baş bixwanê,hingî, mirov çî pirtûkên din bixwanê, wê ji mirov re bifahm werin.Lê belê ku mirov di serî de ni karibe pirtûka xwe bixwe bixwanê, hingî wê mirov nikaribe pirtûkên din ji bixwanê.Ew pirtûka mirov jiyana mirov bixwe ya.Jiyana mirov bixwe ji, rastiya mirova.Bi wê hizirkirina li ser xwe re mirov wê pirtûka xwe dixwanê.Fêra mazin jibo mirov ya rasti ewe.Fêr û têgihîştina wê, fêr û têgihîştina bingihîn ya xwandin û fêr û têgihîştinên din hemûkana. Mihemed di wê têgihîştinê de bû.Ev hizir, weke kevneşopiyekê bû.Xwe naskirin, weke hizreke bingihîn heya. Deme ku mirov li jiyana Mihamed dihizirê, mirov hewldanên wî yê ji bo vê yekê pir baş û mazin dibîne.Di wê heyeme de ji di hizir de bû.Deme ku ketibû hizir de di serê xwe de çûbû bû.Di wê heyeme de deme ku ketibû hizir de, demên wî yê berê hatibû bûna bîre wî.Jiyana wî ya ku buhurandibû, weke di xatakê de di ber çavên wî de herê dibû.Ew di wê

buhurtinê de li ser wê buhurtinê di hizir de bû. Li ser her dîtinên di serê xwe de ku dikirin dihizirî. Pir dihizirî. Bi wê hizirkirinê Mihamed demeke dirêj di buhurêne di wê heyeme de. Dem, hema bêja tê ber bangdana sibehê. Lê hê Mihamed li ser xwe ya û dihizirê. Li ser cihê xwe rûniştî dihizirî. Di wê hizirkirina xwe de hin bi hin weke ku hinekî êdî girenî ji pêde dihat. Wî ji ev yek bi xwe re di xwe de hîs dikir. Çavên wî hê vekirî bûn. Lê laşê wî weke ku hin bi hin hinekî girenî pêde dihat. Wê hizirkirina wî, ew di xwe de bi xwe re dibir. Hin bi hin û hêdî hêdî dibir. Mihamed ji weke ku ev yek fahmdikir. Wî ji di wê heyeme de xwe li bayê wê çûna xwe ya ji wastindina hizirkirin û rojê diberda. Bi wê berdana xwe re, êdî hin bi hin weke ku ew ji xwe dibû. Weke qadarekê piştîre êdî ew ji di wê rewşe xwe de weke ku li ser xwe ji xwe herê lê hat. Weke ku li ser xwe bû û dihizirî. Lê di rastiye de ew di wê rewşe xwe de ji xwe çûbû..

Mihamed, piştî wê çûna xwe re, êdî weke qadarekê piştîre êdî çavên wî ji diçîna ser hevdû. Laşê wî hinekî wastaha bû. Ew wastandina wî ew ji xwe dabû birin. Mihamed, piştî ku ji xwe diçê, êdî piştîre dikeve xewê de. Weke demekê di keve xewê de. Wilo di cihê xwe de ji xwe çûbû û mabû. Bi vê ji xwe re dikeve xewê de haya ku dengê bangdana sibehê tê û ew lê şiyar dibe û tê xwe û dirabe ser xwe di wê heyeme de. Mihamed, hertimî berî ku dengê bangdanê bihatana wî ew dirabû ser xwe. Lê wê sibehê wilo mabû. Deme ku ketibû hizran de pir kur çûbû bû. Gelek tişt hatibûbûna bire wî û ber çavên wî. Wan hizir û tiştên ku hatibûbûna ber çavên wî, ew di nav xwe de di wê heyeme de biribû. Deme ku ketibû hizir de ew demên wî yên li Cizîre bota ji hatibûbûna ber çavên wî di heyeme de. Faqa Qasim û Mele Silêman ji hatibûbûna ber çavên wî. Li ser wan demên xwe yên li wir li Zaxoyê mabû hizirî bû. Li ser wan demên xwe yên ku bi mele Serhengê zaxoyî re mabû û pêre gerahabû li ser wan deman ji hizirî bû. Ew dem, bi hizirkirinê hatibûbûna ber çavên wî. Bihizirinê hatina bîrê, bi xwe re têgihiştinê ji têne bi mirov re ji mirov re.

Mihamed di nav wan hizirkirinan de ji xwe çûbû bû. Lê nahaka dise hatibû xwe. Êdî deme razanê jê re nema bû. Divî bû ku êdî rabû bana ser xwe û kara xwe kiribana û ji bo çûne. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji Muhakak nahaka rabûya ser xwe.

Piştîre ku demek têve diçê, êdî piştîre Mihamed dirabe ser xwe û kara xwe diçê. Hinek nivîsên wi yên ku wê nivîsandibûn û ji xwe qutnedikirin ji wî di wê heyeme de li hewkirin û kirina tûrikê ya ku wê dana milê xwe. Ku wî hinekî her weha kara xwe kir, êdî piştîre ne bi gelekî re deng ji derve hatina wî. Dengên labitandinê bûn. Mihamed ji ew deng hiskirin. Piştîre ku wî deng

hiskirin. Êdî wî ji kir ku derkeve û meyîzenê. Deme ku çû ku herê derve, hê ku li devê derî rasti Seyde Avdilrehîmê xaniqî hata. Wan bi hev re ji hev re rojbaşî kişandin. Yê ku di wê heyeme de rabûbûn ne tenê ew bûn. Hinek faqa ji rabûbûn ser xwe. Deme ku mirov li derve dimeyîzend, mirov çûn û hatina wan didît.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mihamed, deme ku li deve derî gahana hevdû û ji hev re rojbaş ji kişandin, êdî piştire kirin ku herin. Berî ku herin ji Mihamed rahişta wî tûrikê xwe ji û avête ser milê xwe û kir ku herê. Weke tûrikekî ji li ser Milê seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Ew ji muhakak hinek nivîs an ji pirtûkên ku wê xwandiban bûn. Tûrikê herdûkan ji bi ser mil ve dihata berdan. Ne yê piştê bû. Tûrikên piştê, hinekî mazin in. Ji ber tiştên mazitir û hinekî zêdetir tişt hildan bûn. Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî hinek nivîs û ku karibana wî hinek pirtûkên ku wê xwandiban wê bi xwe re biriban. Ji wê pêve ma wê çî dî bi xwe re biriban. Ya ku wan ji dixwest ku ertimî pêre bijîn ji ew bû. Pirtûk bûn.

Ku kara xwe kirin êdî piştire herdûkan dana rex hevdû û kirin ku ji hundurû derkevin û herine derve. Deme ku her weha kirin, êdî piştire ne bi gelekî re êdî bi hev re dana rex hevdû û derketina derve. Deme ku derketina derve ji, dîtin ku wa hinek faqa ji wê li bendî wan û çûnê de. Ew ji wê bi wan re hatiban mizgftê ji bo mêjê. Deme ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî derketina derve, êdî wan ji ji wan faqayên ku li derve bûn û weke ku li bendî wan bûn, ji wan re rojbaşî ji kişandin û piştire ku wan ji ji seydeyên xwe re rojbaşî kişand, êdî bi hev re dana rex hevdû û kirin ku bi kevin rê de û herinê mizgftê. Deme ku riya mizgftê de, di rê de wilo zêde deng ji ti kesekî dervediket. Weke ku hê xawartî li ser wan habû. Hê xawara xewê li ser wan bû. Deme ku li wan dihata meyîzend ev yek dihata farqkirin. Lê yên ku di wê heyeme de bi hinek lavzan ji bana hinek gotin digotin hebûn. Deng ji wan derdiket. Lê ne dengê wilo bilind bû. Yên ku diaxiftin di nav xwe de hinek faqa bûn. Deng ji wan derdiket. Lê dengên wan ji ne zêde wilo bilind bana. Ji ber rêze li ber seydeyên xwe ji bana wan dengên xwe zêde wilo bilind ne dikir û bi hevdû ne dikir. Ew ji bi dengê ku nimz di nab hevdû de diaxiftin. Hinek ji wan ji hê xawartiya ser çavên xwe jê dibirin. Weke zarokakî ku ji nûva ji xwe rabe û ber çavên kenîşt bigirin û bi firêne wan ji di firand. Wilo destên xwe bi ser çavên xwe de dibirin û dianîn. Mihamedû Seyde Avdilrehîmê xaniqî hinekî zû rabûbûn. Deme ku bangdan bûbû Mihamed rabû bû. Piştî ku rabûbû, êdî çûbû hinek av pêşî li ser û ruyê xwe kiribû û ku hatibû xwe, êdî piştire destmêja xwe ji girtibû piştire hatibû hundur û kara xwe kiribû. Seyde

Avdîlrehîmê xaniqî mirov karê heman nêzîkatiyê ji bo wî ji bêne ser ziman.Ew ji zû di rabû. Ew ji xwe, hertimî zû dirabû.Deme ku dirabû êdî ne dirazaha.Destmêja xwe digirt û piştî ku mêj ji dikir,piştî êdî ji xwe re dirûnişt û dixwand.Wî ji weke Mihamed pir dixwand.Mihamed pir hij xwandinê dikir.Wê demên hema bêja hemû bi xwandin û hizirkirinê di buhurandinê di buhurandin.Ew hertimî di serê xwe de tişî bû.Hertimî bihizir bû.Mihamed, deme ku mirov bahsa hizirkirina wî bike divêt ku mirov hinek bi teybet bahs bike.Ji ber ku gelek teybetmediyên wê hizirkirina wî hebûn.Ew bi hizirkirinê di serê xwe de digaha pir amcaman. Ew ancâmên ku ew digahayê de ji wî ji mirovên dore xwe li dore xwe re dianî ser ziman.Bi vê yekê, ew xwedi xoslet bû.Hizirkirin, ku mirov zanibe baş bike, mirov karê pê hizrên mazin xwe bigihênîyê de.Mirov karê pê hizrên mazin bi afirêne.Mihamed, bi vê yekê, mirov divêt ku bêje pir mazin bû.

Piştî ku ew ji medrese derketibûn, êdî n bi gelekî re digihine mizgeftê.Deme ku digihine mizgeftê, êdî dibînin ku wa mirov lê hene.Gelek mirov lê hebûn.Hê mirovên ku di hatin ji di rê de dihatina xuyakirin.Mihamed û seyde Avdîlrehîmê xaniqî û yên bi wan re ji ew di dîtîn. Bi hev re dimeşîn û têne mizgefte.Piştî ku têne nêzîkî mizgeftê, êdî ne bi gelekî re digihine mizgeftê û dikevîne hewşa wê de.Deme ku dikevîne hewşa wê de, êdî di hewşê de rastî gelek mirovên ku li hevdû kom in tên.Di nav wan mirovên ku li hevdû kom in de, Seyde Xûsrew ji û mîr li cem hevdû sekinî bûn.Mirovên ku li wir ji li wan li hevdû kom bûbûn.Kombûn bi vî awayî çêbû bû.Piştî ku Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ji û yên bi wan re dikevîne hundur de, êdî bala wan tê ser wan.Deme ku tê ser wan, êdî ji hev re rojbaşiyê ji dikişênin û piştî bi hev re hevdû ve diçin.Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî, deme ku dikevîne hundur de û ji hev re rojbaş ji dikişênin, êdî ew qavzên xwe bilez dikin û bi ber mîr û Seyde Xûsrew û wan ve diçin.Deme ku diçin û digihine dehma hevdû, êdî bi hev re li hevdû digihine hevdû û êdî ku hinekî li ber hevdû disekinîn ji, piştî êdî bi hev re diçina hundur ku mêj kin. Deme ku ji derve dikin ku herine hundur, hingî, seyde Avdîlrehîmê xaniqî û seyde Xûsrew têne ber hevdû li dehma hevdû û bi hev re dikevîna axiftinê de.Mîr ji di rex wan de ya. Mihamed ji bi gavakê li şûn ve li deham seyde Avdîlrehîmê xaniqî dimeşê.Li dore wan ji gelek mirovên din ji hene.Ew ji bala wan li ser mîr û seyde Xûsrew û seyde Avdîlrehîmê xaniqî û Mihamed wan ne.Seyde Avdîlrehîmê xaniqî û seyde Xûsrew bi hinek gotinne ji bi hev re diaxivin.Bi hev re didin û distênin.Bi vî awayî diaxivin bi hev re.

Ku bi hev re dikevîne hundur de, êdî i hundurû bi hev re dikevîna rêze de û dikin ku bidest mêmê bikin. Deme ku ji bo mêmê dikevîne rêze de Seyde Xûsrew û mîr û Mihamed rêze pêşî de cih digirin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji derkeve pêş û li pêşîya wan mêmê dike. Ew mêmê, mêmêja wan ya dawiyê ya bi hev re hev re bû. Wê pişt mêmê re êdî wê bi rê ketiban. Ku bidest mêmê kirin û ku mêmê xwe bidawî kirin, êdî piştê hinekî li ser çokên xwe li hevdû rûniştî man. Deme ku li hevdû rûniştî man, seyde Avdilrehîmê xaniqî ji wan re pêşî axift û axiftinaka pir baş û qanc kir. Axiftinaka pir bizana kir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, diaxiftina xwe de ji got ku ew mêmê mêmêja wa ya bi hev re ya di wê demê de ya dawiyê bû. Ji wan re bi bîr xistibû ku wê bi rê ve çûban. Lê deme ku axiftibû, axiftinaka bihizirkiribû. Pir bizane axiftibû. Demeke dirêj diaxivê û piştê axiftina bidawî dike. Piştê ku wî axiftina bidawî kir, êdî mîr ji dem wî ne kir û di cih de mafê axiftinê girt û axift. Wî xwest ku axiftinaka bizane ku newê ji bîr kirin bike. Wilo hewlda. Deme ku wî bidest axiftinê kir, pêşî hinek li ser qanciyê axift. Piştê gotin anî ser hatina Mihamed û mele Serhengê zaxoyî ya ji Cizîre bota ya bi hev re li wir. Hinekî li ser wan û wê demê ji axift. Pir bi qancî ji wan û ji hatina wan axift. Piştê mîr gotina xwe bir ser çûna ser dilovaniya xwe ya mele Serhengê zaxoyî. Mihamed ji deme k mîr diaxift, serê wî di ber wî de lê bi hizir û hazn lê dihisand. Bala wî bigiştî li ser mîr û axiftina wî bû. Mîr, weke qadarekê axift. Piştê mîr axiftina bi çend gotinên ku dilxweşiya xwe û ya mirovên dore ji Mihamed tênine ser ziman got û piştê axiftina bidawî kir. Piştî axiftina mîr re, bal çûna ser Mihamed. Mirovên ku balên wan çûn ser Mihamed, weke ku jê bi balên xwe dixwestin ku ew biaxivê lê dimeyîzendin. Mihamed, deme ku mîr axiftina bidawî kir, êdî wî serê xwe ji berxwe rakir û li dore xwe meyîzend. Wî deme ku serê xwe rakir û li dore xwe meyîzend, hingî ew balên li ser wî bûn wî dîtî. Deme ku wî ji wilo fahm kir, êdî wî ji xwe di cihê xwe de xwe adiland û kir ku biaxivê. Deme ku wî kir k biaxivê, êdî bal bêhtir çûna ser wî. Mihamed, piştî ku xwe di cihê xwe de xwe adiland, êdî piştê ne bi gelekî re bidest axiftina xwe kir di cihê xwe de. Mihamed, deme ku bidest axiftinê kir û axift, êdî wî hinekî pêşî weke seyde Avdilrehîmê xaniqî û mîr ji qanciyê axift. Piştê ku wî hinekî wilo axiftin kir, duvre wî axiftina xwe bire ser deme xwe ya li Cizîre bota û wê deme ku mele Serhengê zaxoyî hatibû wir û ji wir bi hev re hatibûbûna wir. Bahsa, ku bi hev re wê çûban bi aliyê rojhilet ve ji kir. Lê piştê wî digotina xwe de gotin ku ne bû nesîb. Ew çû ser dilovaniya xwe. Ku hinekî wilo axift, piştê wî di axiftinê de gotina xwe anî ser wê deme xwe ya ku li wir mayî bû. Bahsa wê dema xwe kir. Demeke dirêj, ji

wê dema xwe axift. Di wê beşa axiftina xwe de bahsa mele Serhengê zaxoyî, seyde Avdilrehîmê xaniqî û mîr ji kir. Hê bahsa gelek qancên din ji kir. Her weha weke demekê ku axift, êdî piştire wî axiftina bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de. Piştire ku ew ma sekinî, êdî hinek mirovên din ji axiftin. Seyde Xûsrew ji axift û wî ji çend gotin ji mirovên li dore xwe re got. Piştire ku hinekî her weha ji hev re cimaat axift, êdî kirin ku rabin. Êdî deme rabûnê bû. Wê rêvan ji bi rê ketiban.

Piştî ku hinekî dî ji li hevdû rûniştinî dimênin, piştire êdî dirabina ser xwe. Piştî ku rabûna ser xwe, êdî derketina hewşa mizgeftê. Deme ku derketina hewşa mizgeftê, êdî li hewşê li hevdû kom bûn. Mîr û seyde Xûsrew di rex hevdû de bûn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di rex wan de bû. Mihamed weke qavzekê li pey wan bû. Li dore wan ji gelek mirov hebûn. Mirovên ku li dore wan ji bûn, mirovên ku li ser xwe bûn û yên navserî xwe bûn. Miorvên ku di nav xalkê de rêzeke mazin hebûn bûn. Bala wan li ser mîr û Seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mihamed bû. Li wan dimeyîzandin. Ew rêvan bûn. Deme ku derketibûna derve, li derve, yên ku wê bi rê ve çûban, li hevdû bi kom amede hatibûbûna dîtin. Bi seyde Xûsrew re ji deme ku ew hatibû, pêre hinek mirovên ku weke ku faqabûn ji pêre hatibûn. Wî hinek mirov naqandibûn û bi xwe re anîbûn. Ew ji li wir amede bûn. Lê ji wan zêdetir bal li ser Mihamed û seyde Avdilrehîmê xanî û mîr û seyde Xûsrew wan bû. Miorvên dore wan, li wan di meyîzend in. Mihamed, di wê heyeme de bi bêdeng bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî hinekî diaxift. Dengê wî dihat. Mîr ji dengê wî dihat. Ji xwe yê ku di wê heyeme de yên zêde dengên wan dihat yek ji wan ji mîr bû. Mîr, divîbû ku ji bi axiftin bana. Her weha hêvî ji jê dihata kirin. Bala pir li ser wî bûn. Miorvên lê dimeyîzend. Li gotina wî dimeyîzend.

Li hewşê mizgeftê, mirovên ku hatibûbûna mêjê, hemûk ji di wê heyeme de li wir bûn. Li wir bi kom bûn. Piştî ku ji hundur derketibûn, êdî ti kesek ji wir ne vaqataha bû. Ji ber ku herkesekî zanibû ku wê Seyde Avdilrehîmê xaniqî, Mihamed û Seyde Xûsrew wê bi rê ve çûban. Ji ber ku wan bi rê bikin li wir mabûn. Bi vê yekê, deme ku mirov di wê heyeme de li hewşê mizgeftê dimeyîzend, mirov didît ku weke rewşeke awarte hebû dihata xuyakirin. Ya rasiî ji ji bo wan di wê heyeme de di wê kêlîkê de rewşeke awarte hebû. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bûbû bûn weke qatak ji jiyana wan. Vêce ew wê di bêhneke din de wê çûban. Ji wir çûban. Herkesek di hizre wê yekê de bû. Herkesek ji bo wan li wir bû, li cem wan bû, li ber wan bû. Li wan dimeyîzandin. Mihamed ji li dore xwe dimeyîzend. Yên ku jê pirsîbana wî bersive wan dide, bi vê yekê axiftina

wî çêdibû. Lê wekî dî ji, ku ti kesekî ti tiştê ne pirsîbana, ew ji bêdeng dima. Bêdeng bû û di xwe de dihizirî. Ka çî dihizirî. Ka çî di serê xwe de di wê heyeme de di wê kêlîkê de dihizirî. Ev yek ne dihata têgihîştin. Lê dihata têgihîştin ku ew di serê xwe de li ser tiştne di hizirî. Ew, deme ku mirov lê dimeyîzend, ew bihizir didît. Ew bi hizir bû. Di serê xwe de bi hizir bû. Miorvekî wilo mazin û zane, gelo wilo kur bihizir çî di hizirî? Deme ku mirov lê dimeyîzend û hinekî lê şaq dima, ev pirs bihizir di serê mirov de çêdibû. Di wê heyeme de ji ew pirs yên ku lê dimeyîzendin, di serê gelean de weke ku hebû. Weke ku şaq dabû. Mîr, di wê heyeme de ew çend ku bi axiftin ji bana, ji aliyekî ve bala wî ji li ser Mihamed bû. Deme ku di axiftin ji, bala wî ji li ser Mihamed bû. Mihamed, di wê deme ku ew li wir mabû de hertimî di bala mîr de bû. Mîr pir hêjatiyak di dayê de. Mîr, ku li qasrê civat li dar diket, hertimî dixwest ku Mihamed li wir bana. Wî dixwest ku ew bidîtina. Her weha Mihamed di hişê wî de bû. Wî di demeke kin de pir hij Mihamed kiribû. Li wir Mihamed, bûbû weke yek ji wir. Mîr ji di wê farqê de bû. Deme ku dihata hizirkirin ku ew wê herê, hingî, weke ku êşek bi wan re çêbibe bi wan re dibû. Mirovên ku wî çûban li wir amede bûn. Mîr bixwe ji hinek tişt dabûn amede kirin ku bi wan re bişêne. Ji xaynî wê yekê ji, mîr hizirkiribû ku wan mirovên mazin û hêje biteneserê xwe ne şêne. Hinek mirovên din ji bi wan re bişêne. Ji ber vê yekê ji, êdî wî ji hinek mirovên ku li ser xwe bûn û pir xurt dihatina xuyakirin dabûn amedekirin ku bi wan re bişêne. Lê mîr deme ku ew yek kiribû, hê heya Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji vê yekê ne bû. Heya Seyde Xûsrew ji wê yekê hebû. Ji ber ku deme ku mîr piştî ji belav bûna civatê hinekî hizirî bû, hingî ew biryar dabû û ji mirovên dore xwe re anîbû ser ziman. Seyde Xûsrew ji, ji xwe, li qasrê mabû. Wî ji, deme ku mîr weha biryara hildabû û gotibû, hinekî axiftin ji pişt wê biryara wî kiribûn. Ji ber vê yekê, wî zanibû. Lê hê haya wê heyemê ew yek di nav wan de ne hatibû rojeve.

Piştî ku ji hundurê mizgeftê derketibûbûna derve û li derve li hevdû gahabûn hevdû, êdî wilo li ser lingan ketibûbûna axiftinê de. Bi hev re di axiftin. Gelek mirov hebûn. Lê deme wê heyeme de ji ber ku bal hemû li ser mîr û wan mirovên ku wê çûban bû, êdî wilo zêde deng ji ti kesekî dernediket. Deme ku mîr di axiftin, bêdeng bûn ji bo hisandinê dibû. Herkesek biguh li axiftinên ku dibûn dihisand. Bala xwe dide ser axiftvanan. Di wê heyeme de ji zêde wilo ti kesek ne di axiftin. Mîr û çend mirovên din di axiftin. Yên din ji axlabe li wan dihisand.

Wê rewşê weke qadarekê berdeyam kir. Piştî ku weke qadarekê berdeyam kir, êdî piştî ne bi gelekî re ku hinekî din ji dem têve çû, êdî

kara çûnê weke ku hata kirin. Deme ku her weha kara çûne hata kirin, êdî labitandinak çêbû. Axiftin ji hinekê zêde bûn. Deng zêde bûn. Ji ber ku deme ku kara çûnê hata kirin, êdî bidest xatir xwestinê hata kirin. Deme ku bidest xatir xwestinê hata kirin, êdî piştî ne bi gelekê re ku xatir ji ji hev hata xwestin, êdî yên ku wê bi rê katiban ji derketina pêş. Deme ku ew derketina pêş ji êdî bi mirovên ku wê bi rê ve çûban re ew mirovên ku mîr dabûn amede kirin ji derketina pêş. Lê deme ku ew derketina pêş, deng ji wan derneket. Berî ku ew axivin, mîr weke ku gavakê derkete pêş û ji wan re got, "min dana amede kirin, bila bi were werina haya bi Urmiyê, ji wir êdî bila vegehînin". Deme ku mîr wilo got, êdî seyde Avdilrehîmê xaniqî derkete pêş û got "mîrê min, hewce nebû bi vê yekê. Emê çûban, ji xwe tişte ku xwûde ferman kiribe wê bibe. Ew ji li ser serê meya. Ji ber ku ya xwûde ya". Piştî ku wî wilo got, êdî mîr dise mafê axiftinê girt û weha careke din axift, "ti rast dibêje, ji ya xwûde sûal nayê kirin. Lê di van rojan de hinek bûyarên ku diqawimin ji ne ti zane li herêma. Awlati hertimî başa". Piştî ku mîr wilo got, êdî seyde Xûsrew ji mafê axiftinê girt û gote mîr, "rast dibêje, ti li gor mazinatiya xwe hizir". Piştî ew ji ma sekinî. Piştî ku her weha hinekê axiftin di nav wan û mîr de ji buhurt, piştî wan kir ku bikevina ser rê de. Mîr ji bo ku di rê de ne kevine zore de, tişte ku hatibû hişê wî dabû kirin ji bo wan.

Mîr, berî ku ew xatir ji wî bixwezin û bi rê bikevin hinekê din ji ji wan re axiftibû. Ku mirov weke demeke ji wan re axiftibû, piştî êdî ku wî axiftina xwe bidawî kiribû û mabû sekinî, êdî kiribûn ku xatir ji hevdû bixwezin û bi rê bikevin. Xatir ji mirovên din yên li dore xwestibûn. Lê ji mîr hê ne xwestibûn. Ku ji wî xwestin, êdî wê bi rê ketiban. Piştî axiftina mîr re êdî karkiribûn ku xatir ji wî ji bixwezin. Yê ku pêşî kiribû ku xatir ji mîr ji bixweze Seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Wî piştî axiftina mîr re êdî ji mîr re gotibû "mîrê min, êdî em bi rê kevin, win ji zêde li ser lingan ne mênin" û piştî bi bi ber wî ve çûbû bû û wan xatir ji hevdû xwestibû. Piştî wî re êdî yên din ji yek bi yek hatibûn ber mîr û jê xatir xwestibûn. Mihamed piştî Seyde Xûsrew re hatibû ber mîr û kiribû ku ji mîr xatir bixweze. Deme ku Mihamed hata ber mîr, wî û mîr weke bêhneke li hevdû meyîzandin û piştî ji hevdû xatir xwestin. Mîr, deme ku ji Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî xatir xwestibû, weke ku di dilê wî de tişte biniqûtê lê hatibû. Wî wilo di xwe de hîs kiribû.

Piştî ku wan ji xatir ji mîr xwest, êdî piştî kirin ku bi rê bikevin. Deme ku kirin ku bi rê bikevin, êdî berê xwe dana haspên ku mîr ji bo wan dabû amede kirin. Mîr haspne pir qanc ji bo wan dabû amede kirin. Haspên

dore Kirmaşanê, haspne pir biasl bûn. Haspne manaq bûn. Demek ku ew hasp diketina bazê de ti haspan ne dide pêşîya wan. Her weha wilo xurt û bazak bûn. Rehwal bûn. Mirovên ku wê bi wan re çûban ji li ser haspne wilo wê sûwar bûban. Haspên wan ji amede bûn. Lê li dervî hewşe û hinekî jê wir de hatibûn amede kirin. Hê ji êvarî ve hatibûn amede kirin. Ji êvarî ve karê ku wê bihatana kirin mîr gotibû û hatibû kirin. Ti kar nema bû sibehê. Deme ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û Seyde Xûsrew di pêşîyê de ku xatir xwestin û piştî ku bi ber haspan ve çûn, êdî li cem haspan ji sekinîn û li mîr û mirovên dore wî meyîzendin û li ser navê yên ku wê bi rê ketiban seyde Avdilrehîmê xaniqî bi dengekî ku bilind ji wan re got "bi xatirê we hemûka". Deme ku wî wilo got, êdî mîr ji got "riya we vekirî bê!" û piştî ew ji ketina rex hevdû de û kirin ku bi rê bikevin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî û Seyde Xûsrew pir pîr bûn. Ew deme ku bi rê ketin li haspan sûwar bûn. Lê Mihamed bi hinek mirovan re meşî. Bi wî awayî bi rê ketin. Mîr û yên ku li dore wî bûn haya ku ew ji ber çavan windabûn di cihê xwe de mana sekinî û ji şûn ve li wan meyîzandin. Ew ji ketine rê de û berê xwe dana bi riya ku wê tere çûban û çûn, û hin bi hin êdî di rê de ji ber çavên mîr û yên ku li şûn wan mabûn, winda bûn..

Beş 4.

Li urmiyê, ew demek bû ku mijarak pir dihata axiftin. Ew mijar ji mijara keça mîr Hasanxan Gulîzer bû. Pir li ser dihata axiftin. Gulîzerê hij kurekî kiribû. Berî ku malbata wan pê bihisihê xalk pê hisaha bû. Ev yek ji bûbû mijara nîqaşan. Kurikê ku Gulîzerê hijê dikir ji kurmîrek bû. Ew ji ji wir bûn. Kurik ji navê wî Selman bû. Bavê Selman hertimî li cem mîr Hasanxan bû. Hertimî li cem hevdû li civata hevdû dirûniştin. Weke aqildanakî ji di nav xalkê de dîma. Ku tişteke bûbana an ji wê biryarak li qasrê bihata hildan, biqasî ku bal diçûna ser mîr wilqasî ji bal diçûna ser wî ji ew ji her weha mazin bû û bi rêze bû di nav xalkê de. Navê wî ji dawid bû. Dawid, deme ku mirov bahsa wî bike divêt ku mirov hinek mazin bahsa wî bike. Kurê wî Selman hij keça mîr Hasanxan kiribû. Ev yek ji hatibû hiskirin. Wê êdî piştî wê hiskirinê re ya ku hatibana kirin, hatina li cem hevdû li civata hevdû rûniştiban û di nav xwe li qasrê li ber wî li civata wî careseriyek bidîtinan. Vêce ku aliyek mîr bana, hingî mesele divîbû pir li ser bihatana sekinandin. Pir li ser bihatana hizirkirin. Pir bi bal gav hatiban avêtin û gotin hatiban gotin. Ku gotinek ji bana, ku li ser mîr û rewşê di wê heyeme de hatibana gotin, wê di aqilan de mabana. Wî n hatibana ji bîr kirin. Vêce ku gotina ne baş ji bihatana gotin, êdî wê berî hatibana guhê mîr, wê bertek jê re hatibana dayîn. Xalk bi mîr ve girêdayî bû.

Xalk bi mîr ve pir girêdayî bû. Biqasî ku pêve girêdayî bûn, wilqasî ki baweriya wan ji lê hebû. Mîr Hasanxan ji mirovekî ku zane bû. Baweriyeke mazin di nav xalkê de lê hebû. Pir baweriyeke mazin lê hebû. Li wî û aqilê wî baweriyeke mazin hebû. Deme ku bahsa wî dihata kirin, û gotin dihata ser wî, êdî ev ji dihata ser ziman. Axlabe ji, yên gotin digotin ji mirovên ku bi temenê xwe mazin bûn. Ew mirovên ku navserî xwe bûn. Di nav xalkê de li wan ji baweriyaka mazin hebû. Deme ku wan ji gotinek bigotina, ew gotin ji ne dihata ji bîr kirin. Xalkê di nav xwe de ji bo wî mirovê ku tiştê digot, di nav xwe de digot ku "de ne, wî got, ku wî got, nexwe tiştêkî ku ew zane heya". Her weha bawerî pê dihata ser ziman. Bi vê yekê, êdî di aqilan de ji ew gotin dima. Ew gotina ku di wê heyeme de ji devê wan mirovên navserî xwe derdiket, di civata mîr de li ber wî ji hebû ku bihatana ser ziman. Îro ne bana, wê siba bana. Lê Muhakak wê hatibana ser ziman. Mîr ji wê hiskiribana. Vêce ku hiskir, êdî wê çî bertek dabana ew ji hingî wê kifş bûbana. Lê ji mîr ti carî bertekeke bêaqil hêvî ne dihata kirin. Hertimî dihata gotin ku wê ew ya rasti çî bana, wê wî ew bianîyana ser ziman. Di wê xate de bertekê bidana. Her weha bawerî û hêvî hebûn. Di wê heyeme de ji bo mîr Hasanxan ji gotinên ku dihatina gotin, ji aqil dihatina gotin. Bi aqil dihatina gotin. Û di gotin ku wê bi aqil be. Her weha divêt ku mirov bêne ser ziman.

Vêce mîr Hasanxan wê ji bo keça xwe Gulizerê û Selman ji çî nêzîkati dabana nîşandin, ew ji hê ne kifş bû. Mesele ji aliyê wî vê ji hê ji nû ve hatibû bihîstin. Ew ji weke ku hê di deme hizirkirina xwe de bû. Lê wê wî ji tiştê bigotana. Tişte ku wî gotibana û gotina ku ji devê wî derketibana ji, wê weke wê hatibana kirin. Dervî wê ti kesekî wê tiştê ne kiribana. Herkesekî ji ev yek zanibû. Gulizerê ji keçeke pir paqij û bîaqil bû. Bi vê yekê, navê wê derketibû. Selman ji di nav xalkê de pir baş û halim dihata naskirin. Deme ku bahsa wî ji dihata kirin bi qancî bahsa wî dihata kirin. Di gotinê de, yên ku bahsa wan dikirin ji ew layiqî hevdu ji di dîtin. Ev layiqbûna ku wan li wan di serê xwe de didît ji dianîn ser ziman. Selman bixwe ji mirovekî ku xwanda bû. Li dergaha Seyde Xûsrew xwandibû. Hê ji wî faqatî fikir li wir. Weke serfaqa ji dihata naskirin di nav xalkê de. Di civatê de ku ew ji hebena mafê axiftinê didana wî ji. Ew ji didana axiftin. Bivê yekê, mirov divêt ku tiştêkî di ji bêne ser ziman. Ew ji her weha faqatiya li cem seyde Xûsrew bû. Deme ku Selman di nav civatan de diaxift, weke ku faqayak ji feqihên seyde Xûsrew were axiftin dihata Dîtin. deme ku diaxift, Seyde Xûsrew ji di serê mirovên ku lê dihisandin de zîn û jîn bû. Ew ji mirovekî wilo bû.

Hê demeke zêde dirêj bi ser bihîstina hijkirina wan ve ne çûbû. Piştî ku her weha hatibû hiskirin, pêre hê li qasrê civatê lev ne gahabû hevdû. Bêguman ku lev gahabana hevdû, êdî ew wê hatibana rojeve mîr di wê heyeme de. Lê meseleyek ku hata bihîstin, zêde nayê sekinandin. Sekinandin ji ne başa. Divêt ku weke ser axiftin. Divêt ku ya rasti, çiya were gotin û biryaraka rast were hildan û di nav xalkê de were bihîstin. Ev yek, weke mecburiyetekê bû.

De ne, divêt ku mirov zêde demê winda nekê û bêne ser ziman. Divêt ku mirov bêje ku çawa hijkirina Gulîzerê û Selman hata hiskirin.

Di jiyana xweze de mirov hertimî bi hev re ne û hevdû dibînin û axlabe ji ku ne hemû ji bin, ji gelek kirinên hevdû bixaber in. Di jiyana de çî dibê, ya ji hevdû his dikin û yan ji bidîtina xwe re agahdar dibin. Di wê heyeme de ji rewşê Gulîzerê û Selman ji, deme ku Selman ji medresê derdikeve û ku hinekî dûr diçê ji medrese û rastî Gulîzerê tê û tê cem wê û li cem wê disekinê û ku ew li cem wê disekinê, êdî ku bi hev re diaxivin û jineke pîr wan di bîne û ew jina pîr ku tê ber avê û li wir ji hinek jinên din re ji dibêje û ew jin ji diçin û ji hinek jinên din re ji dibêjin, her weha tê bihîstin û belavkirin. Piştî ku tê bihîstin, êdî gotin diçê guhê mîr ji û guhê Dawid ji. Piştî ku dawid dibihîze, êdî ew bi selman re diaxivê. Ji Selman di pirsê ku ka ew rasta an ji ne rasta. Deme ku ew ji di pirsê û ku ew ji dibêje rasta, êdî ew ji bidest hizirandinê dike. Ya rastî hij hevdû kirin, xalat ne dihata dîtin. Lê divêt ku dê û bav, pêşî ji wan ew hiskiribana. Piştê ji hewirdore. Ji ber vê yekê, dawid ji bidest hizirandinê kir. Ku pêşî, berî ku bihatana bihîstin, Selman çûbana û ji dê û bavê xwe re gotibana û piştê mîr ji ji wan hiskiribana, wê rewşê pir haasanîtir bana. Lê wilo ne bû. Ji hewirdorê wan ji hiskir. Vêce wê çî bûbana, ew ji êdî xwûde zanibû. Ew ji êdî girêdayî gotinên ku wê ji nav lêvên mîr derketibana bû. Lê qadraq ji bo Selman ji hebû. Ji ber ku ew faqayê Seyde Xûsrew bû. Seyde Xûsrew ji, gelek caran di civata mîr de bahsa wî kurî kiribû û singa bavê wî di nav civatê warimandibû. Dilê wî kêfxweş kiribû. Ew bav bû û bahsa kurê wî wilo bi qancî û mazin di nav civatan mazinan de li ber wî dihata kirin. Ma wê çawa kêfxweş ne bana. Mîr bixwe ji, hinek caran ew di civata xwe de dabû rûnandin. Lê hisandibû. Rehm li bavkalên wî û miriyên wî kiribû. Bi vê yekê mîr dilxweşbûna xwe anîbû ser ziman. Ma gelo ew dilxweşbûn, wê di wê heyeme de ji wilo berdewam kiribana? Ew ji weke pirsê bû di serê mirovan de. Axlabê xalkê de hizirdikir ku wê berdewam kiribana. Ji ber ku Selman kurikekê ku paqij bû û di dilê mirovên ku ew nas dikirin de cihekî mazin girtibû. Bi delalî cih girtibû. Bi delalîyeka qanc cih girtibû.

Mîr ji dihizirî. Li dore wî pir mirov hebûn. Mîr asoya wî mazin bû. Divî ji ku mazina bana. Ew jê dhata xwestin. Mirovên ku li dore wî ji bûn, yên ku navserî xwe bûn. Yên ku bi aqilê xwe re mazin bûn. Wan ji wê hizre xwe gotibana. Wan ji wê di civatê de hizre xwe gotibana. Ew ji di wê heyeme de dihizirîn. Ew ji di serê xwe de hinek ji wan weke ku ne li wir bin di hizir de bûn. Di serê xwe de mesele di birin û dianîn. Li ser di serê xwe de xwe dikirin ku xwe bigihênine hizreke baş û rast. Ew ji bi vê yekê, pir di serê xwe de di wê heyeme de di hizirîn.

Dem ku hin bi hin bi ber êvarî ve diçû, êdî waxt ji ji hizirkirinê re hindik dima. Ji ber ku deme ku bû êvar êdî wê civat li hevdû gihê hevdû û wê êdî li ser bê axiftin. Deme ku hata axiftin, yên ku wê axiftibana, divîbû gotinaka wan hebena ji bo wê rewşê. Bêgotin ne dibû. Wê ji wan ji bihatana pirsîn. Lê wê rojê ku civat li hevdû giha hevdû ji, wê ji mirovên zane û navserî xwe pêk bihatana. Ew yên wilo wê hemû ji amede bana. Yên ku di nav xalkê de ji zanebûna wa êmintî hebûn wê amede li wir bana. Wan ji wî wê gotina xwe bigotina. Wê pêşî mîr axivî bana. Lê wê carê, wê mîr axiftinaka ku tenê mesele bêne ser ziman wê kiribana. Ji ber ku weke aliyekî mesele jî ew dihata dîtin. Ku ne wilo bana, mesele mîr ne aliyekê wê bana, wê dibêt ku pêşî ne axiftibana. Wê pêşî mirovên ku wê hizre xwe anîbana ser ziman wê anîban ser ziman û piştire êdî wî wê anîbana ser ziman. Lê wê carê, wê mîr hinekî tenê anîbana ser ziman û mabana ser ziman û piştire mabana sekinî. Ev yek, weke kevneşopîyeke civatên kurdan bû. Lê wekî dî ji mîr hertimî di civatê de li pêş bû. Di wê heyeme de ji wê li pêş bana. Wê dise di dawiyê de gotina ku ji devê wî derketibana wê herkesek girêdabana. Wî çî gotibana, wê wilo bûbana...

Dem ji li ber êvarî bû. Hindîk mabû ku roj herê ava. Roj li ber avabûnê bû. Piçekî dî mabana wî roj çûbana ava. Di wê demê de ji dinye pir xweş dibû. Mirov hema bêja hemû li derve bûn. Herkesek bi sawalên xwe ve diçûn. Bi kerî û garanên xwe ve diçûn. Dengê zarokan ji di wê demên pir derdiket. Mêr û jin di wê heyeme de bi hev re diçûna pêşîya paz. Jinan, deme ku diketina rê de û diçûn, stilên xwe dikirina destên xwe de û diçûn. Ji bo dohtina sawalan. Dem ku hinekî dî têve çûbana, êdî wê bûbana şev. Êdî wê raş ketibana erdê de. Lê ku raş ketibana erdê de ji wê zêde ne bûbana raş. Ji ber ku dem deme tavaheyvê bû. Wê bi tava hevyê wê bûbana hinekî rahnî. Mirov, di tava heyve de ji, derketina derve. Axlabe ji mirov di wê demê de li derve bûn. Sawalên xwe ji li çolê dihiştin. Deme ku sawal li çolê dihata hiştin, êdî pêre şivan ji li çolê ji diman. Bi çivanan re ji mirovên ku diman hebûn. Lê ku dibû ber êvarî, êdî jinan dirahiştta sitil ('sîtil' ji tê gotin)

û tiştên xwe yê wilo bi ber di şêvîne de cihê ku paz lê maya ve diçûn. Wê çûban û paz dohtiban. Piştî ku wan ji paz doht, êdî wê vegereheban.

Roj hê ne çûbû ava. Ew dem ji pir xweş bû. Ew dem, ji li ser xwe gerandinê ji pir xweş bû. Ji xwe, axlabe ji, di wê demê de mirov di hundur de ne diman. Mîr ji axlabe, ku mêhvanên wî hebana ji, di wê demê de ji derve bû. Bi mêhvanên xwe ji derve bû û bi hev re li ser xwe di gerahan. Ew dem, deme ku wê ro çûbana ava, di wê demê de mirov karê bêje ku mirov derdiket ji bo ku bêhne bistêne, weke ku ji nû ve were dinyê lê dihat. Pir dihata ser xwe. Mîr ji, axlabe ji ku mêhvanên wî hebana ji bi hev re di wê demê de derdiketin û hinekî li ser xwe digerahan. Hinekî her weha bêhne xwe distandin. Dilê wan divebû. Bêhne wan derdiket.

Mîr ji, di wê demê de hinekî mêhvanên wî yê ku ji dûr hatibûn hebûn. Ew ji li hundur li hevdû rûniştî mabû bûn. Haya ku bûbû ber êvarî di hundur de li hevdû li civate hevdû rûniştî mabûn. Ji xwe mirovên ku hertimî li cem mîr diman ji hebûn. Ew ji di wê heyeme de li cem wan bûn. Bi hev re rûniştibûn. Deme ku ew derdikevina derve ji, êdî di bînin ku wan mirov wê hemû li ser xwe ne. Jin ji wa sitilkên wan di destên wan de ne û diçûna bi çolê ve. Mîr, deme ku ku derdikeve, hinekî her weha li wê çûn û hatinê dihazirê. De ne, di vir de divêt ku mirov bêje ku hizirandin û hazirandin, di vir de hinekî jev cude ne. Hizirandin, hizirkirina. Lê hazirandin, bi hizir li çûn û hatinên li pêşîya xwe temaşa kirina. Jê hazir kirina. Deme ku mirov hazir kir, hingî, hazirandin dibe. Hazirandin, navseriyekê bitêgihiştin ji dixweze ji mirov.

Mîr û yê ku li dore wî pêre ne, ku derdikevine derve, êdî hinekî dikin ku li ser xwe herîne bi ber bêndran de û vegerihin. Her weha hinekî li ser xwe bi gerihin. Ew ji wilo dikin. Deme ku ji malê derdikevin, êdî didin rex hevdû û bi hev re diçûne bi ber bênderan de. Hinekî ji ber ku li ser xwe bi gerihin. Piştî ku ji malê derdikevin, êdî ku hinekî bi gerandinê ji malê dûr dikevin, êdî mirovên ku bi mîr re ne, dibînin ku wa hinek mirov wê bi bilez wê bi ber wan ve tên. Deme ku Mîr û mirovên ku pêre ne, vê yekê farq dikin, êdî di cihê xwe de dimênine sekinî haya ew mirovên ku bi ber wan ve tên, da qana bigihine wan. Deme ku ew tên û digihine wan, êdî yê ku pêşî xwe digihine ber mîr, dibêje ku "mîrê min, ji dûr hatina hinekî sûwarne hata kifşkirin ku bi vir ve tên". Deme ku ji mîr re wilo hata gotin, êdî mîr weke ku were xwe lê hata û li dore xwe meyîzend û got, "bila çend sûwar xwe amede bikin û herin û xwe bigihinênine wan ku ka ew kî ne". Deme ku mîr wilo got, hê ku gotina wê di devê wî de hinekan xwe bi sûwar amede ji kir. Di cih de yê ku amede kirin, hatina ber mîr û piştî ku

mîr got "herin", êdî wan ji dana haspên xwe û weke ku li ber bê bifirin di cih de ji wir dûr ketin û çûn ku xwe bigihênine wan sêwarên ku bi wir de dihatin. Sêwarên ku ji cem mîr çûn, hinekî bilez çûn. Sêwarên ku çûn, ku weke qadarekê çûn, êdî ne bi gelekî re wan xwe gehanda wan sêwaran. Deme ku xwe gehandina wan, êdî dîtî ku wa seyde Xûsrew û mirovên ku pêre ne wê tîn. Deme ku wan wilo kifş kir, êdî di cih de çûn û xwe gehandina wan û xwe bi wan dana nasîn û gotina wan, "win bi xêr hatin" û piştî ew ji tevî wan bûn. Lê sêwarak ji wan sêwarên ku bi ber wan ve çûbû ji cem mîr, di cih de ji wir ji dabû haspê xwe û bilezekê re hatibû ku were cem mîr û xaberê bidiyê de ku ewên ku tîn seyde Xûsrew mirovên ku pêre hatina ne. Deme ku mirov ji cem wan bi rê dikeve û ne bi gelekî re ku xwe digihîne mîr û jê re dibêje ku ewên ku tîn Seyde Xûsrew û yên ku pêre hatina ne, êdî mîr ji bi mirovên pêre ne, dike ku bi ber wan ve herin. Ew ji wilo dikin û bi ber wan ve diçin. Ku ew ji hinekî bi ber wan ve diçin, êdî di nîvê rê de digihîne hevdû.

Deme ku digihîne hevdû, êdî seyde Xûsrew yên ku pêre ne ji, ku mîr û wan mirovên pêre ku bi ber wan ve hatina ku dibînin, êdî ew ji ji haspên xwe peya dibin û êdî bi lingan bi ber wan ve diçin. Ku ew ji peya dibin û hinekî ji dimeşin, êdî digihîne hevdû. Deme ku digihîne hevdû, êdî pêşî silavê didine hevdû û piştî diçina dest û ruyên hevdû. Piştî êdî ku ew tevî hevdû dibin, êdî bi hev re didine rex hevdû û tîn ku werine qasrê. Seyde Avdîrehîmê xaniqî berî hingî mîr Hasanxan dîtîbû û naskiribû. Demekê ji li cem hevdû mabûn. Di wê heyeme de ji deme ku hevdû dîtî, gelekî bi hev ve man. Piştî seyde Avdîrehîmê xaniqî û Seyde Xûsrew ji ji hev cude bi cude Mihamed bi mîr û yên ku pêre ne, dana naskirin. Mihamed, berî hingî, berî ku were wir, mîr navê wî bihistibû. Mirovên ku hatibû bûna Zaxoyê cem Mîr Birehîm ew dîtîbûn û piştî ku vegerehebûn, di civate mîr de ku axiftîbûn ji, bahsa wî pir dirêj kiribûn. Bi wê bahskirinê mîr Hasanxan ji Mihamed bigotîne pir baş û qanc naskiribû. Di serê wî de ew bûbû meraq ji. Hingî xweş û dirêj bahsa wî hatibû kirin, di serê wî de bûbû meraq.

Piştî ku xatir û destên hevdû girtin, êdî bi hev re dana rex hevdû û berê xwe dana qasrê û werin. Mîr û seyde Xûsrew di rex hevdû de li pêşîyê bûn. Seyde Avdîrehîmê xaniqî ji ku Mihamed ji di rex wî de û hê di rex wî de gelek mirovên din heyî û pêre diaxiftin hebûn. Bi hev re diaxiftin û di meşin. Di cihê xwe ku tere dihatina, di rê de rasti gelek mirovan ji dihatin. Yên ku ew rasti wan dihatin û wan seyde Xûsrew di rex mîr de didît, di cih de bilezekê dihatina û xwe digehandina mîr û seyde Xûsrew di gotîne de

”ti bi xêr hatî”. Seyde Xûsrew ew demek bû ku ji wir çûbû. Vêce ji nû ve careke dî hatibû, vegerehe bû. Ew ji xwe re diaxiftin û dimeşîn dihatina qasrê. Bi wê awayê ku pê dimeşîn, weke qadarekê dimeşîn ku werine qasrê. Piştî ku têne qasre û dîkin ku herine mezele rûniştinê û rûnihin. Ku diçine mezêlê û dirûnihin, êdî piştî ne bi gelekî re gelek mirov li civate wan lev digihine hevdû. Ne bi gelekî re bavê Selman Dawid ji tê wir. Hemû bi hev re li civate hevdû dirûnihin. Hin bi hin ji axiftina dibe. Ji xwe ji deme ku gehabûbûna hevdû, bi hev re diaxiftin, hîç navber ne dabûbûna axiftina xwe haya ku hatibûbûna wir. Li wir ji, axiftina navber nadabûbûnê de. Axiftina xwe berdewam kiribûn. Di wê navberê de ji kara xwarinê dihata kirin.

Mîr, piştî ku hatibû hundur, êdî ku li dore wî ku gelek mirov, buhurtibû hundur û li hundur li cihê xwe rûniştibû. Mirovên ku pêre hatibûn û buhurtibûbûna hundur ji, li hudnûrê li dore wî li civate wî rûniştibûn. Seyde Xûsrew bal pir li ser wî bûn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, ji ber ku wî mîr nasdikir û gelek mirovên li wir ji nasdikir, êdî wilo ti beyentî ne dikişand. Ew serbest bû. Serbest diaxift. Ew di nava axiftinan de bû. Mihamed hinekî bêhis bû. Deng jê dervediket. Lê bala mîr ji û mirovên li wir li dore wî ji li ser wî bûn. Pir lê dimeyîzandin. Mihamed, farq dikir ev yek, ku bal wilo mazin li ser wî bûn. Lê bala wî ji li ser Seyde Xûsrew û Seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Car bi car bala wî diçû ser mîr ji. Mîr ji bala wî li ser wî bû. Lê mîr bala wî ne tenê li ser wî bû. Bala mîr li ser Seyde Xûsrew û Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bû. Li wan dimeyîzend û ku diketa derba xwe de ji diaxift bi wan re. Mirovên ku diaxiftina xwe de bigotina xwe gotin diavêtine ser mîr dikirin ku ew biaxivê ji hebûn. Mîr, deme ku her weha axiftin diavêtine ser wî, ne dibû ku ew ne axivî bana. Divî bû ku axivî bana. Ya herî makul ji ew bû. Ew mîr bû. Ku gotina hata ser wî, ne dibû ku wî axiftina ne kiribana. Bi vê yekê, mîr di nav axiftinan de bû. De ne, di civatan de, xosletekî axiftinê ji ew bû ku axiftin avêtibana ser hevdû û hevdû kişandibana axiftinê. Her weha axiftin avêtine ser hevdû û axiftin ji, weke kevneşopîyekê ji bû di civatan de. Ev yek ji zanebûnê dihata zanîn. Di wê heyeme de yên diavêtine ser mîr ji hebûn. Ji Seyde Xûsrew ji û seyde Avdilrehîmê xaniqî di nav axiftinan de bûn. Gotinek ji wî û gotinek ji yê din axiftin berdewam dikir. Seyde Xûsrew ji yên ku pêre hatibûn ji, ji dûr hatibûn. Gelek tiştên wan yên ku jîn kiribûn û gotiban hebûn. Li wir ji, di wê dema ku ew ne li wir bû, gelek tişt hatibûbûna jîn kirin û gelek tiştên ku wê wî hiskiribana hebûn. Di serî de mesele Selman û Gulîzerê hebû. Seyde Xûsrew ji mirovekî ku mazin bû. Gotina ku wî gotibana, wê

weke wê ji hatibana kirin. Baş bû ku ew ji di wê demê de hatibû wir. Ji xwe, meseleyên wilo, ne ku mirovên wilo ban me wê hesanî hatiban çareser kirin. Vêce ew ji nahaka li wir bû. Êdî ew ji wê xwediyê gotinê bana di çareser kirinê de. Civate wan ji êdî hin bi hin di axiftinê de germ dibû. Bi gotinek ji wî û gotinek ji yê din, nîqaş zêde dibû. Hin bi hin ew mesele ji dikir ku were ser zimên.

Seyde Xûsrew, ji ber ku ew hatibû, êdî wê êvarê mirovên ku wê hatiban civate êdî hema bêja hemû hêdî hêdî bidest hatine dikirin. Hin bi hin civat mazin dibû. Jin ji dihatin. Jin û mêr bi hev re dihatin. Piştî ku seyde Xûsrew û ew hatibûn û li qasrê rûniştibûn û ku hinekî ketibûn nîqaşê de, piştî êdî dem hatibû ku sofere xwarinê li ber wan bê vekirin. Piştî êdî ne bi gelekî re êdî sofere şive ji hata vekirin li ber wan. Sofere ku bi hinekî re li ber wan hata vekirin, êdî piştî ku vekirin temem bû, bi hev re xwe li dore sofere dana hevdû û li ser rûniştin û biafiyet bidest xwarinê kirin. Deme ku bidest xwarinê kirin, di wê heyeme de zêde wilo ti deng û meng ji wan dernediket. Lê ku hinekê di xwarinê de pêde çûn, êdî hin bi hin gotin bi gotin ji bana, dengin derketin. Dengên ku derketin ji, dengê mîr û seyde Xûsrew û çend mirovên mazin yê navserî xwe bûn. Hin bi hin li ser xwarinê deng ji her weha derketin. Mihamed ji, bala wî li ser seyde Xûsrew û seyde Avdîlrehîmê xaniqî bû. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî deme ku axiftin dibû tevî axiftinê dibû. Ew ji diaxift. Lê bi zêdeyî di wê heyeme de bal li ser Mîr û seyde Xûsrew bû. Mirovên bala xwe dabû ser wan. Li wan dimeyîzend. Li devê wan di meyîzend. Li gotina ku ji devê wan derdiket dimeyîzend.

Seyde Xûsrew, pir xweşik diaxift. Her gotina ku ji devê wî derdiket ji pir bi zane derdiket. Mirovên li dore wî ji bala wan li ser wî bû. Ew ji diaxift. Ji axiftinê taqsîr ne dikir. Pir bizane bû û hertimî dixwest ku zanebûna xwe bi mirovan re hevpar bike. Ev aliyê wî ji aliyê mirovên ku wî nasdikirin ve dihata zanîn. Bahsa wê ji dikirin. Seyde Xûsrew, piştî ku rûniştibû, êdî ji çûna xwe haya hatina xwe çî tiştên ku hatina serê wî û dîtina ji mirovên li dore xwe re divegot. Bi mîr re mirovên li dore wî pir bi bal lê dihisandin. Pir bala xwe didane de. Mihamed ji di wê heyeme de hem li dore xwe li axiftinên ku dihatina kirin dihisand û hem ji dohnê xwe dide dore xwe li mirovên li dore xwe dimeyîzend. Dohnê xwe dide mîr ji. Mîr ne mirovekî ku bêzan dihata xuyakirin. Deme ku dohnê xwe dayê de hinekî bala wî ma ser wî û lê meyîzend. Mîr di wê heyeme de weke ku heya wî ji wê meyîzendina Mihamed ne bû. Diaxift. Li seyde Xûsrew dimeyîzend û diaxift. Lê heya hinek mirovên din ji wê meyîzendina Mihamed hebû. Ji ber

ku hin bal bi hey li ser wî bûn. Deme ku wî dohnê xwe dabû ser dore xweû mîr, wan ji dohnê xwe bi bal û hey dabû ser wî. Her weha li wî meyîzendibûn. Mihamed, deme ku hinekî li mîr meyîzendibû û piştre bala xwe ji ji ser wî qut kiribû û biribû ser dore xwe, êdî wî ji hinek ji wan balên li ser xwe dîtibûn û farq kiribûn. Deme ku wî dîtibûn û farq kiribûn, êdî wî ji bala xwe hinekî biribû ser wan mirovên ku bala wa li ser wî bû û piştre bala xwe dabû ber xwe. Lê deme ku wê bala xwe dabû ber xwe, zêde wilo bala wî li ber wî ne nema bû. Mirovên ku bala wan li ser wî bû, berê xwe dabûn wî û kiribûn ku pêre bikevine axiftinê de. Piştî ku berê dabûnê de êdî ketibûbûna axiftinê de. Mihamed û ew ketibûbûna axiftinê de. Pêşî, deme ku ketibûbûna axiftinê de, hinekî bi gotinne axiftibûn. Lê piştre hinekî axiftina wan mazin bûbû û piştre hin balên din ji çûbû bûn ser wan di wê heyeme de. Bala seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji çûbû bû ser wan. Seyde Avdilrehîmê pir bala xwe dide Mihamed. Heya wî pir li ser Mihamed bû. Deme ku Mihamed ketibû axiftinê de, êdî bala wî ji çûbû ser wî. Li wî meyîzendibû. Mihamed, deme ku axiftibû û hinekî dirêj axiftibû di wê heyeme de, kiribû ku bala mirovên li dore hema bêja bigîştî were ser wî. Piştî ku Mihamed hinekî axiftibû û piştre mabû sekinî, êdî bal dîse ji ser wî qut ne bûbûn. Bala mîr li ser wî mabû. Mîr, bala dabû ser Mihamed û ji ser wî qut ne dikir. Mîr pir li Mihamed dimeyîzend. Mîr berî hingî navê Mihamed bihîstibû. Vêce di wê heyeme de ew li ber wî bû û lê dimeyîzend. Li ser vê yekê, wî bala xwe ji ser wî qut ne dikir. Li ser xwarinê, mîr gih diaxift û gih dohnê wî li dore wî bû. Li dore xwe dimeyîzend. Li Mihamed ji dimeyîzend. Piştî axiftina Mihamed re pir bala wî çûbû ser Mihamed û lê dimeyîzend.

Wê rewşê, haya ku xwarina wan berdewam kir, domand. Piştre ku wan xwarina xwe xwar, êdî ne bi gelekî re sofre wan ya xwarinê ji ber wan hata lihevdan. Piştî ku sofre hata lihevdan, piştre êdî ku şîreniyên wan hatin û wan şîreniyên xwe ji xwarin û vexwartin. Piştî xwarinê re, êdî weke ku hinekî xwe berdan bibe li wan hat. Herkesekî xwe di cihê xwe de berda. Weke kêlikêkê ti axiftinên wilo mazin û dirêj di nav wan de ne bûn. Lê gotin bi gotin ji bana, hin mirovne di nav xwe de diaxiftin. Dengên wan dihat. Mirovên ku di rex seyde Avdilrehîmê xaniqî de bûn, jê di pirsîn û wî ji bi bersivên kin bersiv dide. Seyde Xûsrew ji hinek weke qadarekê di cihê xwe de bêdeng ma. Piştî ku her weha hinekî bêdeng ma, piştre êdî hin bi hin ku axiftin bûn û deng hatina wî, êdî wî ji kir ku tevî axiftinê bibe. Lê seyde Xûsrew hinekî dihizirî. Di wê deme berî wê demê de di deme axiftinê de navê Selman hatibû rojeve wan. Lê mesele ne hatibû

rojeve. Wê yekê ji bala seyde Xûsrew kişandibû. Dibêt ku ew bêdengiye wî ji ber hizirkirina li ser wê bû. Pir bêdeng mabû. Ew mazin bû. Biqasî mîr bal li ser wî ji bûn. Bêdengbûna wî bala mirov dikişand. Deme ku ew bêdeng ma, hingî, ne mumkun bû ku bala mirovên li dore wî ne kişandibana. Ji xwe, di wê heyeme de, deme ku ew bêdeng mabû, bal çûbûbûna ser wî ji. Lê çend ku bal çûbûbûna ser wî ji, deng ji ti kesekî derneketibû. Yê ku bala wan çûbû ser wî, deynekiribûn. Weke ku li bendî wî gotinekê bûn ku ew bike. Lê ew ji bêdeng bû. Dihisand û dihizirî.

Gelo li ser çî seyde Xûsrew wilo bihazn dihizirî. Ew yek di wê heyeme de ne dihata kifş kirin. Berî hingî ew ji di nav axiftinan de bû û pir ji bi gotin bû. Lê di wê heyeme de bêdeng bû. Ew bêdengbûna wî bala mirov dikişand. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bala wî hinekî li dore wî bû diaxift. Weke qadarekê her weha bala wî li dore wî bûbû û axiftibû. Piştre ku hinekî dem têve çûbû, êdî wî ji bala xwe li dore weke ku gerandibû. Deme ku wî bala xwe li dore xwe gerandibû, bala wî çûbû bû ser seyde Xûsrew ku wa ew hinekî di cihê xwe de bi bêdeng e. Ji ber çî bi bêdeng bû? Ne kifş bû. Lê bi bêdeng bû. Ev yek, ku hinekî dem têve çû, pir bi bal hata ber çavan. Mirovekî weke seyde Xûsrew demekê bêdeng di civatê de bimêne, ne mumkun bû ku bal ne kişandina ser xwe. Piştre ku hinekî dem têve çûbû, êdî bitimî bal çûna ser seyde Xûsrew. Lê her ku bal çûna ser ji, ti kesekî ne kir ku jê bi pirsê an ji bêne ser ziman ku ew bêdeng. Ku her weha hinekî dem têve çû, êdî ku ew bêdeng bûna wî ji aliyê herkesekî hata kifş kirin, êdî yê ku jê pirsî ku ka çûna bêdenge seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî jê pirsî ku ka çima bi bêdeng e. Deme ku her weha seyde Avdilrehîmê xaniqî pirsî, êdî bala mirovên li dorê hemûkan ji çû ser wî ku ka wê çî bersivê bide. Seyde Xûsrew ku jê hata pirsîn, êdî ku hinekî dî bêdeng ma sekinî, êdî axift û bersiv da. Deme ku bersiv da ji, hinekî dirêj axift. Got ku hinekî li ser demên buhuriya hizirîya. Bi vê gotinê re, çend gotin li ser demên xwe yê ku li Zaxoyê buhurandibûn ji anî ser ziman. Bahsa wan demên ku xwe yê ku li wir buhurandi bû ji kir. Piştre deme ku kir ku axiftina bidawî bike û bimêne sekinî, weke pirsêkê wî ji li wî mirovê ku bahsa Selman kiribû li wî kir û pirsî ku ka çima bahsa Selman kir. Seyde Xûsrew bi vî awayî bi pirsêkê axiftina bidawî kir. Lê deme ku wî axiftina bidawî kir, êdî bêdengbûnak çûbû. Yê ku bahsa Selman kiribû, divî bû ku wî bersivek ji şêx re dabana. Lê ew ji ma sekinî. Li mîr meyîzend û ma sekinî. Yê ku bahs kiribû, ew ji mirovekî ku navserî xwe û mazin bû. Navê wî Yusif bû. Jê re Yusifê Hisên ji dihata gotin. Ew ji hertimî li cem mîr û seyde Xûsrew wan bû. Pîr

ji bû. Kengî civataka mîr bûbû ew lê amede bû. Ew ji her weha mazin bû û navdar bû. Deme ku wî bahsa Selman kiribû, bala seyde Xûsrew kişandibû. Piştî di serê wî de mabû. Di wê heyeme de ji wî pirsî bû. Lê li ber pirsîna wî bédengbûn çêbû bû. Piştî ku her weha hinekî bédengbûn çêbû, êdî yê ku ew bédengbûn xira kir û axift mirovekî din yê bi navê Salih bû. Salih ji pîr bû. Rêze mîr ji û mirovên li wir hemûkan lê hebû. Li ber wî herkesek bi rêz bû. Salih mirovekî ku pir bizane ji bû. Di ciwanîya xwe de wî pir mêrantiyên mazin kiribûn. Di wê heyeme de pir pîr bû. Lê hê ji ji wan kîrên wî yên ku wî kiribûn dihata axiftin. Li cem mîre mazin ew ketibû pir şeran de. Piştî ku mîre mazin çûbû ser dilovaniya xwe, êdî piştî mîre biçûk weke mazinakî xwe lê xwedî derketibû û di civate xwe de li nêzîkî xwe dabû rûnandin. Hertimî ji ew li cem wî dirûnişt. Deme ku Salih axift û bahsa meselê kir. Wî mesele çawa ya bahs kir. Di dawiyê de hizre xwe ji wî ji anî ser ziman û ma sekinî. Piştî ku ew ma sekinî êdî bédeng bûn çêbûn û bal çûna ser Seyde Xûsrew û mîr ku ka ewê çû bertekê bidine nîşandin. Piştî Salih axiftina bidawî kir, piştî bi bêhnê re êdî seyde Xûsrew kir ku mafê axiftinê hildê û ku biaxivê li ser meselê. De ne, Salih deme ku axiftibû pir xweşik û dirêj anîbû ser ziman. Ji axiftina wî, yên ne bizanebûn ban ji di derbarê meselê de, pir baş bizanebûn bûbûn. Seyde Xûsrew ji her weha pir baş bizanebûn bûbû. Piştî ku bizanebûn bû bû û hinekî hizirî ji bû, êdî kiribû ku biaxivê û hizrê xwe ew ji bêne ser ziman di wê heyeme de.

Seyde Xûsrew mirovekî ku mazin bû. Wî wê çî gotibana pir girîng dihata dîtin. Baweriya mirovên li dore wî ji lê hebû ku ya rast çî û çawa ya, wê ew wê bêne ser ziman. Her weha ji wî bi bawerbûn hebû. Mîr di cihê xwe bédeng mabû. Piştî seyde Xûsrew hinekî bédeng ma û hizirî êdî piştî mafê axiftinê û her weha axift:

‘de ne, ya rast çî divêt ku ew bê kirin. Deme ku ya rast hata zanîn û ne hata kirin, hingî heya ku xwûde ji mirove afû neke. Ji ber vê yekê divêt ku mirov ya rasti kifş bike û bêne ser ziman û bike. Deme ku çûma Zaxoyê sersaxiya şêxê meyê mazin mele Serherngê zaxoyî, li wir ez hinekî hizirîm, deme ku ez hizirîm ji hinek kirinên ku min û wî bi hev re kirina hatina bîre min. Deme ku hatina bîre min ji ez li ser wan pir hizirîm. Di wê heyeme de ku ez dihizirîm de mîr Birehim, de ne, win nasdikin, wî ji min pirsî ku ew gelekî hizirîm û li ser çî. Mîr Birehim mirovekî qanc û baş bû. Ne dibû ku min bersive wî qancî ne dabana. Min ji bersive wî da û min got ez li ser demeke ku ez û mele Serhengê zaxoyî li hevdu rûniştibûn û em di nav xwe de diaxiftin û pir di axiftina xwe de kur çûbûn li ser dihizirîm. Deme ku min wilo Mîr Birehim re got, êdî wî ji weke zanistekî berê xwe da min û

gote min, ew mirovekî ku pir mazin bû. Wî di nav mirovan de hertimî rasti dianî ser ziman û dixwest ku bi wan bide fahmkirin. Bi vê yekê, ew mazin bû. Li ser vê rastteqînîyê, ez bêjim, divêt ku em rastiye ji qancî bênine ser ziman. Rasti ji qancî di cih de ya. Em mirovên li wir hema bêja hemû ji vê yekê zanin. Vêce emê nahaka li vir ji li gor vê yekê tevbiherihin û rasti çiya kifş bikin û bênine ser ziman û wê herkesek ji li gor wê gava xwe biavêje. Em mirov in. Em di jîyanê de ne. Rasti, wekî ku em di jîyanê de ne, xwe xwûde ji bi me re bi wate kiriya. Kirinek ji kirina xwûde ji ev yeka ya. Divêt ku ev yek baş û qanc were fahm kirin. Jin û mêr xwûde ji bo hevdu xuluqandina. Pêşîyên me gahana wê têgihîştine ku mirov ew hemû ji av û axê çêkirina'..

'Deme ku mirovan xwe haşa di kira cihê xwûde de, hingî, xwûde rastiya şanî wan da. Ew rasti ji her weha hebûna xwe ya li ser wan re bû. Bi vê yekê re, mirov êdî têgihîştin ku ew ne xwûde ne. Lê ew hebûna xwe ya ku şanî wan da ji çawa bû, divêt ku mirov wê ji bêne ser ziman. Ew ji her weha hebûna mirov ya li ber xwezayê û li bûyînen dervî vîne wî bûn. Bi wan xwûde gote mirov, "ez hema û li ser were me, hemû tiştî ez diafirênim". Xwûde birehîm xelîl ji bo ku vê ji mirovan re bêne ser ziman û bêje şand. Pêxambertî da wî. Hingî mirovan bawerî pê ne anî. Lê xwûde hingî hin xazabne mazin anîna serê wan. Piştê fahm kirin. Piştê hatina ser rê û ew nas kirin. Pişt wî re Yusif bû. Ew cihê ku Nebî Nuh li wir veşartiya li wir jîn bû. Ew xwûde xweşikatiya ku mirovan hemûkan hema bêja biqasî wê da wî tenê. Ew pir xweşik bû. Xatuna melik Zuleyxa çav berdayê de. Lê Yusif tenê aşqa wî bi xwûdayê wî re bû. Dibêjin ku xweşikati şahwatê ji di xwe de dihawane. Deme ku Zuleyxê çav berda wî, dibêjin ku ev yek piştê çû guhê melik. Melik, piştê deme ku xaber hilda, êdî di cih de bilezê çû mezele Zuleyxê. Di wê heyeme de Yusif ji, wê bi hinek cariyên xwe bakiribûyê de û ew ji li wir bû. Lê deme ku Yusif dît ku wa melik hat, êdî bilezê kir ku ji mezelê derkeve. Zuleyxê dibêjin ne xwest ku ew derkeve, jê re bû asteng. Lê deme ku melik gaha devê derî, Yusif kir ku xwe ji nav lapên wê xilas bike, û bi ber devê derî ve bazda. Lê li devê derî ew û melik gahana hevdu û êdî firsand jê re nema ku herê. Melik, dibêjin jê pirsî ku ma ka çî karê wî li wir heya. Wî ji dibêjin ew bersivkir û got ku xatun Zuleyxa bakirina min bi hin cariyên xwe. Lê dibêjin ku Zuleyxa ew xaberdan wî xwest ku li virê derxe. Melik kir ku ji Zuleyxa bawer bike. Dibêjin ku Yusif li wir ma di zorê de. De ne ku xwûde hertimî tiştên ku dibin dibîne û zane. Wî ew ji dîtibû û zanibû. Dibêjin ku li ber melik di wê heyeme de zarokak (pitik) pêçekê li wir hebû di dergûşa xwe de. Di bêjin

ku ew zaroka di pêçekê de di wê heyeme de xwûde bi ziman kir û axift bi melik re weke mazinakî. Melik li wir ma şaş û mat di cihê xwe de. Dibêjin, deme ku ew zaroka pêçekê bi ziman bû, hingî gote melik ya rasti çiya ya ku xwûde zane ya. Ji ber vê yekê li gor ya xwûde bike. Dibêjin ku melik ji ji zarokê pirsî ku ya rasti çiya û wê çawa bê fahm kirin û têgihîştin. Dibêjin ku zarokê ji melik re got ku li Yusif meyîzenê, nahaka cila li ser wî meyîzena. Ku ti cila li ser wî ji pêşve qatahî bibîne, hingî, di karê bêje ku Yusif bi nêhteke ne baş hatiya mezele Xatun Zuleyxa yê. Lê meyîzene ku ji paş ve qatahî bê, hingî ji, fahmbike û xatun Zuleyxe yê bi nêhteke ne baş ew xwestiya mezele xwe û ew nahaka li vir bê gunaha. Di bêjin ku deme ku zaroka pêçekê wilo got, êdî melik li cila ser Yusif meyîzend û dît ku wa ji paş ve qatahî ya. Êdî dibêjin ku bêgunahiya Yusif di wê heyeme de di cih de derkete hole û ew bêgunah bû. Rastî û rastteqîni ji hingî bi wî awayî derkete hole. Vêce nahaka tişte ku em ji vê gotinê li wir derxin ji ewê ku ya rasti çiya em derxina hole û fahm bikin û bicih bînin. Ji bo ku em bi ser ve werin bila hertimî ji sabra Eyûb ji di bîre me de be´..

Min biqasî ku ji Salih fahmkir van herdû zarokan hij hevdû kiriya. Lê haya nahaka haya ti kesekî ji wan nîne. Selman ez bixwe ji nasdikim. Feqihê min e. Li cem min maya. Xwûde heya û divêt ku mirov rastiye bêne ser ziman. Ew kurikekî paqij û jîr e. Min ji gelekî hijê kiriya. Di hilmê ku ji me girtiya de ji li pêş e. Wê hê ji pède herê. Kî çiqasî karê pède herê wê xwûde riya wî veke. Ew ji wê xwûde riya wî veke. Vêce ya rastî ewê ku em nahaka bi navê xwûde ji wan herdûka ji bi pirsîn careke din, ku hij hevdû dikan, ya ku dikeve ser milê me ji ewê ku em wan bigihênine hevdû bi rastiya xwûde´..

Seyde Xûsrew her weha weke demekê dirêj axift. Hê ji axift. Hê ji demeke dirêj axift. Di axiftina xwe de bahsa pir tiştên din ji kir. Her ku ew diaxift, mîr û mirovên li dore wî hemû ji lê bi hey dihisandin. Piştî ku ew hinekî dî ji diaxivê, êdî piştî axiftina xwe ew ji bidawî dike û dimêne sekinî di cihê xwe de. Deme ku ew dimêne sekinî, hingî, bédengiya li wan serwer dibe. Piştî bi qadarekê re yê ku wê bédengiyê xira dike ji Mîr bixwe ya. Mîr ji dibêje ji civatê re, `ya rast seydeyê min got, ya ku dikeve ser milê me de li gor wê gav bê avêtin bicih bê anîn´. Mîr deme ku her weha hinekî diaxivê, êdî piştî ji cihê xwe, berê xwe dide mirovekî ku hertimî li ber destê wî bû û hertimî di nav civatê wî de suxratiya wî dikir û mîr ji pir hijê dikir û lê bi bawer bû û navê wî Rêzan bû meyîzend û gotiyê de `hisand û fahm kir. Herê û fêr bibe ku ka hizre zarokan çiya`. Deme ku mîr wilo got êdî Rêzan ji di cih de ji cihê xwe rabû û ne sekinî û çû derve ku hizre

Gulîzerê û Selmên fêr bibe û were ji mîr û ji civate wî re bêje. Piştî ku Rêzan ji mezele derket, êdî weke ku li bendbûnek çûbû bi miorvan re. Lê di berde ji mirovên ku weke ku dixwestin ku bi axivin ji hebûn. Seyde Avdîrehîmê xaniqî di deme ku Seyde Xûsrew û mîr axiftibû ji pir bi bal li wan hisandibû. Piştî ku Rêzan ji cihê xwe rabû û çû, êdî wî ji weke ku xwest ku du an ji sê gotinan bêje xwe di cihê xwe de xwe adiland û kir ku bi axivê. Deme ku wî wilo li xwe kir, êdî bala civatê hema bêja bigiştî çû ser wî di wê heyeme de. Piştî ku bal çû ser wî, êdî wî ji ku xwe di cihê xwe de xwe adiland, êdî di cihê xwe de bidest axiftinê kir. Deme ku ew axift, bi balaka mazin lê dihata hisandin. Ew ji ji Seyde Xûsrew xwere ne axift. Ew ji di asta wî de axift. Weke wî bizane û mazin axift. Piştî ku seyde Avdîrehîmê xaniqî her weha weke qadarekê axift, êdî piştî wî ji axiftina bidawî kir. Wî di axiftina xwe de li ser rastiye û di axiftinê de xwe gahandina rastiye rawastaha bû. Piştî wî axiftina xwe bidawî kir, êdî piştî wî re di cih de seyde Xûsrew mafê axiftinê careke di hilda û çend gotin li ser wê hizre Seyde Avdîrehîmê xaniqî ji anî ser ziman. Wê naqlê ji, Seyde Xûsrew wilo xweşik axivî bû, kiribû ku mirovên ku li wir di civatê de bûn bêjin rehma li dê û bavê te bê. Piştî re mîr ji çend gotinên din gotin. Piştî wî re ji hinek mirovên ku li wir civatê de bûn û pir navserî xwe bûn û pîr bûn û rêzekek mazin ji wan re hebû mafê axiftinê hildan û axiftin û wan ji çend gotin di civatê de li ser meselê anîna ser ziman. Wan ji bahsa qancî û rastiye kir. Li ser rewşê, ku bi riyaka başa wê bigahana çareseriyê axiftin. Wan ji weke seyde Avdîrehîmê xaniqî li ser rastiye û qanciyê axiftin û her weha gahana çareseriyê rasti dîtin û pîrozkirin. Bi wî awayî di nav wan de weke qadarekê axiftin bû. Piştî ku qadarekê têve çû, êdî dîtin ku wa Rêzan ji wa hat û wa Selman ji di rex wî de ya. Ku herdû bi hev re ketine hundur de êdî bal çûna ser wan. De ne, bi rasti ji Seyde Xûsrew pir hij Selman fikir. Deme ku hatina hundur bidengekî bilind wî got, "ka werin, li nêzikî min rûnihin". Deme ku wî wilo got êdî ew ji bi hev re ku di rex hev de li nêzikî wî rûniştin. Deme ku rûniştin, êdî Rêzan pêşî kar kir bahsa gotinên ku Gulîzerê bi riya dayika xwe ji wî re anîna ser ziman, bike û piştî ji Selman ku wê tiştêk hatibana pirsîn êdî wê jê bihatana pirsîn.

Deme ku rûniştin, piştî ne bi gelekî re êdî seyde Xûsrew mafê axiftinê girt û ji Rêzan pirsî ku ma Gulîzerê ji dît. Deme ku wî jê pirsî, êdî wî ji bersiv da wî û piştî Rêzan her weha li ber wî axift:

"Weke ku di dilê seydeyê min di buhurê min kir. Ez deme ku ji vir çûm, ez çûma cem dayika Aysexanê û min meselê jê r vekir, wê ji deme ku min jê re mesele anî ser ziman, êdî ji cem min vaqataha û çû ku herê

cem Gulizerê û hizre wê fêr bibe. Di deme ku ne zêde kin de ew çû û hat. Deme ku hat wê ji min re got ku *Gulizerê ji min re gotiyê ku dilê wê ji heya*. Deme ku dayika Ayşexanê wilo ji min re kir û piştîre gote min, herê û Selman ji bibîne û bi xwe re bibe nav civatê, bila ya wî ji rastiye ji devê wî his bikin. Ya rast ev e. Deme ku wê wilo ji min re got û rê şani min da, êdî min di cih de dem winda ne kir û ez çûm ku Selman bibînin û werênime vir. Min ew li malê dît û di cih de bi xwe re anî. Va nahaka ew ji li vir e”.

Deme ku Rêzan wilo got, êdî piştîre seyde Xûsrew piştî axiftina wî re mafê axiftinê careke dî girt û pêşî spasî ji Rêzan re kir û piştîre li Selman meyîzend û kir ku jê bi pirsê. Ku hinekî ma piştîre seyde Xûsrew jî Selman re got, ” de ne, te gotina Rêzan ji his kir, vêce ti zane ku ti nahaka ji ber çî hatî vir, ka tê çî ji me re bêje?”. Deme ku wî wilo got, êdî Selman hinekî ma sekinî û piştîre kir ku bi axivê û piştîre êdî ku xwe di cihê xwe de adiland êdî her weha li ber civatê ji civatê axift;

De ne, seydeyê min ji min nas dike. Zane ku ez çawa me û çî ma. Divêt ku win mirovên mazin û zana hemû ji zanibin û bila mîrê min ji zanibe ku ya dilê safî ya. Lê ez vê yekê bêjim, berî nahaka min û Gulizerê du caran hevdû dît. Wî di dilê min cih girt. Lê di herdû caran de ji ji bo ti kalmaman newine ser wê û rûmete mîrê min, min ne kir ku herime cem wê. Lê di cara dawiyê de jineke pîrebî û navê wê win ji zanin ku Mendê ya em li hevdû dîtî û piştîre got ku ”min ew bi hev re dîtine”. Vê gotinê min ko êşand”. Mîrê min, hertimî weke taça serê mine. Ma qey ezê bihêlim bi zanebûn ku gotinek were ser navê wî. Va ya ez li vir im, serê min ji li ber mîrê min ji li ber mîrê min amede ya”.

Piştî ku Selman ev gotin ji civatê re gotin, piştîre ma sekinî û bêdeng. Di wê heyeme de bala mîr ji bi hey li ser wî bû. Li wî dimeyîzend. Weke mîr, mirovên ku li wir rûniştî bûn, bala wan ji bi hey li ser wî bû. Bala wî Dawid ji li wir bû. Bala wî ji li ser wî bû. Lê ti gotin ji devê wî dernediket. Di wê heyeme de yê ku bigotin bû û mirovên di civatê de li devê wî dimeyîzend seyde Xûsrew bû. Mîr ji bala wî li ser wî bû. Ew di wê heyeme de bi bêdeng bû. Ti deng û sahl ji wî ji dernediket. Wî ji tenê li seyde Xûsrew dimeyîzend ku ka ew wê çî bêje. De ne, seyde Xûsrew pir mirovekî ku rêzdar bû. Herkesekî bi mîr ve ji jê re rêz digirtin. Di wê heyeme de deme ku Selman ew gotin ji wan re li ber wan gotin û ma sekinî, piştîre qadarekê re seyde Xûsrew mafê axiftinê wergerti û li ber civatê li ser mesele bidest axiftinê kir. Mirovên li wir ji, deme ku dîtî seyde Xûsrew ji ber axiftinê xwe kar kir, êdî bala wan bi hey çû ser wî û guhê xwe danê de. Mîr ji di wê heyeme de di cihê xwe de bi bêdeng bû. Ew ji deng jê dernediket. Bêdeng

bû. Deme ku seyde Xûsrew ji bo axiftinê xwe kar kir, êdî bala wî ji weke ya mirovên li dore wî çû ser wî. Wî ji li wî meyîzend. Seyde Xûsrew piştî ku Selman axiftibû, hinekî hizirbû. Piştre kar kiribû ku biaxivê ji civatê re li ser meselê. Piştî ku hinekî hiziribû êdî kiribû ku bpeyivê. Mirovên li dore wî ji ev yek pêre farq kiribûn. Ji ber vê yekê ji, bala wan bi hey li ser wî bû. Wan ji di serê xwe de hizir dikir ku seyde hinekî hizirî, piştî wî hizirkirina xwe re wê çî bêne ser ziman. Her weha bala wan li ser wî bû. Seyde Xûsrew ku kar kir ku bi axivê, êdî piştre li ber mirovên li dore xwe bidest axiftinê xwe kir. Deme ku bidest axiftina xwe kir, berî ku bi axivê, pêşî bi avirekê li mîr meyîzend û piştre kir ku biaxivê. Mîr deme ku seyde Xûsrew avir dayê de farq kir. Piştî ku farq kir, êdî bala wî ji bi hey çû ser wî ku ka wê di axiftina xwe de çî bêne ser ziman. Seyde Xûsrew, ku bidest axiftina xwe kir û axift, her weha axift ji civatê re:

Rêzan çû û gotine Gulizerê ji û selman ji anî ji me re. Me li herdûyan ji hisand. Ya rasti û rastteqîni ewê ku rastî çî ya were fahmkirin. Li vir di vê heyeme de li gor min hata fahmkirin. Ya ku hata fahmkirin, va herdû zarokan dil daya hevdû. Asasê ozê mesele ji ev e. Divêt ku em vê fahm bikin. Ew ne bi nêhteke xirab in. Me ev yek nahaka li vir fahm kir. Vêce ku du dil di xwe de gahabina hevdû, ya li me mazina ji dikeve, ewe ku em li gor wê û rastiya wê tevbigerihiin. Vêce va mîrê me ji li vir e. Wî ji his kir. Li ber wî ji gotin hatina gotin. Ya rast ku ez ji dibînin, ewe ku em van zarokan bigihênine hevdû. Bila rastteqîni cihê xwe bibîne'.

Piştî ku Seyde xûsrew her weha got û ma sekinî, piştre mîr ji mafê axiftinê pişt wî re di cih de girt û axift û her weha got; 'seydeyê min rast got, ez ji rastiya ku wî anî ser ziman di pejirênim. *Bila bi dil xweşî bê!*'. Deme ku mîr wilo got, êdî herkesekî wilo fahmkir ku mîr weke ku seyde Xûsrew da têgihîştin ku ew bila bigihine hevdû, wî ji erê kir. Herkesekî wilo fahm kir. Piştre ku hinekî dem têve çû, êdî piştre mîr û Dawid li ber hevdû di nav civatê de rabûna ser xwe û çûna ber hevdû û hevdû himbêz kirin. Ku ev bû, êdî hata têgihîştin, tişte ku hatibû fahm kirin rast hatiya fahm kirin. Deme ku ew rabûna ser xwe, êdî seyde Xûsrew ji bi wê pîrîtiya xwe bi wan re rabûbû ser xwe. Ew ji bi wan re çûbû dest hevdû. Piştî ku her weha çûna dest hevdû bû û piştre ku xilas bû û mîr û Dawid û Seyde Xûsrew bi hev re careke dî rûniştin, êdî piştre ji aliyê Rêzan ve hata gihandin li derve. Xaber çû ji Gulizerê û dayika wê re ji. Piştre êdî bi hev re şahî kete dilê herkesekî de.

Seyde Xûsrew ji pir kêfxweş bûbû. Ji ber ku wî pir hij Selman dikir. Selman hema bêja li ber destê wî mazin bû bû. Ji biçûkatiya xwe ve Selman

li ber destê wî dixwand. Di wê heyeme de Selman mazin bû û ciwanekî xurt ji jê derketibû. Hê ji li ber destê wî bû. Hê ji li cem wî bû. Ku civat an ji dîwanên seyde Xûsrew li dergaha wî çêdibûn Selman ji amede bû. Ew hertimî amede bû. Bi vê yekê, hertimî di dilê seyde Xûsrew de bû. Hertimî li ber çawaên wî bû. Di civate mîr de ji gelek caran ew li cem Seyde Xûsrew rûniştibû û di civatê de axiftibû. Selman ji ber ku ciwanekî bifahm bû, di wê temenê xwe de pir bi zane bû bû.

Piştî ku di civatê de her weha gabûna biryarakê, êdî pir kêfxweşî çûnû bû. Mirovên ku di axiftin, ji mîr re digotin, "tê rast kir û li gor mazinatiya xwe kir". Piştî biryarê, êdî di civatê de ji axiftin bû ser wê meselê, êdî ji xweşî bahsê dihata kirin. Êdî geşbûnak bi awayekî din çêbû bû. Rewşeke nû di wê heyeme de afirî bû. Piştî ku mîr daxiftina xwe de gotibû "bila bi dil xweşî bê", êdî herkesekî fahm kiribû ku mîr biryara xwe ya erênî da di meselê de. Piştî ku careke di axiftin bûn, êdî hingî careke di mîr axift û mîr bahsa wê dema ku di derbarê wan de gotina hatina guhê wî kir. Li ser wê hinekî nexweş bû bû. Lê mirovên wêderê herkesekî ji Gulizerê ji û Selman ji nas dikir. Herdû ji, mirovên wêderê herkesekî zanibû ku çend bi rêz û hûrmet û edebin. Ji ber vê yekê, yên ku li ser wan axiftibûn ji, ne bi xirabî bi qancî axiftibûn. Yên ku ji mîr re bahs kiribûn bi wî awayî bahs kiribûn û anîbûn ser ziman.

Piştî ku her weha meselê bixweşî bi dawî bû, êdî dilê herkesekê li wir xweş bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji haya wê demê li ser meselê zêde ti axiftin ne kiribû. Lê piştî ku li ser hata axiftin û ew ji li ser meselê pir baş serwext bû, êdî wî ji axiftin kir û hizre xwe anî ser ziman û got ku pir rast hata kirin. Wî ji li mîr meyîzend û pêre axift û gote mîr "ti li gor mazinatiya xwe tevgerheyî. Mihamed ew demek bû ku li wir di cihê xwe de bi bêdeng bû. Piştî ku seyde Avdilrehîmê xaniqî axift, piştî wî ji mafê axiftinê girt û hzire xwe anî ser ziman û got ku pir rast hata kirin. Wî ji her weha bi wî awayî taqdirê xwe anî ser ziman. Seyde Xûsrew, piştî ku ew axiftin, êdî wî dise mafê axifti wergirt û axift û bahsa wî û demên xwandinê kir. Li ser demên biçûkatîya wî kir. Seyde Xûsrew weke demekê her weha dise di axivê. Piştî ku weke demekê diaxivê, piştî êdî dimêne sekinî û mafê axiftinê dide yên li dore xwe û dike ku ew biaxivin. Miorvên ku li dore wî bûn, hemû yên ku bi temenê xwe bê an ji bi zanebûna xwe bê, yên ku navserî xwe bûn. Baweriya xalkê pir li wan hebû. Civata wan ji pir dirêj berdewam kiribû. Êdî weke ku deme rabûnê dihat. Lê piştî axiftina Mihamed re êdî hin bal çûbûbûna ser wî û hine mirovne dikirin ku pêre bikevina axiftinê de. Mîr ji bala wî li ser Mihamed bû. Deme ku hatibûna

wir, hevdû dabûn naskirin bi hev re. Lê hê wilo zêde li ser hatina ya xwe wir û çûna xwe ya ji wir ne axiftibûn. Muhakka wê ew ji hatibana rojeve civatê di wê heyeme de.

Piştî ku li ser meselê Selman û Gulizerê her weha gahabûna ancama baş, êdî piştê li ser wê di axiftin. Seyde Xûsrew pir axiftibû. Weke ku wî gotibû hatibû çareser kirin. Mirovên li wir ji yên ku navserî xwe bûn. Piştî wî re wan ji hizre xwe anî ser ziman. Wan ji hizre xwe li ser rastbûna ancama anî ser ziman. Seyde Avdîrehîmê xaniqî hizre xwe her weha anî bû ser ziman. Piştî wî re mîr ji û Mihamed axiftibû û hizrên xwe anîbûn ser ziman. Demeke dirêj her weha axiftibûn. Bi wê axiftbûna xwe re êdî xwe di serê xwe de gahandibûn hizreke pir baş ji li ser meselê. De ne, divêt ku divir de mirov bêne ser ziman. Piştî biryara dayînê li ser axiftin ji pir girînge. Ew axiftina ku li ser dihata kirin ji, weke ku çawa ku biryar di nav xalkê de li ser têt axiftin, her weha li ser wê û jê wê hizrê ji têt axiftin.

Seyde Xûsrew, demeke dirêj axiftibû. Piştî biryara dayînê ji gelek carên din ji axiftibû û hizre anîbû ser ziman. Hizre wî pir girîng bû. Xalkê ji û civatê ji pir girîng didayê de. Pir wate didane de. Ji ber vê yekê, mirov karê bêje ku ew mirovekî ku pir mazin bû. Wê ew hizrên wî yên ku hatina ser ziman, wê di nav xalkê de bihatan axiftin, li ser wan. Wê bihatan ser ziman. Wê bi gotan *Seyde Xûsrew ev hizir li ser di civatê de di wê heyeme de anî ser ziman*. Wê pêre her weha ew hizir ji bihatana axiftin. Mîr ji pir girîng bû. Hizre wî û gotina wî ji pir girîng bû. Wî çî gotibana wê weke wê bûbana. Dervî wê wê tiştek ne bûbana. Mirovên ku li dore wî rûniştibûn ji, mirovên ku mirov pir bi rêz û hûrmet bahsa wan bike bûn. Di nav xalkê de ji rêzeke wan ya mazin hebû, Gotina wa ya ku wan di civatê de digot, di civatê de ne dima. Dervî civatê di nav xalkê de ji dihata vegotin. Li ser dihata axiftin. Xalkê ji deme ku di nav xwe de li hev dicivî, hingî, li ser wan hizran hizrên xwe dianên ser ziman. Di nav xwe de digotin *ew hizir rast in an ji ne rast in*. Her weha rewşek hebû. Di nav xalkê de li kurdistanê di nav kurdan rewşeke ku mirov di vê xalê de hebû. Ew ji her weha hizirkirina li ser hizir bû. Pir li ser hizir dihata sekinandin. Di nav xalkê de civaknasiyaka hizir ku mirov pir girîng li ser rawastihê hebû. Civaknasiya hizir ya ku hebû, bi deronîya xwe re ji hebû. Bi vê yekê re divêt ku mirov careke din hinekî din li ser hebûn û wate civatan rawastihê. Ji ber ku di vir de pir girîng dibe. Pir divêt ku mirov li ser rawastihê.

Di civatan de deme ku her weha axiftin û nîqaşkirin dibû û hizir dihatina ser ziman, piştê di nav xalkê de ji li ser wan hizran dihata axiftin. Bi vê yekê, weke ku pergalaka hizirî ya xweza di nav xalkê de ava

hebû. Deme ku mirov li wê rewşê di meyîzend, hingê, mirov ev yek fahm dikir û têdigihîşt. Di civatê de li ser rewşê Gulizerê û Selman ji hatibû sekinandin û biryar hatibû girtin û li ser hatibû axiftin ji. Wê hizrên ku hatina ser ziman û biryar ji di nav xalkê de bihatan nîqaşkirin û şrove kirin. Wê li ser bihatana axiftin. Wê xalkê li ser hzire bianîyana ser ziman. Ev yek, weke kevneşopîyekê hebû. Weke ku kevneşopîyek bû xalkê di nav xwe de dikir û dimeşand. Di wê heyeme de li civatê bi biryar û hizrên ku hatina ser ziman, êdî weke ku ew rewşê ku berê ya ku afirî bû û xalkê li ser axiftin dikir hatibû guharandin. Di gotinê de ev yek bûbû. Wê êdî di jiyane de berdewam kiribana. Wê êdî karê dawate hatibana kirin. Wê bixweşî û qancî û başî hatibana axiftin û nêzîkati hatibana kirin. Mihamed û Seyde Avdirêhîmê xaniqî ji hatibû bûna ser meselê. Ew ji hatibû û tevî meselê bûbûn. Wan ji hizre wan anîbûn ser ziman. Seyde Avdirêhîmê xaniqî ji û Mihamed ji dihatina naskirin. Seyde Avdirêhîmê xaniqî berî hingî hatibû wir, Ji ber vê yekê, li wir ew dihata naskirin. Mihamed ji navê wê hatibû bihîstin û bi navê xwe dihata naskirin. Yê ku navê wê bihîstibûn, di wê heyeme de êdî ew li ber xwe û çavên xwe di dîtin. Her weha ji ber wî ji rewşek hebû. Her weha ew ji li ber çavan bû. Her weha ew ji bi rewşekê bû. Mihamed di cihê xwe de dihizirî di wê heyeme de. Di wê heyeme de di civatê de pir axiftin dibûn. Seyde Xûsrew û hinekî mirov din yê ku pîr pir bûn û deme ku mirov li wan û li rudêna wan dimeyîzend mirov digot ku qey ji rudêna wan nurh tê xwere diaxiftin. Mirovne ku deme ku diaxiftin ji pir bi zane diaxiftin. Gotinên xwe pir bi zane digotin. Mihamed li wan dimeyîzend. Li wan dihisand. Deme ku ew diaxiftin, Mihamed pir bi hey li wan dihisand. Bala xwe dide ser wan. Mihamed weke ku heye ti kesekî li ser nebe, heya wî li ser dore wî bû di wê heyeme de. Lê ne wilo bû. Hey li ser wî ji hebû. Lê weke ku heya wî ji wan heyane ne bû. Heya wî ji wan heyên li ser wî ne bû.

Mîr di wê heyeme de heya wî pir li ser Mihamed bû. Bi mîr re hinekî mirovên din ji ku mirov ji wan bêje zanistbûn heya wan li ser Mihamed bû. Piştî ku Mihamed axiftibû, heya wan pir bi bal çûbû bû ser Mihamed û êdî heya wan ji ser wî ne vaqataha bû. Mîr bixwe, berî hingî navê Mihamed pir his kiribû. Di civate wî de pir bahsa Mihamed hatibû kirin. Deme ku mîrê bota jê xazîne xwestibû û gotibûyê de ya tê xazîne ji mîn re bibîne û yan ji tê serê xwe bide min, hingî, navê Mihamed pir hatibû bihîstin. Di nav aliman de navê hatibû bihîstin. Piştî ku xazîna hatibû dîtin, êdî pir zêdetir navê hatibû bihîstin. Êdî di nav aliman de navê wî hatibû ser ziman. Di gotin ku "ew ne alimak bana, ma wê her weha karîbana ku

xazîne bibîne”.Her weha axiftin li ser hatibûn kirin. Ew axiftin, dengên wan hatibû haya wir ji. Li wir ji li ser hatibû axiftin.Bi vê yekê Mîr Hasanaxan ji di civate xwe de navê bihîstibû.Ji ber ku gelek caran navê wî hatibû ser ziman, êdî pir di aqilê wî de mabû. Di wê heyeme de deme ku Mihamed hatibû wir û hatibû naskirin, êdî bal çûbûbûna ser wî di wê heyeme de. Lê deme ku di civatê de rûniştibû û axiftibû, êdî bêhtir bal çûbû bûna ser wî di wê heyeme de.Di wê heyeme de ji ew bal hê li ser wî hebûn.

De ne, ku civat ava bû û nîqaş bû û ku di civatê de mirovên zane hebin, hingî, ku bizanî hata axiftin ji, êdî yên ku zanistin, weke ku bixwezin ku xwe bidine nîşandin êdî dikin ku nêqaş bikin.Di wê heyeme de ji heman rewş bû bû.Piştî ku Mihamed axiftibû, êdî ew mirovên zane yên ku li wir ji kiribûn ku bi Mihamed re bikevine nîqaşê de.Kiribû ku xwe bidine nîşandin.Bi vê yekê, êdî hin bi hin nîqaşak dest pê kiribû.Ew nîqaş bû ku di wê heyeme de berdewam dikir. Mihamed, li wir bû. Heya wî li ser wan bû. Di axiftin. Lê ew di serê de pir bi hizir bû. Gelo li ser wan axiftin û gotinên zane yên ku ji devê wan zanistan derdiketin dihizirî an ji li ser tişt û rewşne din dihizirî?Di wê heyeme de deme ku mirov li Mihamed dimeyîzend, mirov ev yek pir baş fahm ne dikir. Lê mirov tiştêk fahm dikir. Ew ji her weha ew bû ku Mihamed pir bi hizir bû.Ew yek ji ber çavan ne diravî.

Ku hinekî her weha axiftin di nav civatê de dibe. Êdî hê ku mafê axiftinê ne hatî destê Mihamed û ew ne axiftî, seyde Xûsrew mafê axiftinê digirê û ji civatê re hinekî bahsa rêvaniya xwe dike. Hinekî ji bahsa Deme xwe ya li Zaxo dike. Careke din bahsa dike. Berî hingî hinekî bahs kiribû.Lê wê carê, deme ku ew bahs dike, ji cara pêşî cudetir bahs dike. Wê carê bahsa hatina Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî û wan ji dikêt. Bahsa wan dikêt, ku ew wê ji wir êdî bikevine rê de û herine bi herême Kirmaşanê ve û Dînwerê ve.Wê hinekî wanderan ji bibînin û li wanderan ji bimênin û piştê wê vegehihin.Seyde Xûsrew her weha ji civatê re deme ku bahs dike, êdî piştê ku ew axiftina xwe bidawî dike, êdî piştê di cih de yê ku mafê axiftinê dihile û diaxivê ji Seyde Avdilrehîmê xaniqî dibe.Ew ji axiftinê ji cihê ku seyde Xûsrew berda bû dide berdewam kirin.Ew, deme ku diaxivê, hinekî bahsa demên xwe yên berê ku hatibû wir û ji wir çûbû deverên din ji dike. Bahsa gelek deverên ku çûbûyê de û li deverên ku çûbûyê de li wanderan rasti kê û çî hatibû bahs dike.De ne, divêt ku mirov bêje, seyde Avdilrehîmê xaniqî pir gerahabû. Ji ber ku pir gerahabû, pir der û dever û mirovên navdar ji nas dikirin.Deme ku axiftibû, diaxiftina xwe de bahsa wan ji kiribû.Deme ku axiftibû, mirovên li dore

wî li civatê ji, lê pir bi bal hisandibûn. Vêce deme ku mirov wê xweşik axiftina seyde Avdilrehîmê xaniqî li berçav bigirê, êdî mirov karê bêje ku çend balaka bi hey çûbû ser wî di wê heyeme de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî bi zimanekî pir xweş û xweşik axift. Di axiftina xwe de wî bahsa hatina xwe ya wir bi seyde Xûsrew re ya wê deme ji kiribû. Pêre ji bahs kiribû ku wê zêde li wir ne mênin û hinekî bi ber herême Kirmaşanê ve herin. Li ser çî û ji ber çî hatin ji, bahs kiribû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî axiftinaka pir dirêj xweş kiribû. Bala herkesekê li wir bi axiftina ya ku kir di wê kêlikê de kişand ser xwe di wê demê de. Mîr, deme ku wê axiftina xwe anî ber dawiyê û bidawi kir, piştî axift û gote wî xweş axift û piştî ji bo wê axiftina wî ya wilo xweş rehma li wî û miriyên wî kir. Piştî mîr, mirovên din yên ku li civatê bûn ji, mafê axiftinê girtin û gotinê de ku çend xweş û xweşik axift. Pêre ji wan ji rehma li wî û miriyên kir. Ku piştî axiftina wî, hinek mirovên din ji axiftin piştî, êdî seyde Xûsrew xwe di cihê xwe de adiland weke ku bi wê biaxivê. Bi vê yekê re bal bi tavahî êdî çûna ser wî û lê meyîzendin ku ka wê ew çî kê û an ji wê bêje.

Seyde Xûsrew ku xwe di cihê xwe de adiland û piştî ku axift, wî ji weke Seyde Avdilrehîmê xaniqî axift. Weke ku ew ji xwe bide nîşandin di wê heyeme de wî ji wilo kir ku xweş biaxivê. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, deme ku axift, li ser demên xwe yên berê axift. Li ser demên xwe yên ku berê, ku di wê heyeme de hatibûbana bîre wî axift. Ew ji pir bi zane bû. Deme ku axiftibû ji pir bi zane axiftibû. Di deme ku ew axiftibû de, mirovên ku li wir bûn, hemû ji lê şaq bûn û dihisandin. Mihamed ji lê her weha şaq bû û dihisand. Mihamed, bala wî pir li ser seyde Xûsrew bû. Li ser mîr ji bala wî pir bû. Mîr ji bala wî li ser Mihamed bû. Lê Mihamed bala wî di wê heyeme de di deme ku seyde Xûsrew axift de pir li ser dore wî bû. Li dore xwe di meyîzend. Mihamed, weke ku tiştin ji nû ve werine bîre wî an ji tiştin bala wî bikişênin, wilo di wê heyeme de li dore xwe dimeyîzend. Seyde Xûsrew, di deme ku axiftibû de pir li ser hizir ji sekinî bû. Li ser zanistên berê yên ku wê ji wan his kiribû û yên ku di derbarê wan de his kiribû, di anî ser ziman. Bi zane dianî ser ziman. Di deme ku diaxift de bala mîr û mirovên li dore wî pir li ser wî bûn. Seyde Xûsrew, piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî re wî axiftinaka pir xweş xweşik kiribû. Lê zêde dirêj ne kiribû. Kin birrî bû axiftina xwe, wî. Lê wî bi wê axiftina weke ku bandûrak li ser dore xwe ji çêkiribû. Wilo di hata xuyakirin.

Seyde Xûsrew, piştî ku axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî, êdî pişt wî re li civatê hinek mirovên ku pîrbûn û rûniştî bûn mafê axiftin ji wî girtin û axiftin. Wan ji çî zanibana anî ser ziman. Wan ji li ser mijarên ku

seyde Xûsrew û berî wî seyde Avdîrehîmê xaniqî li ser axifti bû, ew ji li ser axiftin. Mihamed ji careke kiribû ku biaxivê. Wî ji deme ku ew mirovên zane axiftibûn, ji ber ku ew mijarên ku ew li ser diaxiftin ew ji li ser pir xwedi zanebûn bû, ji ber vê yekê weke ku ew di cihê xwe de ne disekinê lê hatibû. Wilo ji rewşê wî di hata xuyakirin. Deme ku li Mihamed di hata meyîzandin ev yek dihata kifş kirin. Mihamed, li ser zanist û aliman û hizre wan pir xwedi zanebûn bû. Li ser hizir û hizirvanên deme xwe pir bi zanebûn û têgihîştin bû. Ev ji weke xosletekî wî yê din li ber çavan bû. Ew di xwe de ne sekinandin û germbûna Mihamed, ji aliyê mirovên li dore wî de weke ku hatibû fahm kirin. Piştî ku wî di cihê xwe de dabû xwe, êdî piştê wî xwe ji bo axiftinê kar kir û piştê ne bi gelekî re yê ku diaxift zanistvanekî mazin bû. Ew ji navê wê şêd Abûlqasîm bû. Şêd Abûlqasîm ji wê herême bû. Lê ew mirovekî ku pir gerahî bû. Deme ku axiftibû ji wî ji pir bahsa wê gera xwe û bahsa gelek cih û warên ku çûbûyê de kiribû. Li Cizîre bota ji weke ku wî di axiftina xwe anîbû ser ziman demeke dirêj mabû. Pir pîr bû. Hingî pîr bû, bû bû weke komak hastu. Lê deme ku di axift pir zû diaxift û di axiftina xwe de yekî ciwan ku pir zane ji ne digahayê de. Deme ku diaxift, pir şêrîn diaxift. Axiftina ji ji xaynî ku bi zanebûn bû, pir li mirov şêrîn ji dihat. Deme ku ew diaxift hema mirov dixwest ku ew biaxivê mirov lê bihêne. Wilo mirov di xwe de dixwest. Berî ku ew biaxivê, du mirovên din ji axiftibûn, piştî axiftina Seyde Xûsrew re. Lê ku wî mafê axiftina hilda û axift êdî bal çûna ser wî. Pêşi hinekî li ser şêx Şafî û mûrşide wi şêx zahide gêlanî sekinî bû (Şêx Zahidê gêlanî li herme bi navê "Tacedine Ibrehim bin ruşan emir el-kurdi el-sencani" bû û dergaha wi ji li Lehicanê bû. Weki dî ji bi navê " Tacadinê birehimê kurê mir Ruşanê kurd" ji tê nas kirin). Hinekî ji wî û ji deme wî ji minaq dabû. Pêre hinekî li ser şêx Fîrûzê zêrînê kûlahî ê kurdî ji sekinî bû. Ji pirtûka ku kurê Şêx Şafî şêx Sedredîn nivîsandibû û navê wê "Safvet'ûs –Safa" bû û di sala 1358an de bidawî kiribû ji hinek gotin vegotibû. Şêx Sedredîn di got ku ew temenê wan dîgiha kurdan. Bi vê yekê dihata gotin ku piştî şêx Fîrûzê Zêrînê kûlahî e kurdî bi pênc bavikan re şêx Şafî hatibû û kurd bû (**pirtûk: "Safvet'ûs-Safa", rûpel: 349**). Di got ku ew kurd bûn, di wê pirtûka xwe de. De ne, divêt ku mirov vê yekê bêje ku şêx Fîrûzê kurdî zêrînê kûlahî ê kurdî (li herême bi navê "Birooz şêx Zarin kolahî el-kurdi el-sencani" ji tê naskirin), kurdekî ji herême Erdebîlî bû.

Rêze herkesekî ji wî re hebû. Mihamed xwe kar kiribû ku biaxivê. Lê ew hê diaxift. Mihamed di cihê xwe de xwe amedekiribû ku wî axiftina xwe bi dawî kir, êdî ewê axiftibana. Her weha wilo xwe amede kiribû.

Wilo ji rewş dihata ber çavan. Deme ku Mihamed xwe di cihê xwe de xwe weke ku amede kir ji bo axiftinê, bala hinek mirovan çûbû ser wî ji. Wan mirovên ku bala wan çûbû ser wî di serê xwe de fahm kiribûn ku Mihamed xwe ji bû axiftinê amede kiriya. Ew balên ku çûbûbûna ser Mihamed bi xwe re hinek balên din ji ji dorê di birina ser wî. Piştî ku Şêd Abûlqasim axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî, êdî Mihamed kir ku bi axivê. Deme ku Mihamed kir ku bi axivê, êdî şêd Abûlqasim ji ma sekinî û bala xwe bire ser Mihamed. Seyde Avdilrehîmê xaniqî û seyde Xûsrew ji bala wan çû ser Mihamed. Mihamed, piştî ku şêd Abûlqasim axiftina xwe bidawî kir, êdî bidest axiftinê kir û li ser ewliyayan axift û ji civatê re anî ser ziman. Zimanê Mihamed yê axiftinê ji pir xweş bû. Ku di axift weke ku helbestekê bixwêne li Mihamed dihat. Pêşî, wê carê, di serê axiftina xwe de hinekî ji şêx Hisêne axlatî anî ser ziman û piştî axiftina xwe berdewam kir. Mihamed, di wê heyeme de deme ku axift, bêhtir li ser şêxê Îdirê ku ew li cem wî mabû di ciwanîya xwe de sekinî. Bahsa wî û zanebûna wî kir. Bahsa mirovên li cem wî yê ku dibûna kom kir. Pêre bahsa seyde xwe kir. Di axiftina xwe de hinekî bahsa deme xwe ya li Cizîre bota kir û hinekî li ser seydeyê mazin meleyê Cizîrî axift. Bahsa wî û hizre wî kir. Bahsa zanebûna wî kir. De ne, zanebûna seydeyê mazin Meleyê Cizîrî pir bû û herkesek ji jê biagahî bû. Li wir ji yê ku jê ne biagahî bûn, hema bêja ne bûn. Herkesek li ser wî bi zanebûn bû. Deme ku Mihamed axiftina anî bû ser seyde Mazine meleyê Cizîrî, êdî balaka mazin kişandibû ser xwe di wê heyeme de. Mihamed axiftina xwe bi wî bi dawî kir. Piştî ku axiftina wî bidawî kir, êdî ma sekinî. Lê çend ku ma sekinî ji balên ku çûbûbûna ser wî ji ser wî ne vaqatahan. Balên ku çûbûbûna ser wî, her weha weke qadarekê man, li ser wî di wê heyeme de.

Lê di wê heyeme de mirovek li wir di civatê de rûniştî bû, ji deme ku rûniştibûn bala wî li ser Mihamed bû. Mirovekî wilo zêde wilo ne axivî ji bû. Deme ku ew ji rê hatibûn hingî hevdû naskiribûn û bi hev re hinekî dabûn û standibûn. Lê ji wê pêde wilo zêde axiftinên wî zêde ne bûbûn. Mihamed farqkiribû ku bala wî li ser wî ya. Mihamed, ku hinekî dem têve çûbû êdî farqkiribû ku bala wî ji ser wî neçûya, êdî bala wî ji bihey çûbû bû ser wî di wê heyeme de. Du sê caran de deme ku li hevdû meyîzendibûn çav bi çav ji hatibûn beremberê hevdû. Deme ku her weha hatibûn beremberê hevdû ji, bala wan bêhtir çûbû bû ser hevdû. Mihamed piştî ku her weha bi wî re du sê caran çav bi çav hat, êdî bala xwe ji wî ne vekir. Mihamed bi balaka mazin êdî bidest lê meyîzandinê kir. Weke demeke mazin Mihamed lê meyîzend. Weke ku Mihamed wî nasbike lê

dihat. Lê Mihamed, ku ew nas kiribana ji dernedixist ku ka ew kî ya. Deme ku her weha di serê wî de weke ku ew wî nas bike lê hatibû, êdî bala wî bêhtir çûbû bû ser wî. Bala zilêm ji li ser wî bû. Ew ji pir pîr bû. Simbêlne wî yên pir mazin û weke ku hine kirî hebûn. Bi wê pîratiya xwe ji, weke ciwanekî li ser xwe xwediyê avirne geş bû. Kî bû ew? Mihamed ku naskiriban ji dernedixist. Lê bala zilêm, weke ku wî ew nas dikir li Mihamed dimeyîzend. Mihamed ji ji avirên wî ev yek farq dikir û fahm dikir. Lê Mihamed di wê heyeme de zêde wilo weke ku ti wate ne dide wê yekê. Di xwest ku bi wate fahm bike. Wilo hewldide. Wilo dihata berçavan. Lê Mihamed weke ku di serê xwe de di weha nakokîyekê de bê bû. Lê Mihamed ti wate ji vê yekê, dernedixist. Wî zilemî çima wilqasî bala wî kişandibû? Bala wî çima wilqasî çûbû bû ser wî? Mihamed, di serê xwe de li bersive wê yekê di geraha. Di wê heyeme de li civatê bû. Hem li ser axiftinên ku dihatina kirin dihizirî û hem ji li ser wî miorovî ji ber ku di serê wî de cih girtibû di hizirî. Her weha di serê xwe de pir bi hizir bû. Mihamed kurdikir û nedikir bala wî ji ser wî zilemî ne diçû. Piştî ku bala wî çûbû bû ser wî û hinekî bihizir li wî meyîzendibû, êdî bala wî ji wî ne divaqataha. Di serê Mihamed de hinek hizirne digotiyê de "te ev mirov berê dîtîya". Ev hizir di serê wî de çêdibû. Lê çawa û li kuderê wî ew dîtîbû? Bersive vê yekê ji di serê wî de ne bû. Yan ji mirov divêt ku bêje ku di wê heyeme de ti hizirên ku weke ku ji wê hizre ku weke pîrsekê re bibine weke bersive di serê wî de ne bûn an ji çênedibûn..

Mihamed, her weha di serê xwe de weke bêhnekê bi hizir çû û hat. Zilem ji bala wî li ser Mihamed bû. Weke ku wî Mihamed nasbike li Mihamed dimeyîzend. Ji avirên wî yên ku li Mihamed dimeyîzend ji ji xwe êminbûnek ji dihata berçavan. Mihamed, ew êminbûna di avirên wî de ya ji xwe kifşkiribû. Mihamed, çend ku her weha kifş dikir û di serê xwe de li ser bi hizir di çû û dihat, êdî bêhtir weke ku bi meraq bibe lê dihat. Zilêm ji weke ku ew yek di Mihamed de kifşkiribe lê dimeyîzend. Di wê navberê de ji axiftin di civatê de dibûn. Mihamed divî bû ku guhê û hişê bidana wan ji. Ev yek ji weke pêdivîyaka civatê bû. Weke rêzeke ji civatê re bû ji mirovên ku li civatê rûniştîbûn. Mihamed, ji ber vê yekê ji bana divîbû ku bala wî li ser axiftinên civatê bana. Ji xwe bala wî li ser civatê û axiftinan ji bû. Lê ew zilem ji di serê wî de bû û di serê xwe de li ser dihizirî. Mihamed bi vê yekê di serê xwe di nav hizran de çûbû. Pir bi hizir bû bû. Ku her weha weke qadarekê dem buhurt, piştî zilêm bixwe berê xwe da Mihamed û kir ku pîre bipeyivê. Mihamed ji ev yek di wê heyeme

de kifş kir. Deme ku Mihamed kifş kir, êdî bala wî ji bi hey çû ser zilêm û lê meyîzend.

Zilem, ku weke qadarekê di cihê xwe de ma sekinî êdî piştire kir ku axivê. Berê wî li Mihamed bû. Berê Mihamed li wî bû. Li dore wan ji pir mirov hebûn. Di axiftin. Dengê wan bilind bû. Mîr ji di cihê xwe de gih tevî axiftinan û dibû û gih ji bala wî li ser dore wî bû û li dore xwe dimeyîzend. Bala wî pir li ser Mihamed bû. Mihamed, weke ku hatibû Zaxoyê, di serî de çawa ku bal kişandibûna ser xwe, di wê heyeme de ji wilo bi heman awayî bal kişandi bûna ser xwe di wê heyeme de. Ji xaynî wî bala gelek mirovên din çûbû ser Mihamed û li ser mabû. Ew zilem ji bala wî li ser Mihamed bû. Mihamed hê wilo navê wî ji nizanibû. Navê wî çi bû? Ew ji ji aliyê wî ve ne dihata zanîn. Zilem, ku di cihê xwe de xwe ji bo axiftinê amede kir, êdî piştire ne bi gelekî re ku mafê axiftinê ji girt, êdî bidest axiftinê kir û her weha ji civatê li dore xwe de axift:

‘De ne, di nav me de kevneşopîyek heya. Divêt ku deme ku em hatina ber hevdû, divêt ku em hevdû nas bikin û xwe bi hevdû ji bidina naskirin. Ya rast ji li gor ev yek e. Deme ku mirov hevdû nas kir, êdî serdestiyek bi mirov re di şaxsê mirov de çêdibe. Li civatê me, nahaka pir mirovên ku rûniştî ne, hemûk ji yên ku bi rêz in û yên navdar in. Vêce ezê nahaka ne li ser vê yekê bi sekinîn. Ezê li ser nahaka ku rewşek di nav me de heya û heya gelekani ji me jê nîne bênime ser ziman. Ew rewş ji her weha rewş min e. De ne, weke ku mîrê min ji zane ez ji ji bakûre Kurdistanê me. Lê nahaka li vir im. Li mala mîrê min bi mêhvandariyaka pir mazin tême mêhvankirin. Ez bi aslê xwe ji herême me ya ku jê r tê gotin Miskê an ji bigiştî Çolemerge me. Evder Hakariya û Şemzînan wanderan ne. De ne, va yekî dî ji ji vir li wir di nav me de. Min ew naskir. Lê ez dibe qey wî ez nas ne kirin. Ew ji Mihamed e. Mihamed bixwe ji ji wê herêmê ya. Lê me zûva hevdû ne dîtîya. Ez bixwe ji Şerfeddin im. De ne, di nav çanda hizre me de Şerfeddin, navekî pir pîroz, ku dê û bavê min li min kirina. Şerfeddin, navê Şêx meyê mazina. Şêzê Ezîd e. Navê Şêx Adî yê kurê Misafir a. Ji vê gotina min, li vir nahaka yên ku nizanibin ji ez dibe qey êdî wê fahm bikin ku ez ji ole ezîdî me. Mihamed ji ez dibe qey êdî wê hin bi hin bidest bîrkirinê bike’.

‘Şêx Adî di deme serwerîya Merwanîyan de jîn bû. Di wê demê de li herêmên me hemûkan pêşketineke mazin hebû. Di wan deman de Şêx mazin Êlî Herîrî ji jîn bû. De ne, li vir yên ku nizanin nîn in, ku Êlî Herîrî zanistekî me kurdan ê mazin û navdara. Bi axiftin û xweşik axiftina xwe, xwediyê navekî pir mazin bû. Navê wî deng dabû. Wî pir nivîsand. Gelek

ji we jî heya we ji wan nivîsên wî hene. Xwandina. Min ji xwandiya. Pişt wî re zanistên weke Şahidîn ji derketin. Ew ji nav dar bûn. Yên weke Qasim Celawa ji derketin. Ew ji pir bi zane bûn. Yên weke Şêx Fexre Adîyanî ku ji me re pêşengitî kirin derketin. Pir bi zane û jîr bûn. Pir nivîsandin. Zanebûna wan di nav xalkê de belav bû. Pir hata zanîn. Weke wan, hê gelek zanistên pêşengên me derketin. Ew ne tenê şexsne bi zanist bûn. Ew ji ji xaynî wê, şexsne pîroz ji bûn. Ji hizre wan deme xwe afirand. Piştîre wan re, ji me re ew hizre wan me. Yê min, min bi xwe ji şêx Fxre Adîyanî pir xwandiya. Min hizre wî pir xwandiya. Berî nahaka bi demeke berî ku ez werime vir, ez li şengalê bûm. Li wir, min ez dise pir mazin xwand. Min di serê xwe de tiştên ku berê zanibûn, careke din xwwand û bêhtir di xwe de dana revakirin. Hizre mazin, ji mirovên mazina û mirov mazin dike. Ev yek ji, yek ji me, yê ku nizanibe nîn e. De ne, ev demeke ku ez li vir im. Li vê herêmê, ez li hinek dergahê me mam û min di wan de hê gelek zanistên me yê mazin nas kirin. Vêce ez nahaka, di vê nêhte de me, ku ez riya xwe hinekî dî ji bi rojhilat bixim û piştîre vegehirime malê. Li wir, li mala mîrê min ji, ev demeke ku li vir im û mêhvanê wî me. Li vir, ezê hê hinekî di ji bimênim. Yanî ezê li herêmê bi mênim. Li vir, ezê hinek malên me yê bi nîrx wan hê bibînim. Vêce nahaka ezê çend gotinan ji rastiye bînim ser ziman. Rasti, weke şêx ji şêx Adî tene ser ziman, di mirov bi xwe re ji wate wê heya. Ew ji xwe ji heya. Deme ku mirov xwe naskir, hingî, mirov hinekî wê nêzikî wê ji bibe. Naskirin, di şaxsiyeta mirov de xwediyê gelek wate ya. Naskirin, bêjeyeka ku mirov pir li ser bisekinî ya. Ku mirov pir li ser bêne ser ziman e. Şêx Adî jî *Cêlwe* tene ser ziman û şîrove dike û dibêje di riya rast de meşin, li nîrxên xwe di xwedî derketinê de ya. Ji ber ku wî nîrx weke hêtên riya ku mirov tede diçû didît û ji rê derketine re weke astangên mazin didît´.

Wan zanistan riya me şanî me da. Zanistên mazin yê weke seydeyê mazin Meleyê Cizîrî ji vê yekê bi hizrên xwe tene ser ziman. Zimanekî wî yê pir xweş û xweşik hebû. Pir xweşik di axift. Deme ku diaxift, bala mirovên li dore xwe bi het dikişanda ser xwe di wê heyeme de. Bi zanebûna xwe, wî ji rê şanî mirov dide. Î ro, ew ji nema ne, lê belê hizre wî dimêne û hê rê şanî mirov dide. Ew mirovne ku pir mazin bûn. Her weha bi hizre xwe ya ku anîna ser ziman, pişt xwe re ji rê şanî mirov didin´ ...

Şerfeddin her weha demeke dirêj diaxivê. Piştî ku disekinê, êdî bi tevî axiftinê ya mirovên li civatê re ji, axiftin mazin dibe. Danûstandin mazin dibe. Mihamed ji bala wî bi hey li ser wî bû. Mihamed hê ti gotin ne gotibû. Lê Mihamed, piştî ku ew axiftibû, êdî piştîre bi gotinên wî re êdî hin bi hin

naskirin pêre bûbû. Wî ew naskiribû. Lê Mihamed deme ku dimeyîzend ji, weke ku hinek şaş û mat bimêne ji lê hatibû. Wilo ji avirên wî yên ku dimeyîzengin dihata fahm kirin. Mihmaed pir şaşmayî dihata xuyakirin. Bala pir bi hey li ser Şerfeddin bû. Şerfeddin, di deme ku ew hê ciwan bû û dixwand de li cem seydeyê xwe, hingî, wî ew dîtibû. Hê hingî, wî ew dîtibû. Piştî ku ew ji malê derketibû, êdî piştî wî ew ne dîtibû. Ji xwe, piştî ne çûbû herême ji. Ma wê çawa dîtibana? Lê Mihamed, deme ku ew axiftibû, bi axiftina wî ew pir baş di wê heyeme de naskiribû.

Di wê heyeme de piştî Şerfeddin axiftina xwe bidawî kiribû, piştî nîqaş bidawî ne bûbû. Hê ji berdewam dikirin. Yên ku di pirsîn ji xwe dipirsîn û yên ku hizre wan di serê wan de li ser wan mijarên ku li ser diaxiftin ku hebûn, wan ji mafê axiftinê digirt û diaxiftin. Her weha piştî wê axitina wî ya hinekî dirêj re rewşê berdewam kiribû. Mihamed, haya wê demê bêdeng mabû. Ti deng û sahl jê derneketibû. Lê bala wî li ser axiftinên ku dihatina kirin bû. Weke ku wî axiftinên ku dihatina kirin di serê xwe de dibirin û diaîn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji tevî axiftinan bûbû. Yê wî ji, ew pir bizanebûn bû li ser mijarên ku li ser diaxiftin. Ew li herêman pir mabû. Li pir civatan rûniştibû. Wî ji zanebûna xwe bi civatê re hevpar dikir. Deme ku ew diaxift, mirovên li dore wî, bi Mihamed re herkesek pir bi hey lê dihisand. Seyde Xûsrew ji bi heman awayî pir bi bal lê dihisand. Seyde Xûsrew ji pir bi zanebûn bû. Di dergaha wî de, li ser mijarên ku dihatina axiftin ew pir bi zanebûn bû û ji wan re axiftinan wî ji pir zanebûn girtibû. Bi vê yekê, divêt ku mirov bêje, ku ew ji pir bizanebûn bû. Wî ji dihisand. Hizrên ku dihatina ser ziman, di serê wî de ji ji demên berê ji nîqaşkirinên ku bûbûn gelek hizir anîbûn bîre wî ji. Wî ji ew hizir di serê xwe de dibirin dianîn. Ew ji bi hizir bû, weke Mihamed. Lê Mihamed pir bi hizir bû. Şerfeddin ew naskiribû. Deme ku axiftibû ji, navê wî ji gotibû. Mihamed, ev ji di bîre wî de bû. Li ser vê yekê ji di hizirî. Şerfeddin, navê Mihamed, ne ku ji deverne his kiribû û di wê heyeme de anîbû ser ziman. Wî berî hingî zanibû û anîbû ser ziman.

Li ber Mihamed, di wê heyeme de pir pirtûk hebûn. Pirtûkên Şêx Ahmedê kurê Mihemedê Haranî ji hebûn. Şêx Ahmedê kurê Mihemedê haranî ji ji heman herêmê û cihî bûbû. Ew ji piştî şêx teymîye re ne bi gelekî re hatibû dinyê. Ew ji zanistekî pir mazin ê kurd bû. Wî şêx Teymîye pir başûqanc naskiribû û têgihiştibû. Wî di dergaha xwe de deme ku fêr dida faqihên li ber destê xwe, pirtûk û zanînen şêx Teymîye bikar dianîn. Navê şêx Teymîye ji û Şêx Ahmedê kurê Mihemedê haranî li wir ji hebû. Bavê Seyde Xûsrew deme ku çûbû cem Mîr Silêmanê Eyûbî, ew ji bi zanebûna wan naskiribû û gelek pirtûk ji ku pirtûkên wan ji di nav de bi xwe re anîbûn ji wir, di deme xwe de. Bi vê yekê, li wir di wê heyeme de, ji wan zanistên kurd ji gelek pirtûk hebûn. Ji xaynî wan, hê gelek zanist û alim pirtûk û nivîsên wan li wir hebûn. Mihamed li wan dimeyîzend. Ew ji mirovekî ku li ser xwe bû. Mirovekî ku navserî xwe bû. Êdî ew ji ciwan ne dihata hasêbe di nav xalkê û civatan de. Piştire ne bi gelekî re, ew ji di cihê xwe de weke sawalaka bimaxal bimêne û ji xwe diçê û di xewê ve diçê di wê heyeme de. Mihamed, wilo di cihê xwe de di xewê de ji xwe diçê, haya ku bangdana sibehê dengê wê tê wî û ew ji dengê bangdanê tê xwe..

Mihamed piştî ku dengê bangdanê tê wî, êdî tê xwe. Ji xewe xwe ye ku têve çûbû di rabê ser xwe di wê heyeme de. Ku di rabê xwe de, êdî di cihê xwe de wilo dimêne. Xwe ji cihê xwe na labitinêne. Weke qaderekê di cihê xwe de dimêne. Ew pirtûkên ku li ber wî bûn, ew ji li ber wî bûn. Ew

ji bo ku li pirtûkan meyîzenê hatibû wir û li wir rûniştibû, bi tenê. Lê piştî ku hinekî bidest meyîzandinê dike û hinekî ji dihizirê, êdî di wê hizirandina xwe de ji xwe diçê. Bi dengê bangdana sibehê re tê xwe di wê heyeme de. Mihamed piştî ku hatibû xwe ji, xwe ji cihê xwe ne labitandibû. Wilo mabû. Weke ku dilê wî dixwest, piştî wê hatina wî re careke di bidest meyîzandina li pirtûkan bike. Her weha xwesteke bihizir di serê wî de bi wî re çêbû. Lê wê ji dêla ku wilo bike, di cihê xwe de ma û hizirî. Bidest hizirandinê kir. Hinekî wilo di cihê xwe de ma û hizirî. Lê piştî ku ew hatibû xwe weke ku ji xwe neçûyî, berî hingê li çî meyîzendibû, ew ne çûbû bû tişte ku di deme ku meyîzendibû xwandibû û ketibû serê wî de di wê heyeme de ji dibîre wî de bû. Bi vê yekê, di hizirî. Ew hizrên ku di serê wî de di bîre wî de mabûn, weke ku ew di wê heyeme de di wê kêlîkê de didana hizirkirin. Mihamed, di serê xwe de xwe li bayê wî hizirkirinê berdabû. Di hizirî û di hizirî. Weke ku gelek tiştên ku li ser bihizirê di serê wî de di wê heyeme de dibîre wî de bin di sekinî di cihê xwe de. Wilo di sekinî di cihê xwe de. Pir bihizir bûbû. Di wê heyeme de, piştî ku hatibû xwe ji, êdî xewe wî ji ser çavên wî çûbû bû. Xew li ser wî nema bû. Di serê wî de mejiyê wî pir hatibû xwe. Wilo rewşe wî dihaya berçavan û xuyakirin. Mihamed, di wê heyemê de pêre fêlîteyek (dînamizm) çêbû bû. Di serê wî de ew fêlîte çêbû bû. Fêlîteyeke hatina xwe bû. Hatina li ser xwe bû. Weke ku di serê wî de di wê heyeme de were xwe lê hatibû. Lê ew hatina xwe, ya wî ya di wê heyeme de, weke ku di hundurê xwe fêlîteyek di parast. Fêlîteyeke bi hizir diparast. Mihamed xwe wilo hîs dikir di wê heyeme de. Wê xwe hîskirinê, di wê heyeme de, piştî ku hatibû xwe, êdî careke di weke ku ketibû nav hizran de. Wilo ew û rewşe wî dihata berçavan û xuyakirin.

Mihamed, her weha weke qadarekê dimêne. Weke qadarekê li cihê xwe rûniştî bi hizir ku di hizirê dimêne. Di wê rewşe xwe de wilo dihata xuyakirin ku ew pir dihizirî di serê xwe de di wê heyeme de. Ji rewşe wî, ev yek pir baş û qanc dihata têgihîştin û fahmkirin. Mihamed, zanistekî ku pir mazin bû. Di wê heyeme de li ber wî, ku li ser hevdû, pirtûkên zanistên demên berê û yên wan demên berî deme wî hebûn. Mihamed, li hemûkan hê ne meyîzendibû. Li çendekê meyîzendibû. Mirovên ku pirtûkên wan li ber wî bûn, yên weke şêx Teymîyê Heranî, di nav xalkê de pîroz dihatina dîtin. Hizre wan, ji laiye xalkê ve pir bi qadrekî mazin dihata pêşwazi kirin. Deme ku civatan de ji bana, ku bahsa wan û hizre wan dihata kirin, pir bi rêz bahs dihata kirin û rêzek ji wan re dihata nîşandin. Her gotinên ku ji devê wan derketin, kê çî gotina ji, weke hinek zagonan dihatina bicih

anîn.Ew mirovne wilo bûn ku xalk ji bo wan diçû mirinê ji, bi dil û can.Her weha "mazin" û "pîroz" dihatina dîtîn.

Li vir,ku mirov çend gotina li ser vê yekê ji bêje wê di cihê xwe de bê..Ji ber ku pir girînge. Ew mirovên ku ji ber van xalk diçû mirinê ji. Vê yekê, deme ku mirov bêne ser ziman, divêt ku mirov bi sê xalên girîng bêne ser ziman, di nav kurdan de. Xala pêşî divêt ku mirov bi kevneşopîyê û nîrxên ku pêşketina bi wan ve girêdayî bîne ser ziman.Ev yek di nava xwe de pêşketinên di dîrokê de ji di kê nava xwe de.Xala duyamîn ji herweha "hizre pîroz" e.Hizre pîroz, deme ku mirov wê bêne ser ziman, mirov dikarê bi çend awayan bêne ser ziman. Lê bi çend awayan ji were ser ziman, hemû awayan di awayê têgihîştina hizre pîroz ya di serê mirovan de digihê hevdû. Hizre pîroz, em li ser çî bêjin ji, divêt ku em tiştêkî ji bîr nekin. Ew ji her weha ewe ku di wê têgihîştine hizre pîroz de pêşketinek di serê mirovan de bi bîr û xêvê pêşdikeve. Divêt ku mirov ji vê yekê cude û dûr neyêne ser ziman û şîrove neke.Pîrozî, di pêşketine dîroke xwe de xêveke xalkê ji diafirêne.Yên ku herî baş û qanc vê yekê fahmdikin û nas dikirin û di têgihîştine wê de ne ji, kurd in.Divêt ku mirov vê yekê bi teybet bêne ser ziman. Divêt ku ev yek bi pêşketina wan ya di dîrokê de pêve girêdayî ya.

Bi vê yekê re em karin nahaka vêce xala sêyemîn bînine ser ziman. Ew xal ji her weha hizre pîroz bixwe ya. Hebûna wê ya. Di hebûna wê de naskirinak di demê de bi mirov re bi hizir çê dibe.Lê ev hizirê ku çêdibe û pêşdikeve ji, haya ku di hucre mirov de wate xwe distêne mazina.Bi wê re,hebûneke ku mirov bixwe bi tememî nikarê bêne ser ziman, fahmdike di xwe de û bi wê dikeve wê rewşê de.Her weha mirov karê bêne ser ziman.Şêx, bi şêxîtiya xwe re ji vê yekê re weke dageriyekê ya.Ji xwe,ew mirovên ku li dore wê digihine hevdû ji vê yekê wilo têdigihin û fahmdikin.Bi vê yekê re, şêxîti mazina.Li kurdistanê deme ku mirov bêne ser ziman û şîrove bike, divêt ku mirov hinekî mazin û her weha bi wate bêne ser ziman.Divêt ku mirov weke navendeke bîr û xêvê bêne ser ziman.Weke xêveke xalkê heya. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov wê mazin li ser bisekinî û bêne ser ziman.Mihamed deme ku di wê heyeme de rahiştibû pirtûka şêx Teymîyê hearanî bi rêz, weke ku rajê Kuran'ê rahiştibû wê. Wilo bi rêz û mazin nazik rahiştibûyê de.Piştî ku rahiştibûyê de û hinekî xwandibû jê, êdî piştî li ketibû hizran de û wilo di xwe ve çûbû bû.Heran û ew herêm û dihata bîre mirovan û an ji ku mirov li ser dihizirîn, gelek tiştên ku bi bîr bikin dihatina hişê wan di wê kêlîke hizirkirinê de. Di serî de wê Birahîm xelîl hatibana bîre wî. Ji ber ku ewder

warê wî bû. Ew ji li wir hatibû dinyê û li wir bi xwûdeyê xwe re axivi bû û li wir jiyana xwe bidawî kiribû. Ev yek, muhakak dihata bîre mirov. Mirovekî weke Mihamed bi zane û pir xwanda û pir bi hizir û ku dihizirî, ne mumkun bû ku ne hatibana bîre wî di wê heyeme ku hizirî de.

Mihamed, her weha piştî ku hatibû xwe û bidest hizirkirinê kriibû, ew ji hatibûna bîre wî. Wî berê li ser wan û wan herêman pir xwandibû. Ji seydeyê xwe li ser şêx Teymîyê heranî hisandibû. Deme ku çûbûbûna cem şêx ji bi seydeyê xwe re, hingî, wî li wir ji li ser wî pir hisandibû. Pir dihata naskirin. Mihamed, deme ku li ser wî û hizre wî hizirî bû, her weha gelek tiştên din ji pêre hatibûna bîre wî. Di wê heyeme de, bi vê yekê, wê hizirkirina wî, ew di xwe de biribû. Mihamed, piştî ku hatibû xwe û ku herweha hinekî piştî hatina xwe ji hizirî bû, piştîre êdî ne bi gelekî re seyde Avdilrehîmê xaniqî ji şiyar bûbû. Ji ber ku dengê bangdanê hatibû û êdî divîbû ku ew ji rabûban û ji bo mêjê kara xwe kiriban..

Beş 5.

Deme hin bi hin bi ber subehê ve dihat. Mirov ji hin bi hin yên ku weê ji bo kar û barê xwe rabûban ji, êdî hêdî hêdî dirabûna ser xwe di wê heyeme de. Roj ku derdiketi, lê ku hê bi tememî derneketî, mirov di rabûna ser xwe ji nav cih û nivînan. Dirabûn û bi kar û barê xwe ve diçûn û dihatin. Jiyan, deme ku mirov di sibehan de di wê şavaqa sibehan de dirabû ser xwe, êdî pir gurr û geş dibû. Bi çûn û hartinaka mazin hebûna xwe berdewam dikir.

Di jiyane de ya ku mirov herî zêde di wê demê de têne xwe ji, ew hînkatiya serê sibehê ya. Di her serê sibehê de hînkatiyaka pir xweş û teze heya. Mirovên ku di serê sibehê de dirabûna ser xwe ji, weke ku di bazdanaka werjişî de bin, wilo li ser xwe û geş û meş bûn. Li dore xwe di çûn û dihatin. Bi kar û barê xwe ve diçûn û dihatin. De ne, divêt ku mirov bêje ku her sibeh, karekî mazin ji mirovan re hebû. Axlaba ji mirovên ku di rabûn ji sê koman pêk dihatin. Jin û mêr bi hev re dirabûn. Lê koma ku hertimî di sibehê bi şavaqê re li ser lingan ji bû, şivan bûn. Ew hertimî yên ku hertimî yên herî ku zû dirabûna ser xwe bûn. Di jiyane de barakî mazin li ser milên wan bû.

Di malalê de tişte ku debara malê bû, sawal bûn. Malak ku çend sawalên wan hebana, pê debara xwe dikirin. Ji çend sawalan pir tişt ji xwe re bidest dixistin ji bo ku di jiyane de pê debara xwe bikin. Ji ber vê yekê sawal pir girîng bûn. Mirovan pir qadarek didayê de. Ji ber ku pê debara xwe dikirin. Jiyan wan pê li ser lingan bû. Sawal ji emenetî şivanan bûn. Weke ku paşaroja malê bikeve destê şivanakî de bû. Her weha ew rewş bi

wate bû. Ji ber vê yekê, şivan pir girîng bûn. Wan şawalên xwe dibirina çolê. Ew her sibeh, hê zûkanê di rabûna ser xwe, û sawalên xwe ji kox û govan derdixistin û di birina çolan.

Di wê serê sibehê de ev yek dihata kirin. Sawal ji kox û govan dihata derxistin û şivana di bire çolê. Lê deme ku ew di rabûna ser xwe da ku sawêl derxin û bibin, bi wan re jinên malê ji di rabûna ser xwe. Ji ber ku deme ku ji kox û govan sawal hata derxistin, êdî divîbû ku bi hata dohtin. De ne, deme ku di êvaran de sawal dihat, dihata dohtin û piştire kahrik, golik û barxikên wan di berdana ber wan ku hinekî maka xwe bi mêhên û piştire wan bixina kox û govan de. Di wê deme ku kahrik, golik û barxik dihatina berdan, berî wê, di delavan de êm dihata amede kirin dabû bixun. Axlaba ji ka dikirin dalavan de û hinek ce ji bi ser di raşandin û ew diberdana ser ku bixwûn. Di her malên ku sawalên wan hebûn de ji, ji xaynî kadînên kayê, hin kadînên ku di salên berê de rêşî hatina çêkirin û kirinê de hebûn. Rêşî ji nefelê dihata çêkirin. Nefel ji gayayekî pir dewlemend bû. Sawalan deme ku dixwarin, pê pir bi şîr dibûn. Zikê wan ji xira ne dikir. Ji xwe, ti carî, kaya genim bi serê xwe, bi tenê ne dihata dayîn. An kaya niskan û an ji kaya nahkan pêre hebû. Bi serê xwe, kaya genim, zikê sawalan ji hebû ku xirakiribana. Ji ber vê yekê, ti carî sada ew bi tenê ne dihata dayîn. Sawalan ji ku êmê xwe xwar, êdî bi alîkariya şivan mirovan ew dikirina kox û govan de. Kox ya sawalên weke bizin û mihan wan bû. Gov ji, weke sawalên mazin yê weke çêlek û nehgonan tede diman.

Piştî ku sawal kirina, koxan de, êdî di koxan de ji delavên ku bi hêt ve hatibûna çêkirin hebûn, di hundurê de. Di wan delavan de ji hinek êm dihata amede kirin da ku bixwûn. Haya ku dibû sibeh, her weha êdî dima. Vêce deme ku sawal sibehan dihata derxistin ji kox û govan, hewce dibû ku careke dî bihata dohtin. Berî ku sawal biçûyana çolê, êdî dihata dohtin. Ji ber vê yekê ji, êdî deme ku şivan dirabûna ser xwe di wê serî sibehê de, êdî jin ji dirabûn ku wan sawalan bidoşin. Bi vê yekê re, ew bi hev re êdî dirabûna ser xwe ji nav cih û nivînan. Lê deme ku ew dirabûna ser xwe, êdî ji ber ku di her malê de, hema bêja her weha bi hev re rabûn çêdibû, êdî di jiyane de geşbûnaka pir xweş û geş dibû. Jiyana gurr dibû. Di jiyane de, di wê de çûn û hatin pir zêde dibû. Pir çûn û hatinaka mazin hebû, dibû. Bi wê çûn û hatinê re, êdî hin bi hin jiyana rojana ji xwe êdî dest pê dikir. Jiyana rojana her weha bi vê yekê re dest pê dikir. Axlaba mirov dikarê bêje ku di deme bangdana sibehê de êdî rabûn dest pê dikir û piştire êdî razan ji ne dibû. Her weha jiyane hê ku reş li ardê bû dest pê dikir, bi wê geşbûn û xweşbûna xwe, di wê heyeme de. Jiyana, ku her weha dest

pê dikir, êdî hin bi hin ew geşbûna xwe mazin û geştir dikir. Ji xwe, deme ku dê û bav ji nav cihan derdiketin, êdî li derve ji ber bi kar û bar ve çûn re, ew dengê wan yê ku dihat ji, zarok ji di nav cihan de ne dihiştin. Ew ji piştire ne bi gelekî re dibûna hevalên wan yên rabûnê.

Bi vê yekê, êdî jiyan bêhtir geş û tezetir dibû. Piştî ku sawal hatina dohtin û çûn, êdî piştire ne bi gelekî re jin û zarok bi hev re bi tenê diman. Piştî çûna sawalan, êdî deme keyandinê bû. Ew dem ji, demeke ku zarokan pir hijê dikir. Pir kêfe wan ji wê demê re dihat. Berî ku mast ji aliyê dê ve bêxistinî hundurê meşkê de, pêşî zarokan hinek mast di sênîkê ji jê distand û nanê xwe di firidanda nav de û dixwarin. Pir kêfe wan ji wê re dihat. Bi firidandina nav mêt de ye nê jî firdikê mêt dihata çêkirin. Firdik, di serê sibehê de di wê hînkayîyê de pir xweş dihat li mirov. Dilê mirov hînik dikir. Bêhne mirov ji weke ku derdixist. Zarok ji weke ku pê werine ser xwe ji li wan dihat. Lê zarok bi vê ve ne diman. Ji xaynî wê jî, deme ku bidest heyandinê dihata kirin, êdî piştire, ew ji li bendê dimana sekinî haya ku keyandin bi dawî bûbana. Piştî ku heyandin bi dawî bû, êdî piştire, ji mestê ku bûyî dew, ku jê dihata valakirin, êdî ew ji li bendî wê zerikek dew bûn. Ku dew hata valakirin, êdî ji destê dayikên xwe zerikek dewên xwe di girtin û hinek nîvişkê ku hê di nav dew de ye, jê jî hinek ji wan re li ser nê dihata xistin û wan dixwar bi dewê xwe re. Wê yekê, kêfeke pir xweş dida wan di wê heyeme de. Dilê wan yê biçûk û paqij xweş û geş dikir.

Piştî bi bêhnekê re, êdî ku nanê xwe ji bi dewê xwe re xwarin, êdî hê ku ew sêdara ku ji bo keyandina hatibû danîn, ku hê ne hatî rakirin, wan diçû û xwe têe kil dikirin. Ji wê kilkirinê jî biqasî wê nan û dewê xwe, jê kêfek digirtin. Dilê wan xweş dibû. Weke ku dinye bibe ye wan li wan dihat. Kêfe wan xweş dibû.

Piştî ku keyandin ji hata kirin û piştire bi qadarekê re ku sêdara keyandinê ji hata hilandin, piştire êdî paqijkirina kox û govan dest pê dikir. Ev ji karê deme piştî keyandinê bû. Bi paqijkirinê, pişkûl û rixên ku lev dihatina dayîn hevdû, dikirina tapik an ji pêvadan û bi hêtan ve dikirin ji bo ku zûwa bibe. Ku ew ji zûwa bûn, êdî lev dihatina dayî hew û dihatina hilandin. Ew êdî ji bo şawata salê ya zivistanê di sopan de amede bûn. Her sal, her weha dihata amede kirin. Hê ku ji demên salê yên din, bidest amedekirina her weha ya ji bo şawatê amedekirin di hata kirin. Hersê demên din yên salê, ji bo ku ji dema salê ya zivistanê re weha amede bê kirin, di buhurt. Amedekarî dihata kirin. Dem, weha dewrûdayîm dibû.

Di wê heyeme de li Urmîyê ji, her weha çûn û hatinaka mazin hebû, weke her herêmên Kurdistanê yên din. Li wir ji rewş weha bû. Di wê demê de, dem ketibû ber zivistanê de, lê belê hê bi tememî ne bûbû. Lê çûn û hatinaka weha ye pir mazin di jiyane de hebû. Lê di wê demê de li Urmîyê, çûn û hatinaka pir mazin hebû. Ew çûn û hatin, ne tenê ji bo vê yekê bû. Berî hingî bi çendekê pir çûn û hatinaka mazin li wir bûbû. Dawata wan bû bû. Dawata mîr bûbû. Keça mîr Gulîzerê bi Selman re jiyana xwe kiribû yek. Ji ber wê yekê ji çûn û hatinaka mazin bûbû. Yên ku wê zewicî bana, ji mala mîr bana, wê ji gelek herêman mirovên mazin û mîr û zane wê hatiban. Ji bo vê yekê ji, divî bû ku amedekariyaka pir mazin hatibana kirin. Ji bo vê ji, çûn û hatinaka pir mazin pê divî bû. Ji xwe, ya ku bûbû ji ev bû. Pir çûn û hatinaka mazin bûbû. Demeke dirêj ji ew çûn û hatin berdewam kiribû. Dawata Gulîzerê û Selman ji demekê dirêj berdewam kiribû. Çûn û hatina dawate, li ser 40 rojî re berdewam kiribû. Di wê demê hemûkî de çûn û hatin bûbû. Ji bo wê çûn û hatinê ji, çûn û hatinaka pir mazin bûbû. Bi vê yekê di wê heyeme de pir çûn û hatin bûbû. Dawat bûbû û gelek mirovên ku ji deverên dûr hatibûn ji vegerehe bûn. Lê hê ji çûn û hatin hebû. Hê ji mirov bi cilên xwe yên xweşik di gerahan. Bi vê yekê, di wê heyeme de li Urmîyê çûn û hatinaka mazin bûbû. Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ji wê çûbû ban, bi ber Kirmaşanê û Dînwerê ve. Lê Mîr ew ji dabûn sekinandin û ew ji haya ku dawate dest pê kiribû û bi ber dawiyê ve çûbû bû li wir bûn. Hê ji ew li wir bûn. Bi vê yekê, ew, ev dibû demeke dirêj ku li wir bûn. Lê wan ji kara xwe kiribû ku ji wir bi rê bikevin. Xwe li ser rê amede kiribûn. Di wê heyeme de, deme ku li wir mabûn de ji, wan pir mirovên mazin û zane. Yên ku hatibûbûna wir dawate ji naskiribûn. Bi gelek mirovan re xwe dabûn naskirin û naskiribûn. Ji gelek deveran gelek mirov hatibûn. Yên ku hatibûn ji, yên ku navê wan hebûn bûn. Yên ku di herêmên xwe de dihatina naskirin bûn. Bi vê yekê, Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî, gelek mirovên ku navê wan heyî yên mazin ji herêmên din di wê heyeme de naskiribûn.

Her weha demeke dirêj buhurtibû. Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ji li wir bûn. Lê xwe li ser rê amede dikirin. Dawat ji hema bêja bi dawî bûbû. Mirovên ku ji deverên dûr hatibûn ji êdî yek bi yek diçûn. Di vegerehen malên xwe. Lê Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî demeke pir baş û xweş buhurandibûn. Di wê deme ku li wir mabûn de li cem Seyde Xûsrew mabûn. Wî ew ji ji cem xwe ne vaqatandibûn. demên xwe bigiştî hema bêja bi hev re buhurandibûn. Bi hev re demne pir xweş buhurandibûn. Li wir, wan pir mirovên zane naskiribûn. De ne, deme ku

dawatê dest pê kiribû, mîr ji gelek mîr û mirovên zane yê li herême ne ji, ji wan re xaber şandibû. Bi xaber şandina wî re, êdî ew hatibûn. Deme ku hatibûn, pir bi wasf û mazin hatibûn. Herkesekê ku hatibû ji bi dîyarî û xalat hatibûn. Mîr ji, deme ku ew ketibûne rê de ku herin, her weha wilo mazin û bi dîyarî ew bi rê kiribûn. Her yekê ji wan re pir diyarî dabûn amede kirin û bi wan re ji wan re şandibûn. Bi vê yekê re mîr dilê wan ji xweş kiribû. Ew mîr bû. Ji xwe ji divî bû ku wilo bana. Ma ku ne wilo bana çêdibû? Ne, çenedibû. Wê di nav xalkê de ji hatibana gotin ku mîr pir mirovên mazin û zane û ji xwe qayîl, ku hatina mala wî û dawata wî, wê li ser hatiba axiftin. Pêre wê hatibana gotin ku ew çend bi diyarî û xalat ji hatina, wê ew ji hatibana ser ziman. Lê wê pêre hatibana gotin, ku deme ku ew vegerehen ji çend ku mîr diyarî bi wan re ji wan re şandin. Wê ew ji bi hatana ser ziman. Ev yek, wê pir li ser bi hatana axiftin.

Deme ku yek çûbana mêhvanadariya mîr ji, di nav xalkê de li ser dihata axiftin. Zanist bana, dihata gotin ku ew zanistekî pir mazina. Mirovekî ku ne hatibana naskirin ji, ku li cem mîr û li civata wî hatibana dîtin, wê bihatana gotin ku mirovekî ku mazina. Ma ku ne mazin bana û ne yekî qanc bana, wê mîr halqas hêjatî dabane de û qancê pê kiribana? Ev ji wê bihatana vegotin. Bi vê yekê pir wê li ser bihatana gotin. Bi vê yekê re, wê navê mîr ji û navê yê ku çûya ji wê pir bihatana ser ziman. Wê bahsa wan bihatana kirin.

Li wir, di wê heyeme ku Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî lio wir bûn de, çend ku civata mîr li dar bû, ew ji lê amede bûn. Bi vê yekê, ew ji hatibûbûna naskirin. Mîr bahsa wan ji fikir, ji mirovên ku dihatin re. Ew didana naskirin bi mirovên li civatê re. Lê mihamed di wan heyeman de wilo zêde ne diaxift. Mihamed, ji xwe, divêt ku mirov bêne ser ziman, wê xwe ti carî mazin ne didît. Wî xwe li ser ti kesekî re ne didît. Ev weke xosletekî wî yê pir ku li ber çavan bû, divêt ku mirov bêne ser ziman. Mirovên ku li wir bûn, di wê heyeme de li civatê ji bûn, ev xoslete wê fahmdikirin. Lê wan, deme ku Mihamed diaxift an ji deme ku dirûnişt, ji rewşe wê fahmdikirin ku ew mirovekî ku çend mazin û çawa ya. Wî bi rûniştin û axiftina xwe, hertimî bala mirovên li civatê dikişanda ser xwe di wê heyeme de. Di wê heyeme de ji kişandibû ser xwe. Bala mirovên ku ew naskiribûn çûbû bû ser wî û li ser wî mabû bû. Bi vê yekê, ew li ber çavan bû. Mihamed, bi vê yekê, di wê heyeme de ji aliyê gelek mirovan ve hatibû naskirin. Wî ji di wê heyeme de pir mirovên zane yê herême naskiribûn. Bi wan re rûniştibû û dabû û standibû. Hizre wan, ji wan girtibû. Wan ji, hizre wî ji wî girtibû. Her weha hizre hevdû ji hevdû girtibûn.

Di wê heyemê de, gelek mirovên ku hatibûbûna wir, berî hingê ew bi hiskirina navê wî naskiribûn. Lê ew ne dîtibûn. Lê di wê heyeme de ew jî dîtibûn. Deme ku ew li Cizîre bota bû, pir hatibû bihîstin. Navê wî pir hatibû bihîstin. Weke mirovekî zane û alimakî qancê xwûde hatibû naskirin. Ew jî xwe jî, wilo bû. Ew alimak bû. Qancekî xwûde bû. Her weha navê wî jî hatibû naskirin. Mirovekî ku keremetên wî hebûn. Wilo jî hatibû naskirin. Bi vê yekê, balaka mazin çûbû bû ser Mihamed. Bi wê balê, mirovan dohnê xwe di dane de û lê di hisandin. Li gotina wî dihisandin. Mirovekî ku her weha weke alimakî hata naskirin, jê hinek tişt jî di nêzîkatîyê de têne xwestin. Weke zanebûnê. Divê bû ku wî bi zanebûna xwe, xwe şanî wan dabana. Herkesekî bi zanebûna wî, ew naskiribana. Alimtî, hinekî jî bi zanebûnê re hebû. Mirovên alim, weke mirovên ku di nav zanebûnê de çûne dihatina naskirin. Weke mirovên ku *ji xwe buhurandina* dihatina naskirin. Ji xwe buhurandin, weke gotinaka ku pir bi wate tê ser ziman. Di nav xalkê de jî bi wateyeka mazin tê ser ziman. Di wate di zanebûnê de pir kurbûn tê ser ziman. Mirovê alim, yê ku di zanebûna xwe de buhurî ya jî.

Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî, ew demek bû ku li wir bûn. Êdî dikirin ku herin. Wê çûban Kirmaşanê û jî wir jî wê çûne Dînwerê. Her weha jî xwe re kifş kiribûn. Di wê heyeme de jî êdî kara xwe dikirin. Mîr, ew dabûn sekinandin. Ji ber ku li dawate bi mênin. Lê êdî dawate jî bi dawî bûbû. Êdî li gor wan ti tişteke nema bû ku herin. Li wir, di wê heyeme de wan demeke pir baş û xweş derbas kiribûn. Lê êdî wê çûban. Ew şeve wan ya dawiyê bû ku li wir bûn. Wê, wê şevê jî çûban û li civate mîr rûniştiban û êvarî jî ku rabûn, êdî wê xatir jî jî mîr xwestiban û wê vaqatahan. Ev yek weke kevneşopîyekê bû. Weke kevneşopîyeka ku ne nivîsandi bû. Li civatê, wê gelek mirovan hevdû dîtiban. Wê bi hev re maban û wê bi hev re cara dawiyê axiviban û wê xatir jî hevdû xwestiban û piştê wê êdî jî wir, jî vaqatindinê re amede ban.

Wê rojê, Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bi hev re û ku hê gelek mirovên din jî li dore wan bûn, li dergaha seyde Xûsrew li hevdû rûniştibûn û bi hev re diaxiftin. Ew demeke dirêj bû ku li hevdû rûniştibûn û bi hev re diaxiftin. Gelek mirovên ku hatibûn û di wê heyeme de li wan rûniştî jî bûn, yên ku zane bûn. Yên ku navê wan bi zanebûna wan hebû bûn. Yên pir dihatina naskirin bûn. Li hevdû rûniştibûn û bi hev re diaxiftin. Pêşî li qasrê li civate hevdû rûniştibûn. Lê piştê ku hinekî li civatê hevdû li qasrê rûniştibûn, piştê êdî bi hinekî re rabûbûn û hatibûbûna derve û êdî bi hev re ku hatibûna derve, li derve, rê girtibûn û çûbûbûna dergaha Seyde

Xûsrew û li wir li hevdû rûniştibûn. Mîr ji di wê heyeme de bi wan re bû. Mîr, ji xwe ne mumkun bû ku ne bi wan re bana. Ew ji bi wan re bû. Ew ji bi wan re di wê heyeme de li dergaha seyde Xûsrew rûniştibû. Bi hev re li hevdû rûniştibûn û ji hev re diaxiftin. Mirovên ku li hevdû rûniştibûn, yên ku zanebûn, Yên ku ji aqilê qayîl bûn. Ji ber vê yekê ji, deme ku di axiftin, pir bi bal û zane dikirin ku bi axivin. Bi zanebûna xwe, dikirin ku xwe bidina naskirin.

Di wê heyeme de, Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji axiftibûn. Ne caraka tenê ji axifti bûn. Gelek caran ji axiftibûn. Her cara ku axiftibûn ji, kiribûn ku balaka mazin herê ser wan. Lê Axlabe ji Mihamed kiribû ku balaka mazin herê ser wî. Ew deme ku axivî bû, pir bi zane axivî bû. Bi zanebûna xwe di serê mirovan de hatibû naskirin. Mirov ku bi zanebûna xwe hata naskirin, hingî, mazin tê naskirin. Hingî, ji xwe maztir tê naskirin. Ew ji her weha bi zanebûna xwe hatibû naskirin. Mihamed, deme ku diaxift, yê ku herî zêde bala wî li ser Mihamed bû, di wê heyeme de mîr bû. Mîr deme ku ew diaxift, bişaq mabû û hisandibû. Seyde Xûsrew ji her weha pir bibal, bala dabû ser wî û lê hisandibû. Seyde Xûsrew, Mihamed bi aqilê xwe ve nas kiribû. Ew naskiribû ku çend bi zane ya û aqilê wî mazina. Piştî ku hatibûbûna wir, êdî di civatên xwe de, gelek caran seyde Xûsrew diaxiftinên xwe de bal daya kişandin li ser Mihamed. Di axiftinên xwe de bahsa wî kiriya. Kiriya ku yên ku lê dihisênin, li Mihamed pir bi bal bibin. Mihamed, piştî ku ew hinekî bi hev re mabûn, piştîre êdî di dilê wî de cih girtibû. Seyde Xûsrew ji pir hij wî kiribû.

Di wê heyeme de, li dergaha seyde Xûsrew, civate wan weke qadarekê li hew dimêne. Piştî ku weke qadarekê li hew dimêne, êdî piştîre ne bi gelekî re dikin ku rabin û hinkî li ser xwe di nav malan bigerihin. An ji hinekî ji xwe re herine binîya malan û hinekî li ser xwe bigerihin û bêhne xwe bistênin. Civate wan, ew demek bû ku li hew bû. Ew demek bû ku bi hev re di axiftin. Êdî wilo zêde axiftin ji ne dibûn. Piştîre her weha hinek rewş bi rewşe rabûnê, êdî ne bi gelekî re seyde Xûsrew kir ku bêje mirovan ku bi hev re derkevin û hinekî li ser xwe bigerihin. Pêdivîya wan ji bi wê yekê hebû. Ji ber ku ew demeke dirêj bû ku di hundurê de li hevdû rûniştî bûn. Ku rabûn û çûn ku li ser xwe bigerihin, êdî wê haya deme ber amedekirina şîvê wê li ser li derve maban. Piştîre ku çûn û vegerehen êdî wê li qasre mîr rûniştiban û wê li wir civate xwe li dar xistiban. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ew civate wan ya dawiyê bû ku wê li wir lê rûniştiban. Wê roja din wê bi rê ketiban. Wê çûban. Wê, ku xwûde haskê,

wê xwe di Kirmaşanê ve gihênine Dînwerê. Her weha qewlê wan bi wan û demê re hebû. Ew ji her weha li ser qewlê xwe bûn. Di hizre xwe de bûn.

Civate ku li dergaha seyde Xûsrew li hew rûniştibû, piştî ne bi qadarekê re êdî dike ku rabe ser xwe û piştî bi hindikî ji di rabe ser xwe. Deme ku di rabine xwe, êdî di pêşengiye mîr de û seyde Xûsrew de, dikin ku derkevîne derve. Deme ku di rabina ser xwe ji bo rabûne, hingî Mihamed û Seyde Avdîrehîmê xaniqî di rex seyde Xûsrew û mîr de de ne. Mîr bi seyde Xûsrew re di rex hevdû de li pêşîya civatê ne. Ku dirabine ser xwe, êdî derdikevine derve û dikin ku hinekî li ser xwe bi gerihin. Piştî derdikevine der ve û hinekî li ser xwe digerihin. Li derve ji hewayaka pir xweş û hînik hebû. Hewa ber êvarî, ku dikete ber roçûna ava de pir xweş dibû. Bêhne mirov derdixist. Dilê mirov xweş dikir. Ew hewa, weke hewayaya yên bi dil bû. Wilo di dil de bû. Wilo bi dil xweş bû û dil xweş dikir.

Dem hatibû ber êvarî. Êdî çûn û hatin ji zêde bûbû. Mirovên ku diçûn û dihatin pir bûn, li derve. Axlabê ji jin bûn, yên ku diçûn û dihatin. Lê di wê demê de ne tenê ew, jin û mîr û zarok ji li ser lingan bûn. Pir dengê wan dihat. Ew dem, demeke ku pir xweş bû. Wê demê, dilê mirov xweş dikir. Di wê xweşbûna demê de, ti kesek di hundurê de ne dima. Herkesek derdiket. Dapîr û bapîrên ku ji pîrbûnê nikaribûn li ser bigerihin ji, di wê demê de li ber devê derî li ser tiştêkî ji xwe re rûniştibûn. Ew ji axlabê wan ji, bi tenê ne dihatina hiştin. Ew hertimî ne i tenê bûn. Ew pîrê jiyane bûn. Ew wilo dihatina dîtin. Ji wan re dihata gotin "pîrên jiyane". Pîrê jiyane, di wate xwe de di jiyane de di nav salan de çûyîn dianî ser ziman. Zanebûneka jiyane ji bi xwer re bi mirov dianî ser ziman. Mirov karîbû ku vê bêje, weke ku di nav xalkê de dihata ser ziman, di wate zanistîtiyê de ji bêne ser ziman. Her weha bi wate bû. Ev wate ji bo wan pîran dihata ser ziman. Bi wan re gelek nirxên jiyane ji li ser ziman bûn. Rêze li hevberê wan, ji xwe li ser ne dihata gotûbêj kirin ji. Divîbû li hevberê wan rêzeke mazin bihatana nîşandin. Ev yek weke çand û kevneşopîyeke xalkê bû.

Li ku civat, li dar diketin, ew ji di nav de li koşa herî li berçav bûn. Deme ku ew diaxiftin ji, li wan pir bi bal dihata hisandin. Li wan, deme ku ew diaxiftin, pir bi bal dihata meyzandin. Deme ku diaxiftin ji li wan pir bi bal dihata hisandin. Her weha balaka mazin li ser wan bû. Çavên herkesekî li ser wan û li wan bû. Di wê heyeme de ji, li dore mîr û seyde Xûsrew ji pir mirovên ku pîr û navserî xwe hebûn. Ew ji bi wan re dimeşîn. Deme ku ew diaxiftin an ji dikirin û an ji dixwestin ku tiştêkî bêjin

an ji bênine ser ziman, pir bi bal li wan dihata meyîzêndin û hisandin. Bi vê yekê, li ber wan sekinandin hebû. Di civatekê de rêz û pêşketine wê, di rêze wê ya li hevberê kalên wê de tê ser ziman. Ev yek ji , weke kevneşopîyekê bû. Deme ku me ev gotin got û anî ser ziman, hingî, me çandak û kevneşopîyek ji anî ser ziman. Ev di wê têgihiştinê de ne. Em di wê farqê de ne. Di vir de ew pirs ku mr li jor kiribû, wate maztir distêne. Me pirsê bû ku ji ber çi hertimî li civata mîr mirovên navserî xwe yên dimênin? Bersive vê pirse, li vir, bi hinek avayan tê ser ziman. Pîr ji ber ku çanda mazin ya civakê dianîn ser ziman. Ew yên herî bi bandûr bûn bi hebûna xwe ya kalitîyê re. Bi vê yekê re, deme ku mîr ew li civata didana hevdû, weke ku zanebûn û têgihiştinê civakê hemûkî li xwe bide hevdû dibû. Wî ji ev yek hizir dikir. Yên ku di nav xalkê de yên herî bîrewer ew bûn. Yên ku herî zêde di farq û têgihiştina bûyînan de bûn, ew bûn. Li wan hisandin, weke ku di av xalkê de yek bi yek li xalkê hemûkî bê hisandin bû. Her weha bû. Mîr ji, ji ber ku mazinê xalkê bû, ew ji divîbû ku xwediyê zanebûna xalkê ji bana. ev yek ji di qasre mîr de divîbana ku bi cih bana. Mîr, hingî mîr bû.

Di wê heyeme de, mîr ji ne zêde ciwan bû. Pîr bû. Lê hê hinekî ji li ser xwe bû. Weke ciwanekî, ku lê dimeyîzend, mirov ew li ser xwe didît. Ew pir li ser xwe bû. Ew pir bi xwe bû. Deme ku diaxift ji, dengê wî bilind bû. Dengê wî li ser yê mirovên li dore wî bûn re bû. Ew her weha li ser bû. di wê heyeme de derketibû bûna derve û li ser xwe digerahan. Deme ku dimeşîn ji, pir bi deng mîr diaxift. Dengê wî di wê civate li dore wî dihat. Hinekî ji dor ji, mirov dengê wî his dikir. Dengê wî dihata mirov. Ew di bin wê hînkayîya ber êvarî de li ser xwe ji xwe re digerahan. Mîr ji xwe bitifre bû. Yên ku pêre digerahan ji, bi wan re ji bitifrebûnekê xwe dide der di wê heyeme de. Lê ji xwe, ew ji bi tifre bûn. Ew ji axlabê wan ji, yên k pîr û navserî xwe bûn. Yên ku bi aqilê xwe re mazin bûn. Yên ku xalkê rêzeke mazin dide wan bûn. Ew mirovne bitifre bûn, lê ne mirovne ku bîaqilê xwe, ji xwe qayîl bûn û xwe li ser xalkê re didîtin. Ji xwe rast ji ne dihata dîtin..

Bi mîr û Seyde Xûsrew re, mirovên ku derketibûn û li ser xwe digerahan ji, weke qadarekê li ser xwe digerihin. weke qadarekê li ser xwe diçin û tîn. di wê heyeme de çûn û hatin ji pir hebû. Lê k hinekî dî ji dem têve çûbû bû, êdî ew çûn û hatin ji hinekî dî ji zêdetir bûbû. Ji ber ku di malan de êdî hêdî hêdî sawal û pazên wan dihat, êdî ji ber wê çûn û hatin zêdetir dibû. Deme ku sawal û paz hat, êdî em amede kirina jê re û dohtina wê, divîbû ku di cih de bûbana. Deme ku sawal hat, ne bi gelekî re divîbû ku bihatana dohtin. Ji ber ku deme ku sawal çû ser delavan ji ber ku êmê xwe bixwe,

êdî wê berxik û kahrikên wan ji hatibana berdan li ber wan. Êdî wê zor bûbana ji bo dohtinê. Ev yek ji divîbû ku bi zanebûn bihatana kirin.

Mîr û Seyde Xûsrew û mirovên bi wa re ku dimeşîn ji, di riya xwe de di dîtî ku wa hin bi hin sawal têt. Ro ji li ber çûna ava bû. Hinekî dî ji dem bbuhurtibana, êdî wê bi timî roj çûbana ava. Ro, ku diçû ber avabûnê, li ber avabûnê, dinye weke ku hinekî sor bibe lê dihat. Wilo xweşik dihata ber çavan. Lê wê deme sorbûnê ji zêde berdewam ne dikir. Hinekî ber dewam dikir. Piştî bi qadarekê re, êdî ro ku diçû ava, êdî wê sorbûna xweşik, cihê xwe ji bi ber reşbûnê ve çûnê re dihişt. Ku ro bi timî diçû ava ji, di cih de dinye reş ne dibû. Hinekî dima. Di wê demê de ji, dinye xweş bû. Di wê demê de ji mirov li derve bûn. Lê di wê demê de, êdî hin bi hin karê xwe bi ber xilasbûnê ve birine û êdî wê kin ku herine hundur û bi hev re şîve dênine ber xwe û bi hev re bidest pê bikin. Ew deme piştî ro çûna ava, zêde wilo wilo ne mêne. Piştî ne bi gelekî re êdî ew rahnîbûna piştî roçûna ava re, hêdî hêdî cihê xwe ji reşbûnê re di hêle û diçê. Hin bi hin êdî reş ji dikeve ardê de.

Dem ku her weha hin bi hin bi ber reşbûnê ve diçê, êdî mîr û seyde Xûsrew û mirovên ku bi wan re ji ne, dikin ku herine hundur. Lê vê carê, wê, ku çûna hundur, wê çîna qasre mîr. Nahaka li wir, ji bo wan amedekarî tê kirin. Yê li qasrê ji, li bendê ne, ku êdî wê mîr were. Li bendê ne, ku ha mîr ha û ha mîr ha.

Ji xwe, piştî ne bi gelekî re ew ji berê xwe didine bi qasrê ve û diçin. Di pêşengiyê mîr de. Mîr mirovên ku pêre ne, dide dore xwe û têne qasrê. Li qasrê nahaka amedekariya wan ji tê kirin. Ji xwe, gelek mirovên ku pêre ne ji, mêhvan in. Ji bo wan ji amedekarî tê kirin. Ji qasra mîr, ti carî mêhvan qut nebin kî. Hertimî mêvanên wî hene. Hertimî yê ku li qasrê li mîr mêhvan in hene. Ji ber vê yekê ji, hertimî li qasrê amedekarî dihata kirin. Ev yek, weke karakî ji rêze bû. Hertimî dihata kirin. Qasre mîr mazin bû. Di nav xalkî dihata gotin, "mala mazin" hertimî lê mêhvan hene. Mal mazinti, weke gotinaka biçand bû. Li ser zimanan bû. Pir bahsa wê dihata kirin. Di nav xalkê de dihata gotin "yên mal mazin". Yanî, yê ku hertimî li mala wan civat û mêhvan hene. Gotina mal mazintiyê, weke mazinbûneka di asta serektiyê de ji dianî ser ziman. Yê ku di nav xalkê de li pêş bûn navê wan hebû, ew bûn mal mazin. Yê mal mazin ew bûn. Mîr ji mal mazin bû. Ew ji, qasra wî mala mazin bû.

Piştî ku berê dana bi qasrê ve, êdî hêdî hêdî bi axiftin ketine rê de û çûn. Di riya xwe de hem diaxiftin û hem ji dimeşîn. Seyde Xûsrew û mîr, yê ku herî zêde di wê heyeme de diaxiftin ew bûn. Mihamed, du sê caran

wî çend gotin gotibûn. Lê ji wê pêde wilo zêde ti axiftina wî ne bûbû. Lê Seyde Avdilrehîmê xaniqî pir axiftibû. Ew di rex seyde Xûsrew de bû. Li ber çav û pêş bû. Ji ber vê yekê, deme ku axiftin dibûn, êdî bal diçûna ser wî ji. Wî ji li ser axiftinên ku dihatina kirin û an ji li ser mijarên ku li ser dihatina axiftin li gor zanebûna xwe hizre xwe û zanebûna xwe dianî ser ziman. Yê wî, zanebûna wî pir mazin hebû. Wî pir xwandibû û pir ji geraha bû. Dinye bi çavên serê xwe dîtibû. Wî ji her weha zanebûna xwe dianî ser ziman. Lê bal li ser Mihamed ji hebûn. Di serî de bala mîr li ser wî bû. Seyde Xûsrew ji bala wî car bi car li ser wî bû. Li wî dimeyîzend. Wî pir hij Mihamed dikir. Wî Mihamed pir bi zanebûn dîtibû. Ji ber vê yekê ji, Mihamed pir di serê wî de cih û war girtibû. Wilo ji xwe re bi hev re diaxivin û dimeşin û têne qasrê. Piştî ku berê xwe didina qasrê û dikevîne rê de, êdî ne bi gelekî re tîn û digihine qasrê. Deme ku tîn û digihine qasrê, êdî di qasrê de di pêşengtiye mîr de rê digirin û diçûna *dîwana rûniştinê*. Deme ku dîwana rûniştinê, êdî bi hev re di pêşengtiye mîr de lê di rûnihin. Piştî ku ew hatibûna qasrê, êdî li qasrê ji bo wan, çûn û hatin zêdetir bûbû. Wê xwarin hatibana ber wan û wê wan xweribana. Piştî wê şiranîyên wan ji wê hatibana ber wan û piştî hin bi hin êdî wê civata wan mazin bicih bûbana û axiftinên wan yên civatî wê dest pê kiri bana. Wê ji xwe di nav hev de wê axiftiban, êdî.

Piştî ku bi hev re hatina qasrê û li wasrê buhurtina dîwana rûniştinê û lê bi hev re di pêşengtiya mîr de rûniştin, êdî piştî ne bi gelekî re li ber wan bidest amedekirina sofere hata kirin. Wê şîv ji wan re hatibana. Wê bi hev re xwaribana. Yê ku di wê heyeme de bi vê yekê ve eleqeder dibû ji Rêzan bû. Ew di qasrê de xwediyê wî karî bû. Wî kar û barên wilo didana kirin û amede kirin. Weke mirovên ku di qasrê de wî dibê kirin û were ber mîr û wan û wê di çî demê û kengî were ber wan ji, wê kifş dikir. Ew her weha pir mazin bû. Ew di wê heyeme de bi mîr û wan re bû. Bi wan re digeraha. Deme ku mîr çûbû dergahê bi Mêhvanîn wî re ew ji b wan re bû. Piştî deme ku çûbûbûn ji bo li ser gerandinê, ew ji dese bi wan re bû. Bi wan re diçû û digeraha. Piştî ku hatibûbûna qasre û li hevdû rûniştibûn ji, ew ji bi wan re bû. Hinekî li hevdû ji rûniştibûn û çend gotin ji ji hevdû re kiribûn. Piştî karê sofere hatibû kirin. Deme ku wî dîtibû ku wa kara sofere xwarinê tê kirin, êdî ew ji ji cihê xwe labitî bû û çûbû derve û gotibû amedekirinê bikin û sofere bênine hundur. Piştî ku Rêzan gotibû ku sofere bênime hundur êdî bi hev re çend mirov kirin ku li pêşîya mîr û civatê sofere vekin. Deme ku bidest vekirina sofere hata kirin, di demeke kin de sofere hata vekirin. Ku sofere hata vekirin û Rêzan ji amede bû, piştî mîr herkes

buhurî ser sofre xwarinê ya ku li ber wan hatibû vekirin kir. Deme ku mîr herkesek buhurî ser sofre kir, êdî herkesek bi hev re çûne ser sofre û bi hev re li ser sofre li dore wê bûna kom. Mihamed di wê heyeme de li nêzîkî Seyde Avdilrehîmê xaniqî û seyde Xûsrew rûniştibû. Li Mihamed li cihê ku lê rûniştibû ji, pir li berçav bû. Wilo di wê heyeme de rewşe bi xweza ketibû derba xwe de.

Piştî ku bi hev re xwe li dore sofre dana hevdû, êdî biafiyet bidest xwarina xwe kirin. Lê deme ku xwarina xwe dixwarin ji, diberde car bi car axiftin ji çêdibû. Seyde Xûsrew û mîr û hinekî mirovên din diaxiftin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji car bi car hin gotin digotin. Lê wilo zêde axiftin ne dikir. Riya axiftinê ji seyde Xûsrew re hiştibû. Ew yê mazin û pîroz bû. Mîr ji deme ku ew diaxift, pir bi bal û hey, heya xwe didaye de û lê dihisand. Lê dihisand ku ka ewê çi vebêje. Ya rastî, deme ku ew diaxift, ne tenê mîr an ji seyde Avdilrehîmê xaniqî dimana sekinî. Bi wan re herkesekê li wir bêhis dimana sekinî û lê dihisandin, ku ka ew wê çi ji wan re vebêje. Seyde Xûsrew mirovekî ku zane û pîr bû. Navserî xwe bû. Her vebêjina k wî dikir bi bal lê dihata hisandin. Pir bal diçûna ser wî. Ji xaynî vê yekê ji, ew pir bi nîrx û zane bihata zanîn. Ew bi dergah bû. Mirovekî ku bi dergah ne hasanî bû. Bi nîrx û mazin bû. Mirovên weha, ji aliyê herkesekî ve pir bi bal dihatina şopandin û rêzeke mazin ji wan re dihata nîşandin. Di wê heyeme de ji Seyde Xûsrew re wilo rêzeke mazin dihata nîşandin. Mihamed ji rêzeke mazin didayê de. Wî ji qadrekî mazin didayê de. Di deme ku Mihamed li wir mabû de, Mihamed hertimî li ba wî mabû. Li dergaha wî mabû. Li her axiftinên wî hisandibû. Li dergahê çend zanebûn hebû, wî di xwe de girtibû. Di wê deme ku Mihamed li dergahê mabû de, deme xwe ya ku bitenê mabû, hemû ji bo xwandinê vaqatandibû û li wir xwandibû. Li wir pir pirtûk hebûn. Seyde Xûsrew di dergaha xwe de weke ku çawa ku mîr di qasrê de kiribû, beşek tenê ji bo pirtûkan vaqatandibû û ku derfet ji didît, diçû wir û li wir dirûnişt û dixwand. Li wir wî, her weha ji xwe re rewşek afirandibû. Mihamed, deme ku hatibû wir, di cih de ev yek farq kiribû. Piştî ku wî farq kiribû, êdî ji seyde Xûsrew re piştire tişte ku dîtibû anî ser ziman û seyde Xûsrew ji rewşe wir, weke ku ta bi derziyê ve bike jê re anîbû ser ziman di wê heyeme ku wî pirsî bû de. Piştire wî bidestê Mihamed girtibû û biribû û li beşa ku wî weke cihê xwandinê bi kar dianî herandibû. Mihamed, di serî de deme ku cara pêşî hatibû wir, hinek pirtûk dîtibûn û bala wî çûbû bû ser wan. Piştire ku herkeek çûbûbû û razaha bû ew hatibû û li ber wan pirtûkan rûniştibû û bidest li meyîzendina wan kiribû. Piştire seyde Xûsrew ji hatibû û ew di wê rewşe de dîtibû. Piştî ku

wî ew wilo di wê rewşê de dîtîbû, piştre hinekî li ber hevdû axiftîbûn û piştre seyde Xûsrew çûbû ku hinekî razihê. Lê ew rewş di serê Seyde Xûsrew de mabû. Roja dî, deme ku ji xewê rabû bûn û piştre ku çûbû bûn û mêjkirîbûn û piştre ku vegereha bûn dergahê, êdî piştre ku hinekî li hevdû rûniştîbûn û axiftîbûn, piştre êdî seyde Xûsrew biçengê Mihamed girtîbû û birîbû wê beşa ku wî weke beşa pirtûkan dabû amede kirin. Deme ku Mihamed ketîbû wir de bi wî re, hingî, pir mabû şaş û mat. Ma gelo di xewnekê de bû? Ne ne di xewnekê de bû. Tişte ku didît ji rast bû. Wilqas pirtûk..! Mihamed, pir mabû bû şaş û mat. Seyde Xûsrew mezeleke mazin ku bi hêtan ve ref ji hatîbû çêkirin û gelek pirtûk li ser wan refan li ser hevdû di rêzê de bûn.

Mihamed deme ku ketîbû wir de pir mabû şaş û mat. Piştre Mihamed gelek demên xwe di wê mezê de bi seyde Avdîlrehîmê xaniqî û seyde Xûsrew re buhurandîbû. Li wir, xwandîbûn û bi hev re danûstandîbûn. Mihamed, di serê de deme ku li ber hêt pirtûk li ser hevdû dîtîbûn û bala wî çûbû bû ser wan, wê hingî zan kirîbû ku ew pirtûk tenê hene. An ji qey çendeke din ji hebin û hwd. Ji wan pêve wê pirtûk ne bana. Lê deme ku seyde Xûsrew deriyê mezele pirtûkxanê li ber wî vekirîbû, pir mabû şaş û mat. Li wir pirtûkên pir zanistên kurd hebûn. Ji xaynî wan ji, yên pir zanistên herêmî û ku navê wan hebû ji hebûn. Her yek li gor rêze xwe hatîbû bicih kirin. Seyde Xûsrew, cihekî ku pir xweşik ji dabû bû amede kirin. Piştî ku Mihamed, seyde Xûsrew ew birîbû wir û li wir hinekî ji li hevdû rûniştîbûn, piştre Mihamed ji wî pirsî bû ka çawa ewqas lihev gihandina hevdû. Seyde Xûsrew ji, jê re bahs kirîbû ku ka çawa lev gihandîbûna hevdû. Deme ku Mihamed ji seyde Xûsrew pirsî bû û gotîbû ku "te çawa ewqas pirtûk lev gihandina hevdû", hingî, seyde Xûsrew li Mihamed meyîzendîbû û weke ku hinekî bi beşîşê lê hatîbû. Lê weke ku kêfe seyde Xûsrew ji hatîbû ku Mihamed her weha jê pirsî bû. Seyde Xûsrew, deme ku Mihamed jê pirsî bû, hingî wî bersiv dabû û gotîbû " di deme kalkê min de ji û berî wî ji ev rewş hebû. Lê Bavê min hinekî aşqî xwandîbû. Wî ji hinekî lê zêde kirin. Min ji çendek lê zêdekirin. Lê ne biqasî wan. Wan pir li hevdû zêde kir". Deme ku Seyde Xûsrew wilo gotîbû, êdî Mihamed ji "nexwe dikeve ser piştre tê ku biqasî wan lê zêde bike". Ku Mihamed wilo gotîbû, êdî seyde Xûsrew li Mihamed meyîzendîbû û weke di dilê wî de xweşbûnak hebe, jê re gotîbû " ti rast dibêje" û mabû sekinî. Lê piştre pir bi hevdû re axiftîbûn. Li ser pir tişt û mijaran bi hev re hizre xwe hevpar kirîbûn. Seyde Xûsrew ji, weke ku kêf xweş bûbû ku rastî mirovekî zane weke Mihamed hatîbû. Du mirovên zane

ku li ber hevdû bûn. Ji hevdû fahm dikirin. Deme ku mirov ji hevdû fahmkir, hingî, mirov di xwe de bi hestiyarî ji geş dibe. Ew ji wilo ji bûbûn. Seyde Xûsrew wilo bûbû. Mihamed ji kêf bûbû. Ji rudên û rewşe wilo dihata têgihîştin. Seyde Xûsrew mirovekê weha bû. Vêce ku mirovekî weha axift û lê newê hisandin, me ka dibû? Ne, nedibû. Wê ne bana ji.

Mihamed, di wê heyeme de li ser sofere di naqabîna seyde Avdilrehîmê xaniqî û seyde Xûsrew de bû. Lê bala Mihamed ji xwarinê zêdetir li ser seyde Xûsrew bû. Li wî dimeyîzend. Pir li wî dimeyîzend. Mîr ji bala wî li ser Mihamed bû. Mîr weke ku ew balbûna Mihamed ye li ser seyde Xûsrew kifşkiribû. Lê ti tiştê ne dabû der û kifşkirin. Mihamed ji weke ne di farqê de bala wî li ser Seyde Xûsrew bû. Ew deme ku wî li wir buhurandibû di serê wî de bû. Mayîna wî ya li dergaha seyde Xûsrew di serê wî de bû. Li ber çavên wî bû. Ew rewşe pirtûkxanê ya lidergahê li ber çavên wî bû. Wî ew ji bîr ne dikir. Wî rewşeke wilo di qasre mîrê bota de dîtibû. Pişt wî re ku ne weke wê ji bana li Zaxoyê li qasre Mîr Bîrehîm rewşeke wilo hebû û li wir li dergaha seyde Xûsrew ji hebû. Ya rastî ku mirov bêje, li qasrên mîran hema bêja hemûkan beşên pirtûkan hebûn. Ev yek li ber çavan bû û weke kevneşopîyekê bû. Lê van hersê cihan pir mazin di xwe de afirandibûn. Berî wê demê, navê Mîr Zengî hebû. Li qasre wî ji bahsa rewşeke wilo dihata kirin. Ji gotina, di gotin ku wî di qasre xwe de pirtûkaxanayaka ku ne bin sadhezar pirtûkî ku têde ya avakiribû. Salahaddînê Eyûbî ji di wê pirtûkxanaya wî de deme xwe ya ciwantiyê buhurandibû. Ev yek pir jê dihata axiftin. Pir li ser dihata axiftin. Ku di civatan de bahsa Mîr Zengî dihata kirin, ev yek pir li ser dihata sekinandin. Di wê heyeme de ji ku ne weke wê ji bana, nêzîkî wê rewşê, rewşek hatibû afirandin. Xwandin, weke kevneşopîyekê hebû. Mihamed, deme ku wî li seyde Xûsrew dimeyîzend weke ku ew rewşe ku wî di dergaha wî de dîtibû ji li ber çavên wî bû. Seyde Xûsrew, ji weke ku ne di farqe ku bala Mihamed li ser wî bû. Car bi car ji diaxift. Wilo li ser xwarinê, xwarina xwe dixwar û car bi car ji diaxift. Wê rewşê, haya ku wan xwarina xwe xwar û bidawi kir, berdewam kir.

Piştî ku xwarina wan hata ber dawiyê û bidawi kirin, êdî piştê ne bi gelekî re kirin ku xwe bidine bi paş ve. Lê di wê heyeme de kê têr xwar di cihê xwe de ma sekinî. Xwe ne bi paş(şûn) ve. Di cihê xwe de ma sekinî. Mîr ji weke ku têr xwaribû. Lê wî xwe ne dide bi paş ve. Li ber mirovên li ser sofere yên ku dixwarin ku bixwûn bû. Ku wî xwe dabana bi paş ve, wê pê re mirovên li wir ji wê xwe daban bi paş ve. Ji ber vê yekê, edî ew ji mabû sekinî di cihê xwe de li ser sofra xwarinê. Seyde Xûsrew ji weke ku

tê xwaribû. Lê wê ji xwe ne dide bi paş ve. Ew ji li bendî Mîr bû. Wî ji wê bi mîr xwe bi şûn ve dabanê de. Ji xwe êdî ku wan xwe bi şûn ve dayê de, êdî wê mirovên din ji xwe bi şûn ve dabanê de. Rewş wilo bû. Mihamed ji weke ku têr xwaribû. Lê ew ji di cihê xwe de mabû bû sekinî. Lê hê bala wî bi hey li ser seyde Xûsrew bû. Li wî dimeyîzend. Mîr ji bala wî li ser wî bû. Car bi car wî ji li wî dimeyîzend. Her weha wê rewşe wan ji di nav wan de berdewam dikir. Hê ji seyde Xûsrew weke ku heya wî ji wê rewşê nebe bû. Lê di nav xwarin xwarinê de car an ji du caran serê xwe zîvirandibû û li Mihamed meyîzendibû. Piştî careke din serê zîvirandibû ber xwe û bidest xwarin xwarina xwe kiribû. Seyde Xûsrew ji di wê heyeme de hê dixwar. Lê di nav xwarin xwarina xwe de ji bi mirovên di rex wî de wî car bi car bi gotinne ji bê diaxift. Ev yek ji ber çavan en diravî. Cerna, deme ku diaxift, dengê diçû mîr û an ji Mihamed û Seyde Xûsrew. Deme ku wilo weke ku dengê wî diçû wan, wan ji serê cerna ji ber xwe di zîvirand û li wî dimeyîzend. Di wê heyeme de ku serê xwe di zîvirandin ji, ku wê hin gotin gotiban ji digotin û piştî careke din serê xwe di zîvirandina ber xwe û bidest xwarin xwarina dikirin.

Di deme ku seyde Xûsrew Axiftibû de du an ji sê caran Mihamed serê xwe zîvirandibû û li seyde Avdilrehîmê xaniqî meyîzendibû. Di herdû an ji sê caran de ji wî di axiftin û an ji gotin ne kiribû. Tenê wilo lê meyîzendibû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî di cara dawiyê de farq kiribû ku Mihamed berê xwe daya wî û li wî meyîzendiya. Di wê deme ku wî farq kiribû de ji, wî ji serê xwe ji ber xwe bi ber wî ve zîvirandibû û li wî meyîzendibû. Deme ku li wî meyîzendibû ji, bi wî re çav bi çav hatibû. Lê ti gotin ji devê yekî ji ji wan derneketibû. Herdû ji bêdeng mabû. Tenê wilo bi bêdengî hinekî li hevdu meyîzendibûn. Piştî careke din serê xwe zîvirandibûna ber xwe di wê heyeme de. Mihamed pir bi bêdeng bû. Zêde wilo ne axiftibû. Tenê cerna li dore xwe dimeyîzend. Di wê deme ku dimeyîzend de ji ku bi hinek mirovên ku bala wan li ser wî bûn re çav bi çav dihat ji gotinak an ji du gotin dikirin û hwd. Ji wê pêve ti tiştêkî di ne dikirin. Lê bala mîr li ser Mihamed bû. Hîç ji ser wî qut ne bûbû. Bi avirne ku ew diparzinand li wî dimeyîzend. Mihamed ji piştî farq kiribû ku bala mîr bi hey li ser wî ya. Ev yek wî ji farq kiribû. Lê çend ku farq ji kiribû, wî ti tiştêk ne gotibû. Wî tenê careke an ji du caran avirên xwe biribûbûna ser wî û hwd. Ji wê pêve ti tiştêkî di ne kir. Lê bala wî ki ser seyde Xûsrew bû. Her gava seyde Xûsrew weke ku di ber çav de digirt. Wilo dihata xuyakirin. Deme ku mirov li Mihamed û rewşe wî dimeyîzend, ev yek farq dikir.

Wê rewşê, haya ku wan xwarina xwe xwar berdewam kir. Piştî ku hemûkan xwarina xwe xwar, êdî mîr ji ku fahm kir ku herkesekî xwarina xwe xwar, êdî xwe bi seyde Xûsrew re bi hev re da bi paş ve û deme ku wan xwe da bi paş ve, êdî mirovên din ji yênlî dore sofrê ji bi careke re xwe dana bi paş ve. Piştî ku wan xwe da bi paş ve, êdî di cih de çend mirov ji derve hatin û di cih de bidest li hevdana sofrê li hevdû kirin. Ew mirov ji li ser li ber dêrî sekinî bûn. Ji ber ku wan xwarin xwar, da qana di cih de werina hundur û sofrê bidine lev hevdû. Piştî ew hatin û wan sofrê li hev da hevdû, piştê ne bi gelekî re êdî şîranîyên wan yên wê xwariban û vexwariban hatina ber wan. Ku hatina ber wan, êdî wan ji bi hev re bidest xwarina wê kirin. Weke qadarekê bi xwarin û vexwarina şîranîyên xwe ve ji man. Di wê heyeme de hem dixwarin û divexwarin û hem ji di axiftin bi hev re di wê heyeme de. Hêdî hêdî axiftina wan ji di nav wan de bi wan re zêde dibû. weke qadarekê piştê êdî axiftina wan bi wan re êdî hinekî din ji zêde bû. Di wê heyeme de yê ku herî zêde diaxift ji mîr bû. Weke ku dixwest ku pêşengtiya axiftinê bike û axiftinan bide kirin, di wê heyeme de axift. Piştê ku qadareke di têve çû, êdî weke ku axiftina di nav wan de germ û gurr bû..

Ku di nav wan de axiftina wan ye bi hev re zêde bû, êdî piştê ne bi gelekî re seyde Xûsrew û yên weke wî ketine devrê de û axiftin. Ku ew axiftin, êdî axiftin û danûstandina di nav wan de pir mazin bû. Ew mirovên mazin bûn. Deme ku ew diaxiftin, wê ne hesanî axiftiban. Wê mazin axiftiban. Bi axiftina wan re wê axiftin zêde bûbana. Ji xwe ye ku pir wan bû ji ev bû. Mihamed ji piştî ku seyde Xûsrew axiftibû, pişt wî re çend gotin wî ji gotibûn. Wî ji, ku seyde Xûsrew li ser çî axiftibû, ew ji li ser heman tiştî axiftibû. Pêve axiftibû. Axiftina Mihamed weke berdewama axiftina seyde Xûsrew bû. Mirov, ku weke berdewama hevdû biaxivê, divêt ku mirov zanabûna hevdû zanibe û weke hevdû kur bê.. Seyde Xûsrew pir kur bû. Mihamed ji pir kur bû. Ew herdû ji di aqil û hizre xwe de serweriya wan pir mazin hebû. Ji ber vê yekê mirov karê bêje ku ne bin hevdû re bi zanebûn bûn.

Deme ku seyde Xûsrew axiftibû û pişt wî re Mihamed axiftibû, pişt wî re mîr axiftibû. Mîr ji pir hij axiftinê dikir. Zanebûna wî ji pir hebû. Xosletekî wî yê ku zêde dikete ber çavan de ew bû ku wî hertimî dixwest ku ye di serî wî de çî hebû bi mirovên ku li dore wî lê di hisandin re hevpar bike. Ev yek di wê heyeme de pir dihata ber çavan. Mirov fahm dikir û didît. Mîr, xosletekî wî yê din ji her weha ew bû ku weke zarokekî ku di serî wî de hizre hebe û ji vegotinê re bêsabir bê bû. Wilo dihata ber çavan.

Deme ku mijarak dihata ser ziman, ku li ser wê zanebûn û hizre mîr hebene, di cih de li xwe dianî ku biaxivê. Deme ku wî li xwe dianî ku biaxivê, hingê ji, bala mirovan di cih de diçû ser wî. De ne, ew mîr bû. Ma ku bala mirovan ne çûbana ser dibû? Ne, ne dibû. Ew di civatê de ji di wê heyeme de li serê civatê rûniştibû. Li ber çavên herkesekî rûniştibû. Çavên herkesekî li ser wî bû. Bala herkesekî li ser wî bû. Yên ku li ber wî diaxiftin ji pir bi bal û hey diaxiftin. Hişyar dikirin ku pir bi zanebûn biaxivin. Wilo pir bi bal bûn. Pir bi hey bûn. Pir bi hişyar bûn.

Mihamed ji deme ku mirov li wî û xosletên wî dimeyîzenê, mirov xosletekî wî yê wilo dibîne. Mirov dibîne ku deme ku li ser mijaraka ku hata ser ziman, ku hizir û zanebûna wî mazin hebû. Weke ku xwe ne digirt ji vegotinê re. Wilo ew ji dihata berçavan. Mihamed pir bi zanebûn bû. Wî pir di nivîsand. Li Zaxoyê, wê ew nivîsandina xwe berdewam kiribû. Li wir wî pir nivîsandibû. Çawa ku weke ku wî, deme ku ji Cizîre bota bi rê ketibû û hinekî nivîsên xwe yê ku wî nivîsandibûn radestî faqa Qasim kiribûn û li wir hiştibûn, di wê heyeme de li Zaxoyê ji hin nivîsên wî yê ku wî li wir nivîsandibûn û li wir mabûn hebûn. Lê weke ku çawa ku deme ku ji Cizîre bota hatibû Zaxoyê, hinek nivîsên xwe yê ku wî nivîsandî ji wî kiribûbana wî tûrikê xwe de û bi xwe re anîbûn wir ji, di wê heyeme de ji, wî hinek nivîsên xwe yê ku wî nivîsandibûn û di tûrikê wî de bûn û hîç ji xwe qut ne dikirin pêre bûn. Li wir, ew nivîsên wî heya seyde Avdilrehîmê xaniqî ji û seyde Xûsrew ji wan hebû. Berî ku werine wir, deme ku li dergaha seyde Xûsrew bûn, Mihamed hinek beş ji wan nivîsên xwe ji wan re ji civatê re anîbûn ser ziman. Mihamed di wê heyeme de ji hin ji wan nivîsên wî bi wî re bûn. Di ber wî de bûn. Deme ku mirov li wî dimeyîzend, çavên mirov bi wan diketin.

Piştî şiraniyên xwe re êdî civate wan ketibû nav axiftinên mazin de. Pir mazin diaxift. Yê ku aqilê wî heban di axiftinê de bû. Yê çî zanebûna wî hebene, di ber hevdu de dianîn ser ziman. Her weha rewşeke ku mirov bêje xweza afirî bû di civatê de di nav wan de. Di wê heyeme de, yê ku pir zêde axiftbûn ji mîr, seyde Xûsrew û seyde Axvdilrehîmê xaniqî û ku çend mirovên din yê weke wan di nav wan de mirov bihasibêne axiftibûn. Mihamed ji divêt ku mirov di nav wan de bihasibêne. Ew ji axiftibû. Lê ne weke wan. Ew pir dihizirî. Di serê xwe de pir di hizirî. Kî zane ku di wê heyeme de Mihamed id serê xwe de diçû kuderê û an ji li kuderê bû. Ne kifş bû. Lê deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov bi rehetî kifş dikir ku ew di serê xwe de di wê heyeme de ne li wir bû. Heya wî li ser axiftinan bû û tevî axiftinan ji dibû. Lê belê divêt ku mirov bêje ku ew di

serê xwe de weke ku li ser tiştne din ji dihizirî û di serê xwe de weke ku li derne din ji bû, ku ka li kuderê bû. Ev yek ji rewşe wî, ku mirov lê di meyîzend, mirov pir baş û qanc fahm dikir û têdigihîşt. Vê reeşê, hebûna xwe, di wê heyeme de bi Mihamed re haya ber dawiyê civatê derengîya şevê berdewam kir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji û seyde Xûsrew ji ew rewşa Mihamed kifş kiribûn. Didîtin ku Mihamed di serê xwe de li ser tiştne pir bihizira. Ka li ser çî wilqasî kur û dûr bi hizir bû. Di ber xilasbûna civatê de Mihamed, bi balkişandîna seyde Xûsrew ye li ser wî re wî ji kir ku çend gotinan êdî bêje. Bi vê yekê, di wê heyeme de weke ku were xwe lê hatibû di wê heyeme de.

Mihamed, ku hinekî weke qadarekê mabû sekinî, piştî weke ku hatibû xwe lê hatibû. Bi hatina navê wî ye li ser devê seyde Xûsrew re weke ku were xwe lê hatibû. Seyde Xûsrew, bi mihamed re berî hingî çend axiftibûn û li ser çî axiftibûn, ji civatê re anîbû ser ziman. Bi vê yekê, di wan demên ku ew û Mihamed li hevdû dirûniştin û ji hevdû re diaxiftin û di deme ku diaxiftin ji, ku li ser çî diaxiftin, di wê heyeme de hinekî anîbû ser ziman. Hinekî weke ku bixweze mazinbûna Mihamed ye ku wî di serê xwe de fahmkiribû bêne ser ziman. De ne, weke kevneşopîyeke heya ku deme ku mirovekî hêja were ser ziman, mirov bahsa kirinên wê dike. Ji kirinên wî mirov têdigihin ku ew başa an ji ne başa. Seyde Xûsrew ji di wê heyeme de ji bo Mihamed ne gotibû başa an ji ne başa. Tenê bahsa kirinên wî kiribûn. Ji wan gotinên seyde Xûsrew yên di derbarê Mihamed de, mirovên li dore wî têgihîştibûn ku ew başa an ji ne başa. Bi vê yekê, bal çûbûbûna ser Mihamed. Mihamed di bin balan de bû. Bala mîr berî hingî, wê kêlikê ji li ser Mihamed bû. Lê deme ku seyde Xûsrew axiftibû û bahsa wî kiribû, hingî, bala wî ji bêhtir çûbû bû ser Mihamed. Wî ji bi çavne raq li Mihamed dimeyîzend. Her weha bala wî li ser Mihamed bû. Her weha Mihamed di wê heyeme de bi axiftina seyde Xûsrew di wê kêlikê de hatibû ber çavan. Bal hatibûna ser wî di wê heyeme de.

Bi axiftina seyde Xûsrew re wê rewş weke qadarekê berdewam kir. Piştî ku seyde Xûsrew axiftina xwe bidawî kir. Êdî bal çûbûbûna ser Mihamed ku ew biaxivê. Mihamed ji ev yek farqkiribû. Ew ji bi axiftina seyde Xûsrew re weke ku were xwe lê hatibû. Bi axiftina seyde Xûsrew re ji axiftinê re ji weke ku geşbû bû. Her weha rewşe wî dihata xuyakirin û ber çavan. Piştî ku seyde Xûsrew axiftina xwe bidawî kir, êdî Mihamed ji xwe di cihê xwe de xwe adiland ji bo axiftinê û amede kir ku biaxivê. Tam ku wê axiftibana, seyde Avdilrehîmê xaniqî deng derxist û axift. Deme ku wî deng derxist û bidest axiftinê kir û axift, êdî Mihamed ji

tenê bi nêhte xwe ya axiftinê re ma û ma sekinî di cihê xwe de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku axift, wî hinekî dirêj axiftina xwe kir û hinekî li ser têgihîştin û zanebûnan û divêt ku mirovên bizanebûn çawa bin ser rawastaha. "Mirovekî zane divêt ku çawa bê?" Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku axiftibû di nava axiftina xwe de ev pirs ji kiribû. Weke ku ew bixwe bixweze bersiveke bide vê pirse xwe ye ku wî pirsîbû, li ser jiyan û hebûna hinekî zanistên demê yên navdar sekinî. Navê seydeyê mazin "meleyê Cizîrî, mele Hisêne Batê û ku berî wan jîn bûya Êlî herîrî, bahsa wan kir. Li ser wan hinekî rawastaha. BI wan re di nav axiftina xwe de pir li ser şêx Teymîyê Heranî ji sekinî bû. Ew ji mirovekî ku navdar bû. Wilo wî nav dabû, ku mirov bêje li herême bigîştî çend xalk hebûn rêz ji navê wî re digirtin. Kurd û Erab û Pers bi hev re ji rêze wan ji wî re hebû. Weke wî şêx haşîmî ji hebû ku li dore Mêrdînê wanderanjîn bûbû. Şêx Avdilqasimê Mahadî û şêd Mêhdîyê serhanîkî û hwd. Hê weke wan gelek zanistên demê hebûn. Hemûkan ji di deme xwe de navê xwe dabûn his kirin. Yên ku navê wan ne hiskiribana nebûn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku axiftibû, li ser van pir sekinîbû. Li ser hizir û ramana wan ji rawastaha bû. Pir bahsa wan kiribû. Mihamed ji ew nasdikirin. Navê wa bihîstibû. Bi hizre wan û pirtûkên wan xwandibû. Ev mirovên zanist, mirovne pir bi zanist bûn. Di deme xwe de pir hizir û raman anîbûn ser ziman. Pir nivîsandibûn. Ji ber vê yekê navê wan hebû. Şêx Xalîlê Batirgizî ji weke wan pir bi zane û bi nav û deng bû. Wî ji pir nivîsandi bû. Rehma xwûde lê be. Mirovekî pir mazin bû. Wî pir ji navê xwûde û alima û hizre wan ji di nivîsên xwe de anî ser ziman. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku axiftibû ji wan anîbû ser ziman. Pir dirêj ji bahsa wan û hizir û ramana wan kiribû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî her weha weke demeke pir dirêj ku axift, êdî wî axiftina bidawî kir û ma sekinî. Piştî ku ma sekinî, êdî piştire ne bi gelekî re di civatê de yên ku xwestin ku aixivin û axiftin bûn. Mihamed mabû sekinî û li wan dihisand. Piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî re mirovekî dî ku li wir rûniştibû û bi zanebûna xwe ji mazin û navê wî Mele Alîyê Raşmilî bû axift. Ew ji pir bizane deme ku axift hingî axift. Ew bixwe ji bakûrê kurdistanê bû. Ji dore Hazaxê wan deran bû. Hatibû wir bi serekî û wê vegehera bana. Lê ew ji ew demek bû ku li wir bû. Lê ew ji li ber çûnê bû. Xwe li ser riya xwe amede dikir. Wê çûbana. Ew deme ku axift, pir bi zanebûn axift. Wî ji hema bêja weke seyde Avdilrehîmê xaniqî li ser pir zanistên demê û yên berê wê demê rawastaha û anî ser ziman. Bahsa wan û hizre wan kir. Di dawiyê axiftina xwe de çend gotin ji Şêx Avdilqadirê Gêylanî ji anî ser ziman. Li ser wî û hizir û ramana wî ji

weke demekê rawastaha û anî ser ziman. Wî ku hê axiftina xwe bidawî ne kirî, di dawîya axiftina xwe bahsa Bahlûl kir. Bahlûl ji weke alimakî ku xwe ji xwe buhurandi dihata zanîn. Navê wî ji hebû. Bahsa bahlatiyên wî ji dikirin. Lê pêre bahsa alimtiya wî ji dihata kirin û pêre ji ber çî wî ew bahlati dikir, bahsa wê ji dihata kirin. Mele Alîyê Raşmilî ku weke qadarekê her weha axift, piştî wî ji axiftina bidawî kir û ma sekinî di cihê xwe de. Piştî ku ew ma sekinî, êdî piştî ne bi gelekî re mîr kir ku bi axivê. Wî xwe ji bo axiftinê de di cihê xwe de xwe adiland ji. Lê neaxivî. Wî berî hingî, hê berî ku seyde Avdîrehîmê xaniqî axivê, kifş kiribû ku Mihamed ji bo axiftinê xwe adiland û amede kir, lê ew ne axift. Ji ber vê yekê, wî tenê di wê heyeme de deme ku xwe ji bo axiftinê adiland û amede kir got. Berê xwe da bi Mihamed ve û gote wî, "vêce ka bila seyde me ji hinekî ji me re bêne ser ziman ji wê zanbûna xwe ye mazin, ev demeke dirêje ku bédeng ma". Ku Mîr wilo got, êdî Mihamed ji berê xwe pêşî da wî û piştî berê xwe da civatê û axift. Mihamed, deme ku ew axift, wî bahsa Cizîre bota kir. Ji wir û wê dema xwe axift. Li wir wî çend zanistên mazin dîtibûn. Gelek ji wan navê wan bi hizir û ramana wan re di wê heyeme de pir mazin di bîre wî de bûn. Deme ku axift, pêşî bi navê Xwûde, Nebî Nuh û pêxamber berg û werke xwe anî û piştî bidest axiftinê kir. Mihamed, deme ku axift bala herkesekî pir bi hey li ser wî bû. Herkesekî bi şaq û raq li wî dimeyîzend. Mihamed, her gotina ku ji devê wî derdiket ji di serê wan de dide naşkirin. Pir zane diaxift. Deme ku diaxift wilo xweşik diaxift, hema mirov dixwest ku lê bihisêne. Wilo li mirov dihata. Herkesekî li xwe *di naha* ku lê meyîzenê û bihisêne. Nahandin, ji xwe mazin lê hisandin bû. Bi axiftina Mihamed re, weke ku nahandinaka ku her mirovên zane yên ku li wir bûn, ku bixwezin ku xwe bi zanetiya xwe bidîna axiftin û nişand, di wê heyeme de weke ku bi wan re çêbû. Deme ku mirov li rewşe wan dimeyîzend, mirov ev yek farq dikir û fahm dikir. Li wir mirovên ku hebûn û rûniştibûn, yên zane bûn. Hemû yên ku ji aqilê bi bawer bûn. Mihamed, di wê heyeme de weke qadarekê axift. Ew zanistên ku navê wan seyde Avdîrehîmê xaniqî û Mele Alîyê Raşmilî anîbûn ser ziman, wî ji hinek ji wan û hizre wan anîn ser ziman û bi wan re hineke ku navê wan haya wê heyemê ne hatina ser ziman ji anî ser ziman. Mihamed, di wê heyeme ku di axift de bala seyde Xûsrew û mîr pir bi zêdeyî ji li wir wî bû. Seyde Xûsrew li wî dimeyîzend û bidil lê dihisand. Weke ku di dilê xwe de bêje *ax ev çî zanista û mazina* lê dimeyîzend û di hisand. Zimanê Mihamed pir xweş bû. Ku diaxift, weke ku helbestekê bixwêne li mirov dihat. Mirov li xwe ne di naha ku bala xwe ji ser wî bibe û bibe ser der, tişt

û yekî dî.Hingî ew xweşik û bizane diaxift.Awayê axiftinê hinekî zanebûna mirov ji dide der di dema axiftinê de. Her bêja ku mirov di mejiyê xwe de çêdike û dide dibêje, bi xwe re wê têne ser ziman. Mirov bi çî awayê bêje xwe diafirinê?Ev yek û pirs ji pir girînge.Ji ber ku awayê hizirkirina mirov di bersive wê de tê ser ziman.Awayê axiftinê, mirov ji gelek aliyan ve dide dest.Ji ber vê yekê, pir girînge. Bi axiftina Mihamed re bi awayê axiftina wî re wî di serê wan de cih digirt di wê heyeme de.Mihamed weke qadarekê di axivê. Di wê deme ku ew diaxivê de ji, pir bi zane û her weha xweşik û bi awayekî ku pir baş lev diênê diaxivê.Di axiftinê de lev anîn zanebûnê di hîmê xwe de ji mirov dixweze.Zanebûna wî ji pir mazin bû. Bi wê zanebûna xwe pir xweşik lev diênê û diaxivê.Weke qadarekê diaxivê û pişt axiftina xwe bidawi dike û dimêne sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de.Mihamed, ku wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî, êdî weke qadarekê pişt wî re weke ku ne axiftin bû.Weke ku bédengiyek afirî.Lê wê bédengiyê wilo zêde berdewam ne kir.Kin domand.Pişt re yê ku ew bédengî xira kir, mîr bû. Mîr spasiyak ji Mihamed re kir ji bo wê axiftina wî ya xweş û xweşik û pişt wî re ji sipasî ji mirovên din re ji kir û ma sekinî. Piştî ku ew ma sekinî êdî seyde Xûsrew kete devrê de û axift û bahsa derengbûnê kir û pêre ji bahsa çûna Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ku wê sibehê herin kir.Ku wî wilo bahs kir, weke ku ji bo ve tiştek were bîre wan li wan hat. Pişt re bal çûna ser Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî.Bi zêdeyî ji bal çûna ser Mihamed di wê heyeme de.Êdî çaxê rabûnê ji hatibû. Wê êdî rabû ban. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji, ku rabûnê wê xatir ji ji wan xwestiban..

Seyde Xûsrew, deme ku wî wilo axiftin kir û axiftina xwe wî bidawi kir û ma sekinî, êdî pişt wî re weke ku mîr xwest ku mafê axiftinê hildê û biaxivê, tevgerêhe.Seyde Xûsrew ku her weha hewlida, êdî pişt re wî bi xwe di cihê xwe de xwe adilandinê re bal kişandina ser xwe û êdî ne bi gelekî re axift.Ku axift, wî hinekî ji axiftina Mihamed berdewam kir. Mihamed di axiftina xwe de li kuderê mabû, wî ji ji wir berdewam kir, axiftina xwe.Seyde Xûsrew, ji wê zanebûna xwe mazin axift. Li ser zanistan axift. De ne, Mihamed deme ku axifti bû, hingî, hinekî ji Nebî Nuh ji axiftibû. Mihamed axiftina bi Nebî Nuh bidawî ne kiribû. Haya ku Hatibû dawiya axiftina xwe, li ser pir zanist û alimên din ji anîbû ser ziman. Lê seyde Xûsrew deme ku axift, pêşî bahsa Nebî Nuh kir. Li ser zanebûna xwe û tişte ku zanibû ji anî ser ziman. Pişt re wî axiftina xwe berdewam kiribû. Li ser Nebî Nuh, pir zanebûnaka wî ye mazin hebû. Ji xaynê wê yekê ji, di dergaha wî ji de li ser Nebî Nuh ji pir nivîs hebûn. Zanebûnaka mazin wê

demê, li ser Nebû Nuh di nav mirovan de hebû. Seyde Xûsrew di wan mirovên ku li ser wî bi zanebûn bûn, yek ji wan mirovên herî bizane bû.

Seyde Xûsrew ku hinekî li ser wî anî ser ziman, piştî wî axiftina xwe anî ser wê herêmê û wê demê. Di wê herêmê de di wê demê de çend mirovên zanist hebûn, heya wî ji wan hebû. Ji ber ku mirovên zane bi ser hevdû de diçûn. Ku bi ser hevdû de ne çûban ji, di civatan de li ser wan pir axiftin dihata kirin. Bi vê yekê, êdî weke ku civatê de hatina ser ziman, êdî weke ku çawa ku hatiban ser ziman, wilo ji dihatina naskirin. Ku qanc û zane hatiban ser ziman, wilo êdî dihatina naskirin. Lê ku xirab û nezan hatiban ser ziman, êdî wê wilo hatiban naskirin.

Seyde Xûsrew, di dergaha wî de mirovên ku li hev digahana hevdû û diaxiftin ji hevdû re, ne tenê yên ji wir bûn. Ji hevirdore ji yên ku dihatin hebûn. Ew ji ji herême ku hatibû çî zanî ban di wê heyeme de ji mirovan re dianîn ser ziman. Deme ku dihata ser ziman, êdî herkesekî his dikir û dibihîst. Hingî ji, herkesek bi wan agahîyan dibû xwedî agahî di wê heyeme de ji hevdû û li ser hevdû û li ser herêmên hevdû. Bi vê yekê ji, seyde Xûsrew bûbû pir bi zanebûn. Ji herêman wî pir hiskiribû. Lê ew bixwe ji li herêman gelek geraha bû. Gelek herêm wî bixwe ji dîtibûn. Ji ber vê yekê, divêt ku em bêjin, deme ku ew diaxift, ne tenê ji hiskirinên xwe diaxift, ji dîtin û nerînên xwe ji diaxift. Bi vê yekê, bizane diaxift û dianî ser ziman. Di wê heyeme de ji deme ku diaxift, wilo diaxift. Seyde Xûsrew, di wê heyeme de deme ku bidest axiftinê kiribû ji civatê re, hingî, weke qadarekê axiftibû. Ji wan re pir tişt bi zanebûna xwe anîbûn ser ziman. Seyde Xûsrew, ku her weha weke qadarekê diaxivê, êdî piştî ne bi gelekî re axiftina xwe bidawi dîke û dimêne sekinî di cihê xwe de. Piştî axiftina wî re bêdengbûnaka mazin çêbû bû. Mîr ji bêdeng bû. Deng ji wî ji dernediket. Lê ew weke ku di cihê xwe de xwe kardikir ku bi axivê. Wilo weke ku xwe di cihê xwe de xwe diadiland. Piştî ne bi gelekî re ji xwe ji axift. Ku axift, hinekî wî ji weke seyde Xûsrew axiftina xwe kir. Lê mîr wilo zêde dirêj ne axift. Kin axift. Piştî ku ew ji ma sekinî ji axiftinê, êdî piştî, yê ku piştî wî careke dî axift dise seyde Xûsrew bû. Seyde Xûsrew, wê carê ji ku axift, bahsa rabûnê kir. Ku wî bahsa rabûnê kir. Êdî weke ku rabûn di serê herkesekê li wir de bibîr bibe bû. Êdî piştî ne bi gelekî re êdî kara rabûnê hata kirin. Lê seyde Xûsrew, berî ku wê axiftina xwe ye ku kir, ku bidawi bike, bahsa çûna Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî kir. Bahsa wan kir û got ku "ew wê sibehê re ku mêj kirin wê bi rê bikevin". Deme ku wî wilo gotibû, êdî piştî ku seyde Xûsrew axiftina bidawi kir, êdî piştî yê ku di cih de mafê axiftinê girt û axift ji, mîr bû.

Mîr, deme ku axift hinekî ji wan re biqancî bahskir û piştire gotina xwe anî ser çûna wan. Lê berî ku gotina xwe bêne ser çûna wan, hingî, hinekî ji li ser deme hatina wa kir û bahsa dawatê ji kir. Ji ber ku ew hingî li wir mabûn ji, mîr malavayîya wan kir. Piştî ku mîr malavayî ji kir, êdî gotina xwe her weha bi dawî kir; ”me divî bû ku hinekî dî ji li vi maban. Hê em ji hevdu têr nebû bûn. Lê dibêjin ku ´emê herin´. Ji vir ji, bila bi hinek mirovên ji vir ku bi wan re bi rê bikevin û herin, bila herin”. Deme ku mîr wilo got, êdî Rêzan li wir bû û di cih de got, ”weke ku mîrê min got, ji vir yên ku bi wan re herin ji hema bêja kifş in. Wê ew ji di deme çûnê de amede bin”. Deme ku Rêzan ji wilo got, êdî piştire yê ku piştire mafê axiftinê hilda û axift ji Mihamed bû. Mihamed, deme ku ew axift, pêşî spasî û malavayîya mîr kir û piştire her weha axift, ”bila mîrê min sax bê. Li vir em bi rêz û hûrmet kirina mêhvanê xwe. Ti kêmesî ji mêhvantiya xwe neda nîşandin, ji me re. Ji bo vê ji divêt ku em spas bikin. Mîrê min, rastiye zane û qadr û qiymet dide rastiye. Mirovê ku qadr û qiymet bide rastiye û zanebûnê, wê ti carê bi bin ne keve. Bi qadrê zanebûnê zane. Zanebûn ji bo rasti were fahmkirin û têgihîştin ji heya. Lê rasti, ji bo ku mirov xwe bigihêne hê gelek tişt û cewherê jiyane ji heya. Xwûde bila bi me re bê. Bila me bi paraze. Bila destê qanciyê ji me dûr neke û yê xirabiyê ji me dûr kê. Rasti bixwe, hebûna jiyane ya. Mîrê min ev yek fahmkiriya û têgihîştîya. Me ev yek di vê demê ku em li vir man de fahmkir û pir baş ji fahm kir”...

”Hizreke me heya ku em xwe bigihênine heya bi Kirmanşanê û dînwerê wan deran. Wan deran ji bi zanebûn û hebûne xwe re bibînin û nas bikin. Ya mîn bi xwe ev demeke mazin weke avdalakî di riyan de me. Deme ku ez ji Cizîre bota ketime rê de mîn di serê xwe de kifş kiribû ku xwe bigihênime wan herêman û bi bînim. Deme ku ez ji Cizîre bota derketim, ne bi tenê bûm. Seydeyê mîn, win hemû ji nas dîkin, mele Serhengê Zaxoyî ji hebû. Lê win dise zanin ku ew çûya ser dilovaniya xwe. Vêce li wir, hê berê ku ew herê ser dilovaniya xwe, me bi hev re li herêmê, hinekî gerahan. Me ew der haya bi Musil û Kerkukê ew de dîtin. Me Hewlêr ji dîtin. Me bi hev re herême ”bahndînan” hema bêja hemû dît. Ev yek ji me re bi baxt ku em bi hev re wanderan bibînin. Ev ji qanciyaka ku xwûde bi me re kir. Lê piştire ew çû ser dilovaniya xwe. Xwûde ya qanc ji me çêtir zane û zanetira”.

”Li başûr ku weke demeke em ji xwe re gerahan, piştire ew hê ku em ne vegehahana Zaxoyê nexweş ket. Hingî, hê em li dore Hewlêr bûn. Piştire me ji wir, ku rewşê şêxê min xira bû, me xwe di cih de gihanda Hewlêr û li

wir 'Medrese Şêx' man. Li wir, weke demekê ji em man, weke ku li vir mîrê min mêhvandariyaka mazin ji me re da nîşandin û navê xwe mazin kir, li wir mîrê wir qanciya xwe ji mere da nîşandin. Li wir em li ser dergaha şêx ji man. Me demeke xwe ye ku em bêjin ne kin li wir me buhurand. Piştê ku şêxê min hinekî bi destûra xwûde baş bû, êdî piştê em vegerehan Zaxoyê. Lê piştî ku em vegerahan, piştê ne bi gelekî re, êdî rewşê wî dise xira bû. Êdî ew car bi bû cara dawiyê ji bo wî Piştê wî koç kir. Piştê ji, em demekê li wir man. Lê piştî ku çilê şêxê min derket, êdî em ji ketina rê de, Hê ji êşe wê di dilê me de şîla. Piştê ji wir bi seydeyê min re em hatina vir û em nahaka li vir in. Li vir ji me demeke xwe ya baş û qanc buhurand. Ji vir, dilê me xweş em divaqatihin. Lê emê, ku xwûde bê erê, careke din vegerihin û nêhte me ji eve ku di vir ve em vegerihin û herine, cihê ku emê herinê de. Em bi nêhtin ku careke dî vegerihin û herine Cizîre bota. Qewl û soze me heya, ku em careke din xwe bisaxî bigêhinine Cizîre bota. Li wir ji, ku ji haziran ne çêtir bin du mirovên pir hêja û qanc faqa Qasim û mele Silêman me ji wan re soz dabû. Bi navê xwûde, emê soze xwe bicih bînin”.

Mihamed ku her weha axiftin, weke ku di axiftina xwe navberekê bidiyê de. Lê weke ku hê tiştên ku bêje pêre hebûn û wê bigotina di cihê xwe de disekinî di wê heyeme de. Lê deme ku ew mabû sekinî, êdî di cihê de mîr mafê axiftinê hilda bû û axiftibû. Êdî ew ji mabû sekinî di cihê xwe de di wê kêlikê de. Mîr deme ku axift, di axiftine xwe de her weha li Mihamed vegerand; ” ti pir bi zane û ji dil axiftî. Pêşî ez bêjin, ku kengî win werine vir, devê vî derê ji were weke mala we ji we re vekirîya. Vê yekê divêt ku win zanîbin û ji bîr nekin. Em bi we pir kêfxweş bûn. Lê bi weha zû çûna we ji, em pir xamgîn bûn. Me divîbû ku win hinekî din ji maban. Me hinekî dî ji deme xwe bi hev re buhurandi bana. Lê weke ku mîn got, mal mala we ya. Kengî win werin, weke ku win werine mala xwe werin û ser çavan û seran winê werin”. Mîr ku di dawîya axiftine xwe de weha axift û got, piştê ma sekinî di cihê xwe de. Piştê, ku mîr ma sekinî, êdî weke ku bédengiyek dise çêbû. Deng ji ti kesekî derneket. Piştê bi qadarekê, yê ku deng ji derket, seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Wî ji mafê axiftinê hilda û weke Mihamed hinekî ji deme berê axift û piştê wî ji spasiya xwe ji bo mîr da nîşandin û malavayîya wî kir û axiftina bidawî kir. Ku wî axiftina xwe bidawî kir, êdî ma sekinî. Piştî wî re yê ku mafê axiftinê hilda û hinekî axift, dise seyde Xûsrew bû. Wî, ku hinekî axift, piştê bahsa rabûnê kir û piştê ku wî axiftina xwe bidawî kir û ku mîr ji dise mafê axiftinê hilda û çend gotinên din gotin, piştê êdî di pêşengitiye

mîr û seyde Xûsrew de civatê kir ku bide xwe û rabê ser xwe di wê heyeme de.

Piştêre ji ne bi gelekî re êdî rabûna ser xwe ku herin. Deme ku Mîr û seyde Xûsrew bi hev re rabûna ser xwe, hingî, di wê heyeme de bi wan re mirovên ku li wir i civatê ji bûn di cih de dana xwe û rabûna ser xwe di wê heyeme de. Ku rabûna ser xwe êdî kirin ku berê xwe bidina devê derî û herine derve. Piştêre ji berê xwe dana devê derî û çûna derve. Mîr û seyde Xûsrew li pêşîya civatê bûn. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ku di rex hev de di ber wan re lê hinekî ji wan li şûntir dimeşîn. Rêzan ji di rex Mihamed de dimeşî. Mihamed bi bédeng bû. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî ne bédeng bû. Ew bi mirovên ku di rex de meşîn de diaxift. Mihamed car bi car yên ku di rex de jê weke ku pirsan bi pirsin berê xwe didan Mihamed û diaxiftin. Bi vê yekê, Mihamed ji êdî hinekî diaxift. Deme ku yên ku pêre diaxiftin, ku hizrek dianî ser ziman û di dawiya anîna ziman ya hizre xwed de di gotin ” me ne wilo ya”, êdî Mihamed ji li ber vê yekê weke ku jê bê pirsin êdî divîbû ku ew ji weke ku bi bersiv kê, divê bû ku bersiv dabana. Ji ber ku bersiv dabana vî awayê pirs pirs kirin ji, divîbû ku wî pir hisand bana. An ji divîbû ku zanibana ku çî gotin an ji dibêjin. Her weha ev yek giring bû. Ev awayê pirs kirinê, deme ku mirov hizrekê bêne ser ziman û ku yê ku li hevberê mirov li mirov bihêsene, hingî, tê kirin. Ev awayê pirs kirinê, bi serê xwe nayê kirin. Bi hizir re di deme axiftinê de tê kirin. Deme ku mirov bixweze hevdû bikişêne nav axiftinê ji, ev pirs kirin tê kirin. Bi zêdeyî de di kurmançî ji wilo bû. Lê li wir ji hatibû kirin. Li Urmîyê bû ew. Mihamed, deme ku jê weke ku dihata pirsin û dihata gotin me ne wilo ya, êdî wilo bersiv dida wî. Di wê de bersiv kirinê de, divîbû ku wê ji cihê ku wî axiftin berde bû axiftin berdewam kiribana û an ji divî bû ku li hevberê hizir gotina xwe ye wî, kuu hizre wî ye ccude hebene divî bû ku wî anîbana ser ziman. Her weha ya ku dihata xwestin bi wê awayê pirs pirs kirinê ev bû. Mihamed ji vê yekê zanibû. Ji ber vê yekê ji, deme ku her weha jê dihata pirsîn, hingî, wî ji hizre xwe dianî ser ziman. Bi vê yekê, ew ji bi gotin û axiftin dibû.

Ku di pêşengtiye mîr û seyde Xûsrew de tene dev derî, êdî li devê derî mirovên ku wê çûban, êdî bidest xatir xwestinê ji mîr û yên ku wê ji wan vaqataha bana kirin û çûn. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di rex hev de bédeng mana sekinî. Gelek mirov di ber wan ve ji diçûne ber mîr û seyde Xûsrew û ji wan xatir dixwestin û diçûn. Lê yên ku diçûn berî ku herin, dihatina ber Mihamed û seyde Avilrehîmê xaniqî ji û ji wan ji xatir dixwestin û piştêre diktine riye xwe ye çûnê de û diçûn. Her weha wê rewşê

weke qadarekê berdewam kir. Ji ber ku yên ku li civatê bûn gelek bûn. Yê ku xatir ji mîr û seyde Xwestibûn û gotin şev baş, piştire hatibû bûna ber Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û ji wan ji xatir xwestibûn û gotibû bûna wan şev baş û piştire bi rê ketibûn û çûbû bûn. Piştire ku yên ku wê çûban ku çûn, êdî ne bi gelekî re seyde Xûsrew, ku pêre Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û çend mirovên din ji hene, kirin ku herin. Wan ji kara xwe kir. Lê wan piştî gelek mirovan ku ew çûbûn, êdî her weha kara xwe kiribûn. Piştire ne bi gelekî re seyde Xûsrew ji mîr re got “mîre min, ti ji zêde li derve ne mîne. Em ji herin. Şeve te ji xwest be”. Deme ku seyde Xûsrew wilo li ber mîr got, êdî Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke ku werina xwe li wan hat û weke du an ji sê gavan meşîn û hatina cem Seyde Xûsrew bi hev re weke ku li ber mîr bi sekinîn mana sekinî di cihê xwe de li ber wî di wê heyeme de. Piştire mîr ji û seyde Xûsrew ji xatirê şevê ji hevdû xwestin û ji hevdû re gotin şev baş û piştire Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ku ji mîr xatir xwestin û ku gotin şev baş mîrê min, piştire kirin ku bi rê bikevin. Lê hê mîr ne gotibû şeve we ji xweş be. Ji ber vê yekê divîbû ku li bendî wî sekinîban. Nêhte mîr ji weke ku berî ku bêje şeve we xweş be, weke ku dixwest ku tiştne din ji ji wan re bêne ser ziman. Wilo di di cihê xwe de di sekinî. Mihamed û seyde Xûsrew û ku seyde Xûsrew ji bi wan re û mirovên ku hê li wir mana û li dore we ne, li nav çavên mîr meyîzandin. Mîr, piştire ku hinekî ma sekinî piştire berê xwe da Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û gote wan, “bi wa re ku sibe win bi rê ketin, heya cihê ku win herinê de wê mirov bi we re werin û wê ji we re bine heval di rêya wa de haya cihê ku win herinê de. Cihê ku win gahanê de, ji wir êdî ew wê xatirê ji ji we xwezî û wê vegehin. Ya rasti, me dixwest ku win hinekî dî ji li vir bi me re bi mênin. Lê we nêht kiriya ku winê herin. Lê ez bi hêvî me ku emê careke din ji hevdû bibînin”. Piştî ku mîr weha got û ma sekinî piştire, yên ku axift seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî li ber mîr her weha axift, “rastê mîrên, hêvîya me ji ewê ku xwûde bêje erê. Em ji di we hêvîyê de ne, ku emê hevdû dise di demeke kin de bibînin. Lê sad bela heya. Mirov nizanê ku wê çi were serê mirov û wê riya mirov bi kderê ve bê, cerna. Lê bi hêvî me, ku xwûdeyê me yê ku dengê me his dike, careke din riya me bi vir ve bike. Em pir ji vir bi dilxweş û dilgeş divaqatihin. Jê ji bo ku ji we ji emê vaqatihin, em bi di xamgîn û hinekî ji bi êş in. Ya rasti çi be, bila ew bibe”. Seyde Xûsrew ji ku wilo got, êdî ma sekinî di cihê xwe de û mîr weke ku jê re bêje ti rast dibêje lê meyîzend û piştire mîr gote wan ”de êdî şeve we ji xweş be” û piştire destûr da wan ku herin. Piştî ku mîr wilo ji wan

re got, êdî wan ji ji mîr re careke din got şev baş û piştire kirin ku bikevine rê de û herin. Piştire êdî ne bi gelekî re ku hetine rê de, êdî seyde Xûsrew, seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mihamed û ku li dore wan hinek mirovên din ji hene, ketine rê de û kirin ku ku werin û razihin.

Mihamed di serê xwe de pir li ser xwe bû. Pir dihizirî. Wê hizirikirinê wî, rê ne dide wî ku ew bi xwe bibe an ji her weha di xwe de ji xwe herê. Ew di serê xwe de jîn û zîn bû. Dem dihata nîvê şevê ji. Lê Mihamed hê weke ku di navarojê de çawa bû, wilo bû. Wilo li xwe bû. Seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji wilo bûn. Ew di rê de hem di meşîn û hem ji xwe re diaxiftin bi hev re. Herdû weke ku heya wan ji dinyê nebe, heya wan li ser hevdû û axiftina ku bi hev re dikirin bû. Mihamed ji weke ku li wan dihîsand. Ew ji car bi car ku derfet di dît, tevî axiftina wan ya ku wan di nav xwe de fikir dibû. Lê ew bi zêdeyî di xwe de weke ku bihizir bû, li ber wan bi bêdeng di sekinî di wê heyeme de. Lê hinekî heya wî ji li ser wan bû. Dengê wan yê ku ji wan derdiket, bi xweza bala wî di kişanda ser xwe di wê heyeme de. Bi vê yekê Mihamed li wan û axiftina wan bi hey dibû.

Mihamed, di wê heyeme de bi hizir bû. Di serê xwe de pir bi hizir bû. Ew deme ku ji Cizîre bota bi rê ketibû û ew û mele serhengê Zaxoyî bi hev re bûn, ew dem di bîr wî de bû. Li ber çavên wî bû. Pêre hê gelek tiştên din ji li ber çavên wî bûn. Faqa Qasim û mele Silêman ji li ber çavên wî bûn. Mihamed ew ti carî ji bîr ne kiribû. Ew hertimî di serê wî de jîn û zîn mabûn. Bi teybetî ji faqa Qasim xwediyê teybetmediyeke pir mazin bû bi wî re. Wî pir di hebûna wî cih û war girtibû. Mihamed, weke ku ew duhu ji wî vaqataha bû, ew di bîre wî de bû. Wilo di serê wî de jîn û zîn bû. Li ser wan dihizirî. Li ser mele Serhengê zaxoyî ji hizirî. Ew ji divibû ku bi wan re bana. Wî ji wilo qewl bi wan re kiribû. Bi teybetî bi Mihamed re kiribû. Lê ne nahaka ne pê re bû. Ne bi wan re bû. Mihamed di wê heyeme de hinekî li ser wê hizirî bû. Ew kengî bi rê ketibû û nahaka li kuderê bû. Li ser vê yekê hizirî. Ji deme ku bi rê ketibû ji, haya wê kêlikê çî jîn kiribû ji, fikir bêne bîr xwe. Her weha wî hewl dide. Her weha hizir fikir û di hizirikirina xwe de kur û dûr dibû, bêhtir tiştên ku jîn kirina dihatina bîre wî. Di wê heyemê de careke din rewşe Dîlberê û Dîlşad hatibû bîre wî. Ketibû aqilê wî de. Ji xwe ew ti carî ji aqilê wî derneketibûn kî. Hertimî ew bîr û hişê wî de bû. Weke êşekê û kulekê. Weke qatak ji laşê wî bi wî re bûn. Mihamed, ji wan pir bi bandûr bûbû. Ew ti carî ji bîr ne kiribûn. Dîlberê û Dîlşad, pêre weke kuleka mazin hebûn. Ew di bîre wî de bûn. Di wê heyeme de bi bîrkirina wî, weke ku cihanaka ku pir tişt û jîyan

de bin û li ber çavên wî bû. Wî li wan dimeyîzend. Li ser wan di hizirî. Xwûde ewqas tişt û rewş pê dana jîn kirin. Ma gelo ji ber çi? Weke ku her weha pirsek ji di serê wî de dibû. Wî li wan jîn kirinên ku kiribûn di meyîzend û dixwest ku fahmbike û têbigihê ku ka ji ber çi bû. Jiyana mirov, di xwe de dîrokê mirove ji. Mihamed li ser vê yekê hizirî. Di wê heyeme de wî gelek mirov bi jiyana û jiyankirinên xwe re li ber çavên xwe di dîtin. BI vê yekê re mirov karê bêje ku wê gelek dîrok bi hev re di wê heyeme de li ber çavên xwe dîtin.

Ew di riya xwe de bi hev re dimeşîn. Ji xwe re diaxiftin ji. Mihamed ji bi wan re bû û di xwe de bi hizir bû. Lê tevî wê qasê ji, ew car bi car tevî axiftina wan ji dibû. Bi wan re ji di axift. Mihamed, lê hişê wî diserê wî de weke ku li dereke din bû. Li ser tiştne din bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pêre di cih de kifş dikir. Wî awayê ku ji xwe re diaxivin û mihamed ji ku di xwe de bi hizir û ku car bi car ji ji tevî wê hizirkirina xwe ji tevî axiftina wan dibe dimşîn û diçûna dergaha seyde Xûsrew.

Ew şeve wan ya dawiyê bû. Wê tenê wê şevê maban. Ew şeve wan ye dawiyê bû. Ev yek di serê herkesekî de hebû. Mihamed ji, ev yek ti serê wî de ji hebû. Li ser wê ji bi hizir bû. Wê ketiban rê de û wê berê xwe daban bi Herême Kirşmaşanê ve û di wir ve wê çûban haya Dînwerê û wanderan. Ka wê çi hatiban serê wan û wê çi jîn kiriban, ew xwûde zanibû. Hebû ku gelek tiştên din yên ku jiyana wan kifşkiribana hatibana serê wan di rê de û li wir li cihê ku wê çûbanê de. Hemû tişt ji mumkun bû. Ev yek di wê heyeme de weke di serê Mihamed de ne bû. Mihamed di serê xwe de li ser demên xwe yên buhurî di hizirî. Li ser tiştên ku jîn kiribûn di hizirî. Pir di hizirî. Rewşe Dîlberê û Dîlşad ji di serê wî de bû. Ew ji wê heyemê de di bîre wî de bû. Ji xwe ma ka kîjen de demê ji aqlê wî derketibû û çûbû kî? Ti carî ji aqlê wî derneketibû. Ew demek bû ku bi ser wê mesele ve çûbû bû. Lê weke ku duhu bûbû di serê wî de li bîre wî bû. Hê pêre jîn û zîn û şil bû. Weke kêlikê ku bûbû pêre zîn bû. Weke wê kêlikê di dilê wî de bi bandûr bû. Mihamed pir ji wê mijarê bi bandûr bûbû. Deme ku cerna ji xwe re di rûnişt û di hizirî, ev mijar ji ji xwe re dihata bîre wî û em di xwe de xamgîn dikir. Cerna ku di nav civatê de ji bû, her weha wilo lê hatibû. Mijar hatibû bîre wî û di cihê xwe de xamgîn kiribû. Di wê heyemê de yên ku li civatê ji bûn, di cih de farq kiribûn ku rengê Mihamed bi carekê ji xwe re qulupt. Ew reng quluptbûn, ji bal û heya mirovên li dore wî ne ravî bû. Piştî ku her weha bûbû, êdî bal çûbû bûna ser Mihamed. Mihamed ji di wê heyeme de ev yek farq kiribû. Di cih de kiribû ku xwe li xwe bide hevdû. Lê

êdî piştî ku her weha ji wî hatibû kifşkirin, êdî divîbû ku wê çend gotin ji wan re li ser wê reng qulubandîna xwe ji wan re gotibana. Wî ji êdî di wê heyeme de ji wan re bahsa Dîlberê û Dilşad kiribû. Deme ku wî bahs kiribû, pir bi dil û eş bahs kiribû. Kiribû ku bi gotinê li dilê mirovên ku li dore wî bin bixe. Mihamed, piştî ji wan re gotibû, êdî bi wî dengê xwe yê xweş ku li ser wan anîbû ser ziman. Weke ku qasîdeyekê ji dil û pir xweş bixwêne anîbû ser ziman. Bi gotinê wî di wê heyeme de li dilê wan xistibû. Herkesek bi bahkirin û gotine xwe ya ku pê got, ew xamgîn kirin di cihê wan de.

Di wê heyeme de Mihamed dimeşî. Lê ew rrewşe ku wî jîn kiribû piştî, hatibû bîre wî û li ser wê ji pir hizirî bû. Bi gotina li ser wan hevdû evindaran ji ew mirovên ku lê hisandibûn, wilo di cihê xwe de bi dil eş û xamgîn bûbûn. Vêce yekî ku ew mesele jînkirî wê çawa wilqasî bidil eş nebe. Mihamed di xwe de pir wê jîn dikir. Keşe Tuma ji ji di bîre wî de bû. Ew rewşên ku wî pêre jîn kiribûn an ji wî pê dabûn jîn kirin ji di ber çavên wî de dibuhurîn. Çend ku ew di wê heyeme de di riya xwe de dimeşî û gavên xwe de diavêtin, her weha di serê xwe de ji weke ku wê gav bi gav ew rewş li pey hevdû bi bîr dikirin û li ser wan hizir dikir. Di wê heyeme de seyde Xûsrew û Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di rê de ji xwe re dimeşîn û di axivîn. Ew ji di nav vê yekê de çûbû bûn. Weke ku ew ji bi vê yekê ne di wê heyemê de bin bûn. Her weha li ber çavan bûn. Bi wan re mirovên ku hebûn û dimaşîn ji tenê li wan dihsandîn. Gotinek ji seyde Xûsrew û gotinek ji Seyde Avdilrehîmê xaniqî axiftin di nav wan de di wê heyeme de dibû. Mihamed ji çend caran di axiftinê de tevî wan bûbû. Lê Mihamed wilo zêde tevî ne bûbû. Weke Seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî ne axiftibû. Ew pir diaxiftin. Ew di nav axiftinê de çûbû bûn. Weke ku heya wan ji dore wan ne bû bû. Wê rewşe di wê heyeme de di rê de dimeşîn. Weke qadarekê her weha dimeşîn. Riya wan ji ne wilo zêde dût bû. Lê ew weke ku di riyaka dût de herin û bimênin di wê heyeme de di rê de mabû bûn. Dema ku mirov di rê de bikeve axiftinê de riya mirov dirêj dibe. Axiftina mirov çend germ bibe û dirêj bibe, her weha riya mirov ji dirêj dibe. Di wê heyeme de wilo li wan ji hatibû. Riya wan ji li wan dût bûbû bi di rê de axiftinê re.

Weke qadarekê dimeşîn piştî êdî digihine ber dergahê. Lê hê ji weke ku ew ne li wê farqê û yekê bin bûn. Wilo di hatina xuyakirin. Di axiftinê de bûn. Herdû hetibû bûbûna axiftinê de û di axiftinê de ji li ser mijarên ku herdû ji pir bi zane û serwer bûn di axiftin. Bi vê yekê êdî weke ku di axitinê ji ji xwe herin li wan hatibû.

Seyde Xûsrew pir bi zane û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke wî zane, ma wê êdî çawa bisekinin. Herdû zane ne û li hevdû gahana hevdû û diaxiftin bi hev re. Ew roja wan ya dawiyê ji bû. Di wan demên ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî li wir mabûn de ew hertimî li hevdû rûniştibûn û axiftibûn bi hev re. Lê hê ji, piştî wêqas axiftina ku bi hev re kiribûn ji, weke ku ji hevdû û axiftina hevdû têr ne bûbûn. Ji wan û rewşê wan û axiftina wan ye ku wan bi hev re dikir ev encam derdikete hole.

Mihamed wê heyeme de bi hizir bû. Lê piştî ku nêzikî dergahê bûbûn, êdî ew ji weke ku were xwe lê hatibû. Weke ku ji nû ve were dinyê lê hatibû. Rewşê wî ji wilo dihata xuyakirin. Di wê heyeme de deme ku serê xwe ji ber xwe di rakir û li dore dimeyîzend, weke ku ji xwe re bêje ma gelo ez nahaka li kuderê me, li dore xwe û hevirдорê dimeyîzend. Wilo bi bal dimeyîzend. Deme ku li dore xwe dimeyîzenê, hingî, bala wî diçê ser seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî ku ew hê bi hev re di nîqaşê de ne. Deme ku Mihamed wilo ew dîtîn, êdî bala wî çû ser wan. Weke ku ji nû ve bidest axiftinê bikin, hê li xwe û li ser xwe bûn. Wilo herdû ji dihatina ber çavan. Deme ku mirov li wan dimeyîzend, mirov ev yek ji wan di wê heyeme de kifş dikir.

Piştê ku hinekî dî ji dimeşîn, êdî digihine ber deriyê dergahê ku bikevine hundur de. Deme ku têne ber dêrî, hingî, Hinekî li hevdû ku biaxiftin di sekinîn û bi hev re diaxivin. Ji bo axiftina bi hev re di cihê xwe de mabûn sekinî. Ne ku ji bo ti tiştêkî din. Ku hinekî li hevdû biaxiftin mana sekinî û bi hev re axiftin piştê, êdî kirin ku bikevine hundur de. Dem ji xwe pir dereng bûbû. Êdî weke ku zêde wilo ti kesek li ser di wê demê de nema bû. Herkesek ne nahaka di nav cihê xwe de bûn. Lê ew hê li ser xwe bûn. Hê bi hev re wilo xweş û geş diaxiftin û nîqaş dikirin. Hê ji pir li ser xwe dihatina xuyakirin. Hebû ku hinekî dî ji maban. Lê dem ji nema bû ji bo mayîne, êdî. Piştî ku hinekî li hevdû li devê derî li aliyê derve mana sekinî, piştê êdî ku hinek man êdî dana xwe ku bi hev re ku seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî li pêşiya wan ketine hundur de. Ku ketine hundur de, êdî zêde li derve ne man û di cih de çûn û ketine hundur de. Deme ku ketina hundur de, êdî weke ku wan ji di nav xwe de qinyat anî ku dem derenge, êdî seyde Xûsrew gote wan "nexwe, em ji nahaka herin û hinekî xwe rehet bikin. Dem ji ji xwe dereng bûya. Dem di rewşên weha mirov nizanê ku çawa diçê". Ku seyde Xûsrew wilo got, êdî Seyde Avdilrehîmê xaniqî got ti rast dibêje û piştê ji hevdû re şev başî kişandin û êdî herkesekî berê xwe da ser cihê xwe di wê heyemed de. Êdî herkesek çû ser cihê xwe. Mihamed ji û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ku şevbaşî ji

seyde Xûsrew re kişandin, êdî herdû bi hev re hatina cihê ew têde diman. Cihê ku ew herdû têde diman li cem hevdû bû. Ji ber vê yekê, haya cihê xwe, bi hev re hatibûn. Haya ku hatibûn ji ji xwe re bi hev re çend gotin ji kiribûn. Hinekî axiftibûn ji. Ku piştî ne bi gelekî rehatin û gahana cihê xwe yên ku wê têde maban, êdî wan ji hevdû re şev başî kişandin û piştî herkesek çû ser cihê xwe di wê heyeem de.

Mihamed ku ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re şev başî kişand, êdî ew hata ser cihê xwe, Lê ew weke ku bêxew bû. Weke ku xew li ser çavên wî ne bû dihata xuyakirin. Ew hê di serê xwe de bi hizir bû. Lê tiştên ku ew di serê xwe de li ser di hizirî, hê ji li ser wan bi hizir bû. Wilo ew dihata xuyakirin. Lê Mihamed wê carê, deme ku hata ser cihê xwe, rastûrast hata ser cihê xwe ku serê xwe dêne û hinekî razihê. Wê sibehê bi rê ketiban. Riya wan ji dûr bû. Wê gelekî ji di rê de maban. Divîbû ku hinekî wî ji bixew hinekî xwe rehet kiribana. Ku ew bixewê xwe rehet ne kê, wê sibe wastahî be. Wê di rê de zore kişêne. Mihamed ku hata ser cihê xwe, xwe amede kir ji bo xwe dirêjkirinê. Lê weke ku li ser çavên wî xew ne bû. Lê dise wî xwe dirêj kir û weke ku bixweze hinekî razihê xwe li ser xwe berda. Weke qadarekê piştî êdî hin bi hin weke girenîyê xwe pêde berda.

Lê çend ku girenîyê xwe pêde diberda ji, wî weke ku li ber xwe dide da qana xwe li ser xwe bigirê. Aliyekî wî her weha weke ku bi hizirkirinê û mijûlkirina di serî de weke ku li berxwe dide ku xwe ne berdê. Lê aliyekî wî ji weke ku li berxwe ne dide û weke ku dixwest ku hinekî xwe berdê. Ji ber vê yekê wî aliyê wî ji li ber xwe ne dide. Mihamed di serê xwe de pir bi hizir bû. Ew hatibû ser cihê xwe û li ser cihê xwe, ew rûniştibû. Êdî weke ku wê xwe dirêj bike, di cihê xwe de di sekinî. Lê Mihamed di serê xwe de ne wilo di sekinî. Di serê xwe de bi pir hizrên ku ew di serê xwe de bi wan bi hizir bû, di sekinî di cihê xwe de. Mihamed pir di hizirî di wê heyeme de. Wilo ew dihata xuyakirin û berçavan.

Mihamed di serê xwe de pir li ser demên xwe yên berê dihizirî. Di rê de çî dihizirî, di wê heyemê de wilo li ser wan dihizirî. Hizirkirina wî ya ji wê demê ve, hebûna ber xwe bi wî re berdewam dikir di wê heyeme de. Mihamed di cihê xwe de hinekî axiftibû. Ew demên axiftina xwe ji anîna ber çavên xwe. Li ser wan ji weke ku hinekî di serê xwe de mijûl bû. Lê Mihamed ji xaynî wê ji, di wê serê xwe de li ser demên berê pir bi hizir bû. Hinek hizrên ku di wê heyeme de di serê wî de bûn û re pê bi hizir bû. Mihamed, di wê heyeme de weke ku wastahî ji bû dihata xuyakirin. Di xwe de wî ji wilo hîs dikir. Deme ku mirov li wî dimeyîzend, mirov pêre wilo kifş dikir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji çûbû bû beşa xwe ku razihê.

Bi nêhte rrazanê çûbû bû. Lê ew di wê heyeme de hê li ser lingan bû û an ji razahî bû, ew ji ne kifş bû ji aliyl Mihamed ve. Seyde Xûsrew, ji xwe berî hingî ku ew ketibûbûna dergahê de ne bi gelekî re bi nêhte xwe hinekî rehetkirinê ji wan vaqataha bû. Mihamed, di wê heyeme de nizanibû ku ka yek ji wan şiyara an ji ne şiyar e. Lê Mihamed hê şiyar bû û li ser xwe bû. Li ser cihê xwe bû. Ew ji bi nêhte xwe dirêjkirin û hinekî razanê hatibû ser cihê xwe di wê heyeme de. Lê ew hê li ser lingan bû.

Mihamed, bi wî awayî weke qadarekê li ser lingan li ser xwe dimêne û di xwe de hizirî. Lê ew gireniya ku pêde dibû, wê ew hin bi hin ji xwe dibir û fikir ku ew bikeve xwewê de. Mihamed di serê xwe de weke ku ne bixew bû. Weke ku bixwe û şiyar bû û li ser xwe bû. Wilo di xwe de wî hîs fikir. Lê wê yekê ji ew hin bi hin ji xwe diçû û fikir ku bikeve xewê de. Dem hatibû demeke pir dereng. Hinekî dî têve çûbana hebû ku dengê bangdana sibehê ji hatibana. Lê hê ew şiyar li ser xwe bû.

Mihamed, sibe rêvan bû. Wê bi rê ve çûbana. Ji ber vê yekê ji bana, divêbû ku hinekî ji xwe re razaha bana. Hinekî ji xwe re ketibana xewê de. Ev yek, pêdivîya wî pê hebû. Wî ji ev yek bi wê wastandina xwe ya li ser xwe kifş fikir di wê heyeme de. Lê her ku weha kifş fikir ji, wî hewl dide ku li ser xwe bimêne û ne kevê xewê de. Lê çend ku li ber xwe da ji, hinbi hin êdî weke ku d kete xewê de. Hin bi hin weke ku ji xwe diçê. Wilo ew û rewşe wî dihata xuyakirin û berçavan di wê heyeme de. Piştî ku hinekî dî dem û rewşe wî ye ku wî her weha weke ku li ber xwe dide berdewam kir, êdî piştî ne bi gelekî re, mujgulên çavên wî bidest leyistandina xwe kirin. Ev yek, wate wê ew bû ku êdî wê di xewê ve çûbana. Êdî wê laşê wî li ber xwe ne dabana. Bi vê yekê, ew êdî ne bi gelekî re çavên wî çûna ser hevdu û kete xewê de di wê heyeme de. Wilo çawa li ser cihê xwe rûniştibû, hema wilo di cihê xwe de ji xwe çûbû bû û li ser cihê xwe dirêj bûbû. Hizirkirinên di serê wî de ji, ku bi ketina xewê re sekinî ban êdî weke ku sekinî bûn di wê heyeme de.

Mihamed ku kete xewê de, êdî weke demekê dirazihê. Weke demekê di xewê de dimêne. Di xeweke şêrin de dimêne. Di wê xewê xwe ya şêrin de ku di serê xwe de çî xewn di dîtin û têde bû, di wê heyeme de di nav wê de bû. Weke demekê dirêj wilo di xewê ye şêrin de dimêne. Laşê wî ji ber ku wastahî ketibû, êdî ji ber vê yekê ketibû xeweke ku ne sivik de. Ketibû xeweke ku hinekî giren de bû. Bi hizirkirinê mejiyê wî weke ku wastahî ketibû. Deme ku mejiyê mirov wastahî ket, ew wastandin bûn, wastandina herî mazina ji mirov û laşê mirov re. Mirov bi wê wastandinê ji xwe diçê û dikeve xeweke ku giren de. Ew ji bi vê yekê ketibû xeweke ku hinekî

giren de. Bi hizirkirinê, ew di serê xwe de hinekî weke ku wastaha bû. Weke ku hinekî di xwe de wastaha bû.

Mihamed haya ber sibehê ku dengê bangdana sibehê tê di xewê de dimêne. Lê di wê sibehê de çawa ku dengê bangdana sibehê tê wî hema wilo di cih de na rabe ser xwe di wê heyeme de. Hinekî dimêne. Piştê tê xwe. Deme ku tê xwe ji, êdî ew bixwe farq dike ku bangdana sibehê bûya û ew lê ne rabûya. Ti carî berî hingî wilo lê ne hatibû. Deme ku rabû, di cih de pêşî nehle li şeytên têne û piştê di cih de dirabê û kara xwe dike. Wê ew bi rê ve çûban. Lê berî ku ew kara xwe bike, ew destmêje xwe digire û piştê dike ku kara xwe ye çûne bike. Divêbû ku wî kara xwe kiribana. Divêbû ku tûrîkê xwe ji karkiribana û bi xwe re dabana piştê xwe û bi xwe re biribana û çûbana. Ew tûrîkê wî ji bo wî pir hêja bû. Têde gelek nivîsên wî û kur'an pîroz ji hebû.

De ne, divêt ku em di vir de carekê din ji bênine ser ziman. Mihamed weke ku çawa ku li Cizîre bota û piştê li Zaxoyê mayî, dev ji nivîsandina xwe ne berde bû di wê heyeme de ji dev jê ne berde bû. Wî di wê heyeme de ji dinivîst. Li Cizîre bota wî nivîstibû û li wir pir nivîsên xwe hiştibûn. Li Zaxoyê ji, wî heman tişt kiribû. Li wir ji hinek nivîsên ku wî nivîsandibûn û li wir hiştibûn hebûn. Di wê heyeme ku li Urmîyê mabû ji, nivîsandibû. Li wir ji hinekî nivîstibû. Nivîsên wî yên ku wî li wir nivîstibûn û beşek ji wan nivîsên wî yên ku ji Zaxoyê bi xwe re anibû bûna wir, li wir di nav pirtûkên Seyde Xûsrew de hiştibûn. Beşek ji nivîsên xwe yên ku pir mazin ji li wir hiştibû. Beşa ku wî li wir hiştibû. Ji gotina ne biçûk bû. Pir mazin bû. Weke pirtûkeka mazin bû.

Mihamed, di wê heyeme de deme ku tiştên xwe yên ku wê bi xwe re biribana di dana hevdû û dikirina tûrîkê xwe de, hemû ji nivîs bûn. Wî ji wan pêve wilo ti tiştên din ku wê pêre gireniyê çêbikin bi xwe re ne kiribû ku bibe.

Piştî ku wê tûrîkê xwe amede kir û da piştê xwe ku bide devê derî, êdî seyde Xûsrew ji ku wa xwe amede kirî wê da devê derîyê wî. Li ber devê derî lev gahana hevdû. Mihamed, deme ku ew dît, êdî pêşî roj başî jê re kişand û piştê kir ku bidina dore hevdû û herin. Deme ku seyde Xûsrew û Mihamed kirin ku ji cihê wî derkevin, li devê derî herdû ji rastî hinek faqihên ku rabûbûn û ew ji ku wê bi wan re hatiban mizgefte bûn. Deme ku rasti wan hatin, wan ji pêşî ji wan re roj başî kişand û rêz û hûrmete xwe ji wan re dana nîşandin û piştê wan ji dana dore wan û kirin ku bi meşîn û herine mizgeftê. Lê hê ku bidest meşê ne kirin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ku xwe amede kirî ji cihê xwe derket û roj başî ji wan re kişand.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke ku tûrîkekî wî hebû û li pişte wî bû wî wê heyeme de. Wilo ew dihata xuyakirin. Lê deme ku Mihamed bi seyde Xûsrew ji cihê xwe derketibûn, hingê, ku li ber derî rasti faqihan hatibûn, Mihamed dîtibû wa di destê faqahakî de wa weke tûrekî ku mazin wê tişt têde ne û wê rahiştîyê de sekinîya. Mihakak seyde Xûsrew tiştîn ku bi wan re bişêne dana amede kirin. Ev hizir di cih de di serê Mihamed de çêbû. Lê Mihamed ti tişteki ne got û ne ji da kifşkirin. Tenê meyîzend. Lê ku seyde Avdilrehîmê xaniqî ji gaha wan û ku meşîn piştire, Mihamed berê xwe da seyde Xûsrew û gotiyê de "seydeyê min, ez dibe qey ev tûr naha di dest de te daya amede kirin, ma te çima kir? Ne hewce bi tişteki me nîn e." Deme ku Mihamed wilo got, êdî seyde Xûsrew berê xwe da Mihamed û gotiyê de "ma te ne got ku qey tişteki mazin a. Ku di rê de hinek hewceyîyên wa bicih bênin, hinek tişt hatina amede krin, ne hewceyî gotinê ji ye li ser". Deme ku seyde Xûsrew wilo got êdî Mihamed ma sekinî û piştire ti gotinên din ne got in. Lê seyde Seyde Avdilrehîmê xaniqî kir ku bi xivê û piştire ne bi gelekî re axift û wî ji her weha ji seyde Xûsrew re got. "seydeyê min Mihamed rast got. Di rê de j xwe tişte ku ji me re lazim bûn, me ji xwe ji xwe re amede kirina". Seyde Avdilrehîmê xaniqî weha got û ma sekinî. Piştire deng ji ti kesekî derneket. Weke bêhneke meşîn, êdî piştire seyde Xûsrew deng jê derket û weha got ji wan re. "Dilê dixwest ku em wa nahaka bi rê ne kin. Lê winê çin. Lê ez bi hêvî me ku emê careke dî ji di demeke kin de hevdû bibînin". Seyde Xûsrew ku wilo got êdî ma sekinî di cihê xwe de. Wilo zêde dirêj ne axift û zêde ti gotin ne gotin. Piştire ew ketine rê de herine mizgeftê. Ku ketine rê de û weke qadarekê meşîn, piştire êdî ew gahana mizgeftê. Deme ku gahana ber mizgeftê, hê ku ne ketine hundur de, ji hinekî dûr ve dîtin ku wa gelek mirov wa ji bo mêje sibehê lev gahana hevdû. Ji dûr ve dihatina xuyakirin. Mîr ji di nav wan de dihata xuyakirin. Piştire ku ew ji hinekî dî ji meşîn, êdî piştire gahana wan û tevlî wan bûn û piştire roj başî ji ji hevdû re kişandin, êdî ji bo mêje xwe ketine rêze de bi hev re û kirin ku mêj bikin.

Mihamed, seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî û yên bi wan re, ku gahana ber mizgeftê, êdî ne bi gelekî re gahana devê derî û piştire ku gahana ber devê derî, êdî di cih de bi hev re ku seyde Xûsrew li pêşiya wan ketina hundur de. Deme ku ketine hundurê hewşa mizgeftê de, êdî dîtin ku we hinek mirov wê destmêj digirin. Seyde Xûsrew û yên ku pêre, ku gahana ber wan êdî silav dana wan û ku silava wan ji hildan, piştire ji wan buhurtin. Ku buhurtin, êdî çûn û ketine hundurê mizgeftê de. Deme ku ketine hundurê mizgeftê de, êdî dîtin ku wa mîr ji wê bi gelek mirovan re

li wir e. Gelek mirov li dore wî bûn. Ew ji di nav wan de bû. Deme ku seyde Xûsrew, seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mihamed û yên ku bi wan re ji ketine hundur de, êdî bala wan çû ser hevdû. Deme ku bala wan çû ser hevdû, êdî pêşî silav dana hevdû. Piştîre êdî bi ber hevdû ve çûn û lev gahana hevdû.

Ku bi ber hevdû ve çûn û lev gahana hevdû, êdî piştîre çûn û gahana hevdû û li ber hevdû sekinîn. Ji xwe, piştî ku ew hatibûn êdî ne bi gelekî re karê bidest mêjkirinê de hatibû kirin. Mirov ji êdî hemû yên li derve ji dihatina hundur û diketine rêze de ji bo mêje. Seyde Xûsrew derkete pêş û Mihamed ku seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mîr ji pêre di rêze pêş de rêz girtin û mana sekinî di cihê xwe de. Ku rêzgirtin û ku herkesek ji amede bû, piştîre êdî bi hev re bidest mêje xwe kirin. Ku bidest mêje kirin, êdî ne bi gelekî re mêje xwe kirin. Piştî ku mêje xwe kirin, êdî ne bi gelekî re mêje xwe ji kirin û xilaskirin û piştîre ji hevdû re hinekî bidest afistinê kirin. Yê ku di wê heyeme de axift ji, seyde Xûsrew bû. Seyde Xûsrew weke demekê ji cimaatê re axift û piştîre destûr ji cimaatê re hata dayîn ku rabina ser xwe ji rêze mêje. Ku destûr bû ku rabin ji, ew ne rabûn. Mana di cihê xwe de rûniştî û hinekî ji hevdû re axiftin. Mîr li wir bû. Piştî ku mêj hata kirin, êdî ew ji li dore mîr lev gahana hevdû. Mîr ji ji wan re hinekî axift. Lê ne weke seyde Xûsrew axift. Seyde Xûsrew deme ku axift, hinekî li ser qanciyê û levkirina qanciyê axift. Mîr ji diaxiftina xwe de hinekî minaq li ser vê yekê dan. Hinekî weke ku di axiftina xwe bahsa qanciyê û qancitîyê ji kir. Lê belê yê wî axiftina wî li ser zanebûnê û wan bû. Piştîre wî axiftina xwe anîbû ser Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ku wê herin. Her weha weke qadarekê ji hev re diaxivin. Mîr ji ji mirovên li dore xwe re diaxivê. Piştîre ku hinekî her weha diaxivin, êdî piştîre ne bi gelekî re axiftina xwe bidawî dikin û dikin ku rabina ser xwe. Wê êdî rêvanên xwe bi rê kiriban. Mîr berî ku hatibû wir hinek amedekarî ji dabûbûn kirin ji bo wan. Hê êvarî ji Rêzan re tişte ku wê weke aamedekarî bihatana kirin gotibû û wî ji dabû kirin.

Piştîre ku hinekî mîr bi yên li dore xwe re ji hinekî axift, piştîre axiftina xwe bidawî kirin û kirin ku rabin û derkevina hewşa mizgeftê. De ne, di wê heyeme de hewşeke mizgeftê hatibû çêkirin ku mirov guneh dikir ku lê meyîzenê, hingî xweşik û sipehî bû. Pir bahsa wê dihata kirin. Mizgeft bixwe ji pir xweşik hatibû çêkirin. Hêtnê wê yên ku hatibûbûn naqşkirin hatibûn çêkirin. Deme ku lê dihata meyzendin ji, ew naqş û xweşbûnên ku hatibûn çêkirin bi ber çavan diketin. Li hundur ji her weha hêtnê xweşik hatibûn çêkirin. Gelek xaliçeyên hêtan ku li ser hin nivîsên pîroz hatibûn

nivîsandin hatibûn dalaqandin. Bi vê yekê, hundur ji pir xweşik û teze dihata ber çavan. Lê derve pir xweşik bû. Ne tenê ji bo demên mêje an ji demên pişt mêje re ku hinekî li wir bisekinîn hatibûn çêkirin. Ji bo ku mirov dayimî li ber rûnihin hatibûn çêkirin. Tavikê ji li ber hêtan dixist. Bi vê yekê, germbûneke ku mirovan xwe li ber germdikir ji hebû. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku ew hêt û mêtên ku hatibûn bidil û ji dil hatibûn çêkirin. Pir xweşik bûn. Mihamed û seyde Xûsrew û seyde Avdilrehîmê xaniqî û ku mîr ji bi wan re li pêşîya civatê bi hev re derketina derve hewşê. Deme ku derketina hewşê, êdî li hewşê hinekî li hevdû mana sekinî ci hê xwe de. Lê wê sekinandinê wilo zêde berdewam ne kir. Piştî ne bi gelekî re êdî bahsa çûna Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî hata kirin. Deme ku bahsa çûna wan hata kirin, êdî piştî ew derketina pêşîya mirovên li dore xwe. Deme ku derketina pêşîya mirovên li dore xwe, êdî bal çû ser wan û li ser çûna wan hata hizirkirin û bahs hata kirin.

Ku bahsa çûna wan hata kirin, êdî piştî ne bi gelekî re mîr ji bahsa wan kir û got ku ew wê herin. Deme ku mîr wilo got, êdî ne dibû ku wî çend gotinne din bi ser vê gotina xwe ve ne kirbana. Wî piştî çend gotinne din ji bi ser gotina xwe ve kir û her weha got ”Ya rasti me dixwest ku ew hinekî dî ji maban li vir. Em elimîbûn hevdû. Êdî destê me ji hevdû ne bê..Lê bi hêvî me ku emê wan careke din ji bibînin”. Deme ku mîr weha got, hê ku wî axiftina xwe bidawi ne kirî, seyde Avdilrehîmê xaniqî kete devrê de û got ”ya rastî xwûde raze, bila ew riya qanciyê şani me bixe û ku di baxtê me de nivîsî bê û hebe ji xwe emê careke din ji hevdû bibînin”. Piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî weha got, êdî wî axiftina xwe wilo zêde dirêj ne kir û ma sekinî di cihê xwe de. Piştî wî re careke din mîr mafê axiftinê girt û axift û her weha berdewam kir. ”ti rast dibêje, ya rastî xwûde zane. Vêce winê nahaka ji vir herine bi ber Kirmaûanê de. Riya we hinekî dûr e. Lê ku win bidina xwe winê zêde di rê de ne mênin. Bi hêvî me ku riya we ji baş û bi dilê we herê”. Mîr ku weha got êdî ma skeinî. Piştî wî re seyde Xûsrew weke ku xwest ku çend gotinne bêje derkete pêş û piştî ne bi gelekî re wî ji mafê axiftinê girt û axift û çend gotin wî ji gotin di wê heyeme de. Seyde Xûsrew deme ku axift, hinekî li ser qanciyê axift û bahsa çûn û hatina riyan ji hinekî kir. Hinekî dirêj ji axift. Wî ew rê dîtibûn. Wî ber rêvanî bi wanderan ve kiribû. Tiştê ku ji wê rêvaniya wî hata bîre wî ji wî anî ser ziman di wê heyeme de. Piştî ku wî axiftina xwe anî ber dawiyê, êdî hinekî li ser Kirmaşanê sekinî. Hinekî li ser xweza û dore wê sekinî. Wê riya xwe di kurdê ve bikin ji wan re hinekî li ser wê anî ser ziman. Mihamed ewder ne dîtibûn. Wî tenê deme ku seyde Xûsrew bahs dikir, di

serê xwe de dikir ku wêneyekê ji axiftinên wî di serê xwe de çêke. Wî wilo hewl dide. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî berê çûbû wan herêman. Wî ji ew herême ku wê çûbanê de û cihê ku seyde Xûsrew di axiftina ji wan re bahs dikir dîtî û an ji ne dîtî, ne Mihamed û ne ji yekî din nizanî bû di wê heyeme de. Lê zanibûn ku ew çûya wan herêman. Lê deme ku ew di axift de, Mihamed weke ku avirên xwe bi bal dibirina ser Seyde Avdilrehîmê xaniqî di wê heyeme de. Bi wan avirên xwe weke ku jê bi pirsê ku ka ew wanderên ku ew bahs dike zane an ji nizane. Wilo lê dimeyîzend. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke ku bêje ez zanim li Seyde Xûsrew dimeyîzend û deme ku axift û bahsa wan deran dikir ji serê xwe di hajand. Lê ku wî ji nizanîbana, yên ku mihakak zanibûn hebûn û ne mumkun bû ku mîr deme ku hinekan bi wan re bi rê bike û bişêne, ji wan ji hinekan ne şêne bi wan re. Wê ji wan ji hinek şandibana. Mirov ku kete rê de, naskirina rê ye ji aliyê mirov riya mirov kin dike. Lê ku mirov nizanibe, hingî ji, riya mirov pir li mirov dirêj dibe. Dirêjbûn ji nezanbûna mirov têt di wê heyeme de. Zanebûn, hem dike ku mirov zanibe ku mirov wê çi bike û hem ji dide zanî bi mirov ku mirov wê di kijan riyê de herê. Her weha zanebûn di rewşên wilo pir girînge ji mirov re. Zanebûn di rewşên wilo de hevalekî mirov yê herî başa. Ji ber vê yekê, divêt ku mirov di rewşên wilo de pir li ser zanebûnê rawastihê û guh bidiyê de. Weke mirovekî ku bi mirov re bê, di serê mirov de ji mirov dibêje ha tê di vê rêyê ve çê, ha di vê rêyê ve neçê di vê rêya din ve herê û hwd. Her weha rênîşanekî mirov e zanebûn.

Seyde Xûsrew ji wan re ku her weha li ser rê û çûnê ku hinekî ji wan re axiftin kir û hinekî dirêj ji axift, piştire wî axiftina xwe bidawi kir û ma skeinî. Piştî seyde Xûsrew re yê ku mafê axiftinê girt dise mîr bû. Mîr vê carê wilo zêde dirêj ne axift. Mîr tenê bahsa çûnê kir û bahsa hinekî mirovên ku wî dana amedekirin wê bi wan re bikevine rê de û wê haya cihê ku wê herine de wê bi wan re bin bahsa wan kiribû. Deme ku mîr diaxiftina xwe de bahsa mirovên ku wê bi wan re çûban kir, êdî yên ku wê bi wan re çûban ji, di wê heyeme de di cih de bi gotine mîr derketine ber çavan. Wan xwe da kifşkirin. Ku wan xwe da kifşkirin, êdî piştire ku mîr ji axiftina xwe bidawi kir êdî ew ji çûne rex Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û di rex wan de çêkinin. Êdî bi wê çûna wan ya li cem wan sekinandinê re, weke ku yên ku wê ketibana rê de li aliyekî mabûn û yên ku mabana ji li aliyekî mabûn. Piştî ku mîr her weha hinekî axift, piştire wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de. Piştire ku mîr ma sekinî, êdî piştire ne bi gelekî re Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî kirin ku xatir bidest xwestinê ji wan bikin. Bi vê nêhtê êdî ew

derketina pêş û ji mirovên li wir bidest xatir xwestinê kirin di wê heyeme de ji bo ku êdî bi rê bikevin û di riya xwe de herin.

Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî derketine pêş û kirin ku xatiran ji mirovên li wir bixwezin. Deme ku derketina pêş, êdî yên ku li wir ji bûn fahmkirin ku ew ji bo ku xatir bixwezin derketina pêş. Deme ku wan wilo kir û yên li dore wan ji wilo fahm kirin, êdî rewş di wê heyeme de kete rewşeke awerta de. Mîr hingî ji xwe li pêş bû. Ew li pêşiya mirovan bû. Seyde Xûsrew ji di rex wî de sekinî bû. Li dore wan gelek mirov hebûn. Mirovên ku wê ketiban ji rê de bi wan re ji, li ber mirovan sekinî bûn. Ew ji amede bûn. Piştîre êdî bi qadarekê re Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî bidest xatir xwestinê kir ji mirovên li dore xwe. Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî yek bi yek xatir ji wan xwest. Mîr û seyde Xûsrew ma dawiyê. Ew, wê xatir di dawiyê de ji wan hatibana xwestin. Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî wilo hizir kiribûn.

Mihamed weke her car ew tûrîkê wî yê ku her dayimî li mile bû, di wê heyeme de ji li milê wî bû. Di tûrîkê wî de tenê nivîs û hin pirtûkên ku wê wî bi xwe re biribana têde bûn. Ji wan pêve ti tiştêkî din têde ne bû. Mihamed hin bi hin mazin bû. Hin bi hin navserî xwe dibû. Hinekî di wê heyeme de pîr bûbû. Wilo dihata xuyakirin.

Mihamed, ku xatir ji mirovên ku wê ji wan xatir xwestibana ku xwest, êdî hata pêş û li ber mîr û seyde Xûsrew sekinî. Deme ku ew li ber hevdû sekinî, êdî pêşî seyde Xûsrew qavzek avêt û bi pêş de çû. Deme ku bi pêş de çû, êdî wan xwe gahanda hevdû bi ji hevdû xatir xwestin. Piştîre ku wan xatir ji hevdû xwest, êdî Mihamed bi ber mîr ve çû û ji wir kir ku xatir bi xweze. Di wê heyeme de seyde Avdîrehîmê xaniqî ji xatir ji xwestine ji mirovên li dore xwe xilaskiribû û bi pêş ve hat. Deme ku ew bi pêş ve hat. Êdî bi awaeykî xweze hat û li ber mîr sekinî. Kete pêşiya Mihamed de. Deme ku ew kete pêşiya Mihamed de, êdî Mihamed ji ti tiştêkî ne got û ne ji da nîşandin. Wî ji bixweze xwe da pişt seyde Avdîrehîmê xaniqî û li pişt wî ma sekinî. Deme ku seyde Avdîrehîmê xaniqî hata ber mîr, êdî ew hinekî li ber hevdû mana sekinî û bi hev re li ser pîyan çend gotin ji hevdû re vegotin. Piştîre êdî wan ji ji hevdû xatir xwest. Piştîre ku wan xwesti ji hevdû xwest, êdî seyde Avdîrehîmê xaniqî çû û li ber seyde Xûsrew sekinî û ma sekinî. Deme ku li ber hevdû mana sekinî, seyde Xûsrew û seyde Avdîrehîmê xaniqî hinekî bi ruyekî bi ken ku dilê hevdû weke ku bixwezin xweş bikin li hevdû meyîzandin. Di wê heyeme de li ber hevdû mana sekinî. Tenê li ber hevdû mana sekinî û li hevdû meyîzandin. Weke bêhneke vê rewşê di nav wan de hebûna berdewam kir. Piştîre ne bi gelekî re êdî

wan ji xatir ji ji hevdû xwest û êdî ji bo bi rê ketine êdî amede bû. Mihamed ji di wê heyeme de piştî seyde Avdîrehîmê xaniqî ji ber wî çûbû, êdî wî xwe hinekî din bi pêş ve dabûyê de û xatir ji mîr xwestibû. Wî ji ku xatir ji mîr xwestibû, êdî bi pêş ve ew ji hinekî çûbû bû. Çûbû bû cem wan mirovên ku li pêş sekinîne û wê bi wan re rêvanî kiriban. Seyde Avdîrehîmê xaniaî ji piştî ji seyde Xûsrew xatir xwestibû, bi heman çûnê çûbû bû cem wan mirovên ku wê bi wan re rêvnî kiribana û li cem wan sekinî bû. Ku her weha xatir hata xwestin û yên ku wê bi rê ketiban û çûna cem hespên xwe û kirin ku li wan suwar bibin, piştî ne bi gelekî re mirovên ku li dore mîr u seyde Xûsrew bûn ji wan re gotin ”de êdî riya we vekirî bê”, êdî ew ji li hespên xwe suwar bûn û kirin ku bi rê kevin û herin. Mihamed bi seyde Avdîrehîmê xaniqî re peya bû. Ew peya dimeşîn. Lê hinek mirov ji suwar bûbûn. Lê hinek mirov ji suwar ne bûbûn û bi Mihamed û seyde Avdîrehîmê xaniqî re dimeşîn. Seyde Avdîrehîmê xaniqî û Mihamed ku b yên ku bi wan re ne, ketine rê de û çûn, êdî haya ku ew ji ber çavan winda bûn, yên li şûn wan man li wan meyîzend. Ew ji hin bi hin ji ber çavan winda dibûn û diçûn. Piştî bi qadarekê re ku ew ji ber çavan winda bûn, piştî êdî mîr û yên ku pêre li şûn ji mabûn, êdî kirin ku herine malê. Êdî kirin ku ji hevdû belav bibin. Mihamed û seyde Seyde Avdîrehîmê xaniqî ji bi yên ku bi wan re bûn, ji ber çavên wan hin bi hin winda bûn û ketina riya xwe de û çûn. Ku ketina riya xwe de êdî hinekî di riya xwe de kirin ku zû bikin, da qana di rê de zêde ne mênin. Mihamed hij meşandinê dikir. Weke qadarekê meşîbû bi seyde Avdîrehîmê xaniqî re. Lê belê piştî ne bi gelekî re ew ji mecbûr mabûn ku li hespên ku ji bo wan yên ku bi wan re ketibûbûna rê de bi xwe re anîbûn suwar bibin. Piştî ne bi gelekî re êdî ew ji suwar bibin. Mihamed hij zêde suwar bûnê ne dikir. Weke ku ne dixwest ku lingên wî ardê qut bibe. Hertimî dixwest bi qavzên xwe re pêl ardê bike. Wî weke ku wilo dixwest.

Piştî ku li hespên xwe ew ji suwar bûn, êdî weke ku hinekî dana xwe û kirin ku hinekî din ji zûtir herin. Wilo li wan bû. Mihamed li ser hespê weke ku ne rehet bû. Wilo ew dihata ber çavan lê ti çara din ji ne bû. Divî bû ku wî weke yên din kiribana. Mihamed piştî ku suwar bû, êdî piştî li ser hesp, seyde Avdîrehîmê xaniqî kir ku pêre bi axivê. Seyde Avdîrehîmê xaniqî ku deng kiriyê de, êdî wî ji his kir û berê xwe û heya xwe da wî û wî ji kir ku pêre bi axivê. Piştî ku Mihamed ji berê xwe da wî, êdî wan hinekî bi hev re bidest xaberdanê kir. Mirovên ku bi wan re bûn û suwar bûn, wan ji kir ku xwe tevlî axiftina ku wan di xwe de dest pê kir di wê heyeme de kir. Ew ji bi wan re ketine axiftinê de. Her weha

hem bi hev re diaxiftin û hem ji li ser hespan diçûn. Hespên wan hinekî bilez û baz diçûn. Qavzên xwe mazin û zû diavêtin. Deme ku mirov li dor ve li wan meyîzendibana, mirov wê gotibana qey ew li ser hesp, hespên xwe didine bazandinê û diçin. Wê wilo li mirov hatibana. Lê hespên wan wilo zêde ne di bazin. Ne bi hêdîkan ji diçûn. Hinek bilez û baz diçûn.

Ew ji li ser pişta hespên xwe ji xwe diaxiftin û diçûn. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bi hev re diaxiftin. Yên ku tevlî wan û axiftina wan ji diçûn hebûn. Deme ku mirov li wan dimeyîzend, mirov di dît ku wa Mihamed hinekî çend ku bi seyde Avdilrehîmê xaniqî re diaxift ji bihizir dihata xuyakirin û berçavan. Weke ku di serê xwe de bi hizir bû. Li ser tiştne dihizirî. Lê ka li ser çî dihizirî.

Mihamed, her weha li ser hesp çûne ketibû hizir de. Mihakak hinek rewşên ku wî wilo berê jîn kiribûn hatibûbûna bîre wî. Weke rewşê ku deme ku ew diçû Cizîre bota û rastî Dilberî li Çiyayê Reş hatibû û piştire ji wir ji ketibû rê de û çûbû mala bavê wê û deme ku çûbû wir û ji wir ji deme ku di pêşengitiya Mîr Bedran Beg û birayên wî de bi hezaran suwar ketibûbûna rê de û ew ji li ser hespekî sipî bi wan re ketibû rê de û vegerehe bû wir, hatibû bîre wî. Ew rewş wî ti carî ji bîr ne dikir. Pêre ji çî jîn kiribû û çî hatibû jînkirin ji di bîr û hişê wî de bû. Ji hişê wî dervediket. Hertimî di serê wî de bû. Ew hespê ku di wê heyeme de ji li ser suwar bû, hespekî ku manaq bû. Hespêkî ku sipî bû weke yê wê demê, ku ew li ser suwar bû. Her weha li ber çavan bû. Ew di rê de di wê heyeme de li ser pişta hesp diçû, lê di serê xwe de her weha li derne din bû. Di hizir bû. Weke ku rastûrast ew rewşên di serê xwe de ku li ser di hizirî û berê jîn kiribûn jîn dikir. Di serê xwe de ew wilo bû. Pir bi hizir bû. Di serê Mihamed de gelek rewş û hizrên ku ew li ser hizirî bana hebûn. Ew li ser wan di hizirî. Di wê heyeme de ji ew her weha li ser wan rewşandî bihizir bû û dihizirî. Ew rewşê Dilberê Di carî ji serê ji hişê wî ne diçû. Hertimî û demê, weke ku di wê kêlikê de wî ew jîn kiribe di bîr û hişê wî de bû, di serê wî de bû.

Di wê heyeme de seyde Avdilrehîmê xaniqî pêre diaxift û car bi car ji jê dipirsî. Mihamed haya ku jê dihata bersive wî dide. Lê mirovekî ku di serê xwe de ne li wir be, wê çiqas karibe mazin bersive bide? Mihamed di serê xwe de weke ku bi bi tememî ne li wir bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ku hinekî pêre diaxivê û Mihamed hinekî ew ji pêre diaxivê, êdî ew farq dike ku Mihamed di serê xwe de heya wî ne li wir e. Deme ku seyde Avdilrehîmê xaniqî her weha farq dike, êdî bala wî bitimî diçê ser Mihamed di wê heyeme de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ku her weha farq dike, êdî piştire ne bi gelekî re ew xwe negirê û ji Mihamed re ji dêla ku

bêje ma seydeyê min ti di serê xwe de li kuderê yî, ew di wê heyeme de rastûrast dibêje Mihamed, "ez dibe qey ti di serê xwe de pir bi hzirî û nahaka li derne din yî".Ku seyde Avdilrehîmê xaniqî wilo ji Mihamed re dibêje, êdî Mihamed ji di cih de weke ku were xwe lê tê û bersive dide seyde Avdilrehîmê xaniqî û di bêjyê de "ti rast dibêje seydeyê min, di serê min ti tiştêkî din ji hebû. Lê ne ji naha bû. Ji heyemên berê bû".Ku Mihamed weha got, êdî piştire axiftina xwe birrî û ma sekinî. Lê piştire wî derfet neda seyde Avdilrehîmê xaniqî ku bi axivê û bi persê. Wî di cih de mafê axiftinê careke din hilda û axift û ji Seyde Avdilrehîmê xaniqî re bahsa hizirkirina di serê xwe de kir. Bahsa li ser çî hizir fikir kir. De ne, Mihamed ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re bahsa Mesele Dilberê û Dilşad Kiribû. Ji ber vê yekê, wî ji ew mesele zanibû. Mihamed di wê heyeme de deme ku careke din mafê axiftinê hilda û axift, ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re got hizirkirine wî li ser rewşê Dilberê û Dilşad û piştire ji ji wî re bidest vegotina hizirkirin û hizrên di serê xwe de ji wî re kir.

Mihamed deme ku bidest axiftina xwe kir, pir dirêj û mazin axift. Pir tişt û yên ku jîn kiribûn ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re anî ser ziman. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji lê pir bi bal û hey dihisand. Bala xwe wî mazin dabûbû sr wî di wê heyeme de. Ew li ser hesp diçûn. Li ser hesp ji hev re diaxiftin û divegotin. Mihamed, di wê heyeme de deme ku bidest axiftinê kir, ji mala xwe ji deme biçûkatiya xwe bidest axiftina xwe kir. Piştire bahsa seyde xwe kir. Pişt wî re ji bahsa çûna xwe ya cem şêxê Îdirê kir û bahsa li wir mayîna xwe kir. Bahsa deme xwe ye li wir pir dirêj kir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji lê pir bi bal û bi guh dihisand. Mihamed piştire bahsa hatina xwe ji cem şêx ye li malê kir û piştire bahsa ketina xwe ya ser rê ye çûne Cizîre bota kir. Berî ku bahsa vê beşa jiyana xwe bike ji, hinekî dirêj û mazin li ser seydeyê mazin meleyê Cizîrî rawastaha û bahsa wî kir. Bahsa hatina wî ye guhê xwe kir. Wî di biçûkatiya xwe de çawa ew his kiribû, ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re careke din vegot. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji pir ji seyde mazin meleyê Cizîrî his kiribû û di derbarê wî de ji pir his kiribû. Deme ku Mihamed bas wî kir êdî wî ji bi hey bala xwe da ser wî û lê hisand. Bi balaka mazin lê hisand di wê heyeme de. Mihamed demeke dirêj bahsa seydeyê mazina mele Ahmedê Cizîrî kir. Piştire Mihamed got ku ye ku ew kiribû riyan de ji xwetina dîtina seydeyê mazin û çûna Cizîre bota bû. Bi wê nêhtë êdî got ku "ez ketime rê de".Piştî ku Mihamed her weha bash kir. Piştire êdî bidest vegotina çûna xwe ye ji malê bi ber Cizîre bota ve û di rê de tiştên ku hatina ser xwe kir. Piştire bi qadarekê re êdî di axiftina xwe de bahsa Dîlberê û Dilşad kir. Deme ku bahsa Dîlberê û

Dilşad kir, hinekî weke ku bidil bû. Di dilê xwe de weke ku bi kel bû. Weke ku hinekî bi hest bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ev yek pêre kifş kir. Deme ku kifş kir, êdî bala wî bêhtir çû ser wî di wê heyeme de. Mihamed ku bahsa wan kir, êdî pir bi hest û dirêj bahsa wan kir. Bahsa rasthatibana Dîlberê û tiştên ku hatibûbûna serê wê careke dî ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re kir. De ne, berî hingî ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re pir li ser wan axiftibû. Di wê heyeme de ji li ser wan diaxift. Mihamed bahsa Dîlberê û rewşa pir dirêj ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re kir. Piştî bahsa çûna xwe ye ku xabere bide birakên wê kir. Li wir mayîna xwe û piştî ji wir bi rê ketina xwe pir dirêj bahs kir. Piştî bahsa vagarahana xwe ya li çiyayê reş bi birakên wê re kir. Li wir ji di wê heyeme de rastî çî hatibû û çî dîtibû, careke din pir dirêj ji wî re bahs kir. Piştî bahsa ji wir ne vatandina wan herdû evindaran kir. Deme ke dirêj ji li ser wan axift. Di wê heyeme ku wê bahs dikir de seyde Avdilrehîmê xaniqî pir bi bal dihisand. Bala wî pir li ser Mihamed bû. Mihamed ku her weha weke qadarekê ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re axift, êdî ma sekinî û bêdeng bû. Deme ku bêdeng bû ji, weke mirovekî ku kelegirî bibe lê hat. Wilo weke ku tişî bibe lê hatibû. Lê Mihamed weke ku ne xweze wê tişîbûna xwe bide der li xwe tevdi gerehe. Ji bo vê yekê bi xwe re weke ku şer dikir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ev yek pêre kifş dikir. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî ti tiştê ne digot. Tenê bi bêdeng ser hespê xwe sekinî bû. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke ku ji axiftina Mihamed bi kel û bandûr bûbû. Mirovên ku bi wan re hatibûn dengê Mihamed çûbû bû wan ji. Wan ji his kiribû. Axiftina Mihamed li ser wan ji weke ku kelek û bandûrak hiştibû. Ew ji wilo li ser hespên xwe di sekinîn. Li ser hesp diçûn. Lê weke ku bi kel bin bûn. Wilo dihatina xuyakirin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî weke qadarekê pişt axiftina Mihamed re bêdeng dimêne. Lê piştî dike ku bi axivê û piştî diaxivê. Deme ku ew diaxivê, pêşî hinekî li ser qancî û neqancbûnê di rawastihê. Piştî di axiftina xwe de gotinê têne ser axiftina ku Mihamed kiribû û ku mihamed di axiftina xwe de bahsa wan kiribû ser Dîlberê û Dilşad. Seyde Avdilrehîmê xaniqî weke qadarekê li ser wan ji diaxivê. Mihamed berî hingî ji wî re pir caran bahsa wan û rewşa kiribû. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî berî hingî ji, berî ku Mihamed ji wî re bêje û bahs bike ji, li civate mîr ev mesele his kiribû. Deme ku bahsa mîr Bedran hatibû kirin, hingî, bahsa vê meselê ji hatibû. Bi vê yekê, êdî pê hisaha bû. Lê piştî ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî digihine hevdû û Mihamed meselê jê re têne ser ziman, êdî ew di serê xwe de pir li ser meselê serwext dibe. Mihamed, mirovekî ku ew mesele jîn kiribû bû. Deme ku yekî ku

meseleyek jîn kiribe ku mirov jê wê meselê his bike, hingî, mirov çêtir li ser mesele û bûyarên ku bûna serwest dibe. Mirov çêtir bi zanebûn dibe.

Ji bo seyde Avdilrehîmê xaniqî ji mirov karê vê yekê bêne ser ziman. Wî ji ji yê ku ew mesele jîn kiribû ji Mihamed mesele bixwe his kiribû. Mihamed çawa ku jîn kiribû wilo ji wî re ji anîbû ser ziman. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji wilo ji wî his kiribû. Bi vê yekê, ew bûbû xwedi zanebûn di derbarê wê bûyîne de. Di wê heyeme de ku seyde Avdilrehîm xaniqî ji hinekî axift, piştî ma sekinî. Deme ku ew ma sekinî, êdî ew û Mihamed weke qadarekê ji bi hev re weke ku bi hev re bikevine danûstandinê de bi hev re danûstandin. Cerna Seyde Avdilrehîmê xaniqî dipirsî û Mihamed bi bersiv dikir û cerna ji Mihamed ku diaxift, seyde Avdilrehîmê xaniqî tevî axiftinê wî dibû û weke di axiftina wî de hinek xalên ku weke pirs bûn bi bersiv kê dibû. Bi vê yekê di nav wan de weke qadarekê danûstandin dibe. Lê piştî ku qadarek têve diçe. Êdî Hin bi hin bêdeng di keve nava wan de û serwerî wan dibe.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji piştî hinekî axiftinê ew ji di serê xwe de weke ku di keve hinek hizran de. Wilo rewşe wî ji tê xuyakirin. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pir baş û qanc kifş dikir. Ew ji di serê xwe de bi hizir bû. Ka ew ji li ser çî bihizir bû. Mihamed, deme ku axiftibû û dirêj axiftibû, li ser wî wê axiftina wî bandûraka mazin berde bû. Piştî ku axiftibû ji, bi wê bandûra li ser xwe axiftibû. Bi wê kargerîya li ser xwe axiftibû. Mihamed, deme ku bi wî re ketibû danûstandinê de ji hinek tiştên din ji anîbûn ser ziman ji wî re di wê heyeme de. Bi wê ji ew bi bandûr bûbû. Mihamed di wê heyeme de deme ku ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re axiftibû, weke ku jê re ji berê mazitir û kurtir axiftibû. Bi bandûrtir axiftibû. Mihamed bi wê hizirkirina di serê xwe de ku pir bi ponij jê re axiftibû. Bi vê yekê ji deme ku Mihamed axiftibû, kiribû pir li ser wî bi bandûr bike. Li ser mirovên din ji yên ku bi wan re bûn ji wilo bandûr kiribû. Deme ku li wan ji dimeyîzend, mirov ev yek fahm dikir.

Ew di rê de dimeşîn. Lê wan di wê heyeme de nizanîbûn ku çawa di rê de dimşîn û gahabû bûna kuderê. Di wê heyeme de wan pir rê qad kiribû. Pir rê hatibûn. Lê belê ew di wê heyeme de ne di wê farqê de bûn. Heya wan ne li ser rê bû. Heya wan li ser axiftina di beyna wan de bû. Ji xwe re axiftin û di rê de ji dimeşîn. Di rê de meşandin, mirov hinekî di mirov de germ dike. Dike ku mirov kur herê di serê xwe de. Di wê heyeme de her qavza ku mirov di rê de diavêje, weke ku mirov wilo qavzekê di serê xwe de bi avêje ji li mirov têt. Li wan ji wilo dihat. Bi axiftinê wan qavzên xwe

di rê de diavêtin. Her qavza ku wan di rê de diavêt ji êdî wan di serê wan de ji wilo weke ku bi qavzekê bi pêş de dibir. Wilo dihata ber çavan.

Piştî wê danûstandina Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî re êdî weke bêdengbûnek di nav wan de bûbû. Li ser hespên xwe bûn û diçûn. Lê bi bêdeng diçûn. Deng di wê heyeme de ji yekî ji wan dernediket. Mihamed bi bêdeng bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî bi bêdeng bû. Mirovên din ji yên ku bi wan re ew ji bi bêdeng bûn. Deng ji ti kesekî di wê heyeme de dernediket. Ji deme ku ketibûbûna rê de li ti derê ne sekinî bûn. Ketibûbûna rê de û meşî bûbûn. Dem ji hatibû piştî nîvro. Ew li ser pişta hesp diçûn di rê de. Lê dise weke ku ji suwar bûnê hinekî laşê wan qayimî bû. Wilo li wan hatibû. Divîbû ku hinekî ji xwe re hisandiban ji. Ji ber vê yekê ji divîbû ku li derekê sekinî ban û bêhne xwe standiban. Ew ji vê yekê hizir dikin. Lê li bendê ne, ku pêşî xwe bigihênine beravaekê. Deme ku xwe gahandina beravakê, êdî wê navber dabanê de. Wan ji wilo hizir dikir. Mihamed, di serê xwe de weke ku dise ketibû nava hizran de. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek di cih de jê farq dikir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji heya wî di wê heyeme de çûbû derne din. Heya wî di serê wî de çûbû bû derne din. Ew ji di hizirî di serê de, ka li ser çî di hizirî. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov jê fahm dikir ku ew di serê xwe de di wê heyeme de çûya derne din ku dût. Ketiya nava hizirne de. Ew ji weke Mihamed di wê heyeme de pir bi hizir bû. Tiştên ku Mihamed jê re gotibûn û anîbûn ser ziman û yên ku wan bi hev re li ser axiftibûn, ew pir bihizir kiribûn. Heya wî bi vê yekê, di wê heyeme de ji wir dût ketibû. Mirovên ku bi wî re ji bûn, li dore xwe di meyîzendin ku rasti beravakê werin û lê bisekinin.

Mihamed ji her weha seyde Avdilrehîmê xaniqî di serê xwe de bi hizir bû. Yê wî, ew pir zêdetir bi hizir bû. Ew pirtir bi hizir bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ji sûretê wî ev yek pir baş û qanc fahm dikir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mihamed, piştî hinekî bi hev re ketibûbûn axiftinê de. piştî ku weke qadarekê ji di nav xwe de axiftin kiribûn êdî mabûn sekinî. Lê bi sekneke wilo mabûn sekinî ku pir bi hizir bû. Weke ku di serê xwe de ne li wê dinyê bin çûbû bin dinyeyekê din dihatina xuyakirin. Herdû ji , her weha wilo dihatina xuyakirin. Deme ku mirov li wan dimeyîzend, mirov ev yek ji wan pir baş û qanc fahm dikir.

Mirovên ku bi wan re hatibûn û di rê de ji bûn, ew ji car bi car dikirin ku bi wan re bikevina axiftinê de. Lê Mihamed weke ku ne li wir bû. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî çend ku weke ku bi hizir ji bana, bi mirovên li dore yên li ser hespan ku bi wan re dimşîn re dikete axiftinê de. Bi wan re

dide û distand. Mihamed ji car bi car ku deme ku dihata xwe tevli axiftinên ku wan bi hev re dikirin dibû. Lê ne wilo zêde. Ew hindik tevli dibû. Yê wî, ew bi zêdeyî di serê xwe de bi pirranî bi hizir bû. Rewşe wilo dihata xuyakirin. Mirovên li dore wî ji ev yek ji wî pir baş û qanc fahm dikirin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ev yek ji wî fahm dikir.

Weke qadarekê weha di wê rewşê de dimeşîn. Piştî ku hinekî dimeşîn êdî piştî ne bi gelekî re digihine beravakê ku lê bêhne xwe berdin û hinekî peya bibin û heywenên xwe ji av bidin. Ku têne ber avê, êd li ber avê dikin bi sekinîn û bêhne xwe berdin. Ew av ji mazin bû. Golek bû. Navê wê ji Hasên bû. Deme ku digihine wir êdî li wir hinekî bêhne xwe diberdin. Li wir dimênin. Weke qadarekê wê li wir maban. Piştî wê çûban. Ew der zêde wilo ji Mahabadê ne dût bû. Lê ne ber ji bû. Hinekî jê dût bû. Deme ku têne wir, êdî li wir li haspên xwe peya dibin û diçina ser avê. Pêşî hinek av diavêjine ser ruyên xwe. Piştî destmêjên xwe ji digirin. Piştî diçin û hinekî li ber hevdû disekinîn. Li demê dimîyzênin û qinyata xwe ténin ku bangdana nîvro bûya. Êdî mêje xwe ye nîvro ji bi hev re dikin. Piştî ku mêje xwe dikin. Êdî hinekî li hevdû ji dirûnihin. Mîr ji bo xwarin û tiştne wilo, bi wan re hin tişt şandibûn. Hinekî ji wan ji derdixin û didênin ber xwe û dixwûn. Lê li wir zêde wilo ne mênin. Dikin ku bikevine riya xwe de careka din. Ji ber ku riya wan hê meya û hê gelek ji maya.

Piştî ku hinekî li wir dimênin êdî piştî dikevine rê de û berê xwe didina bi ber mahabadê ve û diçûn. Wê riya xwe di wir ve kiriban. Wê di wir ve çûban. Piştî ku careke di ketina rê de, êdî dise weke berê rewşe wan ya bi wan re berdewam kir. Piştî ku herême kurdistanê ye rojhilat de, êdî gelek kevnere bi ber çavên wan diketin. Ber agirgahên ku weke ku bê xwedî mana di riya wan de bi ber çavên wan diketin. Ji xaynî agirgahan, gelek mal û xaniyên kevnere ku weke ku kevilbûna bi ber çavên wan diketin. Ku têne ber Mahabadê, êdî çavên wan bi keleheka pir mazin dikeve. Ew ji beyer mabû. Ew ji weke ku kevil bûbû. Wilo bi ber çavên wan diketin. Ew ji diber wan de dimşîn û di riya xwe diçûn û ew li şûn xwe di hiştin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku digaha ber kevnereyan hingê pir li wan dimeyîzend. Bi meyîzêdinê ji wan dibuhurt. Mihamed ji û mirovên din yên ku bi wan re bûn, dimeyîzêdin û dibuhurtin. Hevirdor ji pir şîn dihata xuyakirin. Pir şîn bû. Deme ku mirov di meyîzend, li ber çavên mirov pir dimenekî xweşik çêdikirin. Mirov weke ku cerna aliman di axiftinên xwe de digotin, ku mirov dimeyîzend "mirov guneh dikir ku meyîzenê". Wilo xweşik bû û dilê mirov digirt. Mirov hema tenê dixwest

ku li hevirdore meyîzenê. Ji wê pêve, di wê heyeme de dilê mirov ti tiştek ne dixwest ji mirov. Xweza xweşik, li ber çavên mirov, di dilê mirov de weke ku mirov dil bide keçikeke ku pir xweşik û mirov bi wî dilî bimêne, mirov li ber wê dima. Mirov bi dilê xwe re li ber wê dima. Mirov bi nerîne xwe re bi dîtina xwe re li ber dima. Ma gelo çi j ixweşikîyê bi bandûrtir heya li dinyê. Xweşikbûnê mirov karê çawa bêne ser ziman. Zimanê xweşikbûnê ku hebe wê pir xweşik û xweşik be. Xweza ku wan bi çavên xwe di wê heyemê de didîtin, weke keçikeke pir xweşik ku mirov çawa ku dît û dilbikewiyê de bû. Mirov bidîtina xwe re di cih de wê heyeme de dil dikete wê dîtina xwe de. Di pirtûkên pîroz de bahs û tevsire xweşikîyê bi navê firdewse tê kirin û ser ziman. Bahsa xweşikîyaka ku mirov di hizre xwe de ti carî nikaribe tê bigihê tê kirin. Xweşikîyaka wilo tê tevsir kirin, ku hemû tişt bi hefsun xwe bi xwe karê bi afirêne û bike. Lê deme ku di pirtûka pîroz de xweşikîyê tê ser ziman, hinekî weke ku têde pîroz bixweze were ser ziman wilo tê ser ziman. Bi wî awayî ku tînin ser ziman, tê ser ziman. Gelo ew xweşikîyê ew xweşikîyê ku di pirtûkên pîroz de dihatina xwe ser ziman bû? Pirtûkên pîroz li wan axê kurdistanê hatibûn nivîsandin. Pir ji hatibûn nivîsandin.

Deme ku mirov li wê xwezeyê dimeyîzend, mirov wilo xweşik di dît. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji deme ku dimeyîzandin, pir li wê xweşikîyê ku bi ber çavên wan diket bi hey dibûn û dimeyîzend. Bi heybûnaka ku pir bi hey dimeyîzend û heya xwe didana ser dore ku di buhurtin. Di dilê xwe de ji di gotin "hikmete te çend mazina". Wilo digotin û dibuhurtin. Wilo digotin û di serê xwe de bi hizir dibûn.

Ku weke qadarekê piştre berava ku lê sekinî bûn ku bi rê ketibûn, piştre ne bi gelekî re êdî di riya xwe de dise weke berê dabûn lazandinê. Hêdîka ne diçûn. Pir zû û bilez diçûn. Divîbû ji wilo zû û bileze çûban. Ji ber ku hê riya wan gelekî mabû. Ku lez ne kiriban. Wê di riyana de maban. Wê li çolê li wan bûbana şev. Ji bo ku li çolê li wan nebe şev ji, divêt ku wan lez kiribana. Divî ku qavzên xwe zû kiriban. Ji xwe ew li ser pişta hespan bûn. Hespên wan ji zû diçûn. Yên ku bi wan re mîr şandibûn ji, yên ku xwedi zanebûn bûn. Zanibûn ku ka wê çi kiriban. Ji vî alî vî Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî pir bi bext bûn. Baxtê wan, wê ji vî aliyê ve bi rê ve çûbana. Wan ji wilo dihasiband. Ji wê pêve, rê ji ne di danê de.

Mihamedû û seyde Avdilrehîmê xaniqî ku hinekî diçin êdî ew hespên ku ew li ser suwarbûn hinekî dî ji digêhinine nêzîkî hevdu û bi hev re dîkin ku bikevine axiftinê de. Wan pir hij axiftina di nav xwe dikir. Ew herdû ji mirovne ku zane bûn. Ji ber vê yekê ji hertimî dixwestin ku bi hev re

bikevine axiftinê de. Ew herdû ji du mirovne zanebûn. Serê wan tişî bû. Ye di serê herdûyan de ji mazin bû. Ji ber vê yekê ji, dixwestin ku bi hev re bi zanebûna xwe bi hev re biaxivin. Mirovên zane, li kuderê ji be û di çî rewşê de ji be, hertimî dixweze bi zanebûne xwe biaxivê. Dixweze ku ye di serê wî de çî heya bêne ser ziman. Hertimî ji dixweze ku mazin bi afirêne. Yên ku xwediyê vê xosletê bûn zane bûn.

Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ku hinekî dem têve çû, êdî hinekî xwe nêzîkî hevdû kirin û bi hev re bidest axiftinê kirin. Lê ji aliyekî ve heya wan ne tenê li ser hevdû û axiftinê bû. Heya wan hinekî li ser hevîr dore wan bû. Li hevîrdore xwe ji dimeyîzendin û di rê de diçûn û ji xwe re ji diaxiftin. Xweşikbûnaka mazin li dore wan hebû. Xweşikbûnaka mazin li dore wan hebû ku ew di nav de diçûn di wê kêlîkê de. Heya wan ji êdî ne mumkun bû ku ne çûbana ser hevîrdore wan. Mihamed pir li dore xwe dimeyîzend. Ji Urmîyê deme ku ketibû bûna rê de ketibûbûna nav şînayîye de. Di nav şînayîye de dimeşîn diçûn.

Ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî gahana hevdû êdî bi hev re axiftin. Bi hev re bidest axiftinê kirin. Berî hingî li ser çî axiftibûn, axiftina xwe ji wir dise berdewam kirin. Li ser Cizîre bota ji hinekî anîbûn ser ziman di nav xwe de. Li ser seydeyê mazin Meleyê Cizîrî ji pir diaxiftin. Bahsa wî û hizre wî dikirin. Bahsa hizre wî ya ku wî anîbû ser ziman û zimanê wî dikirin. De ne, divêt ku mirov li vir, careke din bêne ser ziman û bêje, ku zimanê seydeyê mazin Mele Ahmedê Cizîrî pir xweş û pek bû. Gotin di devê wî de dibû zêr, hingî xweş dibû. Deme ku gotinbi zanebûn hata ser ziman û xweş ji hata ser ziman, hingî dibe weke zêr di devê mirov de. Lê herkes, gotin di devê wan de ne be weke zêr. Zanebûn gotinê dike zêr. Seyde mazin mele Ahmedê Cizîrî ji pir bi zane bû. Pir bi hiş bû. Ew mirovekî ku di zanebûnê xwe de xwe gahandibû rastteqîniyê. Ew her weha mazin bû. Ew ku hata têgihiştin, wê hingî rastî bi rastteqîniyê xwe re pêre were tîgihiştin. Ew mirovekî rast û yê hizir bû. Mihamed ew hê ku li jiyane bû naskiribû. Ew dîtibû. Pêre dabû û standibû. Lê hisandibû. Dîtibû ku ew çawaya û xwediyê çî hizrê ya. Ji ber vê yekê ji, deme ku di derbarê wî de gotinên xwe digotin, wî gotinê xwe ji xwe bi êmin digotin û dianîn ser ziman. Deme ku li ser wî diaxiftin û dianî ser ziman, ku mirov lê dimeyîzend di deme ku diaxift de, mirov di dît û fahm dikir û çend ji xwe bi êmin diaxiftin û dianî ser ziman. Ji ber ku wî ew dîtibû û naskiribû. Ew tîgihiştibû. Ew ji wî lê hisandibû. Hizre wî ji wî lê hisandibû. Bi vê yekê dianî ser ziman. Di wê heyeme de, deme ku ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re dianî ser ziman, seyde Avdilrehîmê xaniqî hema wilo tenê bala xwe dide

ser wî û lê dihisand. Li gotinên ku wî digotin dihisand. Weke qadarekê wilo ji hevdû re diaxivin û Mihamed wilo xweş û bidil û ji dil bi zanebûne xwe jê re tene ser ziman. Piştî ku demek tene diçe bi axiftinê, êdî weke ku ji axiftinê wastaha bin li wan tene û êdî ji xwe re di sekinîn û dihisênin. Êdî wilo zêde deng ji wan dernekeve. Tenê wilo li ser hespên xwe ne, û berê wan li riya wan ye ku tene diçûn ve bû û di riya xwe de diçûn. Ew divêbû ku di rê de lez kiriban. Ji bo ku di rê de ne maban. Wan ji wilo fikir. Haya ku hespên wan karibana herin di dana wan ku hê zûtir herin..

Beş. 6.

Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî demeke mazin di rê de mabûn, haya ku werine Kirmaşanê. Di riya xwe de xwe gahandibûna pir deran. Di pir deran ve hatibûn. Rastûrast ne hatibûbûna Kirşmaşanê. Haya ku hatibûbûn kirmaşanê, di rê de xwe gahandibûn Mahabadê, Serdeştê, Pawehê û Hekmetenê. Lê haya ku hatibûbûn vanderan û ji wan deran ji buhurtibûn, çûbû bûn û gahabûn pir deverên din ji, yê ku li ser riya wan. Li wanderan ji demekê mabû. Derên ku zêde ew lê mabûn. Mahabadê, Serdeşt, Pawehê û Hekmetenê bû. Li hekmetene pir mabûn. Li wir li nav xwezayê wê ya pir xweş ji ji xwe re geraha bûn. Ewder pir dîtîn. Ji wir êdî ketibûbûn rê de, ku xwe digihênine hinek deverên din û ji wan deran êdî xwe digihênin Kirmaşanê. Rêvaniye wan pir dirêj û mazin buhurtibû. Pir xweş ji wan re buhurtibû. Her devera ku çûbûbnê de ji li wir çûbûbûn û xwe bu mîr û zanistên wir dabûbûn naskirin. Li Civate hevdû rûniştibûn û bi hev re dabûn û standibûn. Hevdû her weha naskiribûn. Mihamed ji li wanderan pir zanist naskiribûn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî berî hingî hatibû wanderan. Ji ber vê yekê, ev car ji wî re ne dibû cara yekemîn- Jê re dibû cara duyemîn. Lê wî ji, di carên pêşî de mirovên ku ne dîtibûn zanist di wê carê de dîtibûn û naskiribûn. Bi wan re rûniştibû û hizre wan hilda bû. Li ber wan ji hizre xwe ji anîbû ser ziman. Bi vê yekê mirov karê bêje ku ji bo wî ji gelek tiştên nû û bal hebûn.

Demeke dirêj di riyana di buhurênin. Lê her herême ku diçinê de, li wir weke mêhvanne bi qadr û qiymet tene pêşqazikirin. Ji ber vê yekê ew di riya xwe wilo zêde zore na kişênin. Lê pir bi wast riya wan di buhurê. Ji ber ku riya wan dîr bû û pir ji di deran ve di buhurin. Wan riyana xwe de dirêj kiribû. Di gelek deveran ve çûbûbûn. Rastûrast ne çûbû bûn Kirmaşanê. Piştî diçine gelek deveran û li wanderan ji hinekî dimênin û li wanderan ji gelek mirovan nasdikin, piştî diçin û xwe digihênin Kirmaşanê. Her devera ku ew diçinê de ji, li wir weke mirovne pir hêja tene pêşwazikirin. Ji xwe ew ji mirovne pir hêja bûn. Mirovne pir bi zane

bûn. Li wanderan ji yê n ku navê mihamed bihîstibûn hebûn. Hê ji deme wî ya li Cizîre bota yê n ku navê wî his kiribûn û bihîstibûn hebûn. Axlabê ji mîran pir navê wan his kiribû. De ne, ku li herêmekê çî bibe û çûkek ji bifirê di civatên mîran de ser têne axiftin. Deme ku Mihamed li Cizîre bota bû û mîr jê xazîne xwestibû, hingî, ji pir deveran ev yek hatibû bihîstin. Piştê ji deme ku xazîne tê dîtin, êdî behtir ji navê wî tê ser ziman û li herêmen din tê bihîstin. Bi vê yekê, mirov divêt ku bêje ku pir navê wî hatibû bihîstin. Li wê herême ji navê wî hatibû bihîstin. Yê n ku li wir zanist, miorvên navserî xwe û mîran axlabê navê wî bihîsti bû û zanibû. Bi vê yekê ew dihata naskirin. Deme ku Mihamed çûbû bû wir ji, êdî mirovên ku li civata wan lev gahaban hevdû ji pir bûn. Li civate wan pir mirov lev gehabûn hevdû.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî bi xosisî ji li hekmetene pir mirovên zanist yê n deme nas dikirin. Ew bi Mihamed dabûbûn naskirin. Mihamed ji bi wan dabû bû naskirin. Bi vê yekê, wan hevdû naskiribû. Mihamed, li wan û li dîwana wan rûniştibû û li wan hisandibû. Wî ji deme ku li dîwana wan rûniştibû hizre xwe bi xwe bi wî zimanê xwe yê pir xweş ji wan re bilev kiribû û anîbû ser ziman. Berî ku bigihine Kirmaşanê li herêmen ku digihinê de demeke xwe ye pir xweş û baş di buhurênin. Li wanderan ji pir baş têne azimandin. Qadrekî ku pir baş ji wan re tê nîşandin. Bi v yekê, ew deme xwe pir baş û xweş û qanc di buhurênin. Mihamed, ku tê wanderan, li wanderan li hevdirdore pir bi bal dimyîzenê. Dixweze ku hevdirdore xwe nas bike. Deme ku ew li wir dimêne û li civatên wan di rûnihê ji, êdî wan hizrên wan baş fêr dike. Di civatan de hizrên herêmi û yê n ku hene, pir baş û qanc têne ser ziman.

Piştî ku herweha demeke xweş di rê de dubuhurênin û piştê ku xwe digihênin Kirmaşanê, êdî li wir rastûrast diçina mizgefte mazin. Li wir deme ku diçin ji, dem ber êvarî ya. Mirov ji bo mêje asrê lê gahana hevdû. Ew ji bi ser wê de diçin. Deme ku diçin di cih de êdî rastî eleqeyê mazin tên. Li mizgefte mazin mele Ismail Yunisê Xêlanî. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ew pir baş û qanc nas dikir. Bi hev re ji mabûbûn. Ew ji di zanebûna xwe pir kur bû û di zanebûna xwe mirovekî ku hingî kur çûbû, nav dabû bû. Lê pir pîr bû. Bi alikarîyê xwe li ser xwe digirt. Zêde wilo nikarîbû bimeşîyana ji. Deme ku ew digihine wir, êdî di cih de ew seyde Avdilrehîmê xaniqî di nav cimaatê dibîne û bi ber çavên wî dikeve û piştê di cih de deng dikiyê de û ew ji di cih de diçê cem û dest didine hevdû. Seyde avdilrehîmê xaniqî hizir kiribû ku wê piştî mêje xwe gahandibanê de. Lê piştî ku mele Yunusê Xêlanî wî dibîne êdî deng dikiyê de û dibakê

wî ku herê cem wî. Deme ku mele Yunusê Xêlanî badikê wî, êdî bala gelek mirovan diçê ser wan. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku diçê cem wî êdî Mihamed dide rex xwe û dibe cem wî bi wî dide naskirin ji. De ne, Divêt ku mirov bêje mele Yunusê Xêlanî ew bihîstibû. Berî hingê hê ku ew li Cizîre bota bû ew bihîstibû. Deme ku ew dît , êdî di cih de bala wî çûbû bû ser wî. Piştê deme ku Seyde Avdilrehîmê xaniqî ew pê dabû naskirin, êdî bêhtir bala wî çûbûbû ser wî. Navê Mihamed bi zanebûna wî mazin bû. Bi vê yekê, balaka mazin li ser wî hebû. Di wê heyeme de mîr Hiseynê Kerim ji li wir bû. Mîr Hiseynê kerim, mîre Kirmaşanê bû û yekî pir bi nav û deng. Ji aliyê qancî û mêreniye xwe ve ji navê wî derketibû. Weke van xosletan navê wî bi zanebûnê û hêjadayîna zanistan ji derketibû. Deme ku Mihamed bi mele Yunusê Xêlanî re tê cem hevdû û ew bi hev re hevdû nasdikin, êdî mîr ji li wir e û bi wî re hevdû didine naskirin. Weke qadarekê ku hevdû nasdikirin û destê hevdû digihin, êdî piştê bi hev re di kevine rêze mêjê de ku mêj bikin.

Piştê ku hevdû naskirin û destgirtin bidawî dibe, êdî di cihê xwe de di rûnihin. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bi hev re ku di rex mîr de di rêze pêş de cih digirin. Bi hev re di kevine rêze pêş de. Lê di wê heyeme de ku hinek têve diçê û piştê ku mêj ji tê kirin, êdî li ber çavên Mihamed ji û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji xarîbîyek heya û ew vê yekê fahm nakin. Mêhle xwe didine ser mirovan ku fahm bikin. Dibînin ku xaribiyek heya. Lê nizanin ku çiya. Ji ber vê yekê, çawa ku her weha di serê wan de çêdibe, êdî ew hewl didin ku fahm bikin. Yê ku pêşî vê yekê farq dike û fam dike ji Mihamed e. Mihamed deme ku farq dike û fahm dike, piştê li seyde Avdilrehîmê xaniqî dimeyîzenê, ku ka wî ji ev yek fahm kiriya an ji ne. Piştê bi qadarekê re ew ji farq dike û fahm dike. Lê ew ji weke Mihamed tê dernaxe ku ka çî bûya an ji çî heya. Piştî mêje ku cimaat dike ku jev belav bibe, êdî ku mirov li hev digihine hevdû û bi hev re diaxivin, êdî ku mele Mele Yunusê Xêlanî ji axiftinê dike û di axiftina xwe bahs dike, êdî fahm dikin. De ne, seyde mazin ku li herêmê bigiştî bi nav û deng bû û pir mazin bû şêx Birehim çûya ser dilovaniya xwe. Wî di rastiyê de hertimî di wê mizgfte de li pêşiya wan mêj dikir. Wî hertimî pêşavanî dikir. Lê ew çûya ser dilovaniya xwe û Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji hatina ser tahzîya wî. Şêx Birehim, jê re şêx birehimê ber sûtî ji digotin. Pir mazin bû û zanistekî navdar bû. Mele Yunusê Xêlanî ji bi aslê xwe ne ji wir bû. Ew bi aslê xwe ji ji Xêlaniya ku li başûrê Kurdistanê dima bû. Lê ew demeke dîrêj ji bû ew ku li wê herêmê bû. Wî ji nêht kiribû ku vegehihe mala xwe û herê û hinekî li Cizîre bota ji bimêne.

Lê piştî ku şêx çûbû bû ser dilovaniya xwe, êdî ew ji li wir mabû bû. Wê dise vegerehe bana. Lê êdî divîbû ku hinekî li wir mana. Haya ku çilê şêx derketibana. Seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Yunusê Xêlanî pir hevdû nas dikirin. Bi hev re demeke dirêj ji mabûbûn. Mele Yunusê Xêlanî ji, divêt ku mirov bêje ku dîwana wî ji hebû û wê pirtûk ji nivîsandibûn. Pir nivîsên wî yên ku wî nivîsandibûn hebûn. Di nav zanist û aliman de dihatina zanîn û xwandin. Bi vê yekê, mirov karê pir mazin bahsa wî ji bike û wî ji di nav zanistan bihasibêne. Li herême wî ji navê wî hebû. Li wir ji dihata naskirin. Ji ber ku malbata wî malbataka ku pir dihata naskirin bû û di nav xalkê de ji xwedi nav bû, ew bêhtir dihata naskirin. Bi navê malbata xwe ji ew hinekî mazin hatibû naskirin. Lê li Kirmaşanê û li dore wê ji, di wê deme ku li wir mabû de ji pir hatibû naskirin. Navê wî derketibû. Ew li wir ji hertimî li civate mîr bû. Li dergaha şêx bû. Mirovên ku dihatina wanderan ji ew nasdikirin û rêzek ji şanî wî didan.

Ku hinekî li hevdû di rûnihin û bi hev re diaxivin, piştî civat ji dike ku jev belav bibe. Deme ku wilo dibe, êdî Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û mîr û gelek mirovên din di mênin û ew êdî bi hev re dimênin û ku derdikevin ji êdî dikin ku herine qasrê û li wir civate xwe li dar bixin û lê rûnihin.

Mîr, deme ku derdikevin, wan bi xwe re têne qasrê û li qasrê dikin ku li hevdû rûnihin. Mîr bi xwe ji mirovekî ku bi asîl bû. Navê wê wî hebû. Ew bixwe bi kalke xwe nav mazin bû. Kalke wî di deme xwe raperineke mazin li hevberê sefeviyan dike. Sefevi deme ku têne herêmê û êrişî jiyana wan dikin. Êdî ew ji li dore artişaka ku ji deh hezaran pêk tê, ava dike û bi artişa Sefeviyan re dikeve şer de. Navê Kalkê wî ji mîr Şerifxan zade bû. Jê re di nav xalkê de Şerifê kurê Hedlê ji dihata gotin. Ew mêrxasakî temem bû. Rehma xwûde lê bêt. Ew pir mazin bû. Navê wî hebû. Berê mîr Şerifxan kalkên wî ji her weha wilo mazin bû û xwedi şop bûn. Ew ji pir mazin bûn. Bi sad salan kevneşopîyên mala wan hebûn. Hertimî di welatê xwe mazin bûn. Bi nav û deng bûn. Li herêmê navê wan hebû. Naqabîna wî mîrê bota ji pir xweş bû. Deme ku ew serî li ber Şaxê sefeviyan Mohammed Xudabendî dirakê, hingî, ew xaberê ji mîrê bota re ji dişêne û ji alikariyê dixweze. Mîrê bota di cih de artişaka mazin dide avakirin û dişêne cem wî ku alî wî bikin. Bi vê yekê êdî bi ser dikevin. Ku bi serdikevin, êdî piştî li herême xwe weke hukumete xwe ye herêmî ava dike. Herême rojhilatê Kurdistanê ku haya bi ber sînorê Şîvan û ji wan wê ji di buhurê û digihê hewramanê û hê gelek deverên din dike bin destên xwe de. Li ser herêmê êdî ew revberêye xwe ye herêmî ava dikê. Piştî

Mohammed Xudebendî re yê ku hata dewsa wî Şêx Abasê yekemîn êdî bi wê rêveberîyê re kete tekiliyê de. Di deme Mohammed Xudebendî de gelek kurd hatina kuştin. Bi hezaran kurd hatina kuştin. Lê tevlî wê qasê ji kurd dise di herêmê xwe de bi serketin û li herêmên xwe serdet bûn. Di wê deme ku Mohammed Xudebendî fermana êrîşê ye li ser kurdan da, hingî, Hemzê beg hebû. Mohammed xudebendî bixw ji di bin bandûra wî de bû. Hemzê beg mirovekî fars bû û pir bi bandûr bû. Çavên wî bixwe ji lê bû ku piştî Mohammed Xudebendî re bibe şax li ser srê sefeviyan. Lê mirovên ku li hevberê wî ji di sekinîn hebûn. Weke Qadî Sileyman bixwe ji. Lê wî hemû ji ji riya xwe derxistin. Ku hemzê beg li Kurdistanê bi serketibana bêguman wê gahabana wê ermanaca xwe. Lê li Kurdistanê bi ser neket. Piştê ew bi awayekî ji aliyê hinek mirovên ku nêzikî Mohammed xudebendî ji bûn hata kuştin. Pişt wî re ji xwe ne bi gelekî re êdî Mihammed xudebendî ji mir. Êdî yê ku hata dewsa wî şah Abasê yekemîn bû. Mîr Huseyin Kerim di wê heyeme de ew rewşe rêvebertiye ye ku ji destê bavê xwe girtibû dide berdewam kirin. Ew mirovelî ku mazin bû. Bandûra wî li herêmê pir mazin bû. Herêmên din yên kurdistanê ji yên weke başûr û bakûr ji di rewşeke weke wê de bûn. Li wanderan ji ku serwerî xwe bûn. Li herêmên xwe serwer bûn. Lê Rojhilatê kurdistanê, piştî wê serketina Mîr Serifxan re êdî rewşeke pir baş afirî bû. Gelek mirov ji herêmên din diçûna wê herêmê û li wir diman. Li wir digerahan. Ewder didîtin. Ew herêmên kurdistanê herême pir ji aliyê pêşketinê li pêş bûn. Wilo zêde mirov nikaribû ku li şûn mana. Ku ne weke herême botanê ji ban, lê dise mirov karê bêje ku ne kêmi wê ji bûn.

Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bi hev re di rex mele Yunusê Xêlanî û mîr de dimeşîn û diçûna bi ber qasre mîr ve. Wê çûban qasrê û wê li qasrê ji xwe re rûniştiban. Li dore wan pir mirovên din ji hebûn. Ew ji bi wan re dimeşîn. Dohnê wan ji li ser wan bû. Wan ji li Mihamed û Seyde Avdilrehîmê xaniqî û mîr û mele Yunusê xêlanî dimeyîzandin. Li gotina wan dimeyîzandin. Ku wan tiştê gotibana di wê heyeme de wan ji weke wê di cih de dikir. Her weha wê kêlikê de rewşek afirî bû. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî hem dimeşîn û hem ji dohnê wan li dore wan bû û dimeyîzandin. Li dore xwe pir dimeyîzandin. Dore wan pir pêşketi dihata ber çavan. Çavên wan dûr didît. Deme ku dimeyîzandin ji didîtin ku çend hevirdor xweşa. Çend bala mirov dikişêne ser xwe. Bala wan ji her weha bi vê yekê çûbû bû ser dore wan. Mihamed ji wê herêmê xwe hinekî beyenbû. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî wilo zêde ne beyen bû. Ji ber ku

ew berê hatibû wir. Heya wî ji bûyarên wê herêmê yên ku dibûn û û bûbûn ji hebû.

Mihamed di serê xwe de di hizirî. Weke ku bihazn bû û dimeşî di riya xwe de di wê heyeme de. Bi vê yekê, wî bala mirovand dikişanada ser xwe. Lê Mihamed yên ku navê wî ji hiskiribûn hebûn. Ew demeke dirêj li Başûrê Kurdistanê mabûbû. Di wê heyeme de ku li wir mabû de, li wir pir gerahabû. Di deme ku mele Serhengê zaxoyî de ew û mele Serhengê zaxoyî hinekî bi hev re li herêmê geraha bûn. Di wê heyeme de bi gelek mirovan re hevdu naskiribûn. Çend ji wan mirovên ku wî di wê heyeme de naskiribûn wî li wir dîtibûn. Lê ji wê pêve wî ti çî kesek nas ne dikir. Lê seyde Avdîrehîmê xaniqî ne wilo bû. Wê gelek mirov naskiribûn. Di cih de ew bi wan re ketibû têkiliyê de bidest axiftinê de. Mihamed ji diaxift. Lê deme ku bi wî re di hata axiftin hingî ew diaxift. Wekî dî ji ew bi bêdeng dima di cihê xwe de.

Mihamed her weha di rewşekê de bû. Mirov karîbû ku her weha wî bêne ser ziman di wê rewşê wî de. Lê ew ji serweri xwe bû. Deme ku diaxift, her gotina ji nav lêvên wî derdiketin ji zanebûna wî radixista ber çavan. Dihîşt ku mirovên li dore wî bi zanebûna wî nas bikin. Deme ku her weha ew diaxift û bi axiftinê zanebûna wî derketike hole, êdî bala mirovên li dore wî ji pir diçû ser wî. De ne, divêt ku mirov di vir de bêne ser ziman ku mirovên ku di wê heyemê de li dore wî ji bûn, ne mirovne ku bêzane bûn. Hemû ji mirovne ku zane bûn. Yên ku ji aqilê xwe bi êmin û bi bawer bûn. Deme ku mirov li wan ji dimeyîzend, mirov ev yek ji wan û ji rewşê wan pir baş û qanc fahm dikir û têdigihîşt. Wan mirovan dohnê xwe dide ser Mihamed. Deme ku hnekî wan bi Mihamed re axiftin kir, piştê êdî wan ji fahm kir ku Mihamed mirovekî ku bizane ya. Her weha zêde dem ne buhurî ku têbigihin ku ew mirovekî ku pir bizane ya. Deme ku ew diaxift, bi axiftina wî têdigihîştin.

Mihamed, car bi car hinekî diaxift û hinekî dima sekinî di rewşê xwe de û li yên dore xwe yên ku diaxiftin li wan dihisand. Li wan dihisand ku ka ew çî diênine ser ziman. Wî her weha dohnê xwe dide ser ziman. Mihamed hinekî di xwe de bi wê rewşê ji bihizir bû. Ku mirov hinekî ji dohnê xwe bidana ser wî, hingî, mirov ew rewşê wî di cih de kifş dikir û fahm dikir. Mirov fahm dikir ku Mihamed di xwe de bi hizire. Lê piştî ku ew ji hinekî bi mirovên li dore xwe re axiftibû, piştê êdî bal mazin çûbûbûna ser wî di wê heyeme de. Piştî ku bal çûbûbûna ser wî, êdî bal ji ser wî ne divaqatahan. Hertimî li ser wî bûn. Wilo di rewşê xwe de Mihamed dimeşî û mirovên li dore wî ji bala wan li ser wî bû. Car bi car an ji mirov bêje

dor bi dor bi hev re diaxiftin. Her weha rewşeke wan ji hebû. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî bala wî li ser mîr û mele Yunusê Xêlanî bû. Mele Yunusê Xêlanî pir hêdîka dimeşî. Wilo zêde nikaribû ji zû bimeşê. Ew di temenekî ku pir mazin de bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend ji, mirov digot ku mirovekî ku pir ciwana bi rudêna xwe. Bi rudêna xwe wilo ciwan dihata berçavan û xuyakirin. Lê ew pir pîr bû. Gelekî û gelekî di nav salan de buhurtibûbû. Divêt ku mirov vê yekê ji bo wî bêne ser ziman. Divêt ku mirov bi rêz ji bahsa wî bike. Ji ber ku mirovekî ku pir hêje ji bû. Rihaka wî ya sipî û pir dirêj hebû. Riha wî li ser singa wî di sekinî. Lê wî bi wê riha xwe dîmenekî ku pir xweşik dide berçavan. Ku mirov lê dimeyîzend, hema mirov dixwest ku mirov lê meyîzenê. Wilo mirov dixwest hîs dikir. Wilo mirov di dilê xwe de ji xwe dixwest. Pir xweşik û sipahî li ber çavan di sekinî.

Seyde Avdîlrehîmê xaniqî û mele Yunusê Xêlanî di rex hevdû de dimeşîn. Mîr ji di rex wan de bû. Bi hev re dimeşîn ji ji hev re ji diaxiftin. Wilo rewşeke wan ye xweza hebû ku mirov li wan dimeyîzend. Mîr car bi car diaxift. Di wê heyeme de mafê axiftinê bi zêdeyî yê seyde Avdîlrehîmê xaniqî û mele Yunusê Xêlanî bû. Mîr car bi car xwe tevlî wan dikir. Lê wekî dî ji li wan dihisand. Mihamed ji car bi car tevlî wan dibû. Ew di rex Seyde Avdîlrehîmê xaniqî de dimeşî. Deme ku ew ji diaxift, bal diçûna ser wî ji di wê heyeme de. Lê wî weke ku diaxiftinê de di wê heyeme de xwe wilo zêde ne dide pêş. Riya axiftinê weke ku ji Seyde Avdîlrehîmê xaniqî û mele Yunusê xêlanî re bihêle di rewşekê de bû. Wilo ew dihata berçavan. Lê bi wê zanebûna xwe re ji ew hatibû naskirin. Êdî dîvîya bû ku ew ji axiftibana. Wekî dî ji ne dibû. Mirovên zane karin biaxivin. Karin bizane û di cih de biaxivin. Mihamed ji her weha mirovekî ku zane û biaqilê xwe mazin..

Ku her weha biaxiftin û hêdîka weke qadarekê dimeşîn ku werine qasrê, êdî digihine ber qasrê. Deme ku digihine ber qasrê êdî Mihamed ji û seyde Avdîlrehîmê xaniqî ji fahm dikin ku hatina ber qasrê. Piştî ku hinekî ji wilo di rewşe xwe dimeşîn û tîn, êdî digihine ber devê deriyê hewşa qasrê û êdî ku digihine ber devê derî, êdî li devê derî ne sekinin û di cih de dikevîne hundurê hewşa qasrê de bi hev re. Ku bi hev re dikevîne hundurê hewşa qasrê de, êdî di cih de dise bi hev re ji hewşê dubuhurin û diçîna hundur û diçîna diwana rûniştinê ye civatê. Ku diçîna diwana rûniştinê, êdî li wir bi hev re rûnihin û dikin ku êdî bi hev re biaxivin û civate rûnênin. Mihamed û seyde Avdîlrehîmê xaniqî di rex hevdû de dirûnihin. Lê mele Yunusê Xêlanî li hevberê wan ku wan herdûyan ji pir baş bibîne

dirûnihê. Mîr ji li cihê xwe li serê dîwanê dirûnihê. Ku dirûnihin êdî ne bi gelekî re bi hev re dikevîne axiftin û danûstadinê de. Bi hev re dikin biaxivin. Mîr bala wî li ser seyde Avdilrehîmê xaniqî dibe. Pêre ji bala wî diçê ser Mihamed. Mele Yunusê Xêlanî bala wî, piştî dirûnihin êdî dayimî li ser Mihamed dimêne. Bala wî ji ser Mihamed ne vaqatihê.

Di wê heyeme de di civata wan de gelek mirovên zane hebûn. Miorvên weke Mîr Xidirê Ankafî, şêx Samedê Basûrî, Mele Menduhê Sêrtî, Mele Avdilqadirê hewlêrî û Tawangalê Dohukî hebûn. Ev hemû ji zanist bûn û di herêmên xwe de xwedî nav û dergah bûn. Ew ji di wê heyeme de hatibûbûna wir. Ji ber ku şêx Birehim piştî ku çûbû bû ser dilovaniya xwe hemû ji hatibûbûna wir. Hê gelek mirovên din ji yên zane û navdar hatibûbûna wir di wê heyeme de. Lê belê gelek wan piştî ku hatibûn ne bi gelekî re êdî vegerehe bûn. Yên ku mabûn ji, yên ku riya wan pir dûr bû. Ji ber vê yekê ji ber ku bi rê bikevin, di xwestibûn ku hinekî dî ji li wir li wê herêmê bi mênin. Wanderan û zane û xweşkatiyên xwe re bibînin. Ji ber vê yekê ji hê ji ew li wir bûn. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî hatibûbûna ser tazîya şêx. Seyde Avdilrehîmê xaniqî bixwe şêx Birehim nasdikir. Pêre mabû bû. Ji ber vê yekê, wî zanibû ku ew mirpvekî ku çawa ne. Lê seyde Avdîrehîmê xaniqî deme ku di bihîze ku şêx Birehim çûya ser dilovaniya xwe pir dilê wî diêşîhe. Pir li dil wî dixê. Deme ku his dike, pêşî weke qadarekê di cihê xwe de bi bêdeng dimêne. Weke ku pêşî yeq neke lê têt. Lê piştê ku hinekî dem têve diçê, êdî ew ji fahm dike ku ew çûya ser dilovaniya xwe û êdî mecbûr dimêne ku yeqîn bike. Îda yeqîn dike. Lê ji seyde Avdilrehîmê xaniqî re pir zor têt. Gelekî jê re giren têt. Haya demekê di bin wê gireniyê de biêş dimenê. Piştê ji ku hinek dem têve diçê ji ew wilo zêde ji bandûre çûna ser dilovaniya xwe ye wî dernekeve. Di rê de ji deme ku dimeşîn û ji xwe re diaxiftin ji di bin bandûra wê yekê de bû. Di rê de deme ku dimeşî hem bi yên ku bi wan re dimeşî diaxift û hem ji di xwe de li ser wî hizir dikir. Her weha ew di rewşekê de bû. Piştî ku hatibûbûna qasrê û buhurtibûbûna dîwanê û lê rûniştibûn ji, ew di xwe de di hizre wî de bû. Deme ku lê dihata meyîzêndin ev yek pêre dihata kifşkirin. Piştî ku li hevdû dirûnihin ji xwe, êdî dikin ku bi hev re bikevîna axiftinê de. Piştê dikevîna axiftinê de. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî di xwe de bi hizire û di hizir de ye. Bi vê yekê, deme ku ew diaxivin ji, ew bi bêdenge di cihê xwe de di wê heyeme de. Piştê ku di rûnihin li hevdû êdî ji xwe bi hev re dikevîna axiftinê de. Hin bi hin êdî axiftinên dirêj û yên bi hizir di wan de dibin. Mihamed ji car bi car di wê heyemê de diaxivê. Lê ew bi zêdeyê ji di wê rewşê de ye ku li wan bi

hisêne. Weke ku bizêdeyî bixweze li yên ku diaxivin û wî biaxivin bihisêne. Lê deme ku di keve derbe xwe de ji ew ji çend gotinan di wê heyeme de dibêje. Lê wilo zêde axiftinên zêde dirêj heya wê kêlikê ji ne kirina. Mîr, piştî li hevdu rûniştin, êdî mafê axiftinê yên ku pêşî hilda û axiftineka zêde dirêj û ku mirov bêje xweşa ji kir. Bi wê axiftina xwe ye ku kir, mîr bala mirovên li hevirdora xwe kişanda ser xwe di wê heyeme de. Piştî ku mîr axiftina xwe kirş û ma sekinî pêde, êdî axiftin bûn û zêde zêde ji bûn. Mirovên ku li wir rûniştibûn bi hev re ketina axiftinê de. Mirovên ku li wir rûniştibûn ji, hemû ji mirov divêt ku bêje ku yên ku navserî xwe û zane bûn. Yên ku di nav xalkê de bi zanebûna xwe û navsertiya xwe dihatina naskirin bûn. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku yên ku di wê heyemê de li wir rûniştî bûn, hemû ji yên ku zane bûn, yên bi aqil bûn. Mirovên weha ji ku biaxivin, wê ne vala biaxivin. Wê bi zane û bi aqil biaxivin. Wê zanibin ku wê çi bênine ser ziman.

Piştî ku axiftin û danistandin weke qadarekê di nav wan de bû, piştî êdî seyde Avdilrehîmê xaniqî tevî wan û axiftina wan bû. Ji wê bédengbûna xwe derket. Piştî ku mîr axiftibû, piştî wî re çend mirov axiftibûn û êdî piştî wan re mele Yunusê Xêlanî bidest axiftinê kiribû û axiftibû. Ew, deme ku axiftibû, weke qadarekê axiftibû. Weke demeke dirêj axiftibû. Kiribû ku bala herkesekî herê ser wî. Ji xwe, deme ku ew axiftibû, bi axiftina wî re weke mirovên li dore wî ku bi axiftina wî re bala wan çûbû bû ser wî, wilo bala seyde Avdilrehîmê xaniqî ji çûbû bû ser wî û bi wê bal çûbûna wî ye li ser wî re ji êdî ew hatibû ser xwe di wê heyeme de. Bi vê yekê, ye ku seyde Avdilrehîmê xaniqî ji hizrên nava xwe anîbû xwe, axiftine mele Yunusê Xêlanî bû. Mele Yunusê Xêlanî divêt ku mirov bêje ku mirovekî ku pir bizane û biazil bû. Yekî ku mazin bû. Bi zanebûna xwe mazin bû. Pir xwedibû û dabû xwendin. Bi vê yekê, bi zanebûnê di nav salan de çûbû bû. Temenê wî hema bêja hemû ji bi xwandinê buhurtibû. Bi vê yekê, wî rêzeke mazin ji mirovan maf dikir.

Mihamed di wê heyemê de car bi car tevî axiftinan dibû. Lê divêt ku mirov bêje ku balna mazin li ser wî ji hebûn. Di deme ku di rê de dihatin, hingî, wî bi mirovên ku di rex xwe de dimeşin re diaxift û hinekî dirêj ji diaxift. Bi wan axiftinên wî, êdî yên ku lê hisandibûn, dîtibûn ku ew çend bi aqil û zane ye. Bi vê yekê re êdî bala wan çûbû bû ser wî di wê heyemê de. Ew balên ku çûbû bûna ser wî, piştî ji ser wî qut ne bûbûn. Li ser wî mabûbûn. Haya ku hatibûbûna qasrê li ser wî mabûbûn. Di qasrê de li dîwana civatê de li ser wî bûn. Di wê heyeme de ji li ser wî bûn. Gelek ji wan mirovên li dore wî ji ku diaxiftin ji bala wan li ser Mihamed bû. Bala

mîr ji li ser Miahmed bû. Mihamed di wê heyemê de car bi car ku ne dirêj diaxift. Çend ku ne dirêj kin ji diaxift, dihata têgihiştin ku ew çend bizane ya. Ji wê axiftina wî ya kin ji her weha ev yek ji wî dihata tîgihiştin û fahm kirin.

Lê di vir de divêt ku mirov tiştêkî bi bal bêne ser ziman. Deme ku mirovekî ku zane ji bê, ku bala mirovên dore xwe kişanda ser xwe, ne xasim vêce yên ku bala wan çûna ser wî zanist bin, divêt ku ew ji wan re li gor zanebûna xwe axiftinaka pir li gor xwe baş kiribana. Ku jê hatibana xwestin ji û ne hatibana xwestin ji, piştî bal çûna ser re, êdî ev yek dibû weke barakî li ser milê wî. Ev yek weke şopaka mazin ye zanist ku li civatên hevdû rûniştibûn bû. Mihamed ji ji vê yekê ne bêxaber bû. Heya wî ji ji vê yekê hebû. Piştî ku bal her weha mazin çûbûbûna ser wî, êdî wî divîbû ku axiftibana ji wan re. Li gor zanebûna xwe çawa karibû ku mazin û zane bianîyana ser ziman, divîyabû ku wî wilo bianîyana ser ziman. Wî ji ev yek di wê heyemê de bi bal çûna ser wî re weke barekî ku li ser piştî xwe didît. Êdî divîyabû ku wî kiribana. Ji xwe balên ku li ser wî ji bûn, yên miorvên zanist û yên ku navê wan hebû bûn. Miorvekî ku çend gotibana ku ez zanistim ji ku ji wan mirovên zanist misogerî ne standibana wê ne weke zanistekî hatibana naskirin. Divîyabû ku wan ew weke zanistekî pêşî erêkiribana. Divîyabû ku Mihamed ji bi zanebûna xwe, xwe danîbana ber wan, da qana wan gotibana an ew zanistekî mazin û an ji ne ew ne zanistekî. Hê ne bûya zanist. Ev yek weke kevneşopîyekê hebû. Mihamed ji heya wî ji vê yekê hebû.

Ku weke qadarekê dem têve çû, êdî ku hinek mirovên din ji axiftin, piştî seyde Avdîrehîmê xaniqî mafê axiftinê hilda û axift. Deme ku ew axift, pêşî wî hinekî li ser deme xwe ye berê ku hatibû wir axift û hinekî di nav de bahsa şêx Birehim kir. Pir dirêj û bi zane bahsa wî kir. Seyde Avdîrehîmê xaniqî axiftinaka pir dirêj bi zane kir. Deme ku wî axiftina anî ber dawiyê ku bidawî bike, lê hê ku bi dawî ne kirî, di dawiyê axiftina xwe de bahsa Mihamed kir. Hinekî li ser Mihamed rawastaha. Bahsa hinekî demên xwe yên ku wî bi Mihamed re buhurandina kir. Pêre ji bahsa zanebûna wî kir. Wilo xweş û ji dil bahsa wî kir, kir kur bala herkesekê li wir tene li ser wî bêgirêdan. Piştî ne bi gelekî re ku wî axiftina xwe bidawî kir, êdî bala çûna ser Mihamed ku ew biaxivê. Mihamed ji piştî ku seyde Avdîrehîmê xaniqî axiftina xwe bidawî kir, êdî wî xwe di cihê xwe de xwe adiland û kir ku biaxivê. Lê Mihamed berî ku bi axivê, pêşî hinekî li dore xwe meyîzend. Di wê heyeme de Wî bi çavên xwe dît ku wa çavên herkesekê li wir li wî hatina girêdan. Piştî çavên xwe dana ber xwe û

bidest axiftina xwe kir. Deme ku wî bidest axiftinê kir ji di serê axitina xwe de ji ji seydeyê mazin meleyê Cizîrî bigotinekê bidest axiftina xwe kir. Got ku "Di rîya rasti û mirov de rê nişan im" û piştî bidest axiftina xwe kir:

Mihamed deme ku bidest axiftinê kir, êdî bi zimanekî pir xweş bidest axiftinê kir. Deme ku bidest axiftinê kir, heya mirovên li dore bi carekê re çûne ser wî di wê heyeme de. Hemûkên li wir dohnê xwe danê de ka wê çawa biaxivê. Mihamed lê deme ku bidest axiftinê kir û piştî hinekî pêde çû, yên ku li dore wî bûn tene li nav çavên wî dimeyîzandin di deme ku ew diaxift de. Pir lê di meyîzandin. Mîr ji di nav de mirovên li dore yên zanist hemûkan heya wan li ser Mihamed bû. Mihamed weke qadarekê axift. Deme ku axift de li ser gelek mijarên zanistî rawastaha. Li ser mijarên hizirî rawastaha. Pir dirêj axift. Di axiftina xwe ji gelek zanistên deme xwe û yên berî deme xwe, ji wan minaq dan û bi axiftina xwe berdewam kir. Kuu mihamed her weha weke qadarekê axifti, êdî kir ku axiftina xwe bêne ber dawiyê. Lê berî ku bidawî bike, hinekî bahsa Dilberê û Dilşad ji kir. Li ser wan ji rawastaha. Deme ku bahsa wan kir, bi zêdeyî ji li ser Dilberê rawastaha. Bahsa wê kir. Pir bi zane weke jinekê bahsa wê kir. Pêre hinekî li ser jine rawastaha. Di wê heyeme de li ser jine axiftin pir hebû. Her zanistek xwediyê hizre bû di serê xwe de di derbarê wê de. Mihamed ji di serê xwe de xwediyê hizrekê bû. Wê jin û mêr wek hev di dît û wî gelek caran di axiftinên xwe di got ku "divêt ku mirov li jinê ji û li mêr ji bi hizir nêzîk bibe. Wî ev yek girîng didît. Li gor wî rastiya mirov bi hizir wê were fahmkirin. Lê divîbû ku ji jine qut mirov ne hildê dest. Wî girîngî dide vê yekê. Hinek hizrên seyde Mazine yê meleyê Cizîrî yên di derbarê jinê de wê di serê xwe de bicih kiribûn. Hinek hizrên meleyê Cizîrî hebûn. Di wan de pir bahsa Nebî Nuh ji dihata kirin. Bahsa rewşa wî ye bi jinê re dihata kirin. Mihamed, heya wî ji wan hizrên wî ji hebû. Ew ji di serê wî de bûn di wê heyeme de di deme ku diaxift de.

Weke qadarekê Mihamed bi Dilberê ve girêdaayî li ser jinê rawastaha. Li ser cihê wê yê di civaka de rawastaha û bahsa demên berê kir. Li ser demên berê û kevneşopîyan ji pir rawastaha. Hinek bahsa kevneşopîyan kir. Li ser wan sekinî. Deme ku wî bahs dikir, yên li dore wî ji pir bi hey bala xwe didane wî û lê dihisandin. Gelekan ji wan yên ku lê dihisandin ji wan yên zanst, weke ku di cih de bixwezî biaxivin xwe di cihê xwe de diadilandin. Lê Mihamed hê diaxift. Weke ku axiftina Mihamed ye ku dikir di wê heyeme de di serê wan de gelek hizir bi bîr dikirin an ji çêdikirin. Deme ku mirov li rewşa wan dimeyîzend mirov ev

yek pir baş û qanc ji wan kifş dikir. Mihamed deme ku bahsa Dilberê kiribû û pêre hinekî li ser rewşê jinê rawastaha bû, hingî, xwestine axiftinê ye wan çêbû bû. Mihamed diaxiftina xwe de gelekî li ser jinên ewliya rawastaha bû. Bahsa wan kiribû. Piştire pêre li ser dayiktiya rawastaha bû. Wî pir hêjatî dide dayiktiyê. Pir li ser disekinî. Ne li wir ji, li gelek deverên din ji di demên ku diaxift de li ser dayiktiyê di sekinî. Di axiftina xwe de her car ji bahsa mafê yê li me dikir. Li ser wê pir dirawastaha. Di wê heyeme de ji pir li ser wê rawastaha bû. Weke qadarekê ji dore xwe re her weha axiftibû. Piştire ku her weha hinekî axiftibû, êdî piştire ku çend gotinên din ji bi ser axiftina xwe ve zêde kiribûn êdî wî axiftina xwe bidawi kiribû û mabû sekinî. Lê deme ku Mihamed ma sekinî di cihê xwe de hingî yên li dore wî ji hê ku bala wan li ser wî lê dimeyîzandin. Hê ji lê weke ku bişaq bûn. Lê şaq mabûn. Mihamed pir mazin û bizane axiftibû. Piştire ku ew ma sekinî êdî weke bêhnekê bêdengî çûbû. Piştire yê ku ew bêdengî xirakir û axift mele Yunusê Xêlanî bû. Wî berê xwe da Mihamed û gotiyê de ” ti mirovekî zanistî û te pir xweş û xweşik xaber da. Te rastî pir xweş û qanc anî ser ziman. Te li vir da nişandin ku ti zanistvanekî pir mazinî. Ti bûyî qancekî nêzkîkî xwûde yî”. Deme ku mele Yunusê Xêlanî weha axift, lê ku wê axiftina xwe bidawi ne kirî, Mihamed ji kete nava axiftina wî û got ”ti ji qanciya xwe dibêje” û ma sekinî. Piştî ku Mihamed her weha got û ma sekinî êdî piştire mele Yunusê Xêlanî axiftina berdewam kir û weke çend gotinên din ji got û piştire wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de. Mihamed di nava axiftina wî de tevî axiftinê bûbû bû. Mihamed, deme ku wî got ku ”ti bûyî qancekî nêzkîkî xwûde”, êdî Mihamed tevî axiftin bûbû û gotibû ti ji qanciya xwe dibêje. Di her demê de deme ku yekî ji yekî dî re bêje qanciyê anî ser ziman, divîbû ku di cih de yê ku jê re hatibû gotin tevî axiftinê bûbana û her weha wilo gotibana. Ev yek weke çandakê bû. Hertimî ji aliyê mirovan ve dihata kirin. Kî ji bana dikir. Di nav xalkê de ji hertimî ev yek dihata kirin. Weke çadaka rêzdayîna û birêz bersivdayîne bû. Mihamed ji di wê heyeme de ye ku kiribû ew bû.

Mele Yunusê Xêlanî ku weke qadarekê axift û piştire ma sekinî di cihê xwe de, êdî pişt wî re yên ku li wir bûn û xwedî zanebûn ji bûn, wan ji çend gotin û weke mele Yunusê Xêlanî heman tişt ji bo Mihamed anînina ser ziman. Wan ji deme ku ji Mihamed bahskirin weke ku ji zanistekî mazin yê demê bahs bikin, di axiftina xwe de bahskirin. Weke qadarekê her weha mafê axiftinê di nav wan de geraha û ew axiftin. Hinekî ku dem têve çû, êdî ku yên ku wê axiftibana ku axiftin, êdî mîr ji mafê axiftinê pişt wan re

girt û axift û li ser Axiftina Mihamed rawastaha. Wî ji li gor zanebûna xwe û biqasî ku fahmkirina xwe bahsa wî kir û li ser wî sekinî. Bahsa wî kir. Mihamed deme ku her weha li ber wî bahsa wî dikirin weke ku fihet bike dibû. Serê xwe car bi car dikire ber xwe de û dima sekinî di cihê xwe de. Piştî ku Mîr ji axiftina xwe bidawî kir, êdî pişt wî re hinekî di nav xwe de axiftin bû. Yên ku di cihê xwe de bi yên di rex xwe de diaxiftin hebûn. Lê wê rewşê wilo zêde berdewam ne kir. Piştî ne bi gelekî re hinek mirovên ku dengxweş bûn ketine devrê de û bidest gotinê kirin. Bi wê dengê xwe yên xweş kirin ku dilê mirovên ku li wir xweş bikin. Yên ku ketine devrê de ji axlabe wan ji ji wir bûn û li cem Şêx Birehim mazin bûbûn. Ji dîwana wî heyîdar bûn. Deme ku wan bidest gotinê kiribûn, ji dîwana wî hinek qasîde bidest gotinê kiribûn. Ji ber ku ew ji nûkava ji nav wan çûbû bû, hê ew di aqil û hişê wan de bû. Hê bi jîn û zîn bû.

Mirovên ku ketina devrê de weke qadarekê bi dengên xwe deng dana dore xwe û gotin. Mihamed di cihê xwe de sekinî pir bi hey li wan dihisand. Wî bala pir bi hey dide gotina yên di gotin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di cihê xwe de mabûbû sekinî. Ew qadarek bû ku ew bi bêdeng bû. Ti deng ji wî ji dernediket. Lê deme ku mirov lê dimeyîzend mirov di dît ku bi gotina wan mirovên ku digotin ketibû hizran de. Ne tenê ew ketibû hizran de. Wan mirovên ku dengê wan xweş bû ku bidest gotinê kiribûn, bidengê xwe re herkesekê li wir kiribûbûna nava hizir de. Herkesekê li wir kiribûbûna rewşeke bi hizir de. Yek di nav wan mirovên ku digotin de hebû, dengê wî pir xweş bû. Dikir ku gîzlonêk bi laşê mirov de werê. Navê wî ji Dilşan bû. Wî weke navê xwe dilê mirov şa dikir. Dilê mirov bi dengê xwe re gih xweş dikir û gih ji xamgîn dikir. Wî pir xweş di got. Deme ku Dilşan bidest gotinê kiribû. Êdî yên ku li dore wî bûn jê xwestibûn ku ew berdewam bike. Hingî dengê wî xweş bû û zîz bû. De ne, di vir de divêt ku mirov bêje. Dilşan mirovekî ku bi dilşawat bû. Berî hingî wî hij keçikekê kiribû. Lê ew ne gahabûbûna hevdû. Keçik piştî tiştêk tê serê wî û piştî di jiyane de Dilşan dimêne bitenê. Piştî êdî ew, wê bitenêbûna xwe bi xwe re dide berdewam kirin. Keçik ji navê Zêrînê bû. Pir xweşik bû. Deme ku bi dayika xwe Sînemê re diçê cihê ku di şêvîne de sawal lê dimêne, di rê de tê gotin ku linge wê di hiltapilê û dikeve bi ser ruyê xwe de. Deme ku dikeve ji tê gotin ku anîya wê dikeve ser anîşka kevirekî ku tuj de û piştî êdî nayê ser xwe. Piştî êdî ne bi gelekî re tê gotin ku keçik hê ku ne gihiştî miredê xwe digihê rehmeta xwe û êdî Dilşan dimêne bitenê. Ew ji piştî êdî ti kesekî nakê jiyana xwe de. Bitenê jiyana xwe berdewam dike. Dilşan biqasî ku tê gotin ahlekî mîr bixwe ji bû. Mîr piştî gelekî pêve dimêne ku

wî bi zewicêne lê dike û nake ew erê nakê. Piştîre mîr madam ku nikarê wî bide zewicandin, êdî wî ji qasrê nade qutkirin. Ew êdî hertimî bala wî dimêne li ser wî ku nîşanakê jê bibîne ku ew wê zewecê erê bike. Lê haya wê kêlikê ji hê ne mîr û ne ji ti kesekî din ti nîşanak jê dîtina. Lê wî di dilê herkesekî de cih û war girtiya. Herkesek ji dilê wan pêve ye û pê dişawitê. Lê ma ka wê çi bikin. Di nav xalkê de yên ku weha diman, ji wan re rêzeke mazin hebû. Hinekî ew nêzîkî xwûde ji dihatina dîtina. Ji ber vê yekê ji qadrekî wan yekî mazin hebû. Ji evîn û evîndariyê re rêz û rêzdayînaka mazin hebû di nav xalkê de ji xalkê. Di evîna wilo bi êş de hinekî pîroziya jiyanê ji dihata dîtina. Pir li ser wan dihata sekinandin. Di nav xalkê de herkesekî ew bi bîra xwe dixistin. Ew di aqılan de bûn. Dilşan ji her weha mirovek bû. Pir bal li ser wî hebûn. Dengê wî ji pir xweş bû û zîz bû. Deme ku wî digot ji dil digot. Bi wê yekê, êdî dide dilê mirovên dore xwe di deme ku digot de. Weke qadarekê ku ew dibêje, piştîre ew ji dimêne sekinî û piştîre êdî hineke din dikin ku bikevine devrê de. Piştî Dilşan re yekî dî ku bi navê Cembele dikeve devrê de û hinekî dibêje. Lê ew ji zêde wilo dirêj nakê. Piştî Dilşan û gotina wî re êdî hinekî di dil de hisandin û zîzbûn bi mirovan re çêdibe. Xwestina gotinê ji êdî ji wan nayê. Ji ber vê yekê êdî hinekî bêdengî di nav wan de di wê heyeme de bi wan re çêdibe.

Piştî gotinê re êdî hinekî dî têve diçê û axiftin hinekî dest pê dike. Mîr dest bi axiftinê dike. Pêre yên diaxivin ji hene. Bi wan re êdî axiftin di wê heyem de di civatê de bi pêşdikeve. Lê ew zîzbûn û di xwe de hisandin berdewam dikir. Weke qadarekê piştî axiftinê re ji ev yek berdewam dike. Mihamed ji ji wan mirovên ku di xwe de dihisand bû. Yên di xwe de di hizir de bû. Lê Mihamed di bin balan de bû. Mirovên ku bala wan li wî hebûn. Deme ku ew axiftibû, weke ku bide nîşandin ku ew zanistekî ku mazina axiftibû. Piştî axiftina wî re bi vê yekê, pir bal û hey çûbûbûna ser wî di wê heyeme de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî di cihê xwe de dihisand. Piştî ku çend mirov piştî qasîdegotinê re dikevine devrê de û diaxivin piştîre êdî ew ji weke ku bixweze ku bi axivê xwe derdixe pêş. Dike ku bal werina ser wî. Mele Yunusê Xêlanî di wê heyeme de yê ku pir axiftibû bû. Yê ku deme ku diaxift pir bal diçûna ser wî bûbû. Yekî ku pir zanist bû. Di nav salan û zanistê de bi temenê xwe ve çûbû bû. Di nav salan de her weha çûbû bû. Bi vê yekê, deme ku ew diaxift balaka mazin diçû ser wî. Mirovan li wî dimeyîzend. Gotina ku ji devê wê derdiket ji weke rastiyaka mazin dihata pejirandin. Her weha ew mazin bû. Li ser gotinê ku ji devê wî derdiket raste an ji ne raste ti gotin an ji nîqaş ne di hata kirin. Bizanebûna wî re her weha baweriyaka mazin lê bûbû.

Di wê heyeme de piştî çend mirovên, ku ew ji hinekî axift piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî axift. Ew deme ku axift, hinekî li ser zanebûnê û qanciye axift. Li ser demên berê yên kurdistanê axift. Li herêmê di demên berê de pir pêşketineka mazin derketibû hole. Deme Merwaniyan û navê wan pir hebû. Di nav demên piştî zayînê de deme Merwaniyan demeke ku pir li ser dihata axiftin bû. Pêre ji pir bahsa Salahadînê Eyûbî pir dihata kirin. Wî tiştê ku mazin kiribû. Li herêmê wî ne tenê di nav kurdan de li gelek herêmên din wî rewşeke nû afirandibû. Wî bi xwe re demeke nû dabû bû dest pê kirin. Seyde Avdilrehîmê pir di derbarê wî de xwedi zanebûn bû. Lê deme ku li Urmîyê ji mabû bûn, hingî, wî li wir hinek pirtûkên ku li ser wî di sekinî û bahsa wî û deme wî û qanciya wî dikirin hebûn. Wî ew pirtûk xwandibûn. Bi vê yekê, wî hinekî dî ji zanebûna xwe ye di derbarê wî de mazin kiribû. Di wê heyemê de deme ku wî bidest axiftinê kir, hinekî ji wê zanebûna xwe bahsa wî kir. Li ser wî sekinî. Bi qanci û zanî bahsa wî kir. Bahsa deme wî kir. Li ser deme wî û zanistên wê deme pir rawastaha. Zanistvanên weke Êlî Herîrî mirov karê bêje ku yên wê demê bûn. Ew ji bi zanebûn û mazinbûna xwe re hebûn. Êlî Herîrî li Şamê ji û li Baxdayê ji mabû bû. Li herême başûrê Kurdistanê ji mabû bû. Li wanderan pir mabûbû. Deme ku ji Dore Semzînanê Diçê Cizîre bota, hingî li cizîre bota demeke dirêj dimêne. Li wir pirtûke xwe ye pêşî di nivîsêne. Piştî ji wir diçê Şamê û ji Şamê careka din di vegehihe Cizîre bota û ku wê carê ji hinekî li wir dimêne êdî piştî rê digirê û diçê başûre Kurdistanê. Li wir ji demeke dimêne. Di wê demê de Qasrê mîr Zengî heya li Hewlêr. Pir mazin û bi nav û dengê. Salahadînê Eyûbî bixwe ji piştî diçê wê qasrê û li wir demeke xwe ye dirêj dibuhurêne. Lê di wê deme ku Êlî Herîrî diçê wir, hingî, bavê mîr Zengî hê saxa û li ser rêveberiya xwe ya. Mîr Zengî hê ne li ser mîrîtiyê ya. Ew li ber destê bavê xwe û seydeyên xwe yên ku fêran didinê de ya. De ne, divêt ku mirov bêje ku Mîr Zengî ji û bavê wî pir mirovne zane û bi aqilê xwe re serketibû. Rehma xwedû li wan be. Bavê mîr Zengî di qasre xwe de pirtûkxaneyaka ku digotin ku ne bin sadhezar pirtûkî re têde ye ava kiribû di qasre xwe de. Piştî ku bavê mîr Zengî diçê ser dilovaniya xwe û ew tê dewsa wî, êdî ew cihê wî vala na hêle. Ew cihê bavê xwe tişî dike. Ew ji piştî wê pirtûkxanaya bavê xwe hê mazitir dike û biqasî ku tê gotin ew wilqas pirtûkên din bi ser ve dike. Ew ji dixweze ku zanebûna xwe bi vê yekê şanî dinye alemê bixe. Bi vê yekê ew navê xwe dide. Êlî Herîrî deme ku tê wê herême, hingî xwe digihine wê qasre mîr Zengî ji wê derê ji dibîne. Li wir ji ji gotinan hinekî dimêne. Piştî ew ji wir xwe digihêne Baxdayê. Di wê heyeme de li Baxdayê navenditiye Xalifetiye

heya.Ew diçê wir û wir ji dibîne û demeke li wir ji dimêne.Li wir bizanebûna xwe derdiekve pêş. Li wir, haçiyê ku wê zanebûna wî dibînin lê dimênine acêmayî.Li wî zimanê wî yê xweş dimênine acêmayî..

Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku bidest axiftinê dike û diaxive, bahsa van hemûkan dike.Li ser van hemûkan dirawastihê.Ew di wê heyemê de axiftinaka pir delal dike.Di axiftina xwe de bahsa gelek zanistên kurd yên weke Êlî Herîrî dike.Li ser wan dirawastihê.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ne tenê zanistên kurd nasdikirin.Gelek yên herêmî ji xalkên din ji nas dikirin.Di derbarê yên weke Ibnî Haldun de ji xwedî agahî û zanebûn bû.Deme ku diaxivê bahsa wan ji dike. Pir li ser wan di rawastihe.

De ne, di vir de divêt ku mirov bêne ser ziman ku di wê heyeme de nîqaşaka mazin ji ye hizrî hebû.Li ser hebûna bikar anîna aqil û bîaqil xwe gahandina rastiyan ji nîqaşaka mazin hebû.Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li ser wan xwedî agahî bû.Ew ji hinek hizrên wî hebûn.Hizrên Ibnî Haldun yên demeke wilo ku nîqaşên ku dibûn ku jidahabûbûn bû.Ew ji di nav nîqaşaka wilo de bû.Yên weke Nesîmî û Halacê mensur hatibû dadgahkirin û piştire bi biryar hatibûn dalaqanadin. Ew hê ne hatibûn ji bîrkirin.

Li rojhilata navîn hizir ku têne ser ziman hinekî bizanebûn têne ser ziman.Yên ku li ser wan hizran hizir bêen ser ziman divêt ku ji wê hizre ku li ser wê hizir bêne ser ziman li pêştir bêt.Ev yek weke kevneşpoîyekê bû.Lê di demên dawiyê de ev yek xirabû bû.Ev kevneşopî xirabû bûbû.Êdî mirov nikaribû ku dihata bicihanîn.Ji ber ku ku êdî ji dêla w serdestî êdî serdest bû, êdî li gor wê hata ser ziman. Yên ku wê serdestiyê an ji bi navekî din desthilatdariyê ne dipejirand ji hole dihata rakirin.Vê yekê ji sadsala 9. û 10 pêde bitimî rewşeke nû afirand li herêmê. Piştire bi hatina Osmaniyan re êdî ev yek bêhtir pêşket. Wan pêşketine hizir li herêmê kuşt.Ji ber ku dem bûbû deme hizir û pêşketina hizir, êdî pêşî li pêşketina hizir ne dihata girtin.Lê hêzekê bi hêze xwe karibû li herêmê ku serdest bû û serweriya wê hebû pêşî li wê herêmê lê girtibana.Ye ku bû ji ev yek bû.Osmaniyan li herêmê lê girt.Lê hizir pêşket û piştire ji pêşket.Piştî ku hizir li rojhilata navîn bi derketin û serdestbûna osmaniyan re rîya pêşketinê ji xwe re ne dît.Êdî hizir bi pêşketina xwe re barî rojava kir.Li rojava pêşketî Mirovên weke *Ibnî Sîna* û *Ibnî Ruşt* ku zanistên herêmê bûn barî roja kirin û li wir hizre xwe anîna ser ziman.Ibnî Haldun ji berî hingî li herêmê ji xwe re mafê jîyanê ne dîtibû û barî magrîpê kiribû.Ya rasti ku mirov bêje di deme Seyde Avdilrehîmê xaniqî de rewşeka xirab ji bo hebûna hizir û pêşketina wê li rojhilata navîn hebû.Ev rewşe xirab mirov nikarê bi hebûna hizir ve bêne ser ziman.Ji ber ku hizrê li pêş bû.Lê bi

rêveberiyân re rewşe ku mirov neerênî bibîne hebû. Wan mafê hatina hizir ye li ser ziman li herêmê ji zanistan re kêr kiribû. Bi vê yekê êdî windabûn çêbû.

Hizir bi demên xwe yêr pêşketinê re di wê demê de ketibû demeke pêşketinê ya nû de. Êdî maf ji hizir re hebene êdî wê pêşketibana. Ji ber ku maf jê re nema êdî pêşneket li herême. Li herêmê pêşneket lê pêşketine xwe ji ne sekinand. Li rojava da berdewam kirin.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku axift hinekî li ser demên xwe axift. Bi gotina qanci û neqancyê ji li ser rêveberan rawastaha. Hinekî bahsa wan ji kir. Li ser wan û nêzîkati û hebûna wan sekinî. Li gor wî, ku rêveberak divêbû ku xwediyê hizir û hebûna dîrok û deme xwe û mirovan bana. Ku xwediyê van bana, hingî, wê karibana qanc bana. Seyde Avdilrehîmê xaniqî di vir de deme ku bêja *qancyê* dianî ser ziman di wateyaka din de dianî ser ziman. Bi wê wate ku pê dianî ser ziman bi mirovên li dore xwe yêr ku ji wan re diaxift ji, bi wan dide fahmkirin. Wî digot xirabî cerna ne hizir de ya, di bikaranîna hizir de ye û gelek tiştên din de ya. Bi vê yekê wî pir girîngî dide nêzîkatiyê. Bêja qancyê û ya rêveberiyê ji ku biaqil û zanebûnê bi hev re bû, hingî li wir gor wî wê rasti tevgerin û gavavêtin wê bibe. Deme ku wî bahsa vê yekê dikir, wê çawa û bi çi awayî bûbana ji bahs dikir û anî ser ziman. Bi vê yekê mirov karê bêje ku ew pir li ser nêzîkatiyê di sekinî. Pir girîngî dide nêzîkatiyê. Ji ber ku ew vê hizre xwe bêne ser ziman, cerna di got “rast hilda dest”. Bi vê gotinê re wî qaste nêzîkatiyaka rast û pak dikir. Wî qaste nêzîkatiyaka bi hizir zanist dikir. Mirove biaqil çawa ya? An ji mirov biaqil çawa tevbigerihe? Wî deme ku axiftin dikir ev pir ji di nav axiftina dianî ser ziman û li gor xwe û zanebûna xwe dikir ku li bersive wan ji bide.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî ku her weha weke demekê diaxivê, piştê êdî axiftina xwe bidawî dike û disekinê. Lê piştî ku di sekinî ji weke ku hê tiştên ku wê bêje di serê wî de hebin rewşe wî tê berçavan. Lê ew di sekinê û pişt wî re careka din ku bal ji diçina ser êdî Mihamed mafê axiftinê dihilde û dike ku biaxivê ji civatê re.

Mihamed, piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî re mafê axiftinê dihildê û diaxivê. Ew ji bi wê zanebûna xwe çend gotinan bi ser gotinên wê ve dike. Mihamed, dema ku diaxivê, hingî, bala herkesekê li dore wî diçina ser wî. Mîr ji bi balaka mazin lê dimeyîzenê û dihisêne. Mihamed di bin wan balên wan de axiftina xwe berdewam dike. Mihamed mijarên ku seyde Avdilrehîmê xaniqî li ser axiftibû, hinekî li ser wan diaxivê. Ew ji bihire li ser mijarên ku seyde Avdilrehîmê xaniqî tene ser ziman. Ew ji li ser wan

mijaran hizre xwe têne ser ziman. Mihamed bi zanebûnaka mazin hizre xwe têne ser ziman. Weke qadarekê ji diaxivê û piştire axiftina xwe bidawi dike. Mihamed ku axiftina xwe bidawi dike û dimêne sekinî, hingê, weke qadarekê dimêne sekinî. Di wê heyeme de bal li ser wî ne. Mirovên ku balên wan li ser wî ne, piştî ku ew disekinî ji bala xwe ji ser wî qut nakin. Mihamed bi sekneke wilo di sekinî û axiftina xwe bidawi dike, ew mirovên ku li wir li dore ne, deme ku lê dimeyîzênin, hizir dikin ku ew wê hê axiftina xwe berdewam bike. Lê Mihamed ku hinekî din ji dimêne sekinî, êdî ew ji fahmdikin ku ew wê êdî ne axivê. Bi vê yekê re êdî ew dikin ku biaxivin. Di wê heyeme de yê ku piştî Mihamed diaxivê, mîr dibe. Mihamed piştî Mihamed re mafê axiftinê digirê û li Mihamed dimeyîzenê û jê re dibêje ku ew pir xweş û xweşik axiftiya. Jê re dibêje ku ew pir bi zane axiftiya. Mihamed, dema ku mîr her weha dibêje, weke ku mahçûp bibe lê dimeyîzenê û serê xwe piştire dike ber xwe de û dihisêne.

Mîr ku pişt wî re weke qadarekê diaxivê, êdî ew ji axiftina xwe bidawi dike û dimêne sekinî. Pişt wî re yên ku diaxivin dibin derdikevine hole. Ew êdî diaxivin. Ew êdî hizre xwe tênine ser ziman. Pişt mîr re seyde Avdilrehîmê xaniqî, ku dore axiftinê tê wî careka din ji diaxivê. Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku diaxivê, weke ku axiftina xwe ye berê ku kiribû wê berdewam bike diaxivê. Ew hizirne din ji bi ser wê axiftina xwe ye ku kiribû bi wê axiftina xwe ye dawiyê dike. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, de ne, divêt ku mirov bêje kêje wî tê ku bihziir û li ser hizir biaxivê. Ew deme ku li ser hizir an ji bi hizir diaxivê, weke ku xwe bibîne lê têt. Wilo li wî têt. Di wê heyeme ku axift de ji deme ku bidest axiftinê kir, bidest axiftina xwe kir û weke ku xwe têde winda bike bidest pê kir û bidawi kir. Her gotina ku wî di axiftina xwe de digot ji weke rêzên helbesten ku hevdu temem dikin bûn. Pir xweş û xweşik axift. Bi wê yekê wî balaka mazin kişanda ser xwe di wê heyeme de.

Piştî wê axiftina wî re ji xwe gelek mirovên ku axiftina xwe kirin ji ji axiftina wî bidest axiftina xwe kirin. Wî bi axiftina xwe û bi hizirên ku anîbûbûn ser ziman, di serê mirovan de pir hizir dabûn çêkirin. Yên ku hizir di serê wan de çêdibin ji kifş in. Ew hertimî dixwezî ku ew hizirên ku di serê wan de bûna bênine ser ziman. Di wê heyemê de ji yên ku hizir di serê wan de çêbû bûn, bi axiftina ku dikirin hewldidan ku hizirên ku di serê wan de bûbûn bênine ser ziman. Bi vê yekê, nîqaşaka mazin di wê heyeme de anîna hizir ye li ser ziman bûbû.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî, xosletekî wî hebû ku diaxift bi zanistan de bi hizirên wan re bi wan re dike axiftinê de pêre hizre xwe dianî ser

ziman. Wilo êdî wî axiftina xwe berdewam dikir. Di wê heyeme de ji wê xosletê wî xwe pêre dabû bû der. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku axiftibû ji, ji deme xwe pir bi zanebûn axiftibû. Li ser zanistên deme, ku kijan xwediyê kijan û çî xosletê ye anîbû ser ziman. Bi vê yekê, wî axiftinaka ku newê ji bîrkin kiribû. Bi wê axiftina xwe re ew di wê heyeme de li ber çavan bû. Pir bal li ser wî bûn. Piştî ku ew axiftibû, piştî ew ji ketibû bin balan de. Weke wî Mihamed ji dibin balan de bû. Herdû ji bi zanebûna xwe ketibûbûna bin balan de. Mirovên li dore wan yên ku zane û navdar bûn di nav xalkê de. Yên ku navên wan hebûn bûn. Mihamed, piştî ku her weha axiftibû, êdî mabû bêdeng. Seyde Avdilrehîmê xaniqî her weha wilo bêdeng mabû bû.

Her weha weke demekê dibuhurê. Piştî bi qadarekê re mele Yunusê Xêlanî diaxivî û di axiftina xwe bahsa zanebûna seyde Avdilrehîmê xaniqî dike. Ji wê axiftina ku wî kiribû ew wî têne ser ziman. Piştî ew hinekî bahsa Mihamed ji dike. Di axiftina xwe de ew gotinê têne ser hatina Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî wan ji. De ne, hatina wan hingî, bal kişandibû ser xwe. Mele Yunusê xêlanî ev yek farq kriibû. Deme ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û ew hatibûn, gelek mirov ji bi wan re hatibû. Mele Yunusê xêlanî mirovekî biazil bû û fahmkiribû ku ew bi wan re hatina haya bi wir. Ji ber vê yekê, ev yek di serê wî de mabû. Wî deme ku di wê heyeme de axiftina xwe kiribû, çend gotin li ser wê yekê ji axiftibû ser ziman. Ku ew axift û wê axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî êdî piştî diviyabû ku an ji Mihamed û an ji seyde Avdilrehîmê xaniqî bersiv dabane wî di wê heyeme de. Bersiv li wan diket. Ji ber ku gotin li ser wan hatibû ser ziman. Mele Yunusê Xêlanî ku axiftina xwe bidawî kir, êdî di cih de yê ku mafê axiftinê hilda û piştî wî re axift seyde Avdilrehîmê xaniqî bû. Seyde Avdilrehîmê xaniqî, deme ku axift, li ser hatina xwe ya bi Mihamed re ye li wir anî ser ziman û piştî got ku “nêhte me haya ku em bigihênin ta Dînwerê wanderan”. Ku wî wilo got, êdî wî axiftina hinekî din ji piştî vê gotine xwe re berdewam kir. Weke qadarekê axift û piştî axiftina xwe bidawî kir.

Seyde Avdilrehîmê xaniqî deme ku axiftibû di axiftina xwe de gotibû ku wê zêde li wir ne mênin. Wê hinekî li wir bimênin û wê ji wir dise bikevine rê de û herin. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî ne gotibû ku ka wê çend rojan li wir maban. Wî ev yek ne anîbû ser ziman. Ji xwe anîbana ser ziman ji wê rast ne mabana. Ew mirovekî bizane bû û di derbarê nîrx û şopên xwe de pir bizanebûn bû. Şêx Birehim gahabû rehmata xwe. Ev yek ji dibû sedemek ku hinekî li wir maban. Wê maban haya ku hinek bi ser

çilê wî ve çûbana. Ji xwe li ber derketina ji çilê wî bûn. Lê ew hê ji nûkava hatibûn wir û divîyabû ku ji bo wî hinekî li wir maban. Divîbû ku çûbûban dergaha şêx û hinekî lê ji maban. Ev yek ji mirovên wilo mazin û zane re weke kevneşopîyekê ji bû.

Seyde Avdîlrehîmê xaniqî Şêx Birehim nasdikir. Berî hingî, wî ew dîtibû. Berî hingî, deme ku seyde Avdîlrehîmê xaniqî hatibû wê herêmê li cem wî mabû bû. Şêx ji pir qadrekî mazin dabûbûyê de. Ew, deme ku ew li wir mabû, ji cem xwe qutnekiribû. Her cihê ku ew di wê heyeme de çûbûyêde ew ji bi xwe re biribû. Bi vê yekê, divêt ku mirov bêje ku seyde Avdîlrehîmê xaniqî û ew bi hev re li wê herêmê li gelek deveran digerihih û li gelek civatan dirûnihin. Bi vê yekê re seyde avdîlrehîmê xaniqî ji li herêmê pir baş tê naskirin û ew bixwe ji li herêmê gelek der û mirovan nasdike. Lê nahaka ew nemêne. Ew çûya ser dilovaniya xwe. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî deme ku ev yek his kiribû, dilê wî pir pê êşaha bû. Weke ku dilê wî bibe qat qat lê hatibû. Weke demekê deme ku dihîze di cihê xwe de dimêne sekinî û dihizirê. Weke ku pêşî bawer neke lê têt. Lê piştî ew ji bawer dike. Ji ber ku rast bû. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî pir dilê wî bi wî ve bû. Di wê heyeme de her ku di civatê de diaxift ji, di aliyekî mejiyê wî de aqilê wî li ser şêx bû. Li ser wî dihizirî.

Di wê heyeme de di civate wan de axiftên wan de zîvirîbûbûna ser wî. Li ser wî diaxiftin. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî li ser wî hizre xwe dianî ser ziman. Wî ji berî hingî ew çawa dîtibû û pêre mabûbû anî ser ziman. Bi wê yekê re axiftinaka mazin li ser wî bûbû. Mîr ji hizre xwe anîbû ser ziman. Ji ber ku mele Yunusê Xêlanî ew demekê dirêj bû ku li wir bû û li cem wî bû, yê ku pir baş di derbarê demên wî yên dawiyê de xwedi agahî bû ew bû. Wî ji ew demên wî anîbûn ser ziman. Mele Yunusê xêlanî pir pêre axiftibû. Wî ji hizre xwe jê re pir anî ser ziman. Li ser gelek mijaran axiftibûn. Hizrên ku anîbûbûn ser ziman û mijarên ku li ser axiftibûn ji di wê heyeme de wî anîbûn ser ziman. Bi vê yekê, ew weke demekê dirêj li ser wî diaxivê. Li ser wî hizre xwe têne ser ziman. Haya demeke dirêj ew hizre xwe her weha têne ser ziman. Dem ji êdî ji xwe biber rabûnê de diçê. Ew demeke dirêj bû ku li wir li hevdû rûniştibûbûn. Mihamed û Seyde Avdîlrehîmê xaniqî wê li qasrê maban. Mîr ew li ser cem dabûn sekinan din. Mele Yunusê Xêlanî ji mîr li qasrê dida hiştin. Ew di deme şêx de cerna bi wî re li cem wî ji diman. Le dixwest ku ew li qasrê bimêne. Li qasre mîr Pirtûkxaneyaka mazin ku tişî pirtûk bû hebû. Ew, deme ku li wir dima, deme xwe wî dikete wir de û ji xwe re bi li pirtûkan dimeyZendinê û dixwandinê dibuhurand. Wî pir hij xwandinê dikir.

Civate wan di wê heyeme de weke qadarekê her weha hebûna xwe berdewam dike. Wilo xweş û ji dil bi hv re diaxivin û demên xwe dibuhurênin, nizanin ku çawa li wan dem di buhurê. Haya demeke dirêj her weha li wir li hevdû rûniştî dimênin û ji xwe re bi hev re di axivin û didin û distênin. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî demeke pir xweş û bizane buhurandibûn. Wan ji mirovên li dore xwe re hizre xwe anîbû ser ziman. Li wir bi vê yekê, ew weke ku careka din hatibûûbn naskirin. Mihamed ji her weha mirov karê wilo jê re bêje. Seyde Avdilrehîmê xaniqî wê cara xwe ye li wir, ji cara xwe ye berê bêhtir xweş û bi zane buhurandibû. Di naabîna herdû caran de seyde Avdilrehîmê xaniqî çend pêşketinaka mazin di xwe de dabû çêkirin, di wê heyeme de raxistibû berçavan. Bi vê yekê, ji cara pêşî cudatir hatibû xuyakirin û naskirin. Wê carê bi tememî weke xanistekî ku mazin û yê deme xwe hatibû naskirin. De ne, di vir de divêt ku mirov bêje ku ev yek ji çavên mîr ji ne ravî bûbû. Cara din deme ku seyde Avdilrehîmê xaniqî hatibû wir, her ku mîr hê piçûk ji bû û hê bavê wî diman li mîrîtiyê ji, wî hingî ji ev baş naskiribû. Vê yekê di vê naqlê de xwe di wî de dabûbû der. Mîr pêşketina di saxsiyeta seyde Avdilrehîmê xaniqî de kifş kiribû. Vê yekê ji dide der ku mîr naqla din ew bi zanebûna wî naskiribû û ev yek di serê wî de ji mabûbû. Bi vê yekê re divêt ku mirov dise bêje ku di vê naqlê de ji mîr ji bala wî ne ravîya ku seyde Avdilrehîmê xaniqî ji cara din çend pêşketîtir wê carê hatiya wir. Ev yek ji wî kifşkirîya. Deme ku mirov li wê kifşkirina wî dihizirê û dimeyîzenê, mirov vê yekê di cih de dibîne û kifş dike.

Bi vê yekê re divêt ku mirov hinekî li ser vê nêzîkatîya zanistî hinekî li ser bisekinî. Wê ev yek baş bibe. Ji ber ku ev yek hinekî girînge. Di nav xalkê de gotina heya û tê pirsîn ”ku demê çi zanebûn bi te re çêkir”. Li ser vê yekê bi zanistî tê rawastandin. Deme ku tê nirxandin ji bi zanistî tê nirxandin. Mirovê ku di demê di xwe de pêşketinak çêkirî, weke miorveki ku li deme xwe û li dore xwe bi hey tê naskirin. Mirovên wilo ji zane tene hasibê. Kî çi pêşketin û bûyar li dore wî û li deme wî çêbûya û heya wî jê haya? Ev pirs zîrebûn û jîrbûna mirov ji radixe berçavan. Bi zêdeyî ji ye zanistan radixe berçavan. Zanistekî weha ji yekî ji başa û divêt ku mirov li ber çavan bigirê ya. Yê ku karibe encamên baş û qanc ji tiştên ku bûna û li gor wan di xwe de pêşketinek çêkirîya, ev yek zaniste. Mirov karê bêje ku ew zaniste. Zanist du tişt jê tê xwestin. Yek Mirovatiya ku ku di saxsiyeta xwe birûnandin û ye din ji her weha li hevberê tiştên ku dibin ku xirab bin bi zanebûna xwe wê ne pejirenê. Ev zanista. Yê ku xwediyê vê yekê bê zanista. Zanistê ku li nirxên mirovahîyê bêbextî ne kirî yê zanista. Nirx

biqasî ku ye ku gelek mirov wê jîn dibin wilqasî ji gelek xalkê ji wê jîn di bin, bi hev re.

Seyde Avdîrehîmê xaniqî her weha mirov karê ji bo wî bêne ser ziman. Wî di xwe de pêşketinaka mazin derxistiya hole. Wî bi zanebûna xwe wê naqlê xwe pir mazin bi mirovên zanist dabû naskirin. Zanistan ew naskiribû. Gele ku Şêx Birehim sax bana wê ji wî di wê heyeme de di xalê de çi gotibana? Wê pir dilê wî ji wî xweş bana. Wî pir jê kêfxweş bana. Şêx Brehim pir pêre ketibû axiftin û danûstadinê de. Seyde Avdîrehîmê xaniqî jê pir tişt fêrkiribû. Bi vê yekê mirov karê wan di vir de birêz bêne ser ziman. Gotinaka di nav xalkê de ya ku hertimî kurdan bikar dianî û digotin ku "Ku kî ji be, deme ku li cem seyde xwand û fêrbû, divêt ku gavakê an ji du gavan jê bilindtir bibe û derkeve pêş. Ku wilo nebe wê çaxî wê bê erêkirin ku wî ti tiştêk ji xwandina xwe fahm nekirya". Bi vê yekê, hertimî li mirovan dihata meyîzandin. Li wan dihata meyîzandin ku ka çend pêşketine li gor seyde û perwerdeye ku hilda ne. Wilo biqasî ku li zanistekî dihata meyîzandin wilo ji mirovekî ji rêzê ji dihata meyîzandin. Vêce mirov karibû ku bêje ku seyde Avdîrehîmê xaniqî gavekê xwe bi pêş ve biribû bû. Ev yek di wî xwe de dide ber çawan. Pir bi pê li ber çawan bû. Seyde Avdîrehîmê xaniqî deme ku di wê heyeme de di nav civatê de diaxift, dikir ku mirovên ku li dore wî ne û ku zanistên, lê şaq bimênin. Ew di wê heyeme de bi zanistîya xwe diaxift ji wan re. Bi vê yekê bala mîr ji û yên li wir, ku wî berê ji naskiribûn kişandibû ser xwe di wê heyeme de. Bi vê yekê ev hatibû berçavan.

Mihamed ji, deme ku mirov ji bo wî bêne ser ziman, mirov karê her weha bêne ser ziman. Ew zanistekî ku pir mazin bû û navserî xwe bû. Ew êdî ciwan ne hata hasibandin. Ew êdî yekî ku di nav salan de çûyî dihata hasibandin. Bi rasti j ew wilo bû. Ew di nav salan de çûbû bû. Wî pir jîn kiribû. Ye ku wî jîn kiribû ji wî bi zanebûnî jînkiribû. Vê yekê divêt ku mirov ji bo wî bi teybet bêne ser ziman.

Mihamed li wir ji yên ku navê wî bi zanebûna wî bihsîtibûn hebûn. Deme ku wan mirovên ku ew û navê wî bihîstibûn ku ew dîtin û naskiribûn êdî bala wan pir mazin çûbû bû ser wî di wê heyeme de. Gelek yên ku li wir bûn û navê wî bihîstibûn ji yên ku zanist bûn. Deme ku yekî zanistî be ku navê yekî dî ku zanist his bike û bibihîze, hingî di serê wî de dibe meraq ku ka ew çend bi zanebûna. De ne, yên zanist ku navê wan derket êdî li wir wê derketina navê wan li wan tê meyîzandin. Ye rasti divê ku li gor zanebûna wan li wan were meyîzandin. Deme ku bi wan re hatina cem hevdu bû, êdî hingî li wan tê meyîzandin ku ka çend bizanebûn in. Mihamed

ji her weha navê wî hebû û di serê mirovan de mereq wî û zanebûna wî hebû. Piştî ku hatibû wir û piştî ku ew axiftibû, êdî hatibû dîtin ku ew çend zane ya. Êdî ji bo wî hatibû ku ew "biqasî ku hatiya ser ziman e, wilo heya". Piştî ku her weha ew bi zanebûna wî hatibû ber cavan. Di wê heyeme de civate wan bi ber derengiyê ve diçû. Hin bi hin wê civatê ji bidest rabûnê kiribana. Lê hê ji hinek axiftin dibûn. Yên ku ne diaxiftin dihisandin ji bala wan hinekan li ser Mihamed bû. Li wî dimeyîzandin. Dohnê xwe dida ne wî, ku ka ew wê çî bike, wê careka din biaxivê an ji ne. Ew her weha bi vê yekê li ber çavan bû. Ji xwe piştî vê demê re ku hinekî din dem têve çû, êdî bahsa rabûnê hata kirin.

Deme ku bahsa ravûnê hata kirin, êdî hin bi hin karbûna rabûnê hata kirin. Yên ku wê çûban malê xwe, êdî xwe lev didana hevdû. Êdî dikirin ku xwe amede bikin ku herine malê. Dem ji hatibû ber derengiyê. Êdî wê rabûbûn çêbûbana. Lê yên ku wê rabûbana ji li bendî mîr bûn. Haya ku mîr ne dabana xwe wê ti keesekî berî ne dabana xwe di wê demê de. Mîr ji vê yekê zanibû. Mîr hê ji civatê xwe re gotin bi gotin ji bana, hê çend gotin digotin. Lê çavên mirovên dore wî ji yên ku wê rabûban ji li ser wî bû. Li wî dimeyîzandin. Wê rewşa mîr ji weke qadarekê hebûna xwe berdewam kir. Piştî ne bi gelekî re êdî mîr bi xwe ji ji balên li ser xwe çaxê rabûnê hata bîre wî. Ku hata bîre wî êdî wî ji bahsa dem derengbûnê kir. Piştî ku wî bahs kir, êdî hinek mirovên li dore wî ku zanistbûn û pir pîr ji bûn, gotina wî "erê mîrê min, deme rabûnê ji hatiya". Deme ku wilo li ber mîr hata gotin êdî mîr ji kara xwe kir û kir ku rabê ser xwe. Mîr, berî ku rabê ser xwe, pêşî çavek li ser miorvên li dore gerand û piştî wî da xwe û rabû ser xwe. Ku wî da xwe êdî pêre yên ku li wir bigiştî ji dana xwe û rabûna ser xwe di wê heyeme de. Deme ku dana xwe û rabûna ser xwe, êdî di pêşegiye mîr de herkesek çû bi ber devê derî de. Yên ku wê çûban, divîyabû ku mîr ew şev başî ji wan re gotibana û bi rê kiribana. Ku bi mîr re herkesek hata devê derî, êdî yên ku wê çûban ji ji mîr bidest xatir xwestinê kirin û ku xatir di xwestin, ji mîr re ji digotin "Şev baş" û êdî bidest çûnê dikirin û diçûn. Weke qadarekê li ber devê derî, mîr yên ku wê çûban bi rê kirin û êdî ew bi yên ku wê maban re bi hev re vegerehana hundur. Ku vegerehana hundur êdî li hundur ew li hevdû careka din rûniştin. Di wê demê de ji yên ku mabûn re cih ji dihata amede kirin. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî li wir mabûbûn. Mele Yunusê Xêlanî ji li wir bû. Hinek mirovên din ji bi wan re bûn. Piştî bi qadarekê re ew ji cihê wan hata amede kirin û wan ji ji hev re û ji mîr re şev xweşî xwest û çûne ser cihên xwe. Ku wan ji mîr re got şev baş êdî mîr çû ku beşa

xwe ku razihê. Lê berî ku ew herê beşa xwe, ku razihê, bi Mihamed û seyde Avdilrehîmê xanqî û mele Yunusê Xêlanî re haya bi cihê wan bi wan re hat û cihê pirtêkxane xwe ji şanî wan da. Deme ku Mihamed ew beşa pirtûkxanê dît, pir hişê wî li ser wir ma. Seyde Avdilrehîmê xaniqî berî hingî dîtibû. Lê wê carê wî ji ewder hinekî cude dîtibû. Weke ku hinekî dî mazin û tiştîr pirtûk dîtibû. Bi vê yekê wêderê bala wî kişandibû. Ku mîr ew birin û weke ku cihê wan şanî wan da, êdî wî ji wan re careka din got "şev baş" û êdî ew ji wan vaqataha û çû ser cihê. Ew ji li wir li ser cihê xwe man. Cihê mele Yunusê Xêlanî ji û yê seyde Avdilirheî xaniqî ji yê Mihamed ji wê beşa pirtûkxanê ne dûr bû. Li nêzikî wêderê bû. Piştî ku mîr ji wan vaqataha êdî ew ji çûna ser cihê xwe ku hinekî serê xwe deynin û razihin. Ew ji riyaka dûr hatibûn û wastahî bûn. Wan ji di xwe de ew wastandin hîs dikir. Ku çûbûbûna ser cihên xwe, êdî ne bi gelekî re Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ketibûbûna nav cihên xwe de ku razihin. Piştî ne bi gelekî re êdî ew di xewe xwe ve çûbû bûn.

Beş 7.

Di jiyane de her tiştî ku mirov wê dibîne hizrekê di serê mirov de çêdike. Ji vê yekê re mirov karê bêje têgihîştin ji. Tegihîştin di derbarê tştekî de ku bi mirov re çêbû, hingî, di mirov de dibe bingihê hinek pêşketinên din ji di hizir de. Fahmkirinê jiyane bi dîtin û nerîne dibe. Bi vê yekê nêrîte mirov çêdibe. Mirov li jiyane û li tiştên ku dibin dimeyîzenê û mirov li ser digihê hinek hizirne. Mirov bi qinyata xwe qaaata tene ku rastî çawa ya. Li ser dîtinan mirov vê qinyatê çêdike. Ev qinyat, di rastiyê de nêrîte mirov bixwe ya ji.

Li jiyane meyîzandin û xwe gahandina hizirne mazin ji, ji bo wê hizreke mirov divêt ku hebe. Mihamed xwediyê hizreke mazin mazin bû. Wî bi hzire xwe re dimeyîzend û bi hizir dikir. Dîtin û nerînen xwe bi xwe re bi zanebûn dianîn ser ziman. Deme ku di nav mirovan de diaxift bahsa hizir û hebûna jiyane dikir. Li ser vê yekê pir di sekinî. Jiyane bi hebûna xwe re li gor wî rastiya mazin ku gelek rastteqîni di xwe de di parast bû. Ji ber vê yekê li jiyane meyîzandin û li ser gihiştine hin têgihîştinne li gor wî pir mazin bû. Ew gihiştin, wê mirov mazin bike. Wî wilo dihasiband. Li ser hevirdor û xwezayê pir dihizirî. Wî pir hij xwezayê dikir. Wî girîngiyeke ku mirov nikaribû ku bitememî fahmbike dide xwezayê. Deme ku mirov li bêje xwezayê ya di serê Mihamed de lê dihizirê mirov tede pir tişt hebûnan dibîne. Mirov hizreke mazin dibîne. Wî "xweza li gor hizreke ku xwûde afirandiya" dianî ser ziman. Bi vê yekê re pir girîngî dana xwezayê ji bo wî pir girîng bû. Ew pir li ser vê yekê pir di sekinî. Weke

mirovekî ku ciwan û di xwe de pîrozîyeka mazin bi parreze wî nêzîkati li xwezayê fikir. Her weh ew mazin li ser disekinî.

Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ev demek bû ku li Kirmaşanê mabû bûn. Li wir mabû piştî çilê Şêx Birehim ji. Lê piştîre ji mabûn. Ew demek bû ku çilê Şêx Birehim buurtibû. Lê hê ji ew li wir bûn. Li wir hinekî ji wan re xweş ji hatibû. Mihamed ya rasti ku mirov bêje pir kêfe wî hatibû ku li wir mabû bû. Ew di qasre mîr de bi seyde Avdilrehîmê xaniqî re dima. Mele Yunusê Xêlanî ji bi wan re bû. Wan li wir ji xayni li hevdu rûniştinan û civatan, demên bi zêdeyî ji li beşa pirtûkxanê di buhurandin. Bi zêdeyî ji mirov karê vê yekê ji bo Mihamed bêne ser ziman. Wî ewqas pirtûk li ber dest weke nîmeteke mazin didît û di nav wan de dima. Pir dixwand. Pir li ser wan di sekinî. Ew demek bû ku ew li wir bûn. Lê mirov karê bêje ku wî dema xwe bêhtir di bir de buhurandibû. Axlabe seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Yunusê Xêlanî ji li cem wî diman. Bi hev re diman û dixwandin. Mihamed pir hij xwandinê fikir. Di wir de gelek pirtûkên zanistên herêmê hebûn. Yê ku berê hingî bi çend heyeman jîn bûbûn pirtûkên wan di wir de hebûn. Mihamed, haya ku ew jê dihat li wan pirtûkan hemûkan dimeyîzend. Lê hinekî zor ku li waqas pirtûkan meyîzendibana. Ji ber li wir gelek pirtûk hebûn. Demek bû li ew li wir bûn û êdî wan kara ya çûnê fikir. Wê li çûban Dînwerê ji. Wê ewder û hevirdore wê ji dîtiban. Di wê heyeme ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî li wir mabûbûn ji, Mîr hinek sefer kiribûn li hinek navçeyên hevirdorê. Wî Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji bi xwe re biribû. Ew ji bi vê yekê li wê herêmê li gelek deverên wê gerahabûbûn. Çûbûbûna gelek deverên din ji. Bi vê yekê, hinekî li wir dirêj li wir mabûbûn. Deme ku ew gahabûbûna wî, hizir kiribûn ku wê çêndekê li wir bimênin û wê êdî ji wir bikevine rê de û herin. Deme ku ji Urmîyê bi rê ketibûn ji, mîrê wir Mîr Hasanxan ji ji wir gelek mirov bi wan re bi rê kiribûn. Piştîre ku ew gahabûbûna wir, êdî ne bi gelekî re ew ji veerahabûn. Mîr Huseynê Kerim ew pir qanc azimandibûn. Deme ku ew bi rê kiribûn ji bi wan re ji wan re û ji mîre wan re gelek dîyarî ji şandibûn. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji êdî li wir mabûbûn. Weke demekê bû ku li wir bûn. Lê êdî ji wir ji dikiirn ku bikevina rê de û herin. Wê berê xwe daban bi Dînwerê ve. Wê çûban wir. Demekê xweş ji wan li wir buhurandibû. Wê êdî çûban. Wê êdî çûban herêmekê din ku ka li wir êdî wê çî dîtiban û rastî çî hatiban. Ev ji wê di deme ku çûn de wê kifş bibana.

Mihamed, li wê herêmê di deme ku mabû de pir miorvên zanist yê herêmê naskiribûn û bi wan re rûniştibû. Zanebûna wan ji wan fêrbûbû. Bi vê yekê, demeke xweş bi wan re buhurandibû. Piştî ku mîr wan bi wa re dibe û hinek li herêmê digere ne bi gelekî re divegihin. Ew deme ku bû ku vegerehe bûn. Ji gerîne, ji xwe ew rojek bû ku vegerehe bûn. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bi hev re bûn. Piştî ku vegerehe bûn, êdî hinekî li civata hevdû ji rûniştibûn û piştî çûbûbûna cihê xwe ku hinekî razihin ji xwe re. Wê roje ku bûbû sibeh ji ew hê zû bi bangdana sibehê re rabûbûn.

Wê sibehê Mihamed deme ku wê bangdana sibehê bibe hinekî berî wê rabûbû ser xwe. Ew zêde di xewê de nema bûbû. Piştî ku rabûbû, êdî xwe amede kiribû û li cihê xwe mabû bû. Li wir hinekî ji xwe re rûniştibû û bidest xwandinê kiribû. Ne bi gelekî pişt re êdî ku dengê bangdana sibehê hat, êdî wî ji xwe lev da hevdû û kir ku herê û mizgeftê. Di wê heyeme de mizgefte wir mizgefte mazin bû. Ew mizgeft pir mazin bû. Di her demê de lê pir mirov lê digahana hevdû û bi hev re mêj dikirin. Mihamed deme ku dike ku ji cihê xwe de û ku piştî ne bi gelekî re ku derdikeve ji, êdî ku hinekî diçê ji êdî rastî Seyde Avdilrehîmê xaniqî têt. Ew roj roja wan ya dawiyê bû li wir. Wan êdî xwe rêvan didît. Wê çûban. Wê bi rê ketiban. Deme ku Mihamed digihê seyde Avdilrehîmê xaniqî, êdî jê re roj başiyê dikişene û piştî ku ew ji her weha ji wir re dibêje roj baş, êdî bi hev re didina rex hevdû diçin ku herine mizgeftê bi hev re. Herdû didina rex hevdû diçin. Hê bi tememî ji ne bûya rahnî Hê hinek reşa. Lê hin bi hin ji dibû rahnî. Rahnî hin bi hin derdiket. Lê hê weke ku di şevê de bin bû. Wilo dem reş bû. Deme ku Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji cihê xwe derdikevin û derdikevine derve û hinekî li derve ji dimeşin, êdî li derve rastî hinek mirovên din têt. Lê ew berê ku derkevin û herine derve, digihine mîr ji û mele Yunusê Xêlanî ji. Ew ji bi wan re têne mizgeftê.

Di rê de deme ku têt hinekî bi hev re diaxivin ji. Deme ku têt di rê de êdî rastî hinek mirovên din yê ku wê bi wan re werine mizgeftê têt. Bi hev re ku digihine hevdû, êdî silavê didine hevdû û bi hev re dikevîne rê de û têne mizgeftê. Mihamed û mele Yunusê Xêlanî di rex hev de dimeşin û car bi car ji bi hev re diaxivin. Hin gotinne ji ji hev re dibêjin. Ev rewşa wan ta ku têne mizgeftê berdewam dike. Deme ku têt û digihine mizgeftê, êdî ew ji dikevîne hewşa wê de û li hewşa wê rastî gelek mirovên ku xwe kar dikirin kji bo mêjê têt. Deme ku rastî wan têt, êdî silavê ji didina wan û piştî ew dibuhurina hundur û li wir cihê xwe digirin. Ku diçine hundur ji, li hundur gelek mirovên ku dore wan digirin dibin. Dore mîr ji xwe ti

carî vala nayê hiştin. Ew mîr bû û mazin bû. Yên ku pêre ji bûn, weke Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Yunusê xêlanî ji zanistên mazin bûn. Ew ji qadrê wan hebû. Ew mirovne ku navserî xwe bûn. Mirovne ku bi temenê xwe û bi zanebûna xwe navserî xwe bûn. Bi vê yekê, mirov karê bêje ku rêzeke mazin ji wan re hebû. Mirovên navserî xwe, hertimî jê re rêzek hebû. Ev yek li ser ne dihata gotûbêj kirin ji.

Mihamed ji êdî ji wan mirovên ku temenê xwe û bi zanebûna mazin dihata hasibandin. Ji xwe j iew ji wilo bû. Wilo bidîtinê bê an ji bi hizir xwandinê bê, pir dîtîbû û xwandibû. Pir mazin jîn kiribû. Ji jiyana wî de pir rewşên u li ser mazin bi bandûr bûn hebûn. Weke rewşa Dîlberê û Dîlşad. Ev wî ti carî ji bîr ne dikir. Hertimî di bîre wî de bû û ew dide hizirandin û pêre ji hazinandin. Cerna wilo ku ji xwe re dihizirî, bi wê hizirandina xwe hêdî hêdî bihazn dibû û ji xwe diçû. Weke ku ji heyemekê herê heyemeka din lê dihat. Ew wilo dibû. Wilo lê dihat. Mirovên ku wî nasdikirin yên weke seyde avdilrehîmê xaniqî ew kur hizirandin û pêre hazinandina wî kifş dikirin. Deme ku kifş dikirin ji jê di pirsîn ku ka çima wilo keta hizran de û an ji hazinî. Wî ji bersiva wan dide û bahsa tiştên ku li ser dihizirî an ji dihazinî dikir. Bi vegotina xwe ye ji wan re ew ji dikirina hizran û haznan de. Ew ji didana hazinandin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî û Mihamed pir bi hev re ketina danûstandinê de. Mihamed ji wî re pir hizirên xwe kiriya. Hizirkirina xwe re ew ji daya hizirkirin. Car bi car bi gotina xwe re ew ji kiriya haznanda. Wan hevdû pir baş û qanc naskiriya. Xosletên hevdû fahmkirina. Seyde Avdilrehîmê xaniqî zane Mihamed di serê xwe de bi aqilê xwe çend mazina. Wî ew pir qanc naskiriya. Ji ber vê yekê ji pir pêve girêbûya. Jê re bûya weke birayekê mazin. Lê herdû ji deme ku mirov li wan dimeyîzenê, mirov dibîne ku hema bêje weke weke hevdû pîr in. Rast bû, herdû ji pîr bûn. Lê seyde Avdilrehîmê xaniqî di temenê xwe de hinekî ji wî maztir bû.

Piştî ku ji bo mêje dikevîne rê de êdî piştîre ne bi gelekî re mele Yunusê Xêlanî derdikeve pêş ku li pêş mêj bike û li pişt wî ji dicmaat cihê digirê. Mihamed bi seyde Avdilrehîmê xaniqî re di rêze pêş de ya. Mîr ji di rex wan de ya. Piştî ku rêzgirtin û wan ji di rêzê de cih girtin, êdî bidest mêje xwe kirin û mêj kirin. Piştîre bi qadarekê re ku wan mêj kirin, êdî hinekî li hevdû rûniştin û bi hev re bidest axiftinê kirin. Yê ku di nav wan de herî zêde navserî xwe de mele Yunusê Xêlanî bû. Wî li pêşiya wan mêj kiribû û piştî mêjê re ji yê ku ji wan re bidest axiftinê ji kiribû ew bû. Hinekî li ser jiyânê û rastteqîniyê ji mirovên li dore xwe re diaxivê. Weke qadarekê ji wan re diaxivê. Piştîre ku ew weke qadarekê ji wan re diaxivê, piştîre êdî

mirovên ku piştî wî re diaxivin û hin gotinne dibbêjin ji derdikevin. Mirovên zane û navserî xwe di wê heyeme de li cem mele Yunusê Xêlanî hebûn. Wan ji pişt wî re mafê axiftinê girtibû û axiftibû. Mihamed di cihê xwe de li wan dihisand. Li gotina wan dihisand. Weke qadarekê ev rewş berdewam dike. Piştî ne bi gelekî re ku piştî mele Yunusê Xêlanê çend mirovên din ji diaxivin, êdî bala diçina ser seyde Avdilrehîmê xaniqî û ew ji di wê heyeme de ji wan re diaxivê û ew ji çend gotinne dibêje. Ew ji gotinên xwe weke yê berdewam mele Yunusê Xêlanî bin têne ser ziman. weke bêhnê ew ji diaxivê. Piştî dimêne sekinî. Piştî ku ew axiftina dike û dimêne sekinî, piştî gotin careke din di zivîrê û tê destê mele Yunusê Xêlanî. Ji xwe piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî re êdî gotin weke demekê di navbara çend mirovên navserî xwe yê seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Yunusê Xêlanî de diçê û têt. Mihamed di wê navberê de mafê afitinê tê destê wî û ew ji çend gotinan dibêje.

Mihamed deme ku diaxivê di wî heyeme de, herê zêde bala mîr diçê ser wî. Mîr weke ku wî ji nû ve bibîne lê dimeyîzenê. Her weha mîr li wî dimeyîzenê. Mihamed deme ku diaxivê, bi bêhtirî li ser qancî û ne qanciye û mazinbûn û zanebûnê diaxivê û dirawastihê. Weke qadarekê diaxivê û deme ku ew axivê ji, bala herkesekî li ser wî dimêne. Mihamed, di axiftina xwe de, weke qadarekê bi hizir diaxivê, piştî di dawiya axiftina wî de, axiftina wî hinek bi hest dibe. Ev yek ji bi bandûrî hebûne li ser mirovên li dore wî dide nîşandin. Ziman wî ji pir xweşa. Bi wê zimanê xwe yê xweş, pir xweş û zîz têne ser ziman. Mihamed ku weke qadarekê diaxivê, piştî axiftina xwe bidawî dike û dimêne sekinî. Lê deme ku ew dimêne sekinî ji bala mirovên li dore wî pir li ser wî ya. Bala mîr li ser wî ya. Mîr di rex wî de ya. Lê bi balaka mazin heya wî li ser Mihamed e. Ev yek weke qadarekê bi wî re berdewam dike. Piştî ku demek têve diçê, êdî mîr mafê axiftinê di hildê û ew ji çend gotinne dibêje. Mîr deme ku hinekî diaxivê, diaxiftina xwe de bizêdeyî ji li ser demên berê di rawastihê û hinekî ew bahsa kalkê xwe û bavê wan ji dike. Li wan û mazinbûna wan ji dirawastihê. Bahsa şer û pevçûnên ku wan kirina dike û di nav de ji bahsa mêreniyên ku wan kirina ji dike. Weke qadarekê diaxivê û ew ji axiftina xwe bidawî dike. Piştî axiftina mîr re, yê ku mafê axiftinê di hildin û diaxivin hene. Gelek ji wan ji diaxivin. Weke qadarekê axiftin piştî mîr re berdewam dike. Lê piştî mîr re êdî deme rabûnê tê û ew ji êdî dikin ku rabin. Piştî bi qadarekê re deme ku dirabin êdî mîr bi Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Yunusê Xêlanî re tê qasre. Li qasre wê ji xwe re rûnihin. Rûniştine sibehan ji xweşa. Sibehên hînik ku mirov li hevdu dirûnihê diaxivê, mirov pir dil

xweş û zîz dike. Qasre mîr ji pir xweş bû. Gelek beşên wê yên ku mîr bi mêhvan û mirovên li dore lê rûniştibana hebûn. Hinek beşên wî li derve dimeyîzendin û deme ku mirov lê dirûnişt, weke ku mirov li derve li bin sihwanaka hînik rûnihê li mirov dihat. Mîr ji her siheh hema bêja bi mirovên bi pêre diçû û li beşek ji wan lê dirûnişt. Qasre mîr ji hêja ya ku mirov çend gotinan li ser bêje. Qasreka ku pir mazin bû. Dore wê ji aliyê şûn ve hemû şînayî bû. Deme ku mirov li wî alî dirûnişt ji, bêhne wê şînayîyê li behvilên mirov dixist. Bêhneke pir xweş bû. Mîr ji hijê dikir. Ji ber ku wî hij wê bêhne dikir, li wî aliyê qasrê mezeleyeke mazin ji bo rûniştinê kiribû dîwan civate xwe di wê heyeme de. Qasr bixwe, deme ku mirov lê dimeyîzend, weke ku mirov li kelehakê meyîzenê li mirov dihat. Qasr bixwe pir kevn bû. Kengî û kîjen demê û heyemê hatibû çêkirin ne kifş bû. Lê belê deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov di dît û fahm dikir ku pir kevnê. Ji derve ji deme ku mirov lê dimeyîzend çavên mirov tiştî dikir bi hebûna xwe re. Li tihêla wî çapê lê ku hinekî jê wirde av pir mazin diharikî. Wê avê ji bi harikîn û xuraxur û nalîna ku ji nava xwe derdixist hewayaka dide qasrê. Qasr bi wê re hê bêhtir xweştir û xweşiktir dibû.

Divêt ku mirov bêje ku yê ku çêkirina wê qasrê hizirkiribû, pir tişt di serê xwe de xweş hiziribûn. Mirovekî ku li kêf û rehet dimeyîzend bû. Ku mîr ji bana mîrekî ku pir ji xwe razî û bitifre bûya. Mirov ji çêkirina wê qasrê û hebûn wê vê yekê fahm dike. Her ku zû ve hatiya çêkirin ji, wilo qayîm û bixwe li ser xwe dimêne, mirov ku lê dimeyîzenê mirov lê acêmayî dimêne. Qasre mîrê bota qey wilo be. Qasre mîrê bota mazin bû. Bigotinê ku dihata vegotin ji ti qasr û gotin li ser re dihatina vegotin û dîtîn. Mirov ku li wê qasrê dimeyîzend, mirov digot ku qey mîrê bota ji qasre hatiya wir û li jîn bûya û wî ew qasr çêkiriya û piştire ku demekê li wir maya û piştire ji wir çûya. Li herêmê ew qasr ji bi nav û deng bû.

Mîr piştî ku bi Mihamed û mirovên din re tê ku were qasrê û têne qasrê ji, êdî diçûna aliyê qasrê ku her sibeh ji wî û mêhvanên wî dihata amede kirin, çû wir û li wir bi wan re rûnişt. Li wir wî civata xwe li dar xist. Piştî ku hatin û rûniştin êdî bi hev re li hevdû rûniştin û bi hev re bidest axiftinê kirin. Lê deme ku mirov li cihê ku di wê heyeme de lê rûniştin ji dimeyîzend, mirov fahm dikir û têdigihîşt ku ew ji pir ji xwe bi tifre ya. Hêtên ku li ber rûniştibûn ji li ardê doşekne ku pir stûr û ku balgihne pir dirêje ku dore ruberê wan qaytan kirî û ku li ser ruberê wan naqş hebûn hatibûn danîn. Mîr û mêhvanên wî li ser wan rûniştibûn. Bi hêtan ve ji hinek xaliçeyên ku li ser wêne bi naqşan hatibûn çêkirin hebûn. Xaliçeya ku wêne Şahmaran li ser hatibû çêkirin pir dihata berçavan û bala mirovan

dikişanda ser xwe di wê heyeme de. Weke wêne Şahmaran hê gelek wêneyên ku hatibûn çêkirin û piştê hatibû dalaqandin hebûn. Hêt bixwe ji bilin bûn. Lê hêt hema bêja hemûk ji ji ber ku xaliçeyên naqş kirî û tiştê wilo pêve hatibûn dalaqandin êdî wilo zêde ne dihatina xuyakirin. Deme ku mirov li hêt û mêtan dimeyîzend, mirov pir xweşikatiyên ku li ser xaliçeyan bidestan hatibûn naqş kirin dihatina xuyakirin. Hemû naqş ji, weke ku ji destên keçikên keçik derketibûn. Wilo xweşik û bidil hatibûn çêkirin. Deme ku mirov li wan naqşan dimeyîzend, ji xaynî wê xweşikatiya wan ye ku bi ber çavên mirov diket, pê wan naqşan re hez nek ji weke ku ji dilên yên ku ew naqş çêkiribûn xwe di nav tayên wan naqşan de di parast û ku mirov lê dimeyîzend ji dilê mirov digirt. Wilo li mirov dihat. Mirov xwe di nav wê nerîna xwe ye ku mirov li wan dimeyîzend winda dikir. Xweşbûn û ji dilbûn, xamgînî û heznitî, ciwanî û li xwe bûn, di wê heyeme de li dilê mirov dixist. Gelek hestên weha bi hev re di dilê mirov de bi mirov re çêdibûn. Mihamed ji li wir rûniştibû. Deme ku ew rûniştibû, bala wî çêbûbû ser wêneya Şahmaran. Wêne Şahmaran wilo ciwan hatibû çêkirin, ku mirov bi gotinê dixwest ku bêne ser ziman, gotin di hebûne xwe ye ku bêne ser ziman de kêma dima. Pir ciwan û rind hatibû çêkirin. Di mala her kurdî de wêne Şahmaran hebû. Ku kurdekî xizan ji bana û dewlemend ji bana.

Mihamed weke ku bi nerîna wî re hinek tiştên din ji hatibûn bîre wî di wê heyeme de di hezn de bû. Wilo ew di rewşê xwe de dima sekinî. Di civate mîr de axiftin ji hin bi hin dest pê kiribû. Mirovên ku li hevdu rûniştibûn ji êdî hin bi hin bi hev re axiftin gurr dikirin. Mîr ji car bi car diaxift. Lê di wê heyeme de mîr bi zêdeyî ji mafê axiftinê weke ku ji mirovên li dore xwe re hiştibû. Ew wilo zêde ne diaxift. Car bi car wî hin gotin digotin. Lê yên ku dirêj û zêde diaxiftin ji mirovên ku li dore wî yên ku ji xwe û ji xwe bi bawer bûn. Deme ku dianîna ser ziman ji, mirov ew bawerî ji dengê gotina wan bi wan re didît û fahm dikir. Mirovên ku ji aqilê xwe bi bawer bê ji xwe biêmin diaxivê ku diaxivê. Mîr wilo zêde di wê heyeme de ne bi gotin bû. Ew hinekî bi bêdeng bû. Lê mirovên li dore wî ji pir bi deng bûn. Diaxiftin. Mihamed ji weke mîr wilo zêde ne bigotin bû. Ew ji di rewşa xwe de bi bêdeng bû. Ew ji bi bêhis bû. Lê heya wî li axiftin ku dibûn û li dore wî bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pir baş û qanc didît û fahm dikir. Piştê ne bi gelekî re ew bêdengiya Mihamed bala mîr ji dikişêne. Mîr êdî bala wî diçe ser Mihamed. Deme ku bala wî diçe ser wî, êdî ew dibîne ku wa Mihamed hinekî bihizire û li dore xwe dimeyîzenê. Wilo wî dimeyîzend, mirov tenedigihîşt ku ka heya wî li

dore axiftinên li dore wî ya an ji di serê wî de li dereke dî ya. Hê mirov tédigihişt ku Mihamed bi hizire. Piştire ku demek têve diçê, êdî Mihamed ji farq dike ku Bala mîr li ser wî ya. Êdî ew ji ku vê yekê farq dike, dike ku xwe bêne xwe di wê heyeme de. Bi vê armancê xwe li xwe dide hevdû. Piştî ku ew xwe li ser dide hevdû, êdî ew xwe li hevdû dana hevdû bala mirovên li dore wî ji dikişêne û ew ji wê zan dikin ku Mihamed dixweze ku bi peyîve û bi vê yekê êdî bal diçina ser wî.

Mihamed, ku bal diçina ser wî, êdî piştire ew hinekî xaber dide ji wan re. Mîr ji di wê heyeme de ku Mihamed xaber dide pir bi bal heya xwe dide ser wî û lê dihisêne. Mihamed deme ku diaxivê, bi zimanekî ku pir xweş û teze di peyivê. Bi zimanê xwe dike ku dilê mirovên li dore xwe xweş dike. Seyde Avdilrehîmê xaniqî li cem wî ya û heya wî pir bi bal li ser wî ya. Her weha weke wî heya mele Yunusê Xêlanî ji heya wî li ser wî ya. Pir li lê dimeyîzênin û lê dihisênin. Weke qadarekê Mihamed diaxivê. Di nav axiftina xwe de Mihamed çênd gotine li ser nerîne xwe ye li ser wêne Şahmaran ji tene ser ziman. De ne, wê ji hê ku biçûk bûya li Şahmaran hisandiya. Şahmaran weke Rûstemê Zal vegotina wan ye pir kevn bû. Lê şahmaran kevtir bû. Mihamed hê ku biçûk bû, weke her zarokên kurd ji dê û bavê xwe ew vegotin hiskirin. Ji wan lê hisandibû. Bi vê yekê wî zanibû. Di deme zaroktiyê de tiştên ku mirov his dike, êdî mirov zû bi zû wan ji bîr nakê. Weke ku jiber bikin êdî di aqilê wan de dimêne. Di her demê de êdî di aqilê wan de dimêne. Mihamed ji ji ber ku di wê dema xwe de li wan hisandibû êdî di aqilê wî de bû. Deme ku wî di wê heyeme de li wêne Şahmaran meyîzendibû, êdî ew hiskirinên wî hemû ji hatibûn bîre wî di wê heyeme de. Bi wê wêneyê de gelek tişt wî bibîr anîbû di wê kêlîkê de. Bi vê yekê di wê heyeme de ji xwe çûbû bû. Di serê xwe de weke ku ji xwe herê lê hatibû. Her weha ew di rewşekê de bû di wê heyeme de. Deme ku axiftibû ji, bi wan bibîranînên xwe axiftibû ji dore xwe re.

Mihamed pir axiftinaka xwe di wê heyeme de dike. Dike ku dilê herkesekê ku lê dihisandin xweş bibe. Dilê wa bi li wî hisandinê xweş ji dibe. Pir deme ku lê di hisêne pir kêf xweş dibe di wê heyeme de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Yunus Xêlanî ji her weha pir kêfxweş dibin bi axiftina wî ye ku wî ji wan kir. Mihamed, weke qadarekê ku ji wan diaxivê, piştire disekinê. Lê deme ku ew disekinê ji, êdî axiftin ne sekinin. Êdî di wê heyeme de li ser hizir û mijarên ku Mihamed di axiftina xwe de ser ziman nîqaşaka din dest pê dike. Yê ku li ser hizrên ku Mihamed di wê heyeme de anîna ser ziman hizrên wî hene, êdî derdikevine pêş û bidest axiftinê

dikin ji civatê re. Seyde avdilrehîmê xaniqî ji û mele Yunusê xêlanî ji diaxivin. Ew ji hizre xwe tênine ser ziman ji civatê re. Mîr ji li ser Şahmaran be an ji li ser hinek vegotinên din yên di nav xalkê de bin bizanebûn bû. Ne mumkun bû ku ew ne bizanebûn bana. Ji ber ku civate wî de hertimî li ser vegotinên weha û hizrên wan têne axiftin. Hertimî di civatê de, ku kî çi zanibe têne ser ziman. Ev yek weke kevneşopîyeka ku ne hatibû nivîsandin lê herkesekî zanibû bû. Di wê heyeme de ev yek bû. Kê çi zanibû anî ser ziman. Civatê ji li wan hisand. Vê rewşê weke qadarekê dî berdewam kir hebûna xwe di wê heyeme de. Lê piştê ne bi gelekî re mirovên ku wê sofere xwarinê ber wan vekiribana li ber derî amede bûn. Mîr ji ew dît. Wê sofere taştê ji li ber wa hatibana vekirin. Hewa ji hin bi hin hînik dibû û xweş dibû. Bayakî nerm dihat. Wî bayê zêde wilo ti kesek nerehet ne dikir. Ji ber ku ew beşa ku ew têde rûniştibûn, gelek deverên wê vekirî bûn, êdî wê bayê li wan ji dixist. Deme ku li wan dixist dilê wan xweş dikir. Wê bi wê dil xweşbûnê sofere wan ye taştê wê li ber wan hatibana vekirin û wê tastê ye xwe kiriban. Piştî ku mîr dît ku wa li ber derî mirovên ku wê sofere li ber vekin amede ne, êdî mîr ji ku hinekî dima û demeke baş dît êdî gota wan "werin, keremkine hundur". Deme ku mîr wilo ji wan re got, êdî ew ji hatina hundur û bidest vekirina sofere li ber wan kirin. Mîr, deme ku ew li ber derî sekinî bûn, mele Yunusê Xêlanî diaxift. Rast ne dibû ku di nivê axiftina wî de wî deng kiribana û gotibana wan werine hundur. Wê rast ne bûbana. Ji ber vê yekê ji ew mabû heya ku wê axiftina xwe bidawî kiribû û ti kesekî din weke wî axiftina ne girtibû û hinekî bêdengbûn ji çêbû bû, êdî wî deng dabû û bakiribû wan ku werina hundur û bidest vekirina sofere taştê ji wan bikin.

Ji xwe, piştî ku bidest vekirina sofere li ber wan hata kirin êdî hinekî weke ku bêdeng bûn ji çêbû. Yên ku diaxiftin hebûn. Lê ne weke berê. Car bi car çend gotin digotin û dimana sekinî. Lê di deme ku sofere hata kirin û haya ku sofere hemû ji hata vekirin bêdengî serdest bû. Ti kesek wilo ti axiftin ne kir. Herkesek bêdeng ma. Piştê bi bêhneke re ku sofere hata vekirin ji, êdî bi pêşengtiya mîr herkesekî xwe li dore sofere bi hev re da hevdû û bi hev re bidest aciftinê kiirn. Lê berî hingî, Mele Yunusê Xêlanî hinekî li sfere meyîzendibû û mabû bû sekinî bihazn. Ev yek ji bala mîr ji û ji bala mirovên din yên li dore wî ji ne ravî bû. Wan ji ev yek pêre farq kiribû. Wê haznbûna mele Yunusê Xêlanî ye bihizir pir balaka mazin kişandibû ser xwe di wê heyeme de. Ji ber vê yekê berî ku ew xwe li dore sofere taştê bidine hevdû bidest taştê bikin, mîr xwe ne girt û ji mele Yunusê Xêlanî pirsî ku ka çima wilqasî bihazn bû. Deme ku mîr jê pirsî êdî bal bi

tavahî çûna ser wî di wê heyeme de. Lê berî ku mele Yunusê Xêlanî bersivê bide wan, li Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî meyîzend û piştîre bidest axiftina xwe kir ji wan re. Mele Yunusê Xêlanî, deme ku ew axift, bahsa çûna Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî kir. Ew roja wan ya dawiyê bû li wir. Ew pir alimî hevdû bûbûn. Lê êdî ewwê çûban. Mele Yunusê Xêlanî pir alimî wan bûbû. Weke ku ew ne demek bû ku ew bi hev re bûn, weke ku ew çend sal bûn ku ew bi hev re bûn bû ji bo wî di wê heyeme de. Wilo ew alimî wan bûbû. Wilo wan di wî de û di serê wî de cih û war girtibû.

Mele Yunusê Xêlanî ku axift û wî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî, êdî mîr ji axift û mîr got ku "me divêbû ku ew ew hinekî din ji li vir li cem me maban û me hinek demên xwe yên din ji bi hev re buhurandibana: Lê wa ew dibêjin emê herin. Lê evder weke mala wa ye û kengî riya wan bi vir bikeve û an ji werine van herêman divêt ku me ji bîr nekin û werin û me bi rûmet bikin. Va win hemû dibînin ku em hemû bi hev re ne, weke birayan. Wê ev yek wilo berdewam bike haya ku em sax in. Yên pişt me re ji vê vê yekê bidine berdewam kirin. Mîreteye me ye mazin ye ji wan re ev e". Mîr ku wilo axift êdî ma sekinî. Piştîre ku mîr ma sekinî êdî yê ku axift seyde Avdilrehîmê xaniqî bû û wî her weha bersiv da mîr û got ku "mîrê min, ti pir bi zanebûn û ji aqil axivî. Ev axiftina te wê ti carî newê ji bîrkirin. Tiştî rast ji xwe ti carî nayê ji bîrkirin". Ku wî ji wilo got êdî ma sekinî. Piştîre yên ku wilo biaxivin nebûn. An ji yên ku gotinaka wan ji bo gotinê hebene ji di serê xwe de hiştibûn. Piştîre wan xwe li dore sofrê taştê dabûbû hevdû û bidest xwarina xwe kiribû. Li ser xwarina de ji axiftina wan gotin bi gotin berdewam dike. Lê ne wilo zêde. Hindik hindik berdewam dike. Haya ku wan xwerina xwe xwar wê rewşa wan wilo berdewam kir. Piştîre ku hinek têve diçê û ew ji xwarina xwe duxwûn, piştîre êdî xwe ji ser sofrê didine bi şûn ve û êdî di cih de mirovên ku sofrê anîbûn û li ber wan vekiribûn, hema mirov bi heman nêzîkatîyê tîn û sofrê wilo ji didine lev hevdû. Sofrê taştê di demeke kin de lev tê dayîn hevdû. Piştîre ku sofrê hata lev dayîn hevdû, êdî ew dise bidest axiftina xwe dikin. Lê wê naqlê axiftina wan wilo zêde berdewam nake. Piştîre bi qadarekê re êdî di pêşengiye mîr de hemû ji bi hev re dirabine ser xwe û derdikevine derve û ji xwe re li ser xwe digerihin. Deme ku derdikevin ji, êdî dikin ku herine beravê. Bi aliyê rojhilat ve ji bi aliyê çiyê ve rewş pir xweş bû. Şînatî pir hebû. Ew ji bi wir ve çûn û kirin ku li ser xwe bigerihin.

Ku derdikevine derve êdî dibina gelek. Li derve ji deme ku derdikevin, gelek mirov digihina wan. Bi yên ku digihina wan re dibina gelek û bi hev

re li ser xwe digerihin. Hinekî pêşî bi ber çiyê ve li ser ve diçin. Lê hinek mirov ji, hespan ji bo wan amede dikin. Hew te dît ku mîr got ku hespan ji me re bênin emê li ser wan hinekî li ser xwe bigerihin. Ji bo ku deme ku mîr got amde bin, wan bidest amede kirinê kiribûn. Lê haya wê kêlikê ji mîr bahsa hespan ne kiribû. Tenê dabûbûn dore hevdû û bi hev re bi ber çiyê ve diçin. Weke qadarekê ku di lingan li ser xwe diçin, êdî piştire berê xwe didina beravê û ku herine ber avê û li beravê hinekî ji xwe re rûnihin. Bi aliyê avê ve ku weke qadarekê dimeşin, êdî digihine beravê û li beravê ji xwe re di rûnihin. Yên ku hesp dabûn amede kirin ji li pey wan bi hespan dihatin. Lê ku mîr û yê pêre digihine beravê û ku li wir ji xwe re hinekî dirûnihin, êdî mîr ji mirov dore xwe re dibêje, ”ku hewa ji pir xweşa. Em hinekî li wir ji xwe re seyrenê bikin”. Deme ku mîr wilo got êdî li wir li beravê ew bicih bûn û hinek mirovan ji li wir ber wan amedekarî kirin ji bo seyrankirin. Piştire hinek mirovên din ji hatina cem wan, ku bi wan hinek kewên nêçîrê hebûn. Dema ku çavên wan bi kewan ket, pir kêfe wan hat. Kêfe mîr pir hat. Hinek kewên xwe berdena hevdû û hinekan ji çûna dût û li cihne xafkên xwe vedan û hatin. Dem ji xwe deme nêçîre kewan bû.

Di hundurê demeke kin de gelek mirov li wir lev digihine hevdû. Mîr ji li wir bi mirovên li dore xwe re dirûnihê û bi wan re dipeyîve. Mîr pir kêfxweş dibe. Piştire weke demekê li wir li beravê ji xwe re dirûnihin. Ji xwe re dirûnihin û ji xwe re diaxivin. Mihemed li cem seyde Avdilrehîmê xaniqî rûniştiya. Mele Yunusê Xêlanî ji li nêzikî wan rûniştiya. Lê ew hinek nêziktirî mîr bi xwe ya. Car bi car ew bi mîr re diaxivê û car bi car ji berê xwe dide Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û wan û car bi car ji bi wan re dipeyîvê. Li dore wan hê gelek mirov hene. Ew ji yê ku navserî xwe ne û yê ku ji aqil û xaberdana xwe bi bawer in. Ji ber vê yekê ji ew ji car bi car hin gotinne ji mîr û ji dore xwe re dibêjin. Lê di wê rewşê de yê ku herî zêde diaxivê ji mîr bi xwe ya. Piştî wî re mele Yunusê xêlanî û pişt wî re ji seyde Avdilrehîmê xaniqî ji car bi car hin gotinne de dibêje. Ew ji hij axiftinê dike. Zanebûna wî ji heya. Mirovê ku hinekî zanebûna wî hebe, di rewşên axiftina bi hev re de car bi car bi bêqabr ji dibe. Ew ji hinekî wilo bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pêre pir baş û qanc kifş dikir. Lê deme ku mirov lê dimeyîzend ji, car bi car mirov didît ku ew bi hizir ji dibû. Demek bû ku bi ser çûna ser dilovaniya ye şêx Birehim bûbû. Lê ew hê ji weke ku wê yekê erêneke dima sekinî di cihê xwe de.

Mihamed li cem wan rûniştibû. Ew ji car bi car tevî axiftinê dibû. Lê ne zêde. Ew bi zêdeyî di cihê xwe de dima sekinî di serê xwe de dikete hizran de. Rewşa wî wilo dihata berçavan. Mihamed di wê heyeme de her çend ku tevî axiftina wan ye ku wan di nav xwe de fikir dibû ji, lê wilo zêde ne diaxift. Wê yekê bala mirovên li dore pir baş û qanc dikîşanda ser wî di wê heyeme de. Mîr ji bala wî diçû ser wî. Deme ku hê ji nû ve hatibûbûna wir, hingî, ew hinekî axiftibû. Wan axiftinên wî yên ku wî kiribûn balaka mazin kişandibû ser wî di wê heyeme de. Wan axiftinên wî, ew weke zanistekî mazin yê deme xwe raxistibû berçavan di wê demê de. Bi vê yekê hê hingî bal çûbûbûna ser wî û êdî ew bal ji ser wî qutnebû bû bûn. Di wê heyeme de ji deme ku mirov lê dimeyîzend û mirov dohnê xwe dide wan balên ku li ser wî ne, mirov fahm fikir ew bal balne ji wan bala na. Ew bal balna ji wan balên ku ew weke zanistan di parzinandin bûn. Mirovên ku li Mihamed dimeyîzandin, ew di wê heyeme de bi avirên çavên xwe pir di parzinandin. Pîr lê dimeyîzandin. Mihamed, ne ku ew ne di wê farqa wê yekê de bû. Ew di farq wê yekê de bû. Lê Mihamed weke ku fihet bike car bi car serê xwe fikir ber xwe de. Weke mirovekî mehçûp di sekinî li ber wan. Yên ku lê dimeyîzandin ji, ev yek pêre di wê heyeme de farq dikirin û fahm dikirin.

Mihamed divêt ku mirov bêje ku wî bi zanistîtiya xwe re xwe dabûbû erêkirin. Di wê heyeme de yên ku lê dimeyîzandin ji, weke ku li zanistekî ku pir mazin meyîzênin lê di meyîzandin. Bi vî awayî avir li ser wî hebûn. Ku mirov lê dimeyîzend, mirov ev yek pir baş û di cihê xwe de kifş fikir. Ew bixwe ji ku mirov di vir de careka din ji bêje, mirov karê bêje ku êdî ew mirovekî navserî xwe de bû. Ne ciwan bû. Pîr bû bû. Lê hê li ser xwe bû. Lê êdî ew ji pîran dihata hasibandin. Deme ku lê dihata meyîzandin, bi wî çavî û nêzîkatîyê lê di meyîzandin. Mirovên pîr yên zanist bûn. Wan deme ku pîr dibûn, ji demeke xwe de pêde êdî xwe didena xwandin û nivîsandinê. Xwe didena zanebûnê. Ew mirovne wilo dihatina hasibandin bûn. Deme ku bahsa wan ji dihata kirin, êdî bi rêz û hûrmet bahsa wan dihata kirin. Mihamed ji wan mirovan bû. Lê ka vê vêce divêt ku mirov fahm bike, ku deme ku mirov zanist yekê weke mihamed ku bi nava salan çûna xwe re di nav zanistîtiya xwe re çûyî vêce wê di wê rewşê de çawa bihatana ser ziman? Ew ji pirseke ku di demê de dihata pirsîn bû. Di deme de di jiyane de bi temenê xwe re mazinbûnê re dihata pirsîn. Lê ji bo Mihamed bi zanebûna wî re ji dihata ser ziman û bersiv ji mirov dixwest. Mihamed, hê di deme ciwaniya xwe de wê xwe weke zanistekî dabû pêş û naskirin.

Di wê heyeme de deme ku lê dihata meyîzandin, her weha bi vê yekê dihata meyîzandin. Pir bal li ser wî hebûn. Mîr di wê heyeme de weke ku hem diaxift û hem ji bala wî ji weke ku li ser Mihamed bû. Li Mihamed dimeyîzend. Lê Mihamed di wê heyeme ku ew diaxift de weke ku hinekî dise weke berê di hiziran de bû. Wilo jê dihata berçavan. Di wê heyeme de deme ku mîr bidest axiftinê kiribû weke qadarekê axiftibû. Piştî ne bi gelekî re ku wê axiftina xwe bidawi kiribû, piştî wê hê bala xwe ji ser Mihamed ne vaqatandibû û piştî pêre axiftibû û jê xwestibû ku ew ji çend gotinan ji wê zanebûna xwe ji wan re bêne ser ziman û bêje.

Piştî ku mîr jê xwest, êdî Mihamed ji xwe ji bo axiftinê amede kir û axift. Ku mirov jê bixweze û ew ne axivê, wê rast ne bûbana. Wê rast ji ne hatibana dîtin. Mihamed ji deme ku mîr jê xwest êdî xwe di cihê xwe de adiland û amede kir û piştî bidest axiftinê kir û axift. Weke qadarekê axift. Bi wê zimanê xwe yê xweş û delal ji wan re pir xweşik axift. Ji zanebûna xwe ji wan re anî ser ziman. Weke qadarekê ew axift. Piştî ku ew weke qadarekê axift, piştî êdî wî axiftina xwe bidawi kir û ma sekinî di cihê xwe de. Piştî ku ew ma sekinî gelek mirovan li nav çavên wî meyîzend. Yên ku li nav çavên wî meyîzandin, di wê heyeme ku meyîzandin de ne axiftin, lê bi avirên xwe weke ku bêjine de ti pir xweş û xweşik axiftî û zimanê te hertimî weha xweş bê. Mihamed ji ev yek ji wan di wê heyeme de fahm kir. Lê Mihamed ti tiştê di wê heyeme de ne got. Dise yê ku got mele Yunusê Xêlanî bû. Wî mafê axiftinê girt û li Mihamed meyîzend û ji dore xwe re axift û got "ti pir xweş p azîz û delal axiftî. Te pir baş û qanc û rast anî ser ziman. Mala te ava!" Deme ku mele Yunusê Xêlanî got mala te ava, êdî Mihamed ji di cih de mafê axiftinê girt û got "ye te ji". De ne, deme ku mirovekî ku mirovekî din got mala te ava, divêbû ku wê ji weha bersive dabana wî. Ev yek weke edeb û terbiyeyekê bû. Ti kesekî nekirin ne fikir. Herkesekî fikir. Mihamed ji deme ku wî wilo got, êdî wî ji di cih de mafê axiftinê hilda bû û axiftibû û ev gotin gotibû. Lê deme ku Mihamed mafê axiftinê hildabû di wê kêlikê de, hê mele Yunusê Xêlanî axiftina xwe bidawi ne kiribû û ne sekinî bû. Ew hê diaxift. Lê ji ber ku deme ku ew gotin hata gotin, divêt ku di cih de ku yê ku axiftibû axiftina xwe bidawi ji ne kiribê divîyabû ku wî mafê axiftinê hildaban û wî ev gotin gotibana û dise maban sekinî. Piştî êdî yê ku diaxift wê axiftina xwe domand bana. Piştî wê bi ser ve gotibana êdî wê piştî wê gotina weke bersive ku jê re hatibûn êdî wê gotibana. Ev yek weke nirxeke xalkî û civakî bû di nav civata kurdan de. Yê ku gotibana "mala te ava!" di rewşêke wilo de, ku mîr bana wê di nava axiftina wî de mafê axiftinê

hatibana hildan û wê ew gotin bihatana gotin. Mîr ji nikarîbû ku li ber wê yekê rabûbûna. Ev gotin, gotinaka ku nirx û edebe mirov û pêre ji zanebûna mirov dide berçav bû.

Mihamed, piştî ku wî wilo got û ma sekinî, êdî piştire mele Yunusê Xêlanî axiftina ber dewam kir. Wî piştire çend gotinne din ji gotin û êdî piştire ma sekinî di cihê xwe de di wê heyeme de. Piştî ku ew ma sekinî, êdî pişt wî re mîr dise mafê axiftinê hilda û her weha jê re got. "dil û gotina te hertim wilo xweş bê. Ne te çî xweş û di cih de got". Mîr ku ev got, êdî çend gotinne din ji biaxiftin bi ser van gotinan ve kir û ma sekinî di cihê xwe de. Lê deme ku mîr wilo got, êdî mele Yunusê Xêlanî ji di nîvê axiftina wî de mafê axiftinê girt û got "ye te ji mîrê min.." û ma sekinî û pişt wî re mîr axiftina berdewam kir. Bitememî li gor kevneşopîyê tevgerahan. Piştire ne bi gelekî re hinek mirovên din ji yên ku navserî xwe bûn mafê axiftinê hildan û wan ji çend gotinên din ji gotin. Wan ji li gor zanebûna xwe çend gotin bi ser ve zêde kirin. Vê rewşê weke demeke dirêj bi axiftin û bi bihev re bi dan û standinê berdewam kir. Deme ku mîr û yên pêre bi hev re taştê ya xwe bi hev re kiribûn û piştire hinekî li hevdû ji rûniştî mabûbûn û piştire ji xwe re derketibûn û rê girtibûn û hatibûbûna wir. Nahaka vêce li wir ji xwe re bi hev re rûniştibûn. Ji xwe re bi hev re diaxiftin. Bi wê yekê, wan ji nizanibû ku deme wan çawa buhurtiya. Wan li wir demeke pir dirêj buhurandibû. Li wir li hevdû di bin wê hînkatiyê de rûniştin li wan xweş hatibû. Bi wê yekê wan ji weke ku xwe ji bîrkiribû. Ne di farqê de bûn ku ka deme wan çawa buhurtiya. Lê piştire ku hinekî di ji têne diçê û ku têne xwe, êdî farq dikin ku dem pir bûya dereng li rûniştina wan ye li wir, ku ew li hevdû rûniştibû bûn. Bi vê yekê re ku têne xwe, êdî rabûna bigotinê mîr bi bîr dixê. Mîr dibêje "ez dibe qey deme me ye li vir hinekî zêde buhurtiya". Deme ku ev wilo dibêje, êdî yên ku pêre ne ji, dibêjin "ti rast dibêje mîrê min" û piştire êdî dikin ku rabûna ser xwe ji cihê di wê heyeme de.

Deme ku her weha ew kara xwe ye rabûnê dikin, êdî nêçîrvanên wan ji kewên xwe lev didine hevdû dikine cihên wan de. Yên ku çûna dûr ji êdî hin bi hin. Piştire ne bi gelekî re ku lev digihine hevdû, êdî dikin ku herine malê. Deme ku ji cihê xwe re di rabin û dikevina rê de ku herine malê, êdî berî ku herine malê, pêşî diçina mizgefte û mêj dikin. Piştî ku mêj dikin piştire êdî dikina malê. Lê berî ku herine malê ji, deme ku ji mizgefte derdikevin, bi gotina mîr, hinekî li ser xwe li hevirdore digerihi. Weke demeke ji xwe re li ser xwe digerihi. Ku weke qadarekê digerihi, êdî piştire rîya xwe digirin û têne malê. Deme ku têne malê êdî ji xwe re dise

li hevdû dirûnihin û ji xwe re diaxivin. Lê wê deme ku têne malê û hinekî ji xwe re dirûnihin û bi hev re diaxivin, zêde rûniştî li hevdû nemênin. Dise di rabina ser xwe re û derdikevine derve. Lê wê carê naçina dûr. Li malê dimênin. Derdikevine ber malê. Li wir ji xwe re li çûn û hatina jiyanê dimeyîzênin. Deme ku dibe ber êvaran dem pir bi çûn û hatin dibe. Mirov yek ji di hundur de namêne. Hemû derdikevine derve û bi kar û bare xwe ve diçin. Di wê demê de pir kara jinan ji û mêran ji heya. Axlabê ji, her mal sawalên wan hene û di wê demê de sawalên wan têne malê. Deme ku hatina malê ji êdî dohtina wan û êm dayîna wan deme wan dihilde. Heya ku reş dikeve ardê de çûn û hatin ji ber van sedeman û hê gelek sedemên din yên weke van berdewam dikin.

Ku bû ber êvarî, êdî sawal û paz ji çolê tên û êdî mirov dibina turatura wan bi sawal û pazan re û diçin û tên. Hewa ji di wê de pir hînika. Li ser deme ku mirov dimêne dilê mirov xweş dibe. Roj ji, deme ku diçê berava lê hê ku nn çûya ava, awayekî pir xweşik di hilde. Roj hingî dinyê pir sor dike. Her der û dever sor tê xuyakirin. Deme ku di wê demê de mirov li dûr j dimeyîzenê, mirov dibîne ku dinye çend xweş û rinde. Mirov hingî evîndarî nerîn û dîtina xwe dibe. Mirov hingî dinyê bi awayekî din dibîne. Dinye ji bi awayekî din tê berçavan. Ew dem pir xweş û rinda. Di wê demê di hundur de mayîn ji herkesekî wê aciz bike. Ji ber vê yekê ji, herkesek derdikeve derve. Mirovên ciwan û ser bixwe, hemû ji di wê demê de kar û barê wan heya. Di wê demê de ew ji bi kar û barê xwe ve diçin. Yên ku karê wan nebana ji, derdiketin û ji xwe re li hevirdorê digerahan. Bêhne xwe diberden. Li wê herême Kurdistanê ji weke herême botanê ew dem ji pir xweş bû. Li van herdû herêman ji mirovan hertimî kêfe van deman û demên sibehan dikir. Ji van deman re ji digotin ”danapaza(bersibehê)”, ”demên berêvark”. Mîr ji û yên pêre ji, di wê demê der derketibûbûna derve û ji xwe re li çûn û hatinan temaşa dikirin. Turatura şivana, mie mie mihan û ira ira çêlek û conagayan di hev de dihata guhê mirov. Pêre qireqire zarokan, dengê girîyê pitikan, dengê jinan ku di bakirina hevdû û dengê hinek mêran ji ji dûr ve ji hev re hin tiştin di gotin di nav hev de dihat.

Mîr bi mirovên li dore xwe re li wê hewayê temaşa dikir. Hin bi hin ji bi hev re ji diaxiftin. Dengê wan ji hinekî biind bû. Hewa hingî xweş bû, deme ku mirov diaxift, dikir ku mirov dengê xwe ji bilind bike bi hev re, deme ku bi hev re diaxiftin. Mîr ji û yên ku pêre ji bûn deme ku bi hev re diaxiftin, hinekî dengê wan bilind dihata hevdû. Debgê wan pir xweş diçû hevdû. Mihamed di wê heyeme de car bi car ew ji diaxift û car bi car ji dima sekinî bi bêdeng di cihê xwe de di wê heyeme de. Lê di wê heyeme

de ew ji wilo zêde bêdeng ne ma bûbû. Ew ji hinekî axiftibû. Wî ji hinekî dengê xwe dabû bû. Weke qadarekê li wir li derve li hevdû rûnihin û diaxivin bi hev re. Haya ku ro diçê ava, ew li derve li hevdû dimênin û li hevdû rûniştî bi hev re diaxivin. Piştî ku ro diçê ava êdî ew ji têne hundur. Mirovên li derve ku bi kar û barê xwe diçûn di wê demê de, hin bi hin karê xwe bidawî dikin û dikin ku herine hundur û êdî şîve xwe dênine ber xwe û bixwûn û piştî êdî li hevdû rûnihin û ji xwe re bi hev re bikevine axiftinê de. Êdî ku piştî şîvan, dem demên li hevdû rûniştin û çûna malên hevdû yên civatan bû. Her şev civatên xwe li dar dixistin. Lê axlabe ji diçûna qasre mîr. Her şev li wir civat hevdû û gelek mirov ji li hevdû lev digahana hevdû. Gelek mirov ji dûr ve ji dihatina mêhvandariya mîr di wê heyeme de. Bi vê yekê re êdî civatên qasrê ji xweş dibûn û bideng dibûn. Mirovên nû ji deme ku dihatina vala ne dihatina. Bi gelek agahî dihatin. Di civatê de çî dîtiban û li herêmên wan çû bûbana wan ji ji mirovên li dore re dianî ser ziman. Bi vê yekê hertimî mirov dihatina civate qasrê, ji bo ku tiştne nû his bikin. Mirov deme ku hata qasre, êdî ne mumkun bû tiştêkî nû his ne kiribana. Ji ber ku mirovên nû yên ku ji deverên dûr hatibûn li qasrê weke mêhvan hebûn.

Wê şevê ji li qasrê civat li dar ketibû û piştî demên şîve êdî mirov xurahabûbûna wir. Gelek lev bûbûbûna kom li wir. Li wir, di demeke kin de gelek mirov lev gahabûbûna hevdû. Dîwana mîr pir mazin bû. Lê gelek mirovan karibû ku lê rûnihin. Bi hev re diaxivin û didin û distênin. Yên ku dengên wan xweş ji ji li wir amede bûn. Wan ji, ku kete derba xwe de êdî wê gotiban. Ew ji li bendî vê yekê bûn. Dengê wan ji xweş bû. Ew ne tenê mirovne ku tenê dengê wan xweş bûn. Her weha ew mirovne ku zane ji bûn. Wan di bîre xwe re dîrokek diveşart. Wan karibû ku gelek destanên kurd yên weke Rûstemê zal, Şahmaran û her weha hê gelek destanên din yên wilo bidev ji serî haya binî jiber gotiban. Di vê yekê pir bi huner bûn. Navê wan hebû. Ew mirovne ku her weha pir mazin bûn. Ji xaynî destanan ji, zanistên ku kurd yên demê bihizre xwe re dihişê wan de bûn. Wan ji bi wî zimanê xwe yê xweş dianîn ser ziman. Bi vê yekê divêt ku mirov bi rêz wan yad bike.

Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ew civata wan ye dawiyê bû. Mîr ji û mirovên li dore wan ji, yên ku her dayimî bi mîr re bûn, ev yek zanibûn. Di wê heyeme de ew ji hinek ji wan bala wan li ser wan bûn. Li wan dimeyîzandin. Mihamed ji û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji heya wan ji vê yekê hebû di wê heyeme de. Lê ew di cihê xwe de bi bêdeng bûn. Gelek mirov hebûn û yên ku diaxiftin ji hebûn. Mîr ji û yên dore wan ji pir bi bal

li wan dihisandin. Mîr ji car bi car diaxift.Lê di wê rewşê de hê ne Mihamed û ne ji seyde Avdilrehîmê xaniqî axiftibû. Mele Yunusê Xêlanî ji car bi car diaxift. Wî çend gotin di wê heyeme de gotibûn. Ew li cem Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî rûniştibû bû. Lê ne dûrî mîr ji bûn. Mîr ji bi rehetî ew di dîtin û dengê wî ku nimz ji axiftibana diçû wan. Her weha rewşeke wan hebû. Lê Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji di wê heyeme de bi bêdeng bûn. Wê yekê pir bala mîr kişandibû. Mîr bala wî li ser wan bû û di serê wî de bû ku wê ew sibe çûban.Mîr bi vê yekê ku weke qadarekê li wan dimeyîzenê û piştire mafê axiftinê dihilde û hinekî diaxivê û piştire ji axiftina xwe ew têne ser Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî. Deme ku mîr bahsa wan dike êdî bi gotina mîr weke ku bi carekê re bal hemû diçina ser wan. Bi vê yekê re Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke ku werina xwe li wan têt û ew ji xwe lê didine hevdû û xwe di xihê xwe de xwe diadilênin û piştire berê xwe didine mîr di wê heyeme de.Piştire ku mîr hinekî di ji piştî bahskirina wî ye wan re diaxivê, êdî ew axiftina xwe bidawii dike û dimêne sekinî. Piştî ku ew ma sekinî, êdî yê ku piştî wî re mafê axiftina hilda ji seyde avdilrehîmê xaniqî dibe û deme ku bidest axiftinê dike, di serê axiftina xwe de berê xwe dide mîr ji mîr re dibêje ”ti rast bêje mîrê min” û piştire ew ji ji wî û ji civatê re bidest axiftinê dike.Seyde Avdilrehîmê xaniqî di wê heyeme de axiftinaka pir bizane dike û dike ku bala herkesekî herê ser wî û dore wî. Deme ku ew diaxivê, bahsa demên xwe yên berê ku hatibû wanderan ji dike. Pêre bahsa wê carê hatina xwe ji dike. Pêre, di dawiya axiftina xwe de bahsa Mihamed ji dike. Bahsa bihev re hatina wan ye bi hev re dike. Bi vê yekê bal diçina ser Mihamed ji. Deme ku bahsa Mihamed dike, bi sereke bahsa hatina wî ya ji Cizîre bota ji dike. Ji wê deme wê haya ku ew bi hev re hatina wir ew bahs dike.Piştire ne bi gelekî re ew axiftina xwe bidawî dike û piştire Mihamed dmafê axiftinê digirê û ji civate re pir axiftinaka bizanebûn dike. Bi zimanekî pir xweş têne ser ziman. Dike ku bal bitavahî herne ser wî di wê heyeme de.Mihamed weke qadarekê diaxivê û diaxiftina xwe bahsa gelek znaistan dike. Bi kê re maya, ew bahsa wan dike di wê heyeme de.Bahsa deme xwe li Cizîre bota ji dike û pêre mele Silêman û Faqa Qasim ji dike.Pir xweş ji bahsa wan dike.Bi rêz û hûrmet bahsa wan dike.Piştire ku ew axiftina xwe bi dawî dike û dimêne sekinî, êdî ew di serê xwe de diçê wê demê û li ser dihizirê. Weke ku bîrkiribe lê têt. Weke ku bîre wan herdû mirovên zane kiribe lê têt. Ew di xwe de vê yekê di wê heyeme de hîs dike.Deme ku bahsa wan kir û piştire ma sekinî, weke ku di serê wî de ew werine ber çavên wî lê hat.Wî demeke jiyana xwe ya dirêj bi wan re

buhurandibû. Ma wê çawa bîre wan neke. Ew bi vê yekê bûbû bûn weke qatak ji jiyana wî di demên wî yên ku wî jîn kirina de..

Civata wan haya demeke dirêj berdewam dike. Piştî ku ew mirovên ku dengê wan xweş bû, ku ew ji ketina devrê de û wan ji hinekî got û bi gotinên xwe re demeke xweş bi wan dana derbaskirin, êdî piştî ew mana sekinî û êdî hinekî din ji civat bi hev re, ku dem derbas kir êdî dem ji bû dereng, û êdî deme rabûnê kete bîre wan de.

Mirovên ku dengên wan xweş bû, demeke pir xweş û teze bi wan dabû bû derbaskirin. Yên ku dengên wan xweş bû, ku ketibûbûna devrê de êdî dabûbûna berhevdû di gotinê de û êdî herkesekî bala xwe dabûbû xwe wan û êdî fahmnekiribûn ku deme wan çawa çûya û derbas bûya. Haya demeke dereng her weha deme wan buhurtibû. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji li cem hevdu rûniştibûn û dihisandin. Pir bi bal li wan dihisandin. Mihamed pir bi balaka mazin dihisand. De ne, di vir de divêt ku mirrov xosletekî Mihamed yê din bêne ser ziman. Mihamed ku carekê ba hisandibana, êdî karibû di cara duyemîn de wî weke wan gotibana. Her weha ew mirovekî ku pir bi bîr û hiş bû. Di wê heyeme de ji wê bala xwe dide yên ku digotin. Wan bi dengên xwe yê xweş dilê mirov zîz dikir û dihaland. Bi dengên xwe dikirin ku mirov di serê xwe de di hizir û ramanan de herê û dûr herê û pir kur herê. Wan dengên wan deme ku wan pê digotin, hingî, gelek tişt bi bîre yên ku dihisandin dianî. Wan pir bi bîr dikir. Mihamed ji ne mumkun bû ku bi wan dengên xwe bi bîr ne kiribana. Yê wê, gelek tiştên ku werine bîrê hebûn. Di wê heyeme de ji dihatina bîrê bi gotinê.

Piştî ku demek têve çûbû, êdî ew mabûbûna sekinî û piştî wan ji hinek mirovên ku çend gotin gotibûn derketibûn û çend gotin gotibûn. Piştî êdî ku dem hatibû ber demerazana, êdî yên ku bahsa demerazana kiribûn û bi kiribûn derketibûbûne hole di wê heyeme de. Wan bahsa deme razana kiribû. Êdî piştî bahsakirina wan re mirovan ji xwe ji bo rabûnê karkiribûn. Lê xwe karkiribûn lê hê ne rabûbûn. Berî ku rabin êdî mîr dike ku bi axivê. Lê çawa ku mîr dike biaxivê û kara xwe ji bo axiftinê dike, mele Yunusê Xêlanî mafê axiftin dihindê û berî wî diaxivê. Mîr êdî dimêne sekinî. Mîr fahmkiribû ku heya wan jev nebû ku herdû ji cude cude xwe ji bo axiftinê amede kiriya. Ne mîr mele Yunusê Xêlanî dîtibû û ne mele Yunusê xêlanî mîr dîtibû. Deme ku mele Yunusê Xêlanî axift. Bahsa çûna Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî kir ku wê ew bi sibehê re bikevine rê de û ji wir herine. Hinekî dirêj ji wî bahsa wan kir. Piştî bi qadarekê ku ew axift û piştî ma sekinî di cihê xwe de êdî mîr mafê axiftinê hilda û

axift. Mîr di serê gotina xwe xwe de got ku "heman tişt di dilê me de ya. Min ji xwe amede dikir ku bahsa wê bikim. Lê seydeyê min berî min axift û ye dilê min ji anî ser ziman. Pir bi zane û bi aqil axift". Mîr ku her weha axift, êdî piştê axiftina her weha berdewam kir. "Ye rastî me ne divîya ku nahaka ew ji vir herine. Em pir alimî hevdu bûn. Lê ew dibêjin emê herin. Lê evder ji mala wan na û kengî ji riya wan bikeve virde, divêt ku taqsîr nekin û werin û me bi rûmet kin. Wê ew wê sibe bi sibehê re wê bikevine rê de û herin. Wê hinek mirov ji ji vir xwe amede bikin û wê bi wan re rêvaniyê bikin haya cihê xwe ku wê herinê de". Deme ku mîr di nivê axiftina xwe de ev yek got, êdî hê ku wê axiftina xwe bi dawî ne kir Zana li cem wan rûniştibû û di cih de bersivê û got ku "weke ku mîrê min got wê bi sibehê re yên ku bi wan re bikevine rê de wê amede bikin. Piştê mîr axiftina xwe berdewam kir û her weha got "me divîya ku win hinekî din ji li vir maban. Lê deme ku win hatibûn ji wê hê hingî ji ji me re anîbû ser ziman ku winê hinekî bimênin û herin. Vêce nahaka ew deme. Winê herin. Lê ez bi hevîme ku emê cerna din ji hevdu di jîyanê bibînin, bihemd û baş". Mîr ku her weha axift, êdî ma sekinî di cihê xwe de. Zane ji ku mirov li ser çend gotinan ji bo ku wî nas bike bêne ser ziman mirov wê her weha bêne ser ziman. Asil navê wî ne zane ya. Hingî zanebûna wî heya jê re mîr dibêje zana. Asil navê wî Dildarê kurê Hisênê Hacî Qasimê Zendî ya. Ew bixwe ji dibê ahalî mîr bixwe. Lê di qasrê çî bê kirin û levdan û lihevda ew dike. Ew rê nîşanî wan dide. Weke mirovekî ku di qasrê de çûn û hatinan dide kirina. Hertimî li cem mîr e. Ew bixwe ji mêrekî mîr e. Bi bavê mîr reji û bi mîr bi xwe re ji ketiya gelek şeran de û pir mêraniyên mazin dana nîşandin. Kurekî wî yê bi navê Arînar heya û bi keçeke mîr re zewiciya ji. Keça mîr ye ku pêre zewiciya ji navê wê Afrînê ya. Arînar bixwe ji perwerdeyê pir mazin hilda ya û pir bizane ya. Mîr pir jê xweşa û ku diçê gelek deveran ji wî bi xwe re dibe. Li ser zanebûn û mêraniya wî ji ti gotin nîn in..

Ku mîr wilo ji Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî re got û anî ser ziman ji, êdî piştê yê ku weke bersiv da wê carê Mihamed bû. Mihamed pêşî sipasiya xwe jê re da nîşandin û piştê hinekî ji ji mîr û ji mirovên li dore xwe re axift û piştê wî axiftina bidawî kir. Mihamed axiftina xwe wilo zêde dirêj nekir. Kin birrî. Piştî wî re yê ku axift seyde Avdilrehîmê xaniqî bû û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji weke Mihamed sipasi da nîşandin û wî ji weke Mihamed çend gotin gotin û êdî ew ji ma sekinî di cihê xwe de. Wî ji weke Mihamed axiftina zêde dirêj nekir. Pişt wan re mîr û mele Yunusê Xêlanî ji çend gotinên din ji gotin û piştê ne bi gelekî re kara

rabûna xwe kirin. De ne, mirovan ji bo rabûnê zûve kara xwe ye rabûnê kiriya. Lê li bendî mîr in. Deme ku mîr da xwe ji cihê xwe, êdî ew ji wê ji cihê xwe dine xwe û wê rabina ser xwe di wê heyeme de. Piştîre ji xwe ne bi gelekî re êdî mîr li dore xwe meyîzend û dît ku wa herkesek ji bo rabûna amede ye, êdî wî bi gotina "nexwe de êdî em rabin" êdî dana xwe û rabûna xwe di wê heyeme de. Deme ku mîr da xwe û rabû ser xwe, êdî pêre mirovên ku li dore wî bûn bi hev re bi carekê re dana xwe û rabûna ser xwe di wê heyeme de.

Ku rabûna ser xwe, êdî bi hev re berê xwe dana bi devê dêrî ve û çûne devê dêrî û li devê dêrî mana sekinî. Êdî ku mana sekinî, êdî yên ku wê xatir ji mîr xwestibana û jê re gotibana şevbaş ji, jê xatir xwestin û jê re gotin şevbaş û piştîre bidest çûne xwe ye malê kirin. Di demeke kin de yên ku wê çûban hema bêja hemû ji çûn. Hindik mirov li wir man. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û mele Yunusê Xêlanî ji ku di nav de çend mirov man. Piştîre ku yê ku çûn ku çûn, êdî Mîr û ew vegeherana hundur û piştîre ku ew ji hinekî dî di hundur de li hevdû man, piştîre wan ji ji hevdû re şevbaşî xwest û herkesek çûn ku herine ser cihên xwe di wê heyeme de. Deme ku herkesek çû ku herê ser cihê xwe, Mihamed ji dêla ku herê ser cihê xwe çû beşa pirtûkxane. Wî xwest ku herê wir. Wî xwest ku hienkî dî ji li hinek pirtûkne meyîzêne. De ne, ew roje wan ye dawiyê bû. Jê wê rojê pêve ti rojên wan yên din li wir wê neban. Wê ji wir çûban. Ev yek di serê Mihamed de ji bû.

Ku Mihamed hata wir, êdî li wir rûnişt û ji xwe re bidest meyîzendine pirtûkne kir. Di wê heyeme de ku hê demeke dirêj têve ne çûbû, Mihamed dît ku wan mîr ji rê girt û hata wir. Deme ku Mîr hata wir, êdî wan li wir silav da hevdû û li wir hinekî li hevdû rûniştin û bi hev re bidest axiftinê kirin. Mihamed deme ku mîr hata wir, wî gotiyê de "min nêht kir ku hinekî li vir deme bi buhurênin û hinekî li pirtûkne ku di serê min de bûn li wan meyîzênim". Deme ku Mihamed wilo got êdî mîr ji gotiyê de di bindestê de ne, keremke". Piştîre mîr û Mihamed hinekî li hevdû rûniştin û bi hev re axiftin. Weke demeke dirêj li hevdû rûniştin û axiftin. Dem haya ku hata ber bangdana sibehê ew li hevdû rûniştî man û bi hev re axiftin. Mîr pir mêhle wî çûbû bû li ser Mihamed û pir hijê kiribû. Hij axiftina wî kiribû. Mihamed zimanekî wî yê tenik hebû. Zimanê wî pir li xoşa mirov diçû.

Piştîre ku hinekî din ji dimênin êdî dengê bangdana sibehê tê wan. Piştîre ew ji dêla ku herina ser cihê xwe diçina derve û kara xwe dikin û dikin ku herine mizgîfte bi hev re. Piştîre ji xwe ne bi gelekî re seyde Avdilrehîmê xaniqî ji û mele Yunusê Xêlanî ji ji cihê xwe derketibû û hatibû ku kara

bikin û herine mizgeftê. Ew hevdû dibînin. Deme ku hevdû dibînin, êdî ji hevdû re rojbaşiyê dikişênin û piştêre bi hev re kara dikin û dikin ku herine mizgefte. Piştêre ne bi gelekî re gelek mirovên din ji yê ku rabûna ser xwe û derketina derve ku kara bikin ji bo çûne mêjê rastî wan tên û digihina wan û bi wan re tevdigerihin. Piştêre êdî ew bi hev re kara dikin û xwe lev didine hevdû û dikevîne rê de û diçûne mizgefte. Mihamed pir bi hizir bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend mirov ev yek pêre kifş dikir. Bala seyde Avdilrehîmê xaniqî ji careke çû ser Mihamed. Lê wî deme ku bala wî çû ser Mihamed tene lê meyîzend û hwd. Ji wê pêve wî ti tiştê ne got û ne kir. Deme ku bala wî çûbû bû ser Mihamed, hingî, wî farq kiribû ku Mihamed pir bihizire. Bi vê yekê re êdî bala wî li ser wî mabû bû. Mihamed wê şevê bêxew mabû bû. Lê ji ber wê wilo ne li ser xwe an ji bixew ne dihata dîtin. Vajî wê, weke ku ew razaha bê û wî xewa xwe hilde bê dihata berçavan. Wilo li ser xwe û bihêz dihata ber çavan di wê heyeme de. Piştêre bi qadarekê re êdî digihine mizgefte. Deme ku digihine mizgeftê, hem di rê de yê ku diçûne mizgefte û hem ji deme ku digihine mizgefte rastî mirvan tên. Deme ku digihine mizgeftê dibine gelek êdî.

Mihamed, seyde Avdilrehîmê xaniqî, mîr û yê bi wan re ku digihine ber mizgeftê, êdî Seyde Avdilrehîmê xaniqî di ber xwe de dibêje va em gahana mizgeftê. Lê deme ku ew dibêre xwe de dibêje ji, mirovên din yê li dore wî ji dingê wî his dikin. Dengê wî diçê wan. Mihamed ji û mîr ji dengê wî his dikin. Piştêre ku ew digihine ber mizgeftê, êdî ne bi gelekî re digihine ber devê derî yê wê û ku digihine ber dêrî, êdî li evê dêrî digihine hinek mirov mirovên din ji. Ew ji hatina ku werine mizgeftê. Deme ku digihine ber hevdû, êdî bi silav dayîna hevdû re rojbaşiyê ji hevdû re dikişênin û piştêre bi hev re didine rex hevdû û dikevîne hundurê hewşa mizgeftê de. Deme ku ew dikevîne hundurê hewşa mizgeftê de, dibînin ku wa hinek mirovên din ji wê li hundurê ne û dikin ku bikevine hundurê mizgeftê bi xwe de. Xwe ji vê yekê re amede dikin. Lê deme ku mîr û yê pêre dibînin, êdî li wan disekinîn û bi wan re li wan disekinîn û piştêre ku digihine ber hevdû ji, êdî rojbaşiyê ji hevdû re dikişênin û piştêre didine rex hevdû bi hev re dikevîne hundur de. Ku dikevîne hundur de dibînin wa gelek mirovên li hundur in ji. Deme ku ew dikevîne hundur de êdî ew ji aliyê wan ve tene pêşwazikirin. Ew li ber wan dirabina ser xwe û rojbaşiyê ji wan re dikişênin û ew ji wan re rojbaşiyê dikişênin û piştêre êdî bi hev re dikin ku rûnihin. Ku dirûnihin, êdî bi hev re dikevîne rêzê de û bi hev re dikin ku mêj bikin. Ne bi gelekî re êdî ji xwe ji li mêj ji dikin. Ku bidest mêjê dikin, Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ku mîr ji di rex wan de

ya, di rêze pêş de ne. Ew mirovne zane bûn. Mirovne ku pir jiwan re rêz dihata girtin bûn. Ji xwe deme ku ew ketibûbûna hundur de, bi xweza, mirovên li dore wan ew derxistibûbûna pêş di nav cimaaatê de. Ku derketibûbûna pêş de ji, êdî hema wilo ku çawa cih girtibûn wilo ji herkesek di cihê xwe de mabû sekinî û rêz girtibû. Bi vê yekê ew ji ketibûbûna rêze pêş de. Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî wê piştî mêjê ketiban rê de. Mîr ji li wir û mirovên navende hema bêja hemû ji di wê heyeme de li wir bûn. Yê ku wê hatiban wir hema bêja hemû ji hatibûbûna wir. Li wir diwê heyeme de amede bûn.

Piştî ku dikevîne rêzê de û bidest mêje dikin û ku mêj ji dikin, êdî piştî hê ku mele Yunusê Xêlanî li pêşiya wan ne, wilo di cihê xwe de dimêne û hinekî ji wan re peyivê. Ew wê carê deme ku dipeyivê, li ser Birehîm Xelîl ji mirovên li dore xwe re axiftina pir bi zane û xweş dike. Mihamed ji li ser Hizre Birehîm Xelîl û deme wî pir xwedî zanebûn bû. Li jiyane wî ji pir xwedî zanebûn bû. Deme ku mele Yunusê Xêlanî bidest axiftinê dike, hingî mirovên li dore wî pir bi bal lê dihiênin. Lê yê ku herî zêde li bi hey dimêne û lê dihisêne ji Mihamed bixwe ye di wê heyeme de. Mihamed li ser Brehîm xelîl ji deme biçûkatiya xwe bigire haya ku mazin bûbû û deme ciwaniya û piştî ji li ser wî pir his kiribû. Pîr xwandibû ji. Li ji ber ku Birehîm Xelîl ji wir û ji wan bû, wan pir ew nas dikir. Li ser jiyane wî yê ku bezanebûn bûn weke ku ne bûn. Li ser Birehîmê Xelîl ji û li Nebî Nuh ji her weha pir zanebûne wan hebû. Ev herdû nebî ji ji wê herêmê bûn. Li ser jiyane wan piştî wan re pir hatibû nivîsandin. Zanstên demê ji ew nêvîs di nav xwe de dixwandin. Mihamed ji zanistekî demê bû. Ne mumkun bû ku wî ji ne xwandibana. Ne mumkun bû ku ew di derbarê wan û jiyana wan de ne bizanebûn bana. Ew ji li ser wan pir bi zanebûn bû. Deme ku mele Yunusê Xêlanî bidest axiftinê kiribû li ser Birehîm Xelîl, weke ku ew ji di serê xwe de di wê heyeme de hê gelek tiştên din ji bi bîr bike lê hatibû. Bi vê yekê weke ku hatibû xwe lê hatibû. Geşbûnek pêre çêbû bû. Deme ku mirov lê dimeyîzend mirov ev yek pêre di wê heyeme de kifş dikir. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ew geşbûn bi Mihamed re kifş kiribû. Lê wî di wê heyeme de ti tiştê ne gotibû. Tenê wilo lê meyîzendibû. Lê piştî ku wî ew wilo bi carekê re geş ditîbû, êdî bala wî çûbû bû ser wî û ji ser wî ne vaqataha bûbû. Mîr ji weke seyde Avdilrehîmê xaniqî bala wî bi wê geşbûna bi Mihamed re çûbû bû ser wî di wê heyeme de. Lê wî ji tenê weke seyde avdilrehîmê xaniqî kiribû. Mîr ji û Mihamed ji wê êvarê ne razaha bûbûn. Herdûkan ji bi hev re li pirtûkxana qasrê kiribû sibeh. Li pirtûkxane qasrê ku ew şîyar li wan bûbû sibeh.

Mele Yunusê Xêlanî ku wê axiftina xwe ye xweş ye li Brehim xelîl bidawi dike û dimêne sekinî êdî piştî ne bi gelekî re dikin ku rabûna ser xwe di wê heyeme de. Piştî ne bi gelekî re ji xwe êdî ew ji dirabin. Lê ti kesek ji wir na vaqatihê. Ji ber ku herkesek zane ku Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî wê herin. Ji ber vê yekê, deme ku derkevîne ji, herkesek li hewşa mizgeftê li hevdû dimêne. Piştî ku bidest rabûnê dikin, êdî piştî ne bi gelekî re mîr ji dide xwe ji ji cihê xwe dirabe ser xwe di wê heyeme de. Deme ku ew dirabe, êdî pêre mirovên li wir hemû ji dirabina ser xwe û ku ew derdikeve, êdî ew ji pêre derdikevine derve di wê heyeme de.

Bi hev re ku mîr li pêşiya wan derdikevine hewşa mizgeftê û li wir li hevdû dimênin. Weke qadarekê li hewşê li hevdû dimênin û wilo ku li hevdû ne ji bi hev re bidest axiftinê dikin. Mîr ji deme ku çavên dike ku li dore bigerêne, êdî ew mirovên ku mîr dabûbûna amede kirin û wê bi wan re heya Dînwerê wê bi wan re çûban ji nav mirovên li dore wî xwe dana kifş kirin. Ji ber ku wan ji fahm kiribû ku mîr çavên xwe li wan gerand. Deme ku mîr li dore xwe meyizend, wan di cih de ev yek fahm dikir û derkevîne pêş û li ber çavên wî. Ku mîr ew didîtî êdî weke ku ew tiştê ku çavên xwe lê biherêne û bibîne lê hat û piştî bi mirovên li dore xwe yên ku pêre diaxiftin re mijul bû. Li dore wî pir mirov hebû. Mihamed ji seyde Avdilrehîmê xaniqî ji ne li cihekî dûrî wî bû sekinî bûn. Ew ji li nêzîkî wî sekinî bûn. Lê mele Yunusê Xêlanî li ber wî sekinî bû. Faqîre mele Yunusê Xêlanî pir pîr bû. Bi zorakê xwe li ser xwe digirt. Ji piştî ne bi gelekî re wî li ber hêt li ser wan kevirên şahîk ku ji bo rûniştinê hatibûn çêkirin û hatibûn danîn li ser wan rûnişt.

Piştî ji xwe ne bi gelekî re êdî Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî ji kara ye çûnê kirin. Êdî wan bahsa çûnê kir. Yê ku pêşî bahs kiribû ji seyde avdilrehîmê xaniqî bû. Piştî ku hatibû bûna derve ji hundur, êdî ku hinekî li derve ji li ser lingan li hevdû mabûn, piştî seyde Avdilrehîmê xaniqî gotibû ji mirovên li dore xwe re, êdî waxtê çûnê hat. Deme ku wî wilo gotibû ji êdî herkesek weke ku were xwe lê hatibû. Herkesekî li wan êdî meyizendibû. Mirovên ku wê bi wan re çûnban ji ji bo çûnê pir tişt dabûn amedekirin. Di rê de çî ji wan re lazim ji bana dabûn amede kirin. Lê mîr bixwe ji ji mîr wir re hinek dîyarî ji li hespne dabûn amede kirin ku wan re ji wî re bişêne. Bi vê yekê re barê wan hinek mazin ji dibû. Yê wan ji hespên wan li derve girêdayî bûn. Ew amede bûn. Kengî Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî û ew amede bûn, êdî wê çûban û li hespên xwe suwar bûban û bi rê ketiban.

Piştire ne bi gelekî re Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî bidest xatir xwestinê kirin ji mirovên li dore xwe. Pêşî wan ji mîr û ji Mele Yunusê Xêkanî bidest xatir xwestinê kirin. Piştire çûne ber mirovên din û li ber wan sekinîn û xatir ji wan ji xwestin. Xatir xwestin, weke bêhneke berdewam kir. Piştire bi bêhneke re ku xatir xwestin bidawî bû, êdî piştire hê ku wan pişte xwe ne dayî wan û bi rê ne ketine, mîr berê xwe da wan û mirovên ku wê bi wan re herîn û li wan axift û ji wan ji hinek gotinên weke tembih kirin. Lê bi zêdeyî ji ji mirovên ku wê bi wan re çûban her weha axift. Mîr axiftina pir xweş ji wan re kir. Deme ku ew axift herkesekî lê pir bi bal hisand. Mîr di dawiyê de got "êdî de riya wa vekirî bê!" û piştire axiftina bidawî kir û wan ji careke din berê da mirovên li dore û gotin de êdî bixatire wan hemûkan û yên ku li dore wan ji ji wan gotin "ogura wa ya xêrê bê!" û êdî wan pişte xwe dana wan bi ber hespan ve çûn û piştire ne bi gelekî re êdî ketina ser riya xwe de û bi xêr û selemet bi rê ketin. Deme ku bi rê ketin, heya ku ew ji ber çavan winda ne bûn ji, mirovên ku li pişt wan man, bi mîr ve, ti kesek ji cihê xwe ne labitî û ne vaqataha. Ku ew ji ber çavan windabûn, êdî piştire ne bi gelekî re êdî mîr û yên ku pêre ne, ji cihê xwe labitîn û çûna bi malên xwe ve. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji êdî ketibûn rê de. Lê deme ku ji wir ketibûn rê de li hespan sûwar bûbûn. Herdû ji pîrbûn. Wilo zêde ne karîbûn ku xwe li ser xwe bigirin. Bi meşê wê êdî nikarî ban ku wilo zêde herin. Ji ber vê yekê hê di destpêka ketina rê de li hespan suwar bûbûn. Mihamed pir hij meşandinê dikir. Ku derfet didît peya dimeşî. Lê ew ji êdî pîr bû. Nekarîbû ku weke berê bi lingan zû bimeşê. Hê ji karîbû ku bimeşîyana. Li ser xwe ji dihata xuyakirin. Lê çawa ji bana ew êdî pîr bû. Wî ji ev yek zanibû û di têgihîştine wê de bû.

Beş 8.

Mihamed û seyde avdilrehîmê xaniqî û yên bi wan re weke demekê di rê de dimênin. Di gelek dever û herêman ve diçin û dibuhurin. Li gelek deveran de di sekinînin û bêne xwe diberdin. Her dera ku lê dimênin li wir hinekî dimeyîzênin ji bo naskirinê. Seyde Avdilrehîmê xaniqî gelek dever ji wan deverên ku tere diçûn nasdikir. Xosletên wanderan zanibûn. Her dera ku wî nas dikir ku dihatina wir, êdî Seyde Avdilrehîmê xaniqî jê re bahsa wê derê dikir û pê dide nasdikirin. Li wanderan ew çawa û bi çi awayî mabû û rasti kê û çi hatibû ji Mihamed re dianî ser ziman. Jê re bahsa herêmê dike. Lê ew di riya xwe de deverên ku diçûnê de li wan deran ji hinekî mabûn. Bixwe çûbûn û ketibûbûna nava herêman de û li wanderan

ji mabûn. Haya ku gahabûbûna Dînwerê demekê mazin ew di rê de di buhurênin.

Piştire ku digihine ber Dînwerê êdî berê ku bikevine hundur de çen mirov ji wan li pêşîye wan diçin û xaberê ji didina qasre mîr. Di wê heyeme de li qasrî mîr Eyûbê Musa Xan dima. Ew ji mîrekî pir baş bû û naqabîna wî mîrê Kirmaşanê re pir xweş bû. Xatuna wî Şamşa ji dibû zerîyeke mîrê kirmaşanê. Ji ber vê yekê ji pir bi ser hevdû diçûn û alikarîya wan digaha hevdû. Deme ku li pêşîye mirov diçin û xaberê didin êdî di cih de ew mirovên ku çûbûn bi gelek mirovên din yên sûwar divegerihin. Gelek mirov bi wan re tene pêşîye wan. Mîr pêşwaziyaka mazin ji wan re dike. Deme ku ew diçin û digihine ber navende ji, êdî li ber navende ew bixwe ji rastî mîr bi xwe tèn. Dibînin ku wa mîr bi mirovên navserî xwe yên ku li dore wîne wê bi ber wan ve tê. Deme ku digihine hevdû, êdî ew ji hê hinekî li dûr ji hespên xwe peya dibin û bi lingan bi ber wan ve diçin. Mihamed û ji dûr bala xwe dide ser wan. Seyde Avdîrehîmê xaniqî ji ji dûr ve bala xwe dide ser wan û çavên xwe li ser wan dike ku hê ji dûr ve ji li ser wan bi gerêne, ka ma ka hineke ku ew nas dike di nav wan de hene an ji nîn in. Bi vê nêhtê seyde avdîrehîmê xaniqî çavên xwe digerên. Ku hinekî din bi ber hevdû ve diçin, êdî hine bi hin hevdû baştir kifş dikin û dibinin. Hinekî dî ji diçin û êdî hevdû dibînin û kifş dikin. Piştire ne bi gelekî re êdî digihine ber hevdû. Ku digihine ber hevdû, pêşî êdî silavê didine hevdû. Piştire diçine ber hevdû û diçine ruyê hevdû.

Weke qadarekê silavdayîna hevdû berdeyam dike. Piştire ku hevdû silav dikin û hevdû nasdikin êdî Mîr wan dihilde û dibe qasre. Mîr deme ku silavdayîna hevdû bidawi dibe, êdî ew bixwe dibêje ji wan re ”win nahaka di rê de pir wastahana em herne malê û ji xwe re rûnihin û hem li rehetê xwe meyîzênin û hem ji bi hev re biaxivin”. Deme ku mîr wilo dibêje, êdî ti kesek ne bêje ne û herkesek dide pey wî û bi hev re diçina bi qasrê ve. Li dore mîr pir mirov hebûn. Hemû ji mirovên ku navserê xwe bûn. Seyde Avdîrehîmê xaniqî hin mirovên ku berê dîtibûn li wir ji nas kiribûn. Wan hevdû dîtibûn. Deme ku hevdû dîtibûn ji, pir bi hevdû ve mabû bûn. Piştire deme ku ketibûbûna rê de ku herne qasrê ji, ew ketibûbûna rex hevdû û bi hev re car bi car diaxiftin û dimeşîn. Mihamed ji li dore wî pir mirov hebûn. Ew ji di nav wan de diaxift û dimeşî. Her weha rewşeke wan hebû. Mirovên ku li dore mîr ji bûn, yên di nav xalkê de dihatina naskirin bûn. Yên ku zanist bûn. Yên ku navê wan hebû bûn. Seyde Avdîrehîmê xaniqî ne dûrî mîr dimeşî. Ew car bi car bi mirovên ku wê nav dikir re diaxift û dimeşî û car bi car ji bi mîr re diaxift. Wî mîr bi

xwe ji berî hingî dîtîbû. Deme di ser dîtine hev de pir dem buhurtîbû. Mîr ji ew dem, deme ku wî seyde Avdilrehîmê xaniqî dîtîbû bi bîr kirîbû û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji deme ku ew dîtîbû ew dem bi bîr kirîbû. Bi vê yekê, êdî ew bi hev ve mabûn. Lê bi xwe re mirovekî ku ne wilo hişk dihata xuyakirin bû. Yekî ku xwûnsêrîn dihata xuyakirin bû. Simbelne wî yê pir mazin hebûn. Ew simbelên wî ji dûr ve ji dihatina kifş kirin. Deme ku mirov lê dimeyîzend, pêşî ji wî tişte ku bala mirov pêşî dikisand simbelên wî bûn. Ew ji xwe re diaxivin û dimeşîn. Seyde Avdilrehîmê xaniqî ji mirovê ku naskirîbûn yek ji wan bi navê xwe Şêx Salihê dûrawanî bû. ew ji pir mirovekî ku zane bû. Navê wî ji bi zanebûna wî hebû. Ew bi xwe ji demeke dirêj li Cizîre bota mabû ji bo xwandinê. Deme ku ew li wir mabû ji, ji ber ku mirovekî ku jîr û pak bû, mîrê bota ji ew ji dîwana xwe qut ne dikir û her weha qadrekî mazin dideyê de. Piştî ku ew demeke dirêj li wir dimêne, êdî ew divegerihê wir. Ya rastî ku mirov bêje, deme ku ew divegerihê, hingî, hinek tiştên ne baş dibin. Hêzê sefeviyan têne bi ser kurdan de. Ji ber vê yekê kurdan gelek kuştin dabûn. Malbate wî ji zirereke mazin dîtîbû. Bavê wê Şêx Hisên ji li dergaha xwe diman. Lê piştî wan êrîşan re ne bi gelekî re ew diçê ser dilovaniya xwe. Êdî ew ji dibe nebe divêt ku vegehihe mala xwe. Deme ku ew divegerihê ji êdî ew li dewsa bavê xwe li dergahê bicih dibe û piştî ne bi gelekî re bi zanebûna xwe tê naskirin. Mirov dibînin ku ew çend bizane ya. Bavê wî ji mirovekî zane û bi qadr bû. Ew zanebûna xwe re di nav xalkê de dihata naskirin. Aqilekî wî yê mazin hebû. Piştî deme ku ew ji tê dewsa bavê xwe, xalk weke demekê ji lê bi bal dibin ku ka ew ji weke wî bi zane ya an ji ne. Piştî bi qadarekê re ku dibînin ku ew ji wilo bi zane ya êdî ew qadrê ku dabûbûna bavê wî dîdina wî ji. Piştî jê re tê gotin ku "te cihê bavê xwe vala ne hişt". Bi vê yekê xalk jê xweşbûna xwe têne ser ziman.

Bavê Şêx Salihê Dûrawanî dergaha kirîbû weke pirtûkxaneyekê, hingî pirtûk tede dabû bûna hevdû. Li dergahê ji gelek sofî û feqîh diman. Li wir dixwandin. Bi vê yekê dergahê hem karê xwe yê dergahiyê dikir û hem ji medresetî dikir. Bi hev re ev herdû dimeşandin. Bavê wî bi zanebûna xwe her weha ev herdû alî ji li ser lingan digirt. Deme ku ew çûbû bû ser dilovaniya xwe, êdî li wî bi xwe ji hatîbû meyîzandin ku ka wê karibe weke wî her weha li ser lingan bigirê. Lê piştî wî re hatîbû dîtin ku ew ji karê vê yekê li ser lingan bigirê û bi rê ve bibe. Wî ev yek di wê heyeme de dabûbû nîşandin..

Ku weke qadarekî bi hev re dimeşîn, êdî digihine qasrê û ku digihine qasrê ji êdî di pêşengtiye mîr de rê digirin û diçina dîwana rûniştinê û li

wir li hevdû dirûnihin. Li wir li qasrê li dîwanê deme ku dirûnihin ji, gelek mirov b hev re dirûnihin. Mîr bi tenê naye hiştin. Hertimî li dore wî pir mirov hebûn. Di wê heyeme de ji pir mirov li dore wî hebûn.

Şêx Salihê Dûrwanî bi xwe navê Mihamed û zanebûna wî pir his kiribû. Di wê heyeme de deme ku bahsa wî hatibû kirin û navê wî hatibû hildan bala wî pir bi hey çûbû bû ser wî di wê heyeme de. Mîr ji navê wî bi histibû. Wî ji di civatên xwe de navê wî hiskiribû. Bi vê yekê bala wî ji çûbû bû ser wî di wê heyeme de. Hê deme ku Mihamed li Cizire bota bû, navê wî pir hatibû bihistin. Wekî dî ji, ji herême botanê gelek mirov dihatina wê herême û divegerahan. Ji wanderan ji pir mirov diçûna herême botanê wanderan û divegerahan. Her çûn û hatinaka mazin li wanderan hebû. Her çûn û hatin ji, ne bê agahî bû. Her ku kî ji bana ku çûbana, ji kuderê çûbana, ji wir deme ku çûbana cihê ku ew diçûyê de, li wir di der haqe wê herême ku jê çatibû de agahîyên ku hiskiribûn û pêre hebûn dianî ser ziman. Bi vê yekê di derbarê herêman de bûna xwedi agahî dibû.

Piştîre ku li hevdû li civate dirûnihin, êdî piştîre ne bi gelekî re bi hev re bidest axiftinê dikin. Di wê heyeme de yê ku diaxiftinê li pêş ji bû seyde Avdîrehîmê xaniqî bû. Ew diaxift. Car bi car ji Mihamed ji diaxift. Lê Mihamed weke ku nexweze derkeve pêşîye wî di axiftinê de. Ji ber vê yekê ji ew dima sekinî. Ew wilo zêde ne diaxift. Lê bêaxiftin ji ne dima. Ew ji diaxift. Deme ku axift ji bal pir diçûna ser wî ji. Ku bi axiftinê demekê dibuhurênin, êdî hin bi hin ew li hevdû germ dibin û êdî di nav wan de axiftin û danûstandin gurr dibe. Êdî bi hev re pir dikevîne axiftinê de. Mihamed ji êdî hin bi hin ne hindik tevî axiftinê dibe. Seyde Avdîrehîmê xaniqî cara pêşî deme ku hatibû wir, wî li wir pir mirov naskiribûn. Lê wê carê gelek ji wan mirovan li wir di wê carê de ne dîtibû. Di axiftina xwe de car bi car ji navê wan ji dianî ser ziman. Lê deme ku tene ser ziman ji, ku bersiveke wî diêşene dihilde êdî dimêne sekinî di cihê xwe de. Gelek ji wan mirovên ku wî berê li wir dîtibûn, di wê heyeme de wî ne dîtibûn. Ew çûbû bûn ser dîlovaniya xwe. Deme ku seyde Avdîrehîmê xaniqî vê yekê his dike, êdî pir bidilêş dibe. Dem ku hin bi hin tene diçê, êdî ew rewşên yên ku pişt wî re di naqabîna cara pêşî û wê carê hatina wî de bûna fêr dike. Hin bi hin çend ku axiftin dibin û danûstandin dibin ew vê yekê fêr dike. Mihamed ji di rex wî de rûniştîya û bi hev re diaxiftinê de ne. Mîr ji di nav axiftinan de pir aktive. Ew ji pir diaxivê. Ew ji zanebûna wî pir mazin e. Deme ku ew di axivê, êdî ev yek jê tê farq kirin. Weke demeke ew li hevdû her weha dimênin bi hev re

diaxivin. Piştire ne bi gelekî re êdî xwarina wan tê ber wan û dikin ku xwarina xwe bixwûn.

Piştire ne bi gelekî re xwarina wan tê ber wan û xwarina xwe dixwûn. Lê bi axiftin û bi hev re bi danûstandinê êdî hevdû ji hin bi hin nas dikin. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî hinek mirovên ku berê dîtin û di wê heyeme de weke mirovne navserî xwe û zane û pîr li wir bûn. Wî ji bi wan re di da û di stand. Mihamed ji bi car bi car diaxift. Ew ji bi mirovên di rex xwe de diaxift. Lê axlabe ji, deme ku yek diaxift yê din ji lê dihisandin. Ji ber vê yekê ji ew ji bédeng diman. Lê piştî ku rûniştibûn ji, du an ji sê caran wî ji mafê axiftinê girtibû û axiftibû. Lê di wê heyeme de yê ku diaxiftin bi zêdeyî ji mîr, seyde Avdîlrehîmê xaniqî û seyde Xalit bû. Seyde Xalit ji mirovekî ku pîr pîr bû. Lê ew ji pîr mazin bû. Pîr pîr bû. Di nava salan de çûbû bû. Hingî pîr bûbû, bûbû weke komek hesto di wê heyeme de. Lê bi zanebûna xwe û bi bîr û hişê xwe herkesekê li dore li xwe bi heyran dihişt. Mirovan pîr rêzeke mazin jêre digirt. Ew ji hertimî li Mizgeftê dima. Mala wî ji li ber mizgeftê bû.

Mîr ew hertimî di civatên xwe de dide amede kirin. Bawerî û rêzeke mazin ye mîr ji ji wî re hebû. Deme ku ew diaxift, herkesekê li dore wî ji lê bi hey dima. Seyde Avdîlrehîmê xaniqî ew pîr nasdikir. Cara pêşî deme ku seyde Avdîlrehîmê xaniqî hatibû wir, bi wî re pîr mabû. Pêre pîr dabû û standibû. Ew zanistekî mazin yê deme xwe bû. Gelek seyde Xalit weke ku mêhla wî pîr li bawê tahirê Uryanî hebû. Wê ji wî pîr xwandibû. Qasîde û gotinên wî, wê ji ber zanibû. Deme ku ew di wê heyeme de axiftibû ji ne demeke dirêj axiftibû. Lê çend ku ne dirêj axiftibû ji pîr carana bahsa wî kiribû. Ew di nav axiftina xwe de anîbû ser ziman.

Piştire ku xwarina wan ji hat û li ber wan hata rastkirin, êdî piştire wan ji bi pêşengiye mîr re xwe li dore sofre xwarina xwe ku li ber wan xwe dabûbûna hevdû û bi hev re bidest xwarinê kiribûn. Lê di ber xwarinê re diaxiftin ji bi hev re. Weke qadarekê li ser xwarinê dimênin û xwarina xwe dixwûn. Ku xwarina xwe xwarin, êdî dise wilo weke ku xwe di pêşengiye mîr de dabûbûna dore sofre xwarinê, herweha wilo ji wan xwe ji dore sofre xwarinê di pêşengiye wê de bi şûn ve kişandibûn. Ku xwe kişandibûn, êdî seyde Xalit li ser navê mirovên ku li wir di wê heyeme derûniştibûn, li mîr zîvirî gotiyê de "sofre te dayîm bê!". Ku wî wilo got, êdî mîr ji dore xwe re got "noşî can bê!". Piştire, ku wî wilo got, êdî piştire di cih de mirovên ku sofre ji wan re li ber wan vekiribûn, wilo ji hatibûn û sofre ji ber wan dabûbûn hevdû û hilandibûn. Piştire ku sofre ji ber wan hata hilandin, êdî piştire dise di nav xwe de bidest axiftinê kirin. Piştire dise di nav wan de

axftin û danûstandin di nav wan de germ û gurr bû. Bi vê yekê re êdî bi hev re dise ketina axiftinê de. Seyde Avdilrehîmê xaniqî pir hij axiftinê dikir. Û pir zanibû ku bi axivê ji. Deme ku di axift pir bi zane û mazin di axift. Deme ku di axift kir ku herkesek bi hey bala xwe bidine ser wî di deme axiftinê de. Piştî ku axiftin di nav wan de germ û gurr bû, êdî Mihamed ji di axift. Mihamed pir bizane di axift. Deme ku di axift, dikir ku bal pir bi hey herine ser wî. Seyde Xalit navê Mihamed his kiribû. Ew di nav mirovên li wir yek ji wan bû ku yê ku navê wî bi zanebûna wî his kiribû bû.

Deme ku Mihamed axiftibû, wî pir bi hey bala xwe dabûbû ser wî di wê heyeme de. Piştî ku Mihamed axiftina xwe bidawî kiribû, piştî wî re seyde Xalit axiftibû. Lê deme ku ew axiftibû, weke ku bixweze bi Mihamed re bikeve danûstandinê de axift. Weke ku bixweze zanebûna wî biazmûn bike li wî axift. Lê Mihamed ji ev yek di wê heyeme de axift. Piştî ku seyde Xalit her kir, êdî piştî weke qadarekê ew axift û piştî ku wî axiftina xwe bidawî kir, êdî Mihamed careka dî mafê axiftinê hilda û axift. Vê rewşê weke qadarekê di nav wan de berdewam dikir. Bi mîr re yên ku li wir bûn, hemûkan ji bala xwe dabûbû ser wan û li wan dihisand. Seyde avdilrehîmê xaniqî ji li wan dihisand. Lê ew car bi car bi gotin bi gotin ji bana, tevî wan dibû bi axiftinê. Lê ne zêde. Weke ku ew di nêzikatiya xwe de xwe bide sekinandin wî di wê heyeme de xwe bêhis dikir. Mihamed û seyde Xalit, piştî ne bi gelekî re axiftin di nav wan de germ û gurr bû. Bala herkesekî çû ser wan. Herkesek bêdeng ma. Ew deme ku axiftin, ji dîrokê bigire haya ku bigihê her mijarên hizir ew li ser axiftin. Li ser gelek mijaran wan hizre xwe li ber hevdû anî ser ziman. Piştî ku weke qadarekê her weha di nav wan de berdewam kir, êdî piştî di dawiyê de seyde Xalit mafê axiftinê hilda û her weha ji Mihamed re got, “ti zanistê deme xwe yî. Mîn dît û fahm kir ku ti pir kur bûyî. Vêce ti ji naha pêde bi zanebûna xwe ji me re pêşavaniyê bike”. Wî wilo got û ma sekinî. Piştî ku ew ma sekinî, êdî Mihamed mafê axiftinê hilda û bidilekî nazik axift û hizre xwe her weha li ber wî anî ser ziman, “ez yê weke min xwandavanên li berdestê xwûde ne” û piştî hinekî dît ji li ber wî axift û hizre li ber wî anî ser ziman û rêze xwe ji ji wî re da nîsandin û piştî wî axiftina xwe bidawî kir û ma sekinî di cihê xwe de. Piştî wî weke demekî axiftin zêde ne bûn. Weke bêhenekê ji bêdengî di nav wan de bû. Piştî bi qadarekê re yê ku ew bêdengî xira kiribû ji mîr bi xwe bû.

Mîr deme ku axift weke çend gotinan li ser seyde Xalit anî ser ziman û piştî çend gotin ji bi Mihamed ji wî anîbûbûna ser ziman. Gotinên ku wî ji bo Mihamed anîbûbûna ser ziman, her weha li ser zanebûna wî bûn. Mîr

di nav civatê de xwe ji bo wî gotibû ku ew çend bi zane ya. Wî gotibû ku “me fahmkir û nas kir ku Mihamed çend bi zane ya”. Mîr piştê di n’axiftina xwe de bahsa Mihamed hinekî dî ji kiribû. De ne, berî hingî navê Mihamed di civate wî de hatibû bû ser ziman. Piştê êdî ew mabûbû sekinî axiftinên di nav wan de berdewam kiribûn.

Axiftinên di nav wan de weke demeke dirêj berdewam kiribûn. Haya demeke dereng ber dewam kiribûn. Haya demeke dirêj ew li hevdu rûniştibûbûn û bi hev re axiftibûbûn.

Ku deme dibe dereng li wan, êdî hin bi hin dikin ku civate xwe jê belav bikin. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî û yê bi wan re ji jî riyeka dûr hatibûbûna wir û pir ji wastahî bûn. Deme ku mirov li wan ji dimeyîzend, mirov fahm dikir ku ew wastahî ne. Ji rewşa wan ev yek di wê heyeme de dihata xuyakirin. Mîr ji di wan de wastandinek farq kiribû. Ku dem hinek bi ber derengbûnê ve çûbû bû, êdî wê wastandinê xwe di wan de dabûbû ber çavan. Piştê ji xwe ku hinekî dî ji dem diçê û hê hinekî dibe derengtîr, êdî deme rabûnê tê û êdî bahsa rabûnê tê kirin. Piştê êdî karê rabûnê tê kirin û mirovên ku li civate mîr bûn, dirabine ser xwe ji civatê. Ku mîr ew dirabin, êdî mîr pêşî li pêşiya wan dirabe û bi wan re diçê derve û wan bi rê dike. Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî li wir dimênin. Mîr ji wan re di cih de piştî jê belavbûna civatê cihê wan dide amede kirin. Mala seyde Xalit ji jî wir ne dûr bû. Deme ku ew dike ku herê, mîr û Mihamed û seyde Avdilrehîmê xaniqî ji wî didine sekinandin. Ew ji li wir dimêne. Ew ji xwe berî hingî gelekê caran li wir dima. Li qasra mîr pirtûxaneyeka mazin hebû û ew lê pir dima û demên xwe bi xwandinê re dibuhurand.

Wê şevê ji piştî ku civat belav dibe, deme ku ew dikin ku herine ser cihê xwe ku xwe dirêjkin û hinekî serê xwe deynin û razihin, ji dêla wê di pêşengiye mîr û seyde Xalit de diçina pirtûkxane û li wir ji hinekî ji xwe re dirûnihin. Seyde Avdilrehîmê xaniqî berî hingî ewder dîtibû. Wî li wî pirtûkxane pir xwandibû. Wî heyeme de ji deme ku têne wir, ew dem têne bîre wî û hinek bi wê dikeve nava hiziran de di serê xwe de û dihazinê. Mîr ji û seyde Xalit ji vê yekê pêre kifş dikin. Deme ku kifş dikin, êdî jê dipirsin ku ew ketiya hiziran de. Ew ji wan re êdî bahsa deme xwe ye berê ku li wir mabû û li wir car bi car xwandibû ji kiribû..

Ew weke qadarekê li wir ji dimênin êdî piştê dikin ku herine ser cihên xwe û hinekî xwe rehet bikin. Deme ku dikin ku herine ser cihên xwe, êdî piştê ne bi gelekî re diçina ser cihên xwe. Mihamed ji diçê cihê ku jê re hatibû amede kirin. Ew di wir û weke bêhneke bi rûniştî li wir li ser cihê

xwe dimêne û dihizirê. Piştire êdî ku xew bi ser çavên wî de tê, êdî ew ji xwe li ser cihê xwe, xwe dirêj dike û hinekî wilo dihizirê li ser demên xwe yê berê û hatina xwe ya berê. Wî hê li Cizîre bota biryara xwe di serê xwe de dabû ku were haya wir û wanderan bibîne. Nahaka vêce li wir bû. Wî gotina xwe bicih anî bû. Deme ku hizir de demên wî yên li Cizîre bota bi faqa Qasim û mele Silêman re hatibûna ber çavên wî di wê heyeme de. Weke qadarekê li ser wan ji hizirê bû. Xew ji li ser çavên wî hebû. Lê wî li ber xwe dide ji bo ku nekeve xewê de di wê heyeme de ji bo ku bihizirê di wê kêlikê de. Wî demeke xwe ye pir dirêj di riyan de û li deran haya ku hatibû wir buhurandibû. Li gelek deveran mabû bû. Li gelek deveran geraha bû. Li Başûrê Kurdistanê ji deverên bi nav û deng û ew lê wanderveran mabû bû. Li rojhilat ji li hinek deveran mabû. Lê hê li rojhilat bû. Wê hê li rojhilatê Kurdistanê wê li gelek deveran mabana. Wê hê gelek dever dîtibana. Her ku digeraha û di dît, bêhtir nas dikir û di dît. Bi di serê xwe de ji mazin dibû. Ew ji xwe di serê xwe de pir mazin bû. Bi xwandin, gerahandin û hizirkirinê re wî xwe pir dihizir û zanebûnê kur kiribû.

Mihamed ku weke qadarekê li ser cihê xwe dirêjkirî dihirê û piştire hin bi hin êdî çavên diçine ser hevdû û dike ku bikeve xewê de. Mijgulên çavên wî hin bi hin diçin û tên. Weke qadarekê ku li ser demên xwe yên berê dihizirê, êdî bi wê hizirandina xwe re ji xwe diçê û dikeve xewê de.

Wê bi sibehê re wê ji bo wî rojeke nû dest pê kiribana. Wî li wir li Dînwerê ji weke demekê êdî wê ew mabana. Wê li hevirdore wê ji geraha bana. Hata Xorasanê wanderan wê çûbana. Ev deme jiyane wî, her weha wê hinekî dirêj û hinekî dî bi ger buhurî bana...

.
Dawîya berga çaremin a Feqiyê Teyran

.
Cizîra bota, Kurdistan, Abdusamet Yigit .

